ABDUSAMET YÎGÎT

# FEQIYÊ TEYRAN

Weşanên Sara'yê

FEQIYÊ TEYRAN -I- ABDUSAMET YÎGÎT - Roman.Sala li çapdanê 2009, Stockholm, Swêd. Mafê berhemê: Abdusamet Yîgît & Weşanxana SARA'yê. Wêneya bergê: Kincên Peyayên Kurd 1885 (Antique Ethnographic Print: *Kurdish Men and Costumes of Kurdistan - 1885*).

Weşanên SARA'yê

FOUNDATION FOR KURDISH LIBRARY & MUSEUM
Dalag. 48
S-113 24 Stockholm SWEDEN
info@saradistribution.com

ISBN 978 91 87662-55-8

PÊŞGOTINA WEŞANXANÊ

Abdusamet Yîgît sala 1978'ê li gundê Xirabesosinê ku di navbera Cizîra Bota û Nisêbinê de ye, ji dayik dibe. Biçûkatiya xwe li wir dibuhurîne. Ta ku dibe 10 salî, li gund dimîne. Pişt re, ji ber hatina dewletê bi ser şêniyê, ew bar dikin bajêr. Dema ku ji gund bar dikin, pêşî diçin gundekî, ku jê re dibêjin Selekunê. Ji wir re Seregir jî têt gotin. Li Selekunê jî derfet na din malbatê, ku li wir bimînin. Yên ku bi wan re bar kiri bûn, nêzîkê 50 mal bûn, hemû jî malên mam û biraziyan bûn. Piştî ku weke 5 yan jî 6 mehan li Selekunê man, tevde barê Midyadê kirin. Li Midyadê malên wan tev bi cih bûn. Piştî bi cih dibin, dewlet dîsan bela xwe ji wan na veke. Vêca ji Midyadê barê Estîlê dikin. Li wir Samet temenê xwe yê xwandinê hilda û gav avête nav salên xwe yên ciwantiyê. Lê belê dewlet li wir jî hate ser bavê Samet û ew êdî carek din jî, ji ciyê xwe hatin rakirin û ji wir jî bar kirin. Mamê Samet yekî serxwe bû û bandûreke wî li ser xelkê hebû. Dewlet jî dixwast, ku vê hebûna wî bi kar bihêne. Ew jî li hevberê vê rabû. Sal 1987 bû. Di wê demê de, dewlet dixwast ku cerdevaniyê pêş bixe. Ew li hevberê vê yekê bûn. Têkiliya wan bi têkoşîna azadiya kurdan hebû. Li Midyadê, ew ta sala 1991'ê man. Pişt re ji ber terora dewletê, bêgav man ku Kurdistanê bi yekcarî bi cih bihêlin û barê Mêrsînê bikin. Di wê demê de jî, li gund û li ciyên din çend mal û sermiyanê wan ku hebûn, dewlet tev dest da ser de û tev da ew gundê ku li ber gundê wan bû û navê wî gundî Alaqamsê bû. Ev gund tev cerdevan bûn.

Samet li Serhedê hat girtin. Dewlet dizani bû, ku têkiliya Samet bi têkoşînê re heye. Ji ber vê yekê jî, gava ku ew girtin, 17 rojan di bin çavan de hiştin û pişt re jî, ew şandin girtîgeha Îdirê. Li girtîgaha Îdirê 47 rojan ma bi 40 hevalên xwe re. Paşê ew tev hev şandin girtîgeha Erzeromê. Di wê demê de li girtîgeha Erzeromê dema wehşetê bû. Samet li 5'ê Çiriya Yekem 1994'ê têt girtin. Piştî 47 rojan, girtîgeha Îdirê, 22 mehan li girtîgeha Erzeromê dimîne. Ji endametiya rêxistinê, di DGM'ê de têt darizandin. Piştî ku derket, bi çendî sê mehan careke din hat girtin. Vê carê jî li Êlihê hat girtin. Li wir, cara ku ser 10 rojan di bin çavan de hat

hiştin û pê de, ew şandin girtîgehê. Bi çendî salakê li hundir ma. Di wê demê de li DGM'ê li Amedê hat darizandin. Li dadgahê 12 sal û nîv ceza jê re xwastin û dan. Piştî ku ceza dane wî, êdî ew şandin girtîgeha Gîresûnê. Li vê girtîgehê 8 salan ma. Piştî heşt salan, sala 2004'ê, 27 salî, ji girtîgehê derket. Samet têkoşîna xwe ya ji bo azadiya kurdan hîna jî didomîne.

Samet bi vê meşqkirin û vegotina hizrî, ya li ser klasîkvanekî me yê fireh navdar, li ser jiyana Feqiyê Teyran; vegotineke serguzarî (roman), wêjeyî, derûnî, ya têra xwe zindî û rengîn dihone.

21.3.2009

# FEQIYÊ TEYRAN

## I

Rojek wek ji wan rojên din bû. Lê li hewa serma hebû û ev serma jî bi xwe re seqemeke pir hişk ji derve dihanî. Bi wê seqema serê sibehê re, Hasnê jî zû rabû bû ser xwe û kar û barê xwe yên malê dikir. Mêrê wê Hamed Beg jî, dereng ji xew rabû bû û li ser taştê rûnişti bû, taştiya xwe dixwar. Hasnê berî wî ji ser taştê rabû bû ser xwe, ji bo kar û barê xwe hinekê zûtir pêk bihêne. Hamed Beg taştiya xwe kir, rabû û çû li ber dîwarê malê, li ber germahiya beroşkê rawestiya. Ew germahiya ku ji royê derdiket, germahiyeke xweş dida û ew germahî jî, wê seqema hişk a sibehê dişikand. Derdor germ dibû û bi germê re jî, di wê heyamê de, hewa hinek xweş dibû. Hasnê ne dikarî pir bi karên giran rabe. Karên ku dikari bû bike, dikir. Hasne zikê wê li ber devê wê bû. Ducanî bû. Di demeke nêzik de wê zarokek jê re çê bûya. Ew jî ji ber vê yekê dilxweş û bidil bû. Ew zarokê wan ê pêşî bû.

Berî ku begê wan ê mazin ji aliyê osmaniyan ve fermana mirinê jê re were dayin, jin hanî bû. Piştî ferman jê re derketi bû, ji wir çû bû. Lê çi kesekî ni zani bû ka ew çûye ku derê, yan jî nuha li ku derê dimîne. Lê bêguman hê sax bû. Ji ber ku hê nûçeya mirina wî ji maliyên wî re ne hati bû. Heger mirî ba, yan jî leşkerên osmaniyan li ciyekê xwe gihandibanê, wê nûçe zû belav bibûya. Begê mazin diçe,  li nig Mîr Mihemed Mîrê Bazîdê xwe dide alî. Mirê Bazîdê mîrekî pir baş û bi qenciya xwe jî fireh dihate naskirin. Beg û axayên li derdorên Agriyê (Araratê) jî gelekî rêz didane wî  û li gorî gotin û lebatên wî gavên xwe diavêtin. Ji ber vê yekê, rezê Şêxê Îdirê jî, ji wî re hê mazintir dibû.

Hasnê jineka pir baş û yeka zîrek bû. Li nav civakê û li derdora xwe dihate naskirin. Hasnê Xatunê, qîza begê Miksê bû. Begê Miksê jî li derdorên herêma Colemergê bi nav û deng bû.

Colemerg di wê demê de heremeke gelekî bi nav û deng bû. Piştî şerê ku li herêmê ku di nav wan û osmaniyan de bû bû, êdi hê bêhtir bala sultanên osmaniyan kişandi bû ser xwe. Hêjayê gotinê ye, ku divêt mirov bêje, ku piştî şerê dema wan, dewleta osmanî li herêmê, di bin navê 'rastkirinê' de gelek guherandin dabûn çêkirin. Weke begê Miksê yên gelek herêmên din jî, bextên wan bû bû wek hev. Lê ji aliyê rêveberiyê ve, ya serketî dewleta osmanî bû. Bi hêzeke mazin xwe bi ser xisti bûn. Bi wan serketinan re, li herêmê û bi begên herêmê re jî gelek guharandin bi xwe re hanî bûn. Piştî seferên bi wan şeran re, gava ku sultanê osmaniyan sefera li Kurdistanê hê maztir dike, êdi wan guherandinan tevî gelek xirakirin û perçiqandinan dest pê dikin û berdewam dikin.

Begê Miksê jî, bi vî awayî ji herêmê têt revandin. Lê lingê wî ji herêma wî na be, ku here herêmeke din û dûr be. Li herêma xwe dimîne, ta ku kal dibe. Kurê wî Hemed Beg jî di wê heyamê de bi awayekî xwezayî cihê wî digire. Gelê Miksê pişta begê xwe û malbata wî digirin û na berdin bi tenê. Ji ber vê yekê jî, Hemed Beg li wir dimîne. Ji aliyekî dî ve jî, dewleta osmanî pir ne diwêrî bû, ku here ser wî. Piştî ku beg ji herêmê çû, ji ber ku di nav civakê de têt jimartin, ku beg ne li malê be û hêriş here ser mala wî, wê beg û axayên herêmê jî, li hevberê vê yekê serî rakin û ev yek, ji bo osmaniyan hîç jî ne baş dibû. Di nav civakê de, her weha weke kevneşopiyeke xwezayî jî, li malbatê xwedîderketin hebû. Di vê xalê de hêjayê gotinê ye, ku divêt mirov bêje, ku mala ku hêza xwe winda kiri bin, lêxwedîderketin weke kevneşopiyeke xwezayî bû. Ji her herêman lê xwedî diderketin û lê dimeyizandin di nav civakê de. Ji ber vê yekê jî rêvebirên osmaniyan ku hatiba, diviya bû pêşî bi serekan re rûnişta, yan jî wan bikişînin nig xwe daku xwe bi ser xin. Ku dihatin jî, yê ku pêşî dikirin ev bû. Şêx û axa û begên herêman, her weha hem jî aliyê mirovên herêman ve, weke ewlekariyeke bi kar dihatin û hem jî, ji aliyê rêveberiya osmaniyan ve ji bo ku nêzikî mirovan bin ew dikişandin bi aliyê xwe de û ew bi kar dihanîn. Lê osmaniyan ev yek di bin navê nêzikatiyeke olîtiyê de dikirin. Dema ku beg çû bû, pişt re Hemed Beg jî bû bû weke begê Miksê. Bavê wî ji bavkalê wî senceqa ku osmanî dabûnê, ji

dest girti bû û ta wê roja jiyana xwe bi awayekî xwezayî berdewam kiri bûn. Beg û axayên herêmê, xwe li gorî jiyan û kevneşopiyên xwe berdewam dikirin. Osmanî dixwastin li gorî nêzikatiyên wan were berdewamkirin. Di nav wan her du nêzikatiyan de, serekî xwezayî ku di nav herêmê û osmaniyan de li ser wan nêzikatiyên bingehîn, ku bi hizrî û civaknasiyê jî dihate ser zimên û xwe di nav wan de didan berdewamkirin.

Hizra civaknasiya Kurdistanê, xwe bi xwezayê re bi wate dike. Ev xwezayetî ji aliyê nêzikatiyên civakî ve jî, her weha xwe bi wate dike. Li hevberên wan rawestan jî, bi vî awayî dibû dûrketina civakî. Li gor vê yekê ku mirov dihizire, mirov dibîne ku şerên dijwar ku bi kuştinên koman re berdewam kiriye. Her weha dîrokek bi xwîn hatiye nivîsîn.

Li Miksê jî ev yek pir bi wate bû. Ava Wanê hinekî ev wate mazintir dikir. Herêm piştî dema ûrartûyan, ta wê demê, her weha ji bo hebûnên xwe rastî hêrişan hatine. Ji ber gelek hêrişan, xwe spartine wê derê. Lê çûna ser wê derê jî hinekî bi dijwarî dibû, ji ber ku mirovên ku xwe spartine wê derê, ji êlên (eşîrên, hozên) wê çûbûn ser wan. Wê çaxê çûne ser wan kesan û li nav hêrişên êlan de mane. Ev yek ji bo artêşê têkçûneke mazin bi xwe re haniye. Osmanî jî ev yek ji ber çavan ne dihildan. Her weha kevneşopî ji parastina mirovan re dibû şargeheke mazin. Li hundirê Wanê yan jî li aliyên din, li navendê jî, filehan, di nav dêran de hinek cihên veşartinê çê kiri bûn. Wan ciyan jî di bin hêrişan de dihatin bi karhanîn.

Li Miksê, ji gelek aliyên ve jî, cihên ewlekariyê çê kiri bûn. Ev cih mazin û di zikê xwezayê de hati bûn çêkirin. Cihên ku ji bo ewlekariyê hati bûn çêkirin, li dêrên weke Miksê, weke nêzîkê cihên daristanan û hwd dihatine çêkirin, daku di tengasiyekê de xwe bigehênine hundurê wê derê. Ku xwe digihandine daristanê, ji çiyayê Sîpan û pişt re Agirî ji bo wan dibû cihekî ewletiyê. Ji êla Hemed Beg jî gelek kesên weha di rewşên dijwar de xwe digihandine ciyan û rizgar dibûn.

Hemed Beg piştî xwarina xwe xwar û hate ber wê tîna rojê, ku zû serê sibehan derdikeve. Serê sibehê ew tîn pir xweş e û li ser

mirov hîkariyekî (tesîreke) pir xweş dike. Hasnê jî pir bi kar ve na mîne ji ber ku ni kari bû pir kar bike. Karê ku kari ba dikir, ê ku ne kari ba jî dihişt ji yên ku dikirin re. Lê piranî karê mala xwe wê dixwast bi xwe bike û dikir. Ku jê dihat, çi caran bi hêviya çi kesekî ve karê xwe ne dihişt. Her weha karê xwe jî, xwe bi xwe kirin jî, tiştê ku herî zêde jê hez dikir. Hamed Beg jî, ji ber ku kurê beg bû û her dem mirovên ku dihatine dora wî, di nav wan de dima. Lê piştî ku begê mazin çûbû, êdi zêde civata wan ne digihaşt hev. Piranî jî, Hemed Beg dema xwe bi Hasnê re li malê dibuhurand. Lê car bi car jî, jin li hev digihan û bi hev re dipeyivîn û li ser mijarên di nav xwe de dan û standinan dikirin. Ji aliyek din ve jî, Hasnê bi tenê ne dima ji ber ku ducanî bû. Ha wê zarokê wê bibûna û ha wê zarokê wê bibûna. Li ser lingan bû. Lê ew jî û Hemed Beg jî pir lihev bûn. Zarokê wan yê pêşî wê çê bibûna. Lê begê wan ê mazin ne li nig wan bû. Bêguman vê yekê jî li ser wan hîkariyê dikir. Lê ne dibû asteng ji dilxweşiya wan re, ku wê zarokê wan çêbe. Di nav jiyana xwe de bi xwezayî tevdigeriyan. Ma gelo wê keç çê bibûna yan jî kur? Ew yek jî weke meraqek di dilê wan de bû. Ma wan çi dixwast?  Keçik yan jî kurik? Tenê weke meraqek di serê wan de hebû û her wekî din, ji wê pê de çi tiştek wê kêlikê di ser xwe de ne dihizirîn. Tenê dikirin ku rojek berê zarokê wan were dunyayê, ku bêguman wê pir bi nirx û hêjayî be ji dê û bavê xwe re. Tenê car bi car ku Hasnê dirûnişt an jî bi tenê dima, destên xwe datanî li ser zikê xwe, dibir û dihanî. Bi kêf û bi dil jî li zikê xwe dimeyizand. Ma gelo çi di zikê wê de hebû? Keç bû yan jî kur? Ew jî pir bi meraq bû. Wê kêlikê gelekî dixwast fêr bibe, ka bi wê re keç e yan jî kur? Lê ne dibû ku wê kêlikê vê fêr bibûya. Divêt ta ku zarokê wê bibûna di vê nezaniyê de bima. Zarokê wan yê pêşî bû ku wê were dunyayê. Ew yek jî pê re dibû sedema hinek dilperîn û bêtebatiyan. Lê ji neçarî diviya bû, li ber hatina roja xwe bima. Ji neçarî bû ku ni kari bûn fêr bibûna ma ka kur e yan jî  keç? Yan jî ni kari bû berî dema xwe tijî bike, ku were dunyayê. Ji wê aliyê ve,  tiştek di destê wê de tune bû. Lê pir bi dil û bi xweşî li hêviya wê roja ji dayikbûna zarokê xwe rawestiya bû. Her weha weke wê, Hemed Beg jî li hêviya çêbûna zarokê bû. Hemed Beg jî wê cara pêşî bibûya bav.

Ji wî aliyê ve jî, hinek meraq û dilxweşî pê re hebûn. Ma gelo ew hesta ku ji nûka ve bibûya bav, ku xwe pê re dide nîşandan, çawa bû? Çi di dilê wî de çê dikir? Yan jî bavîtî çawa bû? Hemed Beg jî wê bibûna bavekî çawa gelo? Her weha bi wî re jî gelek pirsên ku bersiva wan ni zani bû, di serê wî de bûn. Tenê ev pirs di serê wî de bûn, lê wê di demeke nêzik de bersiva van pirsan bihata. Pir carên ku li hewşê yan jî li hundurû ku digehîştin hev, bi xweşî li hev dimeyizandin û bi hev re bi dilxweşî dikeniyan û paşê di hevdu re dibuhurtin.

Her weha dilxweşiyeke pir mazin bi herduyan re jî xwe dida xuyakirin. Hasnê wê bubûya dayik û Hemed Beg wê bibûya bav. Ev hizir di serên herduyan de ji hebû. Hasnê û Hemed Beg bi hezkirina hev, hevdu mar kiri bûn. Ji ber wê yekê jî pir hez ji hevdu dikirin. Hezkirineka mazin di dilê wan de ji bo hevdu hebû. Ev hezkirin bû ku wan ev çend bi hev re ji bo bûna zarokê wan bi hêvî û bi dil kiri bû. Bi wê hezkirinê re di dilên xwe de, bi hev re li zarokê xwe dimeyizandin. Ev hest bi wan re hebû, lê ma gelo wan ev hest çawa yan jî bi çi awayî dihanîn ser zimên? Mirov li ruyên wan dimeyizand, dihat têgehîştin, ku bi hestbûn û rûfihêtî di nav hev de li ruyên wan dixist û bi ruyên wan re dida derve. Lê bêguman divêt mirov bêje ku şahiyek di dilên herduyan de hebû, ku wan bi xwe vê jî bi temamî ni kari bûn bihênine ser zimên. Tenê vê dijiyan. Hemed Beg bav bû ji ber vê yekê kî dizane dibit, ku di dilê xwe de, weke xwe, kur jî dixwast. Lê tiştek ne dida derve. Heger kur be, wê weke wî bibe beg li ser serê herêmê, wê navê wan welê berdewam bike. Lê bi wê bavbûnê re tenê bûyina bavîtiyê di serî de cih girti bû. Carinan kur çê dibûn an jî keç. Lê gava ku mirov ji axatiyê be yan jî begîtî, bêguman her weha dixwaze weke wî jiyanek bi tuxmê wî re li pey wî re jî berdewam bike. Ev xwestek, xwestekeke asayî ye. Lê ji bo mirovekî ku hez kiri be û her weha evîndarê xwe hanî be, ma gelo ev asayî ye? Ma evîndarî ne xwezayî ye, ku bi hev re li gotinekê yan jî li ser biryarekê ku bi hev re were girtinê? Ma ew bi hev re xwedî gotin bûn? Ma gelo hizra Hasnê çi bû di vê xalê de?  Ew jî jin bû û bêguman ew jî, ku mirov li gora wê mentiqê (lojîk) bihizire divêt, ku mirov bêje ew jî bi

awayekî din dixwaze. Mirovên mazin bin û di nav civakê de xwedî biryar û gotin bin, her weha li ser xalên bi vî awayî re jî, bi taybetiyên xwe re, xwe didin nasandin. Mazinbûn û evîndarî her weha di rêveberiyê de bi nakokiyên kesayetiyê (şexsiyetê) re xwe dide nasandin. Lê bêguman divêt mirov bêje ku ev nakokî her weha bi vî awayî, di dilên ew kesên ku hevberên hev in, êşê jî çê dike. Ji ber ku evîndarî û mazinbûn di kesayetiyê de, di ser de ye di wê kêlîkê de. Hasnê jin bû û ku mirov li gor vê yekê dihizirî, mirov didît ku nêzîkatiyeke her weha ku hebe, wê gelekî êş pê re çêbe. Dilên tenik ji evîndariyê re hene. Lê dilên tenik jî, bi pirhestên di dil de ne. Pirhestbûn jî, ji aliyê hestan ve be, yan ji hizir be, rûniştinekê dixwaze di kesayetiyê de. Ji ber ku bi hestan re hevdîtin û bi hestan tevgerîn û li ser ve tevgerînê jiyaneke hestiyar avakirin bi xwe re hizrên hestiyarî jî çêdike û dike di bingeha wê jiyanê de.

Lê gelek caran, ji hestiyariya mazinbûnê, ji aliyê hizir ve jî tenê, bi xwe re bi hêza xwe re ye. Ji ber ku hestiyarî di piraliyan de wekhevî û xwedîtiyê dixwaze. Ev gotin weke gotineke bi nakokî jî were xuyakirin, lê disan divêt mirov bêje ku di sazimendiyê de taybetiyên kesayetiyê dihêne ser zimên. Ev kesayetî ji kesayetiya evîndariyê ye. Kesayetiya evîndariyê gelekî bi hestan re dijî. Ji ber wê yekê têt gotin ku carina ne bi çavekê, lê bi çavikekê dimeyzîne. Hasnê û Hemed Beg jî gelo bi vê çavikê bûn? Jiyana wan di nav wan de di xwezaya xwe de berdewam dikir. Piştî ku begê mazin çûbû, dîsan weke berê di xwezaya xwe de jiyana wan berdewam dikir. Hev bi evîndarî kiri bûn û nuha wê ji wan re zarokek çê bûya. Wê bibûna dê û bav li jiyanê. Bi dê- û bavbûnê re, wê gelek berpirsiyariyên wan çê bibûna. Ji vê yekê re jî diviya bû xwe amade bikin. Jiyan û rêveçûnên wan dihate meyizandinê. Ji aliyê vê berpirsiyariyê ve, ku mirov dimeyizand diviya bû, ku mirov bêje ku berpirsiyariya jinê li jiyanê hê bêhtir bû. Lihevdayina malê û sexbêrî û meyizandina li zarokan, li ser milê jinê bû. Biryarên malê jî bi piranî wê didan. Li malê gotinên jinê divêt ku ne hata binpêkirin. Li malê gotina peya jî dibuhurî û mazin bû. Lê ma gelo bi qasî ku gotina jin li malê dibuhurî, ya peya jî li derve dibuhurî?

Lê dîsan divêt ku mirov bêje ku bi hevrebûn mijareke gelekî girîng bû û xwe dida ber çavan.

Hasnê li malê bi kar û barên malê re pir jêhatî bû. Gava karê xwe hew dikir, di odeya xwe de bi tenê dima, di bedengiyê de bû. Car bi car Hemed Beg diçû nig wê dirûnişt û ew bi hev re li ser tiştên ku dihate hişê wan dipeyivîn. Lê ev yek ne berdewamî bû. Ku dihatin nig hevdu, ji xwe re bi hev re diketine di nav peyivtinan de. Hemed Beg jî di wê demê de ne dixwast wê bi tenê bihêle, ji ber ku li ber bû, ku jê re zarok çê be. Car bi car êş dihatine wê, lê dîsan di cih de dibuhurîn. Wê jî car bi car ku bi tenê bi hev re diman, ji begê xwe re digot 'Ha dem e, ew ê bibe, ha dem e..' Wan jî li hêviya wê dema bûna zarok bûn. Kanê wê kengî bihata? Di nav malê de jinên din jî hebûn ji ber vê yekê di wê rewşê de zêde kar bi wê ne dihate kirin. Ji aliyê dî ve jî, xatûna beg bû û nû bû. Ev yek jî ji wê re dibû weke sedemekê, ku di wê rewşa ducanbûna wê de, pir kar pê ne hatiba kirin. Bi tenê dima, di cih de dihate nav mezelê xwe de û têde dirûnişt. Rojên wê wisan derbas dibûn.

Piştî heyvekê Hasnê dikeve nav ciyan û jê re kurikek çê dibe. Bi hatina kurê wan, gelekî dilxweş bû bûn. Navê wî danî bûn Mihemed. Navê bavê dayika wî ji Mihemed bû. Piştî ku Mihemed hati bû dunyayê, jiyana wan pir hati bû guherandin. Beg jî û dayika wî jî êdî dema xwe di odeya xwe de, bi Mihemed re dibuhurandin. Hêdî hêdî ku mazin dibû, hê bêhtir dikete di ber çavan de. Dem zû diçû, lê bi wan re li nig kurê xwe ni zani bûn ku dema wan çawan diçû. Bêguman, dema wan zû diçû. Mihemed ku bû pênc salî, gelekî di dilên mirovan de cih girti bû. Kesên ku ew didîtin gelekî hez jê dikirin. Ji aliyê jîrbûnê ve jî, çavên kesên ku lê dimeyizandin, dadigirt. Mazinbûna bi serxwebûn di nav hevalên wî de, di têgehîştinê de wî dikir xwediyê serweriyeke mazin. Gotinên wî di nav hevalên wî de dihatine hesandin. Bi vê yekê re, ji aliyê xwe ve bi hevalên xwe re û her weha bi kesên li derdora xwe re, xwe dabû erêkirin. Zaroyên ku hê biçûk be û ev çend di nav hawîrdora xwe, heval û mazinên xwe de, xwe dabe erêkirin, di nav civakê de weke teybetiyên zanebûn û jîrekbûnê dihatine dîtin. Zanebûn û jîrekbûn li gavavatinên wî bi meyizandinê re dihate şirovekirin.

Heft salî dest bi perwedeya  xwe ya bingehîn dike. Ji aliyê xwandinê ve bavê wî jî guhên xwe baş didayê. Li nig seydayan dest bi xwandina xwe kirinê re, jiyaneke nû ji bo wî dest pê dike. Seydayên ku baş û têr bi zanebûn bûn û ji aliyê zanebûna xwe ve bi nav û deng bûn, dest bi fêrdayina wî kirin. Ji aliyê mazinbûna mala bavê wî jê re dibû alîkar. Her weha mazinbûn jê re di vê rewşê de hê bêhtir xwedîderketinê bi xwe re dihanî. Bêguman di vir de divêt mirov bibêje, ku ji aliyê zû fêrbûnê ve jîrbûn, li ber çavan wî derdixiste pêş.  Zûtêgehîştin û hildana serî jî, her weha dibû bingeha hatina ber çavan û ketina çavan ji bo wî. Çend ji aliyê derfetên mazin, ji aliyê mazinbûna malbatê ve jî, jê re bihata nîşandan jî, ku ew bi xwe re ne jîrek bûna, wê gavê jî, wî mazinbûnê jî alikarî ne didayê. Tenê wê jê re bibûna bingehek xwejiyandinê. Lê Mihemed derfetên bingeha xwandina xwe kiri bûn. Mihemed weke yekî pir jîr di nav xelkê de û hawîrdorên xwe de dihata naskirin. Mirov ji biçûkatiyê ve, hinek bi taybetmendên xwe kifş dibe. Yan jî rewş û mercên ku têde ye, vê yekê hinekî dide xuyakirin. Xuyabûna wî ji aliyê taybetmendên wî ve, xwe dide ber çavan de. Di vir de divêt ku mirov bêje, ku dayika Mihemed pir jê re dibû alîkar. Wê ji perwerda xwe hilda bû. Zani bû pir baş bixwîne û binivîse. Di biçûkatiya Mihemed de, her dem ji aliyê fêrbûnê ve, li nig wî bû. Berî ku dest bi xwandina li nig seydayê xwe bike, dayika wî jî dest bi fêrkirina wî kiri bû. Dayika wî jî, jê re bû bû weke seydayekê di wê demê de. Fêrên ku li nig seyda dihatine xwandin, pişt re li malê li nig dayika xwe, bi alikariya wê hê bêhtir dida meşq û ravekirin. Her fêrekê ku baş meşq û rave dikir jî, hê bêhtir ji wî re dibû bingehek mazin. Meşq û ravekirin di zanebûn û fêrbûnê de gelekî girîng e û bingeha pêşketinê çê dike. Mihemed ji vî aliyê ve jî ku dihate şirovekirin, dihata ditin, ku xwediyê pir seydayên baş bû. Hezkirina dayika wî her weha weke ferbûneke xwe jê re dida nîşandan. Li ser fêrekê ku baş hatî meşq û ravekirin re buhurtina fêra ser din, bi xwe re zanebûneke mazin dihanî. Di vê xalê de hêjayê gotinê ye, ku mirov bibêje ku nêzîkatiya bavê wî jî, pir girîng bû ji wî re. Bavê wî bi xwe re ew dibir di nav civatê de dida rûniştandin. Di nav civatan de li gotin û

stranan bi mazinên xwe re dihesand. Her weha di nav civatê de hesandin jê re dibû weke bingehekî ji aliyê naskirin û fêrbûnê ve. Mirovên zane û dengbêjên di nav civatan de, dihatin nig hevdu û di nav civatan de zanebûn û hizrên xwe dihanîne ser zimên. Xelk li hevdu dihesand, hizir û ramanên hevdu fahm dikirin û ji hizir û ramanên hevdu encam derdixistin. Ji gelek aliyan ve jî, di civatan de hevdu bi her awayî nas jî dikirin. Gotinên ku di nav civatan de dihatine ser zimên jî, zû bi zû ne dihatine jibîrkirin. Di mejiyan de diman. Ji ber ku bi nimûneyên weke çîrok û vebêjên jiyana mazinan dihate ser zimên. Piranî ev çîrok û vebêj jî, bi gotinên civakî û hizrên wê dihate afirandin û ser zimên. Her weha Mihemed jî gelek tiştên ku di nav civatan de dihatine ser zimên, di serê xwe de bi cih dikir. Bi vî awayî li nig seyda ferbûn û di nav civatan de naskirina wî bêhtir dikir.

Mihemed her weha ji gelek aliyan ve dibû xwedî zanebûnên di nav civatê de. Di vê xalê de hêjayê gotinê ye, ku divêt ew ji aliyê gotin û hanîna ser zimên ve, pir zane bû. Bêguman yekî ku ji aliyê vegotin û vebêjînê ve kêm be, ni kari bû hizrên di nav civatê de bihaniya ser zimên. Di nav civatan de axiftin ji mirovan hinek teybetmendiyên kesane dixwastin, ku ew xwe û hizrên xwe bihêne ser zimên. Pêşikê diviya bû bi kesayetiya xwe ya rûniştî, li çavên mirovên derdorên xwe tijîkirî bihêle, ta ku lê hatiba hesandin. Ji bo ku gotinên wî ji dev bihêne gotin jî, her weha kesayetiya rûniştî divêt hebe. Wekî din jî xwedayina û guhdarkirin jî vê yekê dixwast. Bi wan taybetiyan re, divêt mirov bihêne ser zimên, ku mirovên ku di nav civatan dirûniştin, zane dihatine jimartin. Ji ber vê yekê jî, çav li ser wan her dem hebûn. Mihemed kurê begê wan bû, ji ber vê yekê jî wetayeke wî jî hebû. Ji ber vê yekê mirov dikare bibêje, ku hatina wî ser zimên ku amade be, ji devê seydayê wî yan jî, ji devê yên ku wî nas dikin taybetiyên wî yên baş dihatine ser zimên. Pê re jî kêmasiyên wî jî dihatine ser zimên. Mirov di nav civatan, weke ku di nav komekê rexne û rexnevanan de be, ew ji ber çavan dihate derbaskirin. Ew ên ku zêde li ber çavan herî pir li civatê dirûniştin, bi zanebûnên xwe kesayetiya xwe didane erêkirin. Zanebûna xwe dihanîn hesandin, ji bo ku di nav civatê de axiftin

pir taybetmendiyên girîng dibûn. Her weha di nav civatekê de bi piraliyan ve fêr têt girtin. Naskirin, fêrbûn, têgehîştin û kesayet, di civatan de xwe didane derve li ber çavan. Ji aliyê naskirin û fêrbûnê ve guhdarkirin pir gerek û girîng bû. Ji aliyê têgehîştin û kesayetiyê ve jî meyizandin û bi meyizandina xwe re encamgirtin pir gerek û girîng bû. Kesên ku di nav civatan de dirûniştin, ji aliyê gotin û hanîna ser zimên ve, weke dengbêj û wêjenasên mazin û xwedîfêr bûn. Çîrok û her weha vebêjên bi gotin û hanîna ser zimên, bi xwe re zimanekî wêjeyî dixwaze. Lê zimanê helbestmendî jî her weha weke beşek ji vê vegotina wêjeyî dihate afirandin. Bi vebêjan re avêtina ser kesayetiyan jî wêjeyek bi helbestmendî dixwast. Zimanê te ne bi helbestmendî bûya, di nav vebêjan de, yên ku dikari bûn vê yekê pêk bihaniyana jî, tevlî gotinê dibûn û bi gotina yekî û helbestmendiya yê din jî, bi taybetmendiyên xwe ve ji serî ta dawiyê vebêj dihate ser zimên. Di gotinan de taybetmendiyên herî ku li ber çavan bûn, dihatine girtin. Ji ber vê yekê divêt mirov bêje ku ew kes pir bi wan taybetiyan jî di nav civatan de dihatin naskirin. Ji aliyê hanîna ser zimên û li gor teybetmendiyên gotinan jî, hanîna ser zimên, ji taybetiyên ku li ber çavan bûn dihatine girtin. Her weha hizir û raman, çîrok û dîrok, helbest û wêje, rêvebirin û rêveber, bi taybetiyên xwe ve, di nav civatan de ji bingeh û koka xwe yên pişt re, bi hanîna ser zimên re dihate gotin û ravekirin. Di vir de ku mirov bahsa hinek taybetiyên xwezayî yên civakê, yên ku xwe berdewam kirine bike, taybetmendiyên pir girîng û mazin divêt werine ser zimên. Civak li gor taybetmendiyên xwe yên xwezayî, her weha di civatan de dihata ser zimên. Zimanê xelkên herêman jî, her weha digehîşt hevdu. Bûyerên ku di civakê de dibûn, bi zimanê xelkê bi awayekî wêjeyî dihatine ser zimên. Vê yekê jî li ser mirovên guhdar, hîkariyeke pir mazin dihişt. Di nav civakê de beg an jî axa jî ba, her weha bûna gotinên bi vê rewşê re dibûn sereke. Di wê demê de serekayetî her weha xwe li ber çavan xwe dida nişandan. Vê yekê jî li ser mirovên ku ji nûke ve mazin dibin û pêş dikevin, pir bi wate bû. Gelek caran jî mirovên ku perwerde didîtin, dihatine di nav civatê de û dirûniştin. Kesên mazin û yan jî serekenên di nav

civatê de, li lebat û rewşên wan dihate dimeyizandin, gelo ew di nêzikatiyên xwe de yan jî di zanebûna xwe de çawa ne. Gelek caran jî ew yek bi pirs û axiftinan li nav civatê dihate xuyakirin. Mirovên ku ji wan jî dipirsîn an jî li wan dipirsîn, bi zanebûna xwe ve ji ne kemî, zanistvan bûn, kesên ku navser bûn. Yên ku dikari bû têgehîjin ku bi çendîn bi pêşveçûyinan jê dipirsîn, an jî di nav hev de bi şirovekirinan re jî, ji hev dipirsin ka çendîn bi pêş ve çûne. Di wê heyamê de yên di civatê de dirûniştin, hem li pirsvanan û hem jî li bersivdêran pir bi bal dihesandin. Hizrên wan, bi hatinên dema pirsbûnê, ji wan dipirsîn û diviya bû bikaribin bersivên xwe bidin.

Bêguman di zanebûnê de hatina pile û radeya herî mazin di civatê de xwe dida xuyakirin. Di axiftin û gotinên xwe de, di nav civatê de wî pile û radeya xwe dida derve. Di vir de divêt mirov bêje, ku kêmasiyên ku di nav civatê de dihata dîtin û gotin jî, ne dihate ji bîrkirin. Ji ber vê yekê jî ew kes pir bi bal tevdigerin. Yekî ku diçû nav civatekê û rûnişti ba, mazin û zane dihate jimartin. Ji xeynî wan, vê yekê jî gelek mirov jî diçûn li civatên din dirûniştin. Ew hati bûn daku tiştekî fêr bibin. Lê divêt mirov bêje, ku riya axiftinê jî pêşî ji kal û pîran û navseran re bû. Her weha weke dibistaneke civakî û ya destpêkê, ku em civatan bijimêrin, me bawerî heye ku wê ne xelet be. Ji ber ku ev di gelek xalan de xwedî wate û erk bû. Hizir û ramanên civakê û pirsgirêk û li çareseran jî lêgerîn, di civatan de dihate rojevê. Divêt mirov bêje ku rojevên xelkên civakê jî, di civatan de dihate zanîn: ''Î roj di nav civata beg de, yan jî di nav civata mêhvanan de wan hizir û pirsgirêkek her weha hate gotin û guftûgokirin'', dihate gotin di nav xelkê de. Lê hemû xelk jî her weha, ji rojev û guftûgoyên hevdu bi riya seydayan re, yan jî kesên ku dihatin û diçûn agehdar dibûn. Agahdarbûn jî bi xwe re hizrên hevdu ji hev re û bi hev re dida li hevparkirin.

Mihemed bi biçûkatiya xwe re li civatan dibe xwedî nasbûn. Lê yê ku wî bêhtir dike xwedî nasbûn jî, zanebûn û zûfêrbûna wî bû. Mirovên ku serê wan ji fêrbûn û têgehîştinê re vekirî be û mejiyên wan zû hilbigire di civaten de bi wan re teybetmendiyên bi

xwe re dihata ser zimên. Mihemed jî ji wan aliyan ve xwediyê jêhatiniyekê bû. Jêhatîbûn di bingeha xwe de hizir diparêze. Jêhatîbûn jî bi hizir re weke zanebûneka kesayetiyê, xwe di ber çavan de dida nîşandan. Lê jêhatîbûn tenê hizir di bingeha xwe de na bîne. Ji xeynî wê yekê jî weke hinek taybetiyên ciwanî, rê ji xwe re dide nîşandan. Di fêrbûnê de mirovek ne jêhatî be, yan jî weke ku di nav xelkê de dihata gotin; şevekorî be, zû dihate dîtin. Yekî ku şevekorî jî ba, wî çaxî di nav xelkê de hinek gotin weke bi rexne, jê re dihatine gotin. Wekî din jî, li gor gavavêtinên wî navpêvekirin jî çê dibû. Her weha jêhatîbûn û jîrekbûn ji wan dihate xwastin. Bi vê yekê re mirov dikarê bêje, ku nejêhatinî û nejîrekî, di nav civakê de ne dihate pejirandin. Bi vî awayî, weke zanebûneka xwe bi taybetmendiyên xwe re, xwe dida derve. Lebat, jêhatinî û jîrektî taybetmendiyên, ku herî baş bûn ku dihatine pêşwazîkirin. Li gor wan taybetmendiyan jî, li mirovan dimeyizandin û şirovekirin jî dihate cih, di nav civakê de. Ji aliyê hizir û ramanan ve be, yan jî her weha ji aliyê hinek tiştên din ve jî be, ji kesên ku weke serekeyan, an jî pêşengan derdiketin ber çavan jî, bi wan taybetmendiyan bû. Her weha hêjayê gotinê ye, ku divêt mirov bêje, ku ew taybetmendiyên di bingehan xwe de weke tevgerek li mejî dide çêkirin. Ji ber vê yekê ye, di wê demê de li kesên ku her weha dihate meyizandin, ku ka ji fêrbûn û zanebûnê re lêhatî ye yan jî ne lêhatî, ev dihate şirovekirin. Lêhatîbûn her weha bi kesayetiyê meyizandinê re weke nêzikatiyeke biryarî dihate ser zimên. Her weha zanebûn bi hizir re xwe pir baş dihanî ser zimên. Mirov nirx û qedrê zanebûnê zani bû. Ji ber vê yekê divêt mirov bêje ku pir girîngî didane zanebûnê. Her weha civat jî weke komelên zanebûnê bûn. Piranî mirovên beg bi zanebûnên xwe ve û navserbûnên xwe ve xwedî gotin bûn. Kesên navser xwedî nirx jî dihatine pêşwazîkirin. Begek jî bana yan jî axayek, li hevberê mirovên navser (kal bi kalbûna xwe xwedî zanebûn) xwediyê qedr û qiymet bû. Li wan mirovên di nav civakê de weke serekeyên xwezayî dihate meyizandin. Bavkalê Mihemed jî mirovekî her weha yekî navser bû. Lê wê kêlîkê ne li nig wî bû. Ji wî dûr bû. Gelek gotin û vebêj ji wî ji devan bihîsti bû.

Bi destpêkirina perwerdê re jêhatîbûna wî jî hati bû dîtin. Bi destpêkirinê re jiyana wî jî her weha hati bû guherandin. Hê bêhtir hati bû li ber çavê mirovan. Kesên ku weke wî bi xwandina xwe re bûn gelek hebûn. Lêbelê ew kurê beg bû. Ji bo vê yekê jî hê bêhtir çavê xelkê li ser wî bû. Ji ber ku kêmasî û nejêhatiniyên wî ji vî aliyê ve jî hati ba şirovekirin. Bi navê kurîtiyê begîtiyê jî wê hati ba şirovekirin. Ji ber vê yekê jî begê wî jî gelekî giringî didayê. Mihemed weke ku liberçavbûneke mazin bêt buhurandin bû. Wê kêlikê navê wî, bavê wî û bavkalê wî bi wî re bû. Xelk jî ev yek wilo didît. Li cihê perwerdê jî ku dest pê dikir jî, çavên seydayê wî li ser wî bû. Seydayê wî jî yekî pir kal bû. Hinekî jî li nig Şêxê Îdirê ma bû. Ji ber vê yekê jî, ji aliyê zanebûnê ve jî mirovekî gelek hêvî jê dikirin. Pir zane,  baş û qenc dihate naskirin.

Di fêran de fêrkirina seyda ji mirovan re zor ne dihat, ji ber ku li gor taybetmendiyên zimên dida fêrkirin. Li ser fêrên olî yan jî yên bi awayên din jî ba, zimanê xwe baş bi kar dihanî. Li ser quranê dest bi fêran dikir, li gor ziman bi cih dihanî ser zimên. Pêşîkê bi kurdî kite dikir û pişt re weke ku hatî nivîsînê bi dorê dida xwandin. Kesên ku li nig xwandi ba, êdî bi her awayî dikari bû bixwîne. Ku pirtûk bi wan re dida kutakirin, êdî mirov bi herdu zimanan jî dikari bûn bixwînin. Mihemed di kitekirinê de û pişt re jî ji xwandinê re gelekî baş bû. Seyda pergaleke wilo ava kiri bû, ku bi perwerdekirina xwe re, mirovên ji zimanê xwe yê zikmakî, buhurtina zimanên din, an jî ji zimanên din buhurtina zimanê zikmakî xwezayî, kiri bû. Her weha di perwerdekirina xwe de, ev yek ava kiri bû. Bi vê yekê re kesê ku dest bi xwandinê dikirin, pişt re hêdi hêdi zimanê wan jî bi xwe re dikir bi pergal. Di gotinê de her weha pirtûkên, ku ne ji zimanê zikmakî jî ba, mirov bi kitekirinê, bi serê xwe fêr dibû û dixwand. Mirovekî ku bi tenê maba jî, her weha pirtûka ku ne ji zimanê wî jî ba, dikari bû bi zimanê xwe bixwîne. Kitekirin û  xwandina bi dorê, di perwerdedayina seyda de, dibû weke zimanekî fêrbûnê. Lê bêguman her du ziman jî, ne ji zimanekî bûn. Du ziman bûn. Lê bi her du zimanan jî her weha bi avakirina pergaleke xwezayî, weke ji zimanekî di perwerdê de bi kar dihatin. Herdu ziman jî, her weha di perwerdekirinê de, bi

nêzîkatiyeke pergalî re ji hev re dibûn alîkar. Ji ber vê yekê hêjayê gotinê ye, ku divêt mirov bêje, ku perwerdekirin an jî dîtin, li Kurdistanê hinek taybetmendiyên xwe yên xweser hebûn. Pêşîkê divêt mirov bêje ku di dawiya perwerdê de gava mirovekî ji perwerdê derbas bû, êdî dikari bû bi du zimanan pir baş jî binivisanda û bixwanda. Ji ber ku di bingeh de fêrbûna du zimanan bi hev re çê dibû. Di ferbûn û daxwaziyê de, hem zimanê dê di serî de bi pergal dibû û hem jî zimanekî din ku di perwerdê de fêr dibû. Her weha bi du aliyan, bi sazûmana perwerdê re pêşketin çê dibû. Lê di vir de hêjayê gotinê ye, ku divêt mirov bêje, ku ji ber vê şimşata perwerdê pir karkirin jê re diviya. Ji aliyê xwandinê ve be, yan jî ji aliyê nivisandinê be, karekî mazin dixwast. Ev sazûmana perwerdê li ser bingeha zimên dihat avakirin. Mirovên ku ji biçûkatiya xwe ve çi ziman bi kar haniye, li ser wê bingeha xwe fêrbûna ziman pêş dixist. Her weha divêt mirov bi vê yekê re girêdayî bêje, ku di hundurê malbatê de jî, bi vê yekê re girêdayî, fêrbûn hebû. Ji dayikê û bavî, pêşîkê weke bingehekî dihate standin. Li ser wî bingeha li nig seyda dest bi perwerdê dihate kirin. Di vir de divêt mirov ji dayikê bi rêzeke mazin bahs bike. Ji ber ku ew gelekî karkereka mazin bû ji aliyê alîkariya zarokên xwe ve û ji aliyê amadekirina wan ve ji perwerdê re. Zarokên perwerdê ku li nig seydayan digirtin, gelek caran jî li nig dayika xwe ew perwerdeya ku dihildan, hê bêhtir rave dikirin. Zarok hê gava ku biçûk in, pêşîkê tema wan li ser dayika wan e. Ji ber vê yekê jî di gotina dayika xwe de alîkariya dayikê ji bo zarokan pir dibû û pir girîng jî bû. Gotinên ku di perwerdê de careke din ji devê dayika wan derdiket, li hevberê zarokan, di serê wan de cih digirt û dima.

Diya Mihemed jî her weha jê re pir alîkareka mazin bû. Ji gelek aliyan ve ji wî re dibû alîkar. Diya wî yeka zana bû. Li nig seyda xwandi bû. Perwerda xwe ya bingehîn biri bû serî. Ji ber vê yekê jî zani bû wê ji zarokê xwe re çawa bibe alîkar, an jî di kîjan aliyan de wî alîkarî divêt. Di fêrkirina xwandin û nivîsînê de alîkareka mazin bû. Ji bo dayina ravekirinê jî her weha gelekî dibû alîkar. Zaro di biçûkatiya xwe de, li devê kesan dimeyizînin, kanê

wê çi bêjin an jî wê çawa bêjin. Her weha nihertin li derûniya zarokan dê xwedî hebûneka pir mazin in. Gava ku dê ji perwerda zarokên xwe re xwe amade kirin, ji zaro re na bêjin ne, wê bêjin herê. Ji ber ku diya wî li nig wî ye û diya wî dibêjê herê. Rastiya dayikê dibe ya zarokê di wan nêzikatiyan de. Bi vî awayî dayik gelekî girîng dibe ji bo zarokan. Mihemed li dayika xwe dimeyizand. Her dem jî di biçûkatiya xwe de dên û bala wî li ser dayika wî bû. Di serê Mihemed de fêrbûn û dayka wî bi hev re bûn. Ev yek jî ji bo zaroktiyê pir girîng bû ji ber ku bi wî awayî re zanebûn bi xwe re xwe dikir cism û mazin dikir. Bi vî awayî bingeha cismkirina fêrbûnê, bi dayikê re çê dibû. Di perwerdê de û di pêşketinê de ev yek pir girîng bû. Ji ber ku bi xwe re awayê fêrbûna bi wî awayî di serê xwe de bi dayika xwe re çê dikir. Ji bo zarokekî ev yek dibe bingeha pêşketinê, ji ber ku ji nû ve perwerdê dike û tiştên ku hîs dike yan jî jê re têt gotin û xwandin, bi awa dike. Di awakirinê de zanîn wêne distêne di serê zarokan de. Zanîna ku wêne stand jî, bêguman dibe ya ku hatî ravekirin.

Bi xwe jî ku Mihemed gava pêşîkê dest bi perwerdekirinê dike, diya wî bi vî awayî ne bûna alîkar, wê li paş bima. Ew hîskirina diya wî ye li wê destpêkirina ketina jiyanê de jî, jê re bi vî awayî dibû bingeh. Di vir de hêjayê gotinê ye, ku divêt mirov bêje, ku nêzikatiya dayikê jî bi vî awayî girîng dibe. Bi zanebûn gavavêtin girîng dibe. Nêzikatiya dê jî bi hîskirin û nêzikatiya hesta parastinê dibe bingeh ji wî re ji bo ravekirinê. Zaro gava ku dest bi perwerdê dike, bi çendî ku li diya xwe û seyda dihesîne, ew çend jî li tevger, lebat û gotinên derdorên xwe dimeyzîne. Ew yek jî weke kargêriyeka xwe li ser zarotiyê xwe dide nîşandan. Ji ber vê yekê bû ku piştî perwerdê re, Mihemed bi lez û bez dihate nig diya xwe û tiştên ku fêr bû bû, jê re digot. Her weha lezbûna wî di bingeha xwe de bi xwe re xwestinekê jî dida nîşandan. Mihemed her tiştekî ku nû hîn dibû, bi lez û bez baz dida, nig diya xwe. Ev yek di salên wî yên pêş de pir çê dibûn. Ji ber ku hê gotinên ku di bin navê perwerdê de hîn dibûn, hê ne evçend mazin bûn jê re, ku cihê gotin û nêzikatiyên diya wî bigirta. Di demê de ta ku bi gotinên pê re têrbûn çê ne bûbin, wê her weha bi lez hati ba nig dayikê. Lê

belê ku di demê de dest bi avakirina wêneyên di serê xwe de kir, wê demê jî wê ew lezbûna wî zivirî ba wî. Wê demê jî zû bi zû pêşketin wê bi xwe re çê kiri ba. Bi dayikê re her weha temenê xwe ava dike û pişt re bi xwe re berdewam dike. Di pêşketinê de navenda xwe ji diya xwe hêdi hêdi bi ferbûnê re dizivire di ser wî de. Ev zivirandin têt wateya ku kesayetiya wî hêdi hêdi xwe dest bi avakirinê dike û ku xwe ava kir jî, bi demê re jî dibe serbixwe. Zanebûn bi fêrbûnê re her weha di kesayetiyê de rastbûneke diafirîne. Di vir de, dê, bi hebûna xwe, hebûneke mazin e. Bi rastbînê re jî, dê di serî de, dema careke din jî ji aliyê wê ve têt watekirin. Bêguman di vir de divêt mirov bêje, ku di vê watekirinê de, dê wateya xwe kêm na ke. Hê bêhtir bi zarokan re bi wate dibe. Ev têt wê wateyê ku hizir, mentiq û zanebûn bi pêşketinê re û bi xwe re kesayetiyek daye avakirin. Bi wî awayî zaro kesayetiya xwe û ya dayika xwe jî hê bêhtir bi xwe re di wê demê dê nas dike.

Her weha ku Mihemed çend salan dixwîne êdî bi xwendina xwe re digehîje kesayetiya xwe ya mazin. Divêt mirov bêje ku ew teybetmendiyên ku di serî de Mihemed di biçûkatiya xwe de bi dayika xwe re girtin, bi mazinbûna wî re ji holê winda na bin, hê bêhtir bi wî re weke taybetmendiyên zanebûna wî xwe dide nîşandan. Lê ew bi xwe re wê demê xwe bi xwe biryarên xwe digire û dide. Mirov ku çend baweriya wî bi kesayetiya wî çê dibe û mazin dibe, ewçend jî serbixwe dibe. Bi zanebûnê re bûyina bi sere xwe re jî, ji bo çêkirina hizrên di serî de, gelekî girîng dibe. Bi xweyîbûn re li ser dîtin û gotinên hizir di serê Mihemed de çê dibe. Mihemed her weha bi mazinbûna xwe re û di nava salên perwerdeyan de dibû xwediyê kesayetiya xwe. Gava ku biçûk bû, carina diya wî ew dihilda hevberê xwe û jê re digot; ”divêt tu baş û qenc guh bidî perwerda xwe, daku tu bi ser kevî. Ku tu bi ser ketî jî, wê demê jî tu wê kari bî dunya xwe bikî lewzik. Lê ku tu bi ser ne kevî tu wê ni kari bî di dunya xwe de lewzikatiyan çê bikî.” Wî jî ji diya xwe re digot; ”tu mereqan ne ke dayê. Ez ê guhê xwe bidim perwerda xwe û bi ser kevim.”  Ji ber van gotinên wî bi guhdar tevdigeriya û her weha di perwerde û di jiyanê de gavên xwe yên xurt diavêtin.

Li nig seydayê xwe ji biçûkatiya xwe ta ku mazin bibe xwandina xwe berdewam dike. Zarokatiya xwe her weha bi xwandinê re li nig seydayê xwe dibuhurîne. Seyda pir ji Mihemed hez dike. Mihemed jî di dema ku li nig seydayê xwe dixwand, bi dil û can xwe dida xwandina xwe daku bi serkeve. Seydayê wî ku Mihemed zarotiya xwe dibuhurîne dikeve xortaniyê, êdî ew jî bi xwe re dest bi gerandinê dike û li ser hizir û jiyana mazinan dest bi axiftinê dike. Seydayê wî bi zanistî û zanebûna xwe re, li ser xwezayê gelek caran bi wî re axifî. Di axiftinên xwe de, behsa çûnên xwe yên di riyan de jê re dike. Seyda ji aliyê gotinê û bi awayekî xweş hanîna ser zimên de jî, xwediyê hunerekî bêhempa bû. Ji wan aliyan ve jî pir hîkariyek li ser Mihemed dike. Mihemed ji aliyê hestewariyê ve kelegerm bû. Li hevberê rewşeke zû li xwe digirt. Ku Mihemed hê mazintir bû, taybetmendiyên bi vî awayî ku pê re hene, hêdi hêdi xwe di kesayetiya wî de didane der. Bi dil li xwezayê meyizandin, ruhekî bi hest dixwaze. Ji aliyên din ve jî, hestbûn ji aliyê fêrbûnê ve jî dibû weke awayekî fêrbûnê ji wî re. Hestbûn xwezayê dixwaze. Ji aliyê din ve jî hestbûn her weha bi xwediyê xwe re hizrên hestiyar dihêne ser pê. Di kesayetiya hestiyar de, hezkirin û dîtin bi awayekî taybetî xwe dide avakirin. Hizir bi hestan re jî xeynî mirovan ve jî, xwe bi wate dike. Xweza di nêzîkatiya hestiyar de, xwedî hizir e. Lê divêt mirov karibe bibîne. Gava ku mirov dît, wê demê jî mirov dikare bêje ku xweza bi mirov re xwedî kesayetî ye. Kesayetî xwe bi gotinan dihêne ser zimên, yan jî bi awayê ku xwe di tevgeran de dihêne ser zimên. Tevger ji bo kesayetiyê gotineke herî xwezayî ye. Bi gelek awayan re tevgera zimên, kesayetiyê pêş dixe. Gava ku mirov xwe bi tevgera kesayetiyê re bihêne ser zimên, wê gavê, mirov karê xwezayê pê re dihêne ser zimên. Mihemed digot û digot ku bi çendî em dikarin ji wî têbigehîjin, ew jî dikare ji me têbigehîje.

Her ku Mihemed mazin dibû û dibû serwerê xwe, hê bêhtir xwe dikişande nav xwezayê û di nav û hizir ramanan de. Bi gotin û nêzikatiyên xwe re, bi xwezayê re bû. Ew pir li ser xweza û mirov bi hev re dihizirî. Bi vê yekê jî, her weha hizra xwe dihanî ser zimên. Mirov bi xwe, ji xwezayê bûn, li gor hizra wî. Ji ber vê yekê jî çend

xwe fahm kiri ba, wê hê ji cihekî kêm maba di wê têgehîştina di ser û dilê xwe de. Lê mejî pê re heye û jîr e ji ber wî xwe nas bike û fahm bike. Mirov çend pêş diket, ew çend jî xwe nêzî xwezayê dikir. Ji ber ku di serê xwe de bi hizra xwe jî xurtbûnek pê re çê dibû. Mirov bê xweza ni kare bijî. Ev yek jî, ji nêziktiyên wî ve xwe dida ber çavan. Lê wî ev yek çawa dîti ba û fahm kiri ba jî, ew çend hinekî jî ji fahm û ditina xwezayê dûr diket. Mirov çend didît bi dîtina xwe ve pêş ve diçû. Hê bêhtir di rewşa xwe de bi kar û barê xwe ve diçe. Çend bi kar û barê xwe ve diçû jî, ewçend jî dibû gelek û ’tenê’. Bi mala xwe dibû gelek, lê bi xwe re jî dima bi tenê. Dunya û mirov bi xwezayê re heye. Xweza û mirov ruh dide hev. Lê ya herî dewlemend jî xweza ye. Erd her gav dizê. Roj li ezmana ye. Germê didit deşt û zozanan. Roj bi tîhna xwe ser û binê xwezayê germ dike. Bi germbûnê re û şilbûnê re xweza vedizê. ’Cisme’ xwezayê di demê de xwe diguherîne. Dem û hebûna wê jî berfireh û dirêj e û bi têgehîştin e. Mirin heye lê zayin jî heye. Mazinbûn jî heye lê çêtirbûn jî heye. Hizra dûr heye gelek kûr e. Xweza xwe dide naskirin. Mirov dike ku fahm bike. Têgehîştin ji mirov re gerek e. Hizir û têgehîştin taybetmendiyên mirov in. Jiyan bi vî awayî pêş ve diçe. Mirov jî bi vî awayî pêş ve diçin. Bi pêşveçûnê re nûkirin dibe. Bi nûkirinê re xurtbûn dibe. Bi xurtbûnê re pêşketina zûtir dibe û dem kintir dibe. Jiyan her weha bi zanebûnê re pêşkevtîtir dibe. Her weha Mihemed li hizra xwezayê evîndariyê jî bi wate dike. Bi ’dîtin’ û ’têgehîştinê’ re naskirin çê dibe. Bi naskirinê re jî hezkirin di dil de cih digre. Mihemed di dema perwerdeya xwe de, di demeke kin de zanebûna xwe her weha pêş ve dixe. Bi pêşvexistina hizrê re jî, li ser pêşveçûnê dipeyive di nav xelkê de. Ji aliyê gotinên wî ve jêhatîbûna wî çavan dadigirt. Bi vê jêhatinî û gotinên xwe re, xelkê dida hizirandin. Bi hizirandindayina mirovan jî, bi tenê bi hizirandinê re çêdibe. Hizra wî zû pêş ve diçû û bêhtir dibû di heman demê de.

Mirovên ku li ser jiyan û mirin û xwezayê hizir didin hizirandin, bi gotin û hanîna ser zimên re û bi xwe re gotin, bi mirovan dide xweşkirin. Mirov hez dikir ku li wî bihesînin. Li cihên digeriya, hizra xwe ji wan re digot. Her weha li gelek cihan digeriya. Seydayê wî

gelek pirtûk dihanîn û didanê, daku bixwîne. Wî jî yên ku digihan ber destên wî, dixwand. Li ser gelek bûyerên dîrokî yên ku bûne pirtûk û li ser jiyana kesayetiyên mazin pir dixwand. Bi hesandinê re jî serê xwe didagirt. Her weha jî dirok û ji gelek kesayetiyan agahdar bû. Tenê ne der heqê wan de agahdar bû. Der heqê wan û hizir û ramanên wan de jî, zane û agahdar bû. Kesayetiyên wek Ebû Mislimê Xorasanî, Babek, Arîstotales, Sokrates, Eflatûn û hwd, di serê wî de bi hizir û dîrokên xwe hebûn. Ji aliyê olî ve jî, hem ji aliyê dîrokê ve jî be, hem jî ji aliyê hizir ve, xwediyê zanebûneke mazin bû. Ji aliyê dîroka olî ve, weke Adem, Îbrahim, Aîs, Nûh, Îdrîs, Yûsif, Eyûb, Yehya, Salih, Harûn, Mûsa, Meryem û Îsa ve, yên bingeh bi wan re û bi hizrên wan re û bi dîrokên wan re, zani bû. Der heqê wan û jiyana wan de xwedî hizir û raman bû. Lê zanebûnê bi xwestekeke pir mazin re dixwast bi xwezayê re xwe biafirîne. Li ser xwezayê pir mazin difikirî. Hîkariyeke mazin ya xwezayê li ser wî û hizra wî hebû ku dihanî zimên. Evîndariyek di dilê wî de hebû. Ku dipeyivî pir bi evînî û bi hezkirin dipeyivî. Wê evîn û hezkirinê jî, ji dilê wî dihat ku kesên wî didît, li ser wan jî pir bi hîkar dibû. Gelekî hez ji gotina evîndariyê dikir ku pir jî dihanî ser zimên. Lê ji bo ku evçend mazin jî bihata ser zimên, diviya bû evîndariyek di dilê wî de heba. Dilê wî ne bê evîndarî bû. Di dilê wî de evîndariyeke pir mazin hebû. Ji ber vê yekê, ruhê evîndariyê pê re baş û pir mazin bû. Hesta evîndariyê çawa ye? Dilê bi evîn çend bi kel û germ e? Di gotin û hanîna ser zimanê wî de ew kel û germahî hebû. Evîndarî bi ruhekî û hizrekê bi hev re hatî hunandin, bi wî re dihate ser zimên. Mentiq li hevberê hestên bi hebûna xwe re çend xurt û zexm e? Yan jî ku yekî di dilê wî de evîndarî hebe, wê çend kari be bi mentiq bihizire? Di hebûna evîndaran de dil û mentiq di mejî de gelekî bi hev re şer dikin. Di vî şerî de gelek gijolînek çê dibin. Wê çawa ji nav wan gijolînekan derkeve? Ew mijaran jî rewşeke pir tenik çê dikir. Bi çendê vê rewşa tenik jî, têgehîştin jî girîngiyekê dihêne ser zimên. Serlêdana xwezaya xwe dihêne ser zimên. Xweza ku mirov kari be meyizêne têt dîtin, ku weke ku gelek bi ruhekî tenik hatiye hundandin têt xuyakirin. Xweza ruhekî evîndariyê bi xwe re dide ber çavan. Bi xweza re

habûnek û hêsaniyek di dil de çêdibe. Di rehetiyê de ruh pir bi hestiyarî tevdigehere. Dîtin û gotin tenê bi dîtina xwezayê tene re mazin têt ser zimên. Mejî di vir de têgihîştineke pir mazin û tenik dike. Dilekî û xweşbûneke jî bi xwe re dihêne ser zimên. Li gor Mihemed bi vî dilî çi kes xirab nabe, ji bo ku xirabûn çê ne be li xweza meyizandinê de. Ma gelo kê kari be ku li xwezayê bi dil re meyizêne û bi hesandinê? Ji wê re jî hebûnek diviya. Hebûna hizir û ruh diviya, ku mirov kari be li xwezayê binere.

Xweza bi xwe re evînê çêdike. Êvîn jî xwezayê xweşik dibîne. Evîn tevgereke xwezayî ye di dilê mirov û jiyanê de. Evîndarî germeke mazin e di evîniyê de. Evîn xweşikbûna dilî ye, ku gelekî xweşik dibîne. Lê hinekî zor e ku mirov fahm bike. Divêt mirov jî ji bo têgehîştinê xwediyê gavavatinekê be. Lê ma dîsan mirov dikari bû, ku xwe bigihêne bingeha wê? Bingeh weke dendikekê ye ku di dil de ye. Ew dendik ji hêzekê çêdibe. Ji ber vê yekê jî ew dendika hêz her dem dixwaze. Ev hêzxwastin jî her dem evîndariyekê li ser lingan dihêle. Mejiyê ji wî dendikê di germahiyê de dihêle. Lê ew dendik her dem jî bi mirov re ye ta ku mirov sax be. Ji ber vê yekê Mihemed dixwast xwe jî fahm bike. Li gor wî ev têgehîştin jî ku bibe wê hinekî din xwe nêziktirî ‘evîna’ mazin bike. Ji ber vê yekê jî digot ‘hinek jî ew evîna mazin di dilê mirov de ye.’ Divêt mirov wê evînê jî fahm bike. Têgehîştin demeke dûvdirêj e. Evîna dunyayê heye û mazin e. Lê evînek jî heye, hê jî ji wê maztir e. Divêt mirov xwe bigehîne wê dunyayê daku xwe bigehîne ya din jî di demê de. Dîtin û naskirin du dem in li pêşiya gehîştinê. Divêt ew her du dem baş û qenc werine têgehîştin, ku gehîştina demê, ji êvînê çê dibe. Dîtin û naskirin jî bi xwe re zanebûnê dihêne. Zanebûn jî çêkirinê bi xwe re dihêne. Çêkirin gava ku çê bû nexwe dest bi gehîştina xwe û dilê xwe dike. Lê her dem divêt di têkoşîna têgehîştinê de be. Evîn bi carekê nayêt têgehîştin. Evîn gelekî mazin û şêrîn e. Demê û zanebûnê dixwaze. Di hundurê vê dema zanebûnê de, sebr û aram jî heye. Divêt sebr jî were têgehîştin. Aqil kêrê sebrê bike. Lê dil ne bi sebr e. Dil bêsebr e. Hizira dil jî zanebûna wî ya evîndariyê ye. Di serî de ji tova hizrê dil heye. Ji ber ku tuxmê wî di serî de heye, ku kêrê xwe bigihêne rastiyê. Ev tuxma dil di serî de

hizir jî di mejî de çêdike û di nav xwe û kesayetiyê de ava dike. Kesayetiya evîndarî her weha ava dibe û xwe dide nîşandan. Lê hê jî, ji gelek aliyên din ve jî, divêt di jiyanê de were ser zimên. Rê nîn e, ku ji hemû aliyan ve were têgehîştin. Hest di rewşa hezkirinê de ji vê kesayetiya evîndariyê ye. Kesayetî evîndariya kesayetiyeke pir bi hest e. Ji ber vê yekê gelekî tenik e û bi hizir e. Bi şehwê re jî hest bilind dibin. Evîndarî jî bi şehwê re.. Lê hest carina jî bêşehw tevdigerin. Divêt mirov jî fahm bike ku hestbûn ji taybetmendiyên jiyanê ye her weha di vê rewş û pêşketina wê de.

Her weha Mihemed ji hizra xwezayê û ji mirovan têdigehîşt. Hizra xwe û têgehîştina xwe berfireh dikir. Wî hizirkirina li ser mirov û jiyanê girîng didît, ji ber vê yekê jî, ji ber ku vê têbibihîje gelekî tevdigeriya. Wî ji xwezayê dest pê dikir. Bêja xwezayê di serê wî de ne xwediyê wetayeke bi tenê bû. Bêja xwezayê di serê wî de xwediyê gelek wateyên mazin û hizrî bûn. Xwezaya mirov û suruşt li gor wî bi hev re bûn û wê bi hev re jî hebûna xwe berdewam bikirana. Ku li ser xwezayê dikir weke xweza hêzek be û bi ruh be û xwe di mirov de bihêne ser ziman, nêzîkatiyekê bi zanist re nîşan dida. Li gor wî mirov ne bê zanist e. Mirov xwediyê zanist e. Lê ma ka mirov wê çawa ew zanist bi kar bihaniya. Ji vê yekê re jî zanebûn û hizir diviyabû. Mirov jî dikari bû xwe bi zanebûnê re bi hizir bike. Lê zanebûn taybetmendiyek herî bilind e. Ji bo ku xwe bigihêne wî jî diviyabû baş û qenc tevbigere. Bi vê yekê re jî, ji van gotinên hizrên wî dihanîn ser ziman. Mirov dikarê bi aqilê xwe re, xwe bi xwe bi hêz ke. Li gor vê yekê jî, ji xwe aqil hêzeke pir mazin e. Hêzbûna mejî têgehîştina jiyanê ye. Têgehîştin hêzbûneke çêdike. Ku mirov nuha her weha wê hêzbûnê şirove bike, mirov wê bibîne ku têgehîştin bi xwe re ruhekî ji diafirîne. Ew ruh jî bi du aliyan divêt were têgehîştin. Aliyek jî ji zanebûnê têt. Ev aliyê dinê jî bi têgehîştin û naskirinê re çêdibe û pêş dikeve. Mirov bi van aliyan re pir pêş dikeve. Lê aliyê duyemîn ku baş ne yêt têgehîştin, wê ev aliyê zanebûnê jî kêm bimîne bi mirov re. Ew jî bi zanebûn û têgehîştinê re çêbûne ezbûna mirovan de wateya xwe dihêne ser zimên. Ezbûn bi xwe re baweriyê çêdike û her weha baweriyeke jî dihêne ser zimên.

Ezbûn ku ne be wê tirsandin û xwe paşvekişandin çêbe. Ji ber vê yekê jî ezbûn di jiyana mirovan de gelekî girîng e. Li gor Mihemed gava ku mirov ezbûnê şirove dike, mirov dibîne ku weke bingehek tenê ji mirovan re têt ser ziman. Bi vî awayî di gotin û nêzîkatiyên xwe de, gelekî li ser dirawestiya. Li ser gotina ’ez ji bo te..’ weke gotineke kesane dizanî û didît. Ku dihizirî bi xwebûnê didît. Ji ber vê yekê bixwebûn ji bo ku peşkeve divêt ku ezbûn hebe. Ezbûn bi mirovan re serbixwebûna herî mazin e. Ku mirov dihizire û dibîne, ku gotina ’ez ji bo te’ ezbûn û zanebûnê bi hev re dixwaze ji mirovî. Di vir de li gor Mihemed divêt mirov li xwezayê bimeyizîne. Ku mirov li xwezayê meyizand mirov wê di demê de bersivên mazin û yên çareseriyê bibîne. Lê li gor Mihemed mirov çawa dikarî bû bêje ku mirov xwezayê fahm kiriye? Li gor wî tenê xwezayiya xwezayê têgehîştin ne têgehîştineke têr e. Ku bi xwe re bi xweza bû wî çaxî wê ji jidandina xwe ya bi xwe re hew be. Ku jidandinên mirov çûn û mirov ji xwe rehet hîs kir û hizirî, wê çaxê jî mirov dikare bibêje, ku têgehîştin û têkilî çê bûye. Lê mirov dikare bibêje ku her bende ku bi mirov re hene, dûrbûna mirov ya ji xwezayê bi xwe re dihênê ser zimên. Xweza bêbend heye. Xweza bi bendan re ji holê radibe. Mirov bi xwe re her weha jî, bi du aliyên jiyanê dibîne. Aliyek mirov dixwaze bêbend be. Lê aliyek wî jî dixwaze bi bend be. Ev jî suruşteke mirov e ku dijî. Aliyê xwezayeke bêbend, bendan diqetînê û dike ku bi pêş ve herikîn çê bibe. Lê ku çû pêş jî, li wir jî hinek bendên din mirov bi xwe re çê dike. Wek bext têt serê wan bendan jî di pêş de. Divêt were têgehîştin, ku her dema ku dibuhure, bi xwe re zanebûnê çêdike. Weke zencîreke mirov li vê yekê bihizire. Zencir çend jiyan berdewam dike xelekên wan jî pir dibin. Bi jiyanê rê safîbûn jî bi xelekan re derdikeve holê. Ev zelalbûn jî hizra û zanebûna ku pê re çê dibe û pê dikeve. Pêşketin her weha di jiyanê de çê dibe.

Xweza, mirov û evîndarî hinek gotinên pir girîng in di hanîna wan ya li ser zimên. Ji bo pêşketina hizirê, evîndarî weke bingehekê didît. Li kurahiya wî evîndarî taybetmendiyek xwezayê bû. Lê bi mirov re bi zanebûn dijiya. Di xwezayê de jî di evîndarîyê de jî zanebûn heye. Lê divêt mirov kari be bibîne û têbigehê. Ji bo

têgehîştinê jî meyizandin û dîtin li kûrahiya wî gelekî girîng bûn. Li gor wî evîndariya herî rast yê ku herî xwezayî ye. Ku evîndariya xwezayî bû wê çaxê ji hev xuya dibe. Ji hev xuyabûn, di evîndariyê de weke rastbûnek têt ser ziman. Lê zelalbûn şiyana evîndariyê ye. Evîndarî şiyana mazin e. Her evîndariyek şiyanek wê heye û ev şiyan ku rast hate dîtin, di wê çaxê de mirov dikare bêje ku mirov dikeve di riya evîndariya herî rast de. Evîndarî bi rê ye. Riya wê ji dil dest pê dike, lê bi mejî re jî xwe berdewam dike. Di wê berdewamkirinê de ji bo bi destxistinê serûbinbûnek di dil de heye. Dest bi dest dixwe di demê de. Lê ka ma dil jî bi dest re bi dest dixwe? Di vir de ji Mihemed re hizra xweşikbûna mazin ya ku bi dil re ye, dikeve dest. Bi evîndariyê re xweşikatiyeke têt ser zimên. Ev xweşikatî jî xweşikditîn e. Ji bo xwe gihandina wê dîtine jî têkoşîn têt dayin. Dil dixwaze bi dest bike. Ji ber ku dil xweşik dibîne. Dil ku bi dest jî dike, dilxweş dibe. Dilxweşbûn divêt bigehîne evîndariya herî mazin, ya ku hebûna xwe berdewan dike. Mirov ji bo xwe bigihêne evîndariya herî mazin divêt xwe biwestînê da ku di demê de xwe bigehîniyê.

Her weha Mihemed hê di ciwaniya xwe de xwe bi hizir dike û hizra xwe dihênê ser zimên. Li ser evîndariyê û xwezayê pir kûr dihizire. Ew bi xwe jî hez ji xwezayê dike. Li ser evînê bi evîndariyê û xwezayê hûnadineke pir mazin di gotinên xwe de çê dike û dihêne ser zimên. Dilê wî hingê bi evînê re mazin e bi evîna xwe re dipeyive. Hingê dilê wî evçend ji vî aliyê vê tisiyê, bi gotinên evîndariyê dilê xwe difûrîne. Dilê wî her dem difûre weke sirê li ser êgir ku bi kel re difûre. Ev fûrandina dilê wî jî hin bi hin çend kûr dibû xwe maztir dida derve. Ku digihê dema ber ciwaniya xwe, êdî hizra xwe di nav mirovan de dihêne ser zimên. Bi hanina ser zimanê xwe re jî, zanibû mirovan li xwe bide hesandin. Li gotinên wî dihesandinê de bi mirovan re hem dilxweşiyek çê dibû û hem jî fahmek dihata girtin bi mirovan re. Gelêk caran jî di nav civatan de li nig seydayê xwe dirûnişt. Lê car bi car jî di nevbera bav û seydayê xwe de dirûnişt. Seydayê wî jî mirovekî bû, ku pir rêz jê re dihata dayin. Hê evçend biçûk û mazin lê dihesandin, hinekî jî para seydayê wî jî tê de hebû. Mirovên dihizirin, ku mirovekî li nig

wî seydayê zane bi xwe ne we geleki bi zane be. Ji ber vê yekê jî di serî de weke ku gotinên seydayê wî bixwazin ji devê wî hiskin, lê dihesandin. Di demê de wî jî bi vê rewsê re ji xwe weke seydayê xwe dide erêkirin bi miroven re. Mirov hîn bûbûn ku di demê de Lê bihesênin. Bi lê hesandinê re jî hizir û ramenên wî fêr dibin û nas dikin. Bi awayÊ ku wî dihanî ser zimên re, li ser mirovan jî hîkarî çêdikir. Bi ziman û xweş gotinê re hîkariya wî li ser mirovên xwe dide nîşandan. Her gotinên ku ji devê wî derdiketin, weke rêzên helbesteke li pey hevdu, ji nav lêven wî derdiketin. Her weha awayekî gotinê pê re hebû ku di gotinên wî de dida nîşandan. Ji aliyê gotin û hanîna ser zimên ve, xwediyê hûnerekî pir a mazin bû. Di gotinê de bêjeyên dihatina gotin û awayê ku pê dihatine gotin, di serweriya wî yê ser ziman de xwediyê herikandineke pir a zelal bûn di vebêjîna wî de. Pêşîkê di serê xwe de hizra xwe çêdikir û pişt re digot. Di gotinê de jî gava ku dipeyivî û her gotina ku digot, Pişt re zanibû ku we kijan gotinê bihêne ser zimanê xwe û bibêje. Bi vê yekê re gava ku dipeyivî ne aliqandin û ne ji qutbûn di nav herikandina gotinên wî de çê dibûn. Ve yekê jî li mirovan hîkarî dikir. Bi vê yekê re mirov bi bandûr dibûn. Hûnera wî ya axiftinê her weha xwediyê hinek taybetmendiyan bû ku dibû temenê xweşik axiftina wî di nav mirovan de. Her weha hêjayê gotinê ye ku divêt mirov bêje ku bi çendî hizra wî ya li ser xwezayê xwezabûnek di kesayetiya xwe de jî çê kiri bû. Di nav peyivtinên xwe de gelek nimûneyan jî ji teyrikan jî dide. Vê yekê jî bala mirovan pir dikişand. Gelek caran jî di gotinên xwe de li ser teyrikan digot ”ew jî can in, ew jî bi ziman in”. Bi awayekî kûr ku hîkarî li ser mirovan dikir û mirov jî di serê xwe de divejandin û bi nimûneyên wî re kûr dihizirîn. Bi her gotinên wî re weke ku di dil û serê mirovan de tiştnin bivejin. Vejînbûna hizir di serê mirovan de divekir. Hê bêhtir mirov di serên xwe de kûr û kûr dikir bi hizirandinan re. Bi vî awayî Mihemed bi gotin û hanina ser zimanê xwe re, di serê mirovan de wêneya jiyanê bi zanebûn çêdikir. Her weha wêneyekî ku di serê mirovan de bi hizir û zanebûnê dide avakirin jî, gelekî mazin û berfireh bû. Mirov bi vî awayî bi zanebûnê re hevdîtin pek dihanîn.

Jiyan xwediyê teybetmendiyên pir mazin û xwezayî ye. Jiyan li gor wan teybetmendiyan xwe bi wate dike. Watekirin di jiyanê de teybetmendiyek e ji bo mirovan. Her weha bingehek e jî ji pêşketinê re. Pêşketin bi naskirin û têgehîştinê di jiyanê re xwe radigire û dihere. Her weha zanebûn pêş dikeve û xwe dide nîşandan. Zanebûn di jiyanê de bi hebûn û wateya xwe xwediyê hinek teybetmendiyan e. Ku mirov kar kir ji wan teybetmendiyan têdigehê. Di wê demê de jî pêşketinan bi xwe re çê dike. Pêşketinên , ji pêşketinên jiyanê ne. Jiyan û di têkilîyan de bi hevdû re zanebûnê derdixin holê. Bêgûman divêt mirov bêje ku taybetmendiyên gelek in û mazin in. Li gor nêziketiya Mihemed xwediyê taybetmendiyên wîsa ne ku divêt mirov baş û qenc wan taybetmendiyan bibîne û fahmke. Li gor wî ew taybetmendiyên weke mirov bi fêrbûna tipan re fêrbûna xwandinê dibe, her weha divêt mirov nêzîketiyeke li jî bike. Li gor wî hinek teybetmendiyên xwe ji xwezayê digre û her weha bi wan teybetmendiyan re bi navenda xwe re pêşdikeve. Lê pêşketinên, li gor nêzikatiya wî xwediyê du taybetmendiyên mazin û girîng bûn. Teybetmendiya pêşî bi hîskirin û dîtinê re tevgerên, ku tenê kirin û her weha bi aliyê duyemîn re jî guharandina bi wan tevgeran re çêdibe. Aliyê duyemin ji têgehîştin û çêbûna zanînê ye. Li gor wî ew taybetmendiyên weke temenekî ye ku divêt mirov ji bo têgehîştin jiyanê qenc fahmke. Li gor wî tenê digire lê ye ku bi pêşketina kesayetiyê re dide jî mirov bi xwe ye. Di dayinê de gava ku mirov destgirtî bû mirov dikare bêje ku bi taybetmendî û awayên ku di de hatine standin re têkilî heye. taybetmendiyên xwe di gelek awayên ku di jiyanê de hene, weke nêzîkatiyan dihêne ser zimên û bi hanîna ser ziman re xwe dide nîşandan. Her weha bi vê yekê divêt mirov baş û qenc xof û gûmanên, nêzîkatî û berdestên, bandûr û azmûnên ku li ser bi bandûr in, fahm dike.

Her weha Mihemed xwediyê wan nêzîkatiyan bû ku di jiyanê de bi hizir û wate bûn. Jiyan ji bo wî divêt hatiba têgehîştin. Lê jiyan bi carekê çi kesekî ni dikari bû fahm bike. Ji ber vê yekê jî divêt mirov xwediyê israr û hinek teybetmendiya zanînan be, ta ku mirov kari ba têbigihê. Teybetmendiya mirov ya herî mazin çî ye?

Divêt bersiva vê pirsê ji gelek aliyan ve were dayin, ta ku mirov karibe bêje pêşve çûyin çêbibe. Carina tenê bi bersivdayinê re mirov di jiyane de bersiva xwe jî digire. Lê carina bi pirsîne re her weha mirov bersiva xwe bi dest dixe. Lê begûman bersiv di jîndayinan de xwe bi wate dike. Jîndayinên jiyanê ji bûyerên ku çêbûne dihêne ser zimên. Lê em ê li wan bimeyizênin û xwe pê re bigihênin ku weke bingeh hebin. Her weha di jiyanê de derfetên me yên têgehîştinê hene. Di gelek cihan de jî weke gotinên bingehîn ên wek ’agirê evînê’ û hwd, dihêne ser zimên. Bi vê gotinê re begûman tenê ne hesteke têt ser zimên. Bi gotinan re her weha weke hizrekî xurt jî ku di serê wî de heye jî, têt ser zimên. Her weha weke ’dilkirin’, ’can û cism’, ’şawq û şamale’ ‘sabr û aram’, ‘hêvî û rastî’, û hwd, gelek havok û bêjeyên ku dûbare dihêne ser ziman û di bêje ne bi wateyeke tenê têt ser zimên. Gava ku mirov bi kûrahî lê dimeyîne, di wê demê de mirov dibîne ku wate hizir xort û mazin têt ser zimên. Mihemed her weha hê di ciwaniya xwe de xwe digihîne zanyariyek mazin. Bi vê yekê re xwe di nav mirovan de dide erêkirin. Bi Mihemed re dîtin fêrbûneke baş dihêne ser zimên. Fêrbûn jî dîtineke mazin û bi zanebûnê re dide avakirin. Lê di vir de divêt mirov baş û qenc bêje ku gelek nêzîkatiyên xwe yên bi hizirî re jî, bi nêzîkatiyên evîndarî yan jî nêzîkatiyên her weha hizirî re dihatin ser zimên. Di nav mirovan de zimanê xwe pêş dixe. Ew xwe bi vî awayî bi mirovan re dide erêkirin. Lê her weha jî gava ku dihêne ser zimên jî, ew dihizire ku we bê têgehîştin. Mihemed di perwerdeya ku nêzikatiyên olî têde xurt bûn, perwerdeya xwe dibîne. Lê çand û hizir bi taybetmendiyên xwe re bi wî re li nezikatiyên wî serwer dibin. Di nav rewşa olî de mirovên bi civakê re xwe dide naskirin. Nêzîkatiyên civakî bi gotin û nêzîkatiyên xwe re bi gotinên xwe re derdixe ber bi pêş. Her weha bi zimanê civakê re axiftin ji aliyê hizir ve wî di nav civake de dike xwediyê teybetmendiyên cûda. Di nêzîkatiyên xwe de evîndariyê, hizir, xwezaye, mirov bi nêzîkatiyên xwe re derdixe pêş di nav civakê de. Bi vî awayî ji xwe û hizra xwe bi civake re dide erêkirin. Di demên pêşketina xwe de çend pêşdeçûn bi wî re çêbûba evçend jî bi ruhê mirovan ve mijûlbûn

pê re çêdibû. Di mijûlbûna giyanî (ruh) de, ji xweza û evîndarî, ji mijarên sereke diditin. Ew bêjeyan jî bi wateyek pir mazin di nav gotina xwe de dihanîn ser zimên. Meyizendina wî ya li mirov bi germahiya ruh û dilê mirov re çê dibû. Têgehîştin û zanebûna wî her weha bi ve germbûna mirovan re xwe dihanî ser ziman. Wateyeke bêjeya ’evînê’ jî bi hizira dil ku wî dihanî ser ziman, ji vê nêzîkatiya wî xuya dibû. Di vir de hêjayê gotinê ye ku, divêt mirov bêje, ’evîndariyê’ jî her weha xwediyê gelek nêzîkatiyên watedar bû, ku pê re dihatine ser zimên. Her weha bêjeyên ku dihanîn ser ziman, gelek ji wan bêjeyan di hizra wî de bingeh û pirwateyî bûn. Weke wateyên mirov, zanîn, têgehîştin, dil û hwd, gelek wateyên bingeh ku li gor hinek bêjeyên ku didan xuyakirin. Bi hanîna wî ya ser ziman re, di gotina rewşê de, di zimane wî de jî her weha pirwateyî heye. Di wateya bêjeya rewşê de, weke hizir, zanebûn, têgehîştin, çand, war û hwd, têt ser ziman. Her weha divêt mirov bêje, ku gotinên ku ew dihêne ser ziman, ne tenê bi wateyeke dihatin ser zimên. Bêje ’cism’ tenê ne tiştetkî tenê ye, ku bi gotinên wî re dihêt ser zimên. Pê re hizrek jî dihanî ser zimên. Gava ku dihêne ser zimên, di serê wî de gelek hizir û nezikatiyan bi hev re û bi wateyên xwe re hene. Weke wan bêje û wateyên wan ji bo gotinên xwe re û bihaniya ser zimên. Lê li hinek ciyan ku dubare dike, dihêne ser zimên ji hinek wateyên din jî tevlî wateyan dike û dihêne ser zimên.

Hizra dema xwe, Mihemed bi taybetmendiyên xwe yên zanebûnê re digire. Ew mirovekî hevdemê dema xwe ye. Hizra wî ya jiyanê, hizra zanistiya di bingeha hizra civakê de dide avakirin. Ji ber vê yekê mirov dikare bêje ku ji bo dema xwe di nav civakê de mirovekî zanistvan e. Mirovekî ku dema xwe fahm kiriye. Li gor taybetmendiyên civakê yên ku têne têgehîştin, nêzikatiya bi çand û hizrê dike. Ji ber vê yekê gotin û nêzikatiyên wî yen di dema wî de, ku tenê li ber çavan û bi gotinan re hizra wî jî têt dîtin û têgehîştin. Hizrên wî sûden xwe ji xwezayê û li jiyanê bi meyizendinê re digirin. Ji ber vê yekê jî divêt ji bo wî mirov bêje ku mirovekî ku zanebûna xwe pir fireh û mazin kiriye. Vê yekê jî mirov dikare ji nêzikatiyên wî û gotinên wî bimeyzêne û têbigihê.

Mirov di dema xwe de hizra dema xwe fahm dike û bi têgehîştinê re bi fahm dibe. Bi vê yekê re divêt mirov bêje ku di vê têgehîştinê de kurbûn ji ku çêdibe, bi xwe re pêşketinê dihênê. Em bi vê yekê li nêzîkatiyên Mihemed dimeyzênin û têdigihên. Hizra demê çi ye yan jî çawa ye, li gor merc û hoyên xwe bi şirovekirinê re têt gehîştin. Bi çendî vê yekê jî, jiyana zanistvanan jî di ber çavan de bi bûhûrandinê re têt têgehîştin. Ev yek bi çendî zanîna demê ku têde têt jînkirin, ku têt xwandin û her weha ji wê jîn û xwandinê, taybetmendiyên deme dihêne têgehîştin. Bêgûman gelek zanistvanên bi jiyana xwe re taybetmendiyên deme hanîne ser zimên, hene. Ji ber vê yekê jî, hêja ye ku divêt mirov wan jiyanan jî bibîne û bixwîne, bi hizrên demê têbigihîje. Nêzîkatî di vir de weke mijareke girîng têt ber çavan. Yan jî ku hebe berhemên wan bi xwe re hanîne, vê yekê bi gotinê re didin xuyakirin. Jîn ku têt jiyîn, her weha wateya xwe mazin dihêne ser ziman. Mihemed li ser demê hinek gotinan bi me dide gotin. Dem xwediyê pêşketinan e û ji aliyê zanîna xwe ve ew dide çêkirinê. Zanîn dema damezirandinê de, di wê demê de xurt e. Lê her weha bi zaninê re jî kevneperestî wek teybetmendiyake girîng xwe dide nîşandan. Pêşveçûn û paşvekişandin bi hev re bi awayeke sereke di wê demê de têt jiyandin. Bi vê yekê re divêt mirov bêje ku bi zanînê re damezirendina xwe çê kiriye. Li ser vê damezirandinê jî, di demê de şer dest pê kiriye. Bi vî awayî divêt mirov bêje ku bi pêşketin û hatina hizir ser zimên, ya zanînê re ew şerê ku çêdibe, ji bextê demê xuya dike. Bi vê yekê re tenê hanîna hizir ser ziman, ji pesketine re têr nake. Bi hizir re hanîna ser zimên, bi awayê xwe re jî, xwe bi wate dike. Nêzîkatî bi vê yekê re di deme de dibe xwediyê hinek taybetmendiyên girîng. Bi nêzîkatiyê re li ser nêzîkatiyê hanîna hizir a ser zimên jî, di wê demê de dibe xwediyê hinek girîngiyên ji bo pêşketinê. Ji bo pêşketinê, du taybetmendiyên girîng derdikevin pêş. Taybetmendiyên pêş dibe nêzîkatî. Ya duyemin jî di zanebûne de dibe kûrbûn. Mihemed li kûrahiya dema xwe, kûrbûnê digire û nêzîkatiyên xwe jî bi zanebûna xwe re dide xuyakirin. Mirov dikare bibêje ku nêzîkatiyeke pir bi zanebûn li gor dema xwe bi gotinên xwe re

dide ber çavan û bi vê yekê re jî di nav civakê de wê deme dinirxîne. Mihemed ji nêzikatî û zanebûnên dema xwe têdigehê, li gor merc û hoyên demê jî xwe têkuz dike.

Mihemed di dema xwe de bi nêzîkatî û gotinên xwe re dibe xwediyê zanîneke kûr. Li vê bingeha li gor rastiya wî, gava ku mirov wî şirove dike, mirov wî çaxî jî, ji rastiya hizrên wî têdigehê. Gotinên xwe bi awayekî ku bi gotinên çandî pêşkêş dike. Lê belê bi hanîna ser zimên re, hizrên xwe jî diyar dike. Li ser pêşketinên, hizran derdiketin holê û nêzikatiyên rêvebiriyan jî, di şirove û nêzikatiyên xwe de, dide nîşandan. Li hevberê nêzikatiyên rêveberiyên xwediyê nêzikatiyeke bi serê xwe re, xwe dide nîşandan. Nêzîkatî bi wî re weke hanîna hizreke li ser zimanê xwe dide ber çavan. Di nêzîkatiya xwe de, li hevberê rêvebiran û di nav civake de xwediyê nêzîkatiyeke bi kesayetî ye. Lê begûman nêzîkatiyeke wisan jî bi nêzîkatiyên xwe re dihêne ber çavan, ku mirov dimeyzîne ev yek di berhemên wî de xwe li rû dixe. Di nav civakê de yan jî di nav civatan de peyivtina wî, bi vî awayî xwediyê gelek taybetmendiyan bûn. Nêzikatiyên wî ji hizrên olîtî yên din re jî, li gor hebûna di nav civakê de bû. Wê demê li nêzîkê Miksê yan jî di navenda herêmê de hizrên olîtiyê yên ji hev cûda jî hebûn. Weke filahî, êzdayetiyê û ji hizrên din ên olî, ku di nav civakê de li piya û li dar bûn. Hemû jî rastiya herêman dipejirandin. Li dema ciwaniya xwe, li nav herêman jî pir digere. Ji navendan bigire ta ku diçe herema Xoşav û ber çiyayê Herekol û hwd. Her weha li gelek derên welêt digere. Lê di vir de divêt mirov bêje ku piranî li aliyê çiyê pir digere. Bi aliyê Exlatê ve, bi wan deran ve jî diçe û digere. Di nav xwezayê de pir hez ji gerandinê dike. Ji ber vê yekê jî demên xwe bi piranî di nav xwezayê de dibuhurîne. Li ber çiyayan gelekî demên xwe dibuhurîne. Li herêma Xoşavê cihên ku lat û zinarên mazin lê hene û bilind in, di nav zinaran de derz çê dibûn û di nav van derzan de dima, ku ji nav wan aveke hênik ku ji bin erde dizê, hebû. Li ber Xoşavê diçû li ser latên ku herî bilind in û li serê dima û li hawîrdorên xwe bi hizir dimeyizand. Lê ji xeynî vê yekê jî, carina riya xwe digirt û diçû ber Kulê Sixqê ji bo rûniştinê. Kulê Sixqê di demên ku baran bû, bi herikîna ava baranê têde bilind

dibû. Ku dihata wir, diçû li ser aliyê wê yê ku weke kaşekî bilind e, di nav şînahiyê de dirûnişt û li aliyê ku li pêşiya wî dima û berî bû, lê ku cih bi cih ne jî ku darên hene, dihatine xûyakirin dimeyizand. Her weha li ber wê avên ku jî di nav latan de derdikeve, li Xoşavê hinekî bêhtir dirûnişt ta demên berêvarên dirêj ku hindik dima ji êvarê re ku reş bikeve erdê. Av li ser latenê re jî ku diherikî, weke hênikatiyeke bi herikandina xwe re ku pir xweş bû dihanî ser pê. Li dorên laten jî her weha sîmahî ji xwe dida xuyakirin. Av ku ji latan dibuhurîn û hinekî din wîr ve diçû dibû şat û diherikî. Di hearikandinê de li avê dihat meyizandin, aveke pir zelal û paqij dihate xuyakirin. Di vir de hêjayê gotinê ye ku divêt mirov bêje ku ev ava ku di nav latan de ye, hê derneketi di bin latan de, weke kezînan dide çêkirin. Lê avên kezînên ku çêdibin û av têt û di wan kezînan de dibuhure, diçe, bi wan deran ku dibuhure û di nav kevirên axê de diçû, zelalbûneke hê maztir çêedibû. Axê herêmên Kurdistanê sor e û ku şil jî dibe, ji avê re dibe weke bêjingeke avê. Mihemed her hez ji cihên weha dikir. Li cihên weha di rojê de, pir demên xwe dibuhurand. Di ciwaniya xwe de hem bi bavê xwe re û hem jî bi seydayê xwe re li heremên li hawîrdorên xwe digere. Bi vî awayî hem herêman dibîne û hem jî bi gerandine xwe re li heremên cuda, weke cihên cuda jî dibîne. Bi gerandinên xwe re, ne tenê cihên jî dibîne, li herêman, di nav civatên wan de, bi mazinen xwe re dirûne û li wan ji dihesêne û dipeyive. Her weha xwe bi mirovan re dide naskirin. Bi vî awayî mirov dikare bêje ku hê di ciwaniya xwe de li herêma xwe, di nav mirovan de têt naskirinê. Mirovên herêmê dest bi naskirina wî dikirin. Li nig wî jî dirûnin û li hizir û ramanên wî jî dihesênin. Mihemed bi gotina xwe li ser mirovan re dibe xwediyê kargêriyeke mazin. Ji aliyê hanîna ser ziman ve, xwediyê hûnerekî mazin e. Li Kurdistanê li ku derê jî ba gava ku civat dihata lidarxistin, mirov di nav civakê de weke pêşeng an jî mazin amade dibûn. Yên ku dirûniştin jî, ji mirovên zane û xwedîhizir û mazin pêk dihat. Bi vî awayî mirov dikare bêje ku li herêmekê gava ku mirov xwesti ba pêşeng û zanistvanên wan, an ji her weha mirovên sereke dîti bana, diviya bû mirov here di nav civatên wan de rûne, daku mirov wan bibîne. Civat xwediyê

hinek taybetmendiyên weke zanebûnê, sereketiyê û lihevcivîniya civakê bû. Mirov di wan civatan de jî hizir û ramanên xwe dihanîn ser zimên û bi hev re didane têgehîştin.

Mihemed vê yekê baş dizani bû. Ewçend mazin dibû cihê wî jî di nav civatan de hê bêhtir dibû û ew dibû xwedî qedr û qiymet. Bi vî awayî naskirin ji bo wî pir mazin dibû. Di nav civatan de mirovên ku bi dengên xwe yan jî her weha bi zanebûna xwe mazin bana, di civatan de xwediyê cihekî taybetî bûn. Mirov ji her weha li gor vê yekê nêzîkatî li wan kesan dikir û di nav civake de qadr û qiymetê dida wan. Her weha mirovên taybetmendiyên xwe yen ku hene, di nav civatan de didane derve ber çavan. Di civatan de tenê zanebûnên mirovan dihatina holê. Her weha taybetmendiyên wan yen kesane jî, bi her aliyê xwe re di van kombûnan de dihatin ber çavan. Mirov di wan qadên kombûnan de, li hevdû dimeyizandin ka ma ji aliyê hizir û destvekirîbûnê ve jî qasis in an jî merd in, şirove dikirin. Her weha ji wan aliyan ve jî dihatine ber çavan û meyizandin û şirovekirin. Di civatan de divêt mirov bêje ku nêzîkatiya ji aliyê zanebûnê, divêt mirov bigire ta ku digihê her weha taybetmendiyên kesayetiya li ber çavan dihata girtin. Xelk di civatan de li nêzikatiyên hevdû jî pir û baş dimeyizandin. Li gotinên mirovan meyizendin ka ma mirov zane ne yan ji hizrek cuda bi wan re heye. Mihemed mirovekî ji civakê bû û di nav civatê de rûniştibû. Lê her weha nêzikatiyên wî jî li ber çavan ve dihata buhurandin. Ji ber vê yekê jî gelek taybetmendî di nav civekê de hebûn. Bi vî awayî weke ku li nig seydayekî bi zanebûna xwe re bi nav û deng e, di kesayetiya xwandinên wan de car bi car dihata şirovekirin. Yan ji kurê miroveki sereke weke axa, begekî jî li taybetmendî û nêzîkatiyên wan yên sereke dimeyizandin. Ji ber ku di ber çavan de bi buhurandin re, weke ku li radeya wan dimeyizandin ka ma çend bi zanebûnên li wan bi bal bûn.

Di bin çavan de bû Mihemed, ji ber ku seydayê wî mirovekî bi zanista xwe re, bi nav û dengê xwe re, di nav civakê de pir dihate naskirin. Rêzgirtina mirovan jê re pir mazin hebû. Bi vê yekê re bêgûman bêtirs divêt mirov bêje ku bala mirovan li ser Mihemed jî bana bi vê yekê re. Di vir de du tiştên ku di serê mirovan de bi hizir

re bi tesîr bin li ser mirovan. Yek ji wan tiştan jî her weha ji aliyê malbat û seydatiyê têt xûyakirin, hatina naskirin bû. Yê din jî bi vê yekê zanebûna xwe hatina naskirin bû. Teybetmendiya pêşî dibe bingeha heskirina navê wî jî di nav mirovan de. Lê ya ku nave wî mayinde dike, ji zanebûn û têgehîştin û hanîna wî ya ser zimên bû. Bi vî awayî re di vir de divêt mirov bêje ku bi malbat û seydayê wî re û bi zanebûna wî re taybetmendiya wî baş di nav mirovan de dide rûniştandin. Hanîna ser zimên di vir de gelekî girîng e û divêt mirov li gor vê giringiyê xuya bide. Hizrên mirovan bi kasi ku zanistî û mazin be, evçend jî gotin jî girîng dibe ji bo encama derxistinê. Gotin hizir li gor rastiyê dike malê civakê. Yan jî bi vî awayî re ku mirov bêje ku di deng de bi awayê gotinan re di gotinan de we kîjan hevok an jî bêje, kîjan tîp wê bi deng be, wî xwe di vê yekê de bi zanebûn kiri bû. Ev nêzîkatî bêguman ji bo hizrekî û têgihiştina rastiyeke gelekî girîng e û divêt mirov li ser baş û qenc raweste. Bi Mihemed re ev yek hê girîngtir têt ber çavan. Ji ber ku di gotinên xwe de pir li ser vê yekê jî dirawestiya di axiftinan de. Her weha taybetmendiyên ziman di gotinan de xwe dihênin ser zimên. Di gotinên wî de jî xwe dida xuyakirin. Bi vê yekê re girêdayî hêjayê ku mirov bihêne ser ziman ku di herikandina di peyivtinê de, li ku derê wê were rawestin an jî wê li ku derê deng bêt dayin an jî her weha were kêmkirin, girîng dibe. Bi vê yekê re mirov dikare bêje ku Mihemed taybetmendiyên ziman baş û qenc bi xwe re dabûn rûniştandin. Taybetmendiyên ziman her weha ne tenê li ser pergala gotinan têt rawestin. Bi vê yekê re jî li ser zimên jî diraweste. Di vir de li gor nêzîkatîya Mihemed nêzîkatiya herî baş û qenc yên xwezayê ye. Pergala zimên di serê mirovan de bi xweza bû. Wî çaxî pêşketin û çêkirin xwe dide derve ber çavan bi mirov re. Ji aliyê zimên ve hem ji aliyê hanîna ser ziman ve û hem jî ji aliyê xwezabûne ve, Mihemed xwediyê hinek teybetmendiyan bû. Gava ku mirov li ser wî û nêzîkatîyên wî û berhemên wî dihizire ew yek li ber çavan bi bal xwe dide xûyakirin. Homeros zimanekî bi helbestî bi xwe re çê kiri bû û pê dihanî ser zimên. Zerduşt jî her weha xwediyê teybetmendiyên ku hê divêt werine têgehîştinê ye. Mihemed jî her

weha xwediyê zimanekî bi pergal bû ku xwezayî bû. Ew jî bi gotin û nêzîkatiyên xwe re yên ku bi ziman re weke zanistvanekî zimên têt ber çavan. Bi vê yekê re ji bi gotin û berhêmên xwe re gelek derfetên hizirandinê dide me.

Gava ku mirov bi Mihemed re ziman şirove dike, mirov dibîne ku gelek taybetmendiyên mazin pê re dihêne ber çavan. Dema xwe de bi teybet evçend ziman bi karhanîn tiştekî gelekî mazin e. Ziman bi wî re taybetmendiyên xwe yên wêjeyî û hêlbestî dema wî de baş û mazin dide rûniştin. Fêrbûna olîtiyê jî bi zimanê wî re bingehekî ku taybetmendiyên xwe dide derve û tenê bi ber çavan re bi awayekî wêjeyî û hêlbestî re pêş ve dixe. Bêguman ev yek di pêşketina olî de li Kurdistanê û di hizir de weke domaneke nuh xwe dide nîşandan û dihêne ber çavan. Pêşketinên ku di hizir û pêşketinên hizra olîtiyê li Kurdistanê xwediyê dîrokeke dûvdirêj in. Her weha ku mirov li gor domanên pêşketinan weke domanên nûkirinên olî jî bihênin ser zimên û ve yekê bijmêrin, em ê pê re bibînin ku çawa xwediyê dirokeke dirêj û berfireh in ewan domanan. Her weha ev dîroka dirêj bi awayekî hizirî dest pê dike û hêbûna xwe berdewam dike ta wê rojê. Medan hizir di temena olê de dest bi karhanînê kirin. Piştî ku medan ji rêveberiya heremên xwe ketin jî, ji aliyê civakî û hizirî ve, vê yekê hêbûna xwe berdewam kir. Piştî medan bi pêşketina xiristiyaniyê re, ji dema duyemîn bi xwe dest pê dike. Lê ev dem bi hêbûna bindestkirina sasaniyan re bêhtir pêş na keve. Lê sasaniyan jî li hevberê wê hêbûna civakî ya Kurdistanê gûharandin di hizrên xwe de çê dikin. Divêt mirov bêje ku bi vê yekê re bêgav dimînin. Bi vê demê re ku gûharandin dest pê dike, hinek hizrên din jî yên olî li Kurdistanê derdikevin. Manî di vê demê de derdikeve û hizra xwe ya olîtiyê çê dike. Manî li gor civaka Kurdistanê dixwaze hevgirêdaneke (sentezeke) bi hizra xiristiyaniyê û zerduştiyê re çêke û di nav civakê de demezirîne. Hizra xwe ava dike. Lê na gihê ku bi mirov re bide têgehîştin. Ji ber vê yekê jî bêhtir pêş na keve. Tenê hizra wî di nav komekê de bi tixûb dimîne. Her weha wê demê divêt mirov weke demêke lêgerîna xwenûkirina li Kurdistanê divêt mirov ji vî aliyê ve bi navke û bihêne ser zimên. Ta dema derketina

musulmanetiyê, mazdekiyan jî di nav gelek hizran de di nav civake de ji hev cuda derdiketin holê. Piştî musulmanetiyê re demêke nû ji her aliyê ve ku bi wate ye li Kurdistanê dest pê dike. Êdî hizrên din yên olîtiyê û hinekî yê Kurdistanî jî ku derdiketin bêhtir mafê hatina ser ziman ji bo xwe winda dikin. Bêguman ev yek ji aliyê civakî ve jî li Kurdistanê bi kargêrî dibe. Weke Êzdayetî, xiristiyanî jî li Kurdistanê bi vê yekê re weke ji aliyê pêşketin û hêbûna hizirî yên wan ve dikevin pêvejoyeke nû de. Lê li Kurdistanê bi yekcarî ew cudatiyên ji holê na rabin ji ber ku li Kurdistanê weke hêbûna civakî û rastiya wan jî her weha xwediyê wateyeka pir mazin e. Civak di nav xwe de hizrên xwe  dijiyîne û bi jiyandina xwe re berdewam dike. Di wan deman de gava ku musulmanetî dibe olek ji olên Kurdistanê, hinek demên dirêj ji bo têgihiştinê dibuhure bi damezrandina xwe re. Ji ber ku hizra olîtiyê ye ku musulmanetiyê dike hizrekî civakî. Hinek taybetmendiyên civakê bi wan mirovan re xwe dide pejirandinê. Di wan demên tegihiştinê de li gor taybetmendiyên Kurdistanî jî şirovekirin hêdi hêdî derdikeve holê. Ji aliyê ziman ve be yan jî ji aliyê hizir ve be, di wan deman de bingehek ava dibe. Mirovên wek Weysel Qeranî jî di serî de bi damezirandina vê temenê re û li gor taybetmendiyên civakê ji aliyê olî ve dihizirîn û dihatin ser zimên. Her weha bi mirovên weke Weysel Qeranî re temeneke mazin li gor civakê çê dibe. Mirov weke wî jî ji ber ne li gor rêveberan diaxivin bekargêrî dimînin. Wan demên pêşketinan ta dema Mihemed xwediyê gelek pêşketinên mazin in. Di vir de gava ku mirov pirojiyê jî şirove bike, mirov wê bibîne ku domanên wê li Kurdistanê diçine ta dema medan. Lê li gor demên rengdayinê jî, xwediyê hinek teybetmendiyên xwe yên girîng in. Bi vê yekê re bi wan piroj re jî li herêmên wan jî rêzgirtin jî li gor civaka Kurdistanê pêş dikeve. Ta ku Kurdistan wek civat ne hata têgehîştin, di nav civake de jî bi olîtiye mazinbûn jî hinekî zor dibû. Civaka Kurdistanê xwediyê hinek rengên ji hev cuda yên dirokî ne. Mihemed jî hinekî bi seydayê xwe re vê yekê fahm dike. Her weha bawerkirin, taybetmendî û ol bi civaknasiyên xwe yên hizirî re, di serê Mihemed de dirûne.

Gava ku dest bi perwerdê dike, pêşîkê, taybetmendiyên li herêmên li dûrên xwe hîn dibe. Pişt re li ser hizir û wateya hêbûna wan dibe xwedîhizir. Ev yek dibe bingeha têgehîştina civaknasiya ku ew fêhm dike. Her weha bingeha pêşketinê bi xwe re çê dike. Di demên perwerdeya xwe de ji hizir û diroka olê jî dide rûniştandin. Li ser vê bingehê, xwe digihêne hizir û ramanên ku hene. Mihemed Bi vî awayî re ku mirov wî şirove dike, mirov dibîne ku di nav civaknasiya welêt de jî, bi hizra xwe re xwe dide herêkirin. Her weha êdî bi gotin û nêzîkatiyên xwe re, xwe dide herêkirin di nav civake de. Lê bêguman divêt mirov du sê gotinên li ser vê herêkirinê jî bihêne ser ziman. Ji ber ku ev herêkirin jî hinek pêverojiyan di bingeha xwe de nîşan dide. Pêşîkê divêt mirov weke ku berî nuha me gotî zanebûna wî û ji pêşketina wî yê bi herêkirinê re xwediyê temenekî mazin e. Lê li nig vê yekê têgehîştina pêverojiyên pirojê û sereketiya malbata wî jî xwediyê temenekî bingeha bi vê yekê re ye. Bêguman li gor zimanê civakê hanîna ser zimên jî bi ve yekê re xwediyê bingehekî girîng e. Bi wan taybetmendiyan re taybetmendiyên din yên herî girîng jî honandine pirojiya bi zimanê xwe re di demê de hin bi hin rêza li hevberê wî mazin dike û wî bi gotin û rêza ku jê re têt nîşandan derdixe asta herî bilind.

Ji aliyê zanebûnê ve Mihemed bingeha herêkirina xwe baş çê dike. Bi gotin û nêzîkatiyên xwe re xwe dide herêkirin bi mirovan re. Mirov jî li zanebûn û hanîna wî ya ser ziman, dimeyîzînin û Lê pir guhdar dibin. Bi agahdarbûnyinê re çend wî fêhm dikin û wî didin herêkirin. Zimanê wî jî her weha xwediyê hinek taybetmendiyên ku bala mirov dikişîne ser xwe ye. Bi ve yekê re gotinên wî ji di serê mirov de weke hizrekî mazin xwedî kargêrî ne. Kargêriya hizran wî ji awayê gotinên wî û ji tiştekî nû ji dayina mirovî ve têt. Mejiyê mirov ku gotinêk an jî her weha hizra di hiş de digirt êdî mirov dikare bêje ku ew hizr bi kargêriya di serê wî de ye. Bi vê yekê re mirov dikare bêje ku çend di hişê wî de dimîne jî, hê behtir hizirnên nû di hiş de dimîne bi xwe re çêdibe û diyar dibe. Her weha ji aliyê hizir ve, dewlemendî pê re xwe bi çêkirinê re dide nîşandan. Bingeha wê dewlemendiyê jî di mejî de dimîne û

hêbûna xwe berdewam dike. Gotinên ku bi kîjan awayî dihêne ser zimên jî, girîngiya xwe bi wê awayê gotinê re dihêne ser zimên. Awayê gotinê li gor hanîna ser zimên re xwediyê hinek taybetmendiyên ku li ser mirov kargêrî dihêli. Wan taybetmendiyan hêstan bi xwe re xweş û mazin dihênin ser zimên. Hizir ku hate ser zimên jî, xeynî hizra ku di serê mirov de çê dike, bi hanîna xwe ye ser zimên re hinek hêstan ji çê dike û bi serwer dike. Hizir û hest bi hev re pêş dikeve. Lê ku hestên li hebûna mirov serwerbûn jî, wê çaxê mirov dikare bêje ku hest hizir bi xwe re dike hizra hestiyer. Hizra hestiyer bi awaye ku Mihemed dihanî ser ziman re, hinekî ji xwe mazin çê dikir. Mihemed, mirov bi nêzîkatiyên xwe yên hêstiyer re dixiste di nav hizir û hêstan de. Her weha mirov bi hizrên hestiyer re ew û hizran wî fêhm dikirin. Di vir de hêja ye ku divêt mirov bêje ku hesta welêt, di vebêjnîkên weha de, dibe weke temenekî bi mirovan re. Bi vî temenî re têgehîştinên mirov dibûne xwediyê hinek taybetmendiyên welatî. Lê hest jî gava ku têt ser zimên, çawa ku rewşeke nasik û tenik bi mirov re çê dike, her weha welat jî, di vê rewşê de hem ji aliyê hestiyarî ve be û hem jî ji aliyê nêzikatiyên welatî ve be j, mazin û bi zanebûn tevdigere. Bingehên nêzîkatiyên nûbûnî, reformî jî, her weha di hizra olîtiyê be, yan jî hizrên din de be jî, temenê xwe dibîne. Bi vî awayî re hestbûn û welat bi mirov re di rewşeke hizrên hestiyer digihêjin hevdû. Lê ji aliyê olîtiye ve welat xwe bi hizir re bi temen dike û hêbûna xwe berdewam dike. Çawa ku welat xwe bi hizir, hest û baweriyê dide, hebûna xwe berdewam dike, her weha bi nimûneyên dagerî (sembolîkî) re jî xwe dide aşkerekirin.

Dema ciwaniya xwe de Mihemed bingehekî pir mazin bi zanebûnê re, bi xwe re çê dike. Di kesayetiya xwe de hizir baş dide ravekirin. Ravekirin ku çê dibe bi xwe re pêşketina di taybetmendiyên kesayetiyê de çê dike. Gava ku di taybetmendiyên kesayetiyê de pêşketin çê bû, wî çaxî mirov dikare bêje ku xwe gihandina hizran nû dibe. Gava ku Mirov di serê xwe de xwe gihande hizrên nû û hinek hizra nû di serê xwe de avakirin, wî çaxî di jiyanê de jî bingehekî xurt û mazin ava dibe

ji bo pêşketinan. Mirov her weha digihê radeya ku karibe bi mejiyê xwe re di xwe de pêşketinan çêke. Her weha kesayet hinek taybetmendiyên hizirî û zanistî bi xwe re bi vê yekê re ava dike. Bi vê avakirinê re, avabûna nûbûnên ku wê bibin jî diafire. Mirov dikare bêje ku Mihemed bi mejiyê xwe pêşketinan di xwe de cîh dike û bi mejiyê xwe re ji pêşketinan dide çêkirin. Bi wî awayî re, xwe gihandiye redayeke nû di zanîna demê de. Zanîna demê xwediyê hinek taybetmendiyên zanebûnê û hanîna ser zimên e. Hizir di wê demê de di rada yeka pir mazin de ye. Mirov dizane di wê demê de hizir û ramanên xwe hinekî dihênin ser zimên. Bi vê hizir re hanîna ser zimên re taybetmendiyên zanînê bi mirov re dibe weke temenekî di demê de. Lê her weha di têgihiştinan de cûdayetiyên bi hev re sabûnekê jî dihêne. Di nav vê sarbûnê de nêzikayeti dibe xwediyê hinek taybetmendiyên mazin. Her weha mirov dikare bêje ku li ser hebûna nêzîkatiyên li hevber hevdû rawestan didemê de çêdibe. Mirov ni kare bêje ku têgehîştin bi tevayî di nêzîkatîya ku dihatina ser zimên de, dihate ser pê. Nêzîkatî di astekê wîlo de bû ku pêşketinên demê xwe di asteka herî bilind de dida xuyakirin. Nêzîkatî bi hizir re çêdibe. Bêguman dîsa wê bi hizir re wê buhurandina bi xwe re çêbe. Nêzîkatî bi hizir re û bi pêşketina hizrê re çêdibe û dibuhure. Mihemed tenê ve yekê di nêzîkatiyên xwe de na yêne ser zimên. Pê re ku mirov weke pêrspêktîfeke ji şiroveke çawabûneke jî xuya dibe. Çawabûn di nav mentiqa xwe de bingeha di nêzîkatiyan de, hizir û buhurandinê jÎ diparêze. Weke felsefeyeke hevdemî ku her dem hizira nûjeniyê bi rih bigre bi xwe re. Bi gotinê wî ye ’ta kenge hêy hêy’ re nêzîkatiyeke mazin bi hizir re têt der. Gava ku mirov bi vê yekê re dihizire, mirov dibîne ku hizrek jî çêdibe. Ev gotina wî bi çendî ku di hundurê xwe de nêzîkatîyeke diparêze, her weha evçend jî hizrekî di bingeha xwe de û rexnek jî bi xwe re dihêne holê. Nêzîkatî bi gotinê re bi hizir re rexne dike. Rexnekarî bi xwe re ji nêzîkatîyekê dihêne, lê bi xwe re nêzîkatîyekê nû ji tenê. Nêzîkatî bi zanebûnê re têt dîtin. Ku zanebûn pêş ket, wê çaxê nêzîkatiyên ku dihêne kirin û dihêne holê, dihêne ditin. Li ser wan nêzîkatiyên hizir jî ava dibin. Gava ku hizir hate ser zimên, wî çaxî

mirov dikare bêje ku bi demê re bingeha gûherandinê tê çêkirin. Bingeha gûharandinê her weha bi hizir re çêdibe. Mihemed di hişê vê yekê de bû. Ji ber vê yekê li ser nêzîkatiyên hizra xwe re dihanî ser zimên. Di jiyana xwe de jî fêrên mazin didane ber çavan ji mirov re. Li ser nêzîkatiyên wî gelek gotin ji devan dihatin gotin. Her weha wan gotinên hamûkan jî gava ku ew ji cihê kûr dibe û li Kurdistanê dest bi gerandinê dike, pê re çêdibin. Mirov ku ji nû ve ew didît, nêzîkatiyên wî yên nû fahm dikirin û didîtin. Her weha nêzîkatiyên wî di serê mirov de jî diman. Ji ber gava ku mirov ji nû ve ew didît, bi nêzîkatiyên wî yên ku balkêş dihat ji wan re. Ji ber ve yekê jî pirsîn an jî meyizandin ku lê dibû, tiştê ku mirov bi wî re didît, di serê wan de dima. Carinan mirov bi gotinêkê re jî di hişê xwe de dihêlan. Ji ber ku di didîtina pêşîkê de nêzîkatiyên bi bal qenc jî bin an jî xirab, di mejiyan de cih digirin.

Her weha di meji de cihgirtin dibe bingeha gelek pêşketinan. Lê bêguman ev yek bi mirov re hizrekî çê dike. Hizra Mihemed bi nêzîkatiyên wî re, hizrên pir mazin û qenc di serê mirov didan çêkirin. Mirov li dunya hiziran de digerandin. Mirov ku hizrên xwe di nav civakê de dihanîn ber bi pêş, her weha bêguman ev gelekî girîng bû. Ev girîngbûn bi Mhemed re xwe bi gerandinên wî re, dida ber çavan. Di ciwaniya xwe de li herêma xwe pêşîkê li wan deran digere. Lê ku mazin dibe êdî li Kurdistanê li gelek cihan digere û hizra xwe dihêne ser ziman û hizrên nuh bi gerandina xwe re, bi xwe re çê dike. Di gerandinê de divêt mirov bêje ku weke têgihîştina Lêgerineke jî di serê wî de hêye. Ev Lêgerina di serê wî de, wî ji herêman dibe herêman. Her weha Lêgerina di serê wî de, weke li tiştêkî digere lê gelek hizr ji di serê wî de pê re çê dike. Lêgerîn di hizrê de di serê wî de heye. Hizra Lêgerînê weke felsefeyek pê re xwe dide nîşandan. Mirov dikare bêje ku lêgerîneke felsefeyî ji lêgerîna wî ye, ku di dema xwe de kir, hebû. Her weha bi lêgerîna xwe re ne tenê di hizra xwe de di pêş dîtina xwe de jî, bi hizra xwe re naskirineke pir mazin dide çêkirin. Bi naskirina xwe re jî hizra xwe dihêne ser zimên. Çend nas dike evçend jî mazin dihêne der. Bi naskirina wî re hesten waritiyê ji pê re pêş dikevin. Di berhemên xwe de her weha hestên bi zanebûnê

re diyar dibin. Hestên xwe yên waritiyê li ser zanebûnê ava dike. Zanebûn her weha, ji gelek aliyên ve, pê re divêt were şirovekirin û ser zimên. Ji ber ku bi zanebûnê re, hem bi bêjeyî û hem ji bi hizirî re dihanî ber bi pêş ve. Hizra Mihemed ya waritiyê, her weha bi naskirinekê re xwe çê dike û dihêne ser zimên. Lê bêguman bêja waritiyê ye, ku bi wî re xuya dike, xwediyê gelek taybetmendiyên zaneyî ne. Zanebûna xwe di vir de bi du bingehan re mazin dike. Ya pêşîkê li ser dîtin, naskirin û têgehîştine ye. Ya dinê jî bi wan taybetmendiyan re hanîna ser zimên, xwe bi temen dike. Bingeha wateya bêjeya waritiyê, her weha bi wî re di serê wî de bi awa dibe. Bêjeya waritiyê di serê wî de li temena hizir û dirokê, mirov û war, jiyan û pêşketin ava dibe. Her weha bi wê bêjeyê re mirov dikare bêje ku pê re zanebûneke bi tegihiştin heye. Ev yek jî di berhemên wî yên ku ta î roj winda ne bûne, di hatina xwe de dide ber çavan û gelek jî bi balkêş e. Li ser bêjeya war, li wateya zanebûnê digere. Di wateya zanebûnê de jî, bêjeya war dihêne ser zimên. Ji bo ku bêje war ya ku di serê wî de mirov şiroveke, berhemên wî hizrekî mazin didin. Lê ji bo ku ev zanebûn têr be, divêt mirov li jiyana wî jî bimeyizêne, ta ku têr were ser zimên û têgehîştin. Jiyana wî jî weke berhemên wî, xwediyê hinek taybetmendiyan e, ku teybetmendiyên wê mazin in. Jiyana wî wêneyeka Kurdistanê di hûndurê xwe de diafirîne. Ev wêne jî bi gotin û dîtinên wî re, xwe bi war rê dike. Her weha mirov dikare bêje ku jiyaneka wî ya weke berhemeke dîrokî heye, ku dijî. Ev jiyana wî ye ku weke berhemeke dîrokî ku xwe dihêne ser zimên di temena pêşketina dîrokî de, her weha weke ku di dîrokê de bi hizir û raman, çand û wêje, felsefe û xwezayê re, xwe her weha weke mijarên girîng dihêne ser zimên û ber çavan. Lê bêguman mirov ni kare bi nihêrîna xwe re bêje ku ew tenê pê re hene. Ew mijarên weke mijarên sereke pê re dihêne ber çavan. Pê re hûnera hanîna ser ziman û gotin, helwêst û olîti jî, bi nêzîkatiyên xwezayê re, bi wî re dihêne ser zimên. Xweza her weha di bin gotin û hizra wî de mijareke sereke ya herî mazin e. Bi xwezayê re hizir, war, dîrok, mirov û ziman bi hinek teybetmendiyên xwe yên cûda û bi zanebûn re pê re diyar dibin. Gava ku ew xwezayê şirove dike, mentiqa xwe jî bi şirova xwe re

ava dike. Di bingeha mentiqa wî û hizra wî ya mentiqê de, hizir, dîrok, mirov û war weke hinek taybetmendiyan wate bi xwe re radixin ber çavan. Lê bi rastitiyê re nêzîkatîyeke ji mentiqî re dibe. Mirov dikare bi mentiqa xwe re, xwe bigihîne rastiyan. Wate, bêje, mentiq di serê wî de hinekî kûr e û divêt ji gelek aliyan ve were diyarkirin, ta ku bi zelalî were têgehîştin. Di nêzîkatiyên xwe de rastiyê weke teybetmendiyek mentiqî dipêjirîne. Bi nêzîkatiyên xwe re rastitiya weke teybetmendiyeke mentiqî şirove dike û li gor ve yekê jî weke teybetmendiyeki ya mentiqa xwe ye taybet û cuda û bingehê ve şirove dike di axiftinên xwe de. Mihemed di demên cûwaniya xwe de gava ku ber bi temamkirina xwendina xwe ve têt, êdî di hizra xwe de rengê xwezayê û çandî hê behtir di gotinê de diyar dike. Weke zimanekî hêlbestan derdixe pêş û pê dide xuyakirin. Berhemên wî her weha ji bo ve yekê jî, ji me re gelek derfetên têgehîştinê dihêne ser ziman û dide ber çavan. Têgehîştina ku bi wî re, bi vî awayî re têt ser zimên, xwedî gelek taybetmendiyan e. Divêt mirov wan taybetmendiyan têbigihê. Bi vî awayî re têgehîştin ji mirov, di qada hizir û ramanê de bigihîne astake herî mazin. Zanebûna mirov mazin û xort dike. Nêzîkatiya wî ye li ser zanebûna weke awayekî bi hêz kirinê têt xuyakirin. Bêguman li gor wî ew radeya mirov hê behtir bi vê yekê re di qada zanînê de bilind dibe. Hizra xwe ye ku bi mirov dayî têgehîştin û li ser mirov hani xuyakirin, divêt mirov bêje ku xwediyê gelek teybetmendiyên balfireh û kûr in.

Mihemed ku ji ciwaniya xwe hêdi hêdi dibihurand, êdî hizrên wî di serê wî de her weha çêdibin û mazin û kûr dibin. Mihemed bi naskirina kesayetiya xwe re têgehîşt û mazin dibû. Divêt mirov bêje ku ev têgehîştina wî dibe bingeha pêşketina wî ya ku pê re di demên pêş de çêdibin. Piştî ku li nig seydayê xwe zanist hilda, xwe mazin dike. Lê weke mirovek zane têt meyizandin. Ji ber vê yekê jî divêt hê behtir kûr bibe di zanista xwe de. Seydayê wî gava ku di demên xwandinê de gelek caran ew jî hilda bû di rax xwe de û bi hev re çûbûn nig şêxê mazin ku li Gilîdaxê dima. Bi çûna nig şêx re jî, naskirin û têgehîştin û serwerbûn jî dihate girtin. Şêxê Gilîdaxê gelek mirîd û sofiyên wî hêbûn. Mirovek xwedî zanist û

pirojiya xwe re bi deng bû. Ji ber vê yekê jî çûna nig wî gelekî bi qedr û qiymet dihate pêjirandin. Di civata şêx de li ser hizir û zanista olîtiye û ji xeynî wê yekê jî hizrên ku werine fêrkirin û yên din jî hêbûn.  Şêx gelek mirîd û sofiyên xwe weke mamoste bi kar kiri bû û di nav mirovan de hizir û gotinên wî bi pesin (wesf) û zanebûn dihanîn ser zimên û digotin ji mirov re. Bêguman di vir de divêt mirov bêje ku pesnê mirovên ku li nig wî dixwandin jî hebû. Ji ber ku li nig wî bûn û zanebûna wî dihildan. Pesna wan jî li nig wî rawestinê jî hinekî dihat. Lê divêt mirov bêje ku Mihemed jî hinekî bi pesn û serbilind bû. Zanebûna wî hebû û mazin bû. Seydayê wî jî li nig şêx bû û bi zanista mala Şêx mazin bûbû. Dikari bû bi mirovên mazin ku salên xwe dane fêrbûna zanistê re ketibin di hinek guftûgoyan de. Vê yekê jî ji zanebûn û ji xwebewerbûnê dihat. Zanebûn ku bêhtir bû êdî li xwe bawerbûn jî li ber çavan pê re xwe dide nîşandan. Bawerbûn her weha di wê demê de weke Mihemed yên ku dixwandin bi wan re xwediyê du wateyan bû. Yek; her weha ji zanebûnê dihat, ya din jî, jinêzîkatiyên olîtiye ku di nav de jî mazinbûn û pirojbûnê dihat. Mazinbûna her weha weke wateyên zanebûnê, ku di wê demê de xwedî zanebûn di nav wateya xwe de di demê de dipêjirand. Li ser mazinbûna nêzîkatî her weha weka nêzîkatiyên hinekî felsefî xwe dida ber çavan. Lê bi zanebûnê re mazinbûn û kibirbûnê jî divêt di wê heyamê de bihatana dîtin û têgehîştin. Di vir de ev dîtin ji ku çêdibû, weke taybetmendiyekê bi rûmet dihata pêşwazîkirin. Mihemed gava ku bi seydayê xwe re çûbû nig şêxê Gilîdaxê, li wîr çavên gelek mirovan hati bû ser wî. Ev çavên çûbûn ser wî jî, ne tenê ji aliyê wî ve xwe didane xûyakirin. Her weha ji aliyê zanebûnê ve jî xwedî wate bû. Lê bêguman divêt mirov bêje ku weke me pêşi gotîbû, lê dihata meyizandin, ku ka ma ew xwe mazin dibîne yan jî bi mazinbûnekê re çawa li xwe dinere. Ew mijareke girîng bû di serê yên ku di wê heyamê de lê di meyizandin de bû. Li nig Şêx pesindar û mazin tevgerîn, ne tiştekî biçûk dihate dîtin. Bêguman jî ne wîlo bû. Vê yekê bala mirov li wîr hamûkan ji dikişand ser xwe. Di we heyamê de ev rewş û zanebûn, ku bi hev re dihate hûnandin û di gotinan de dihate ser zimên,

dibû weke rewşeke herî bilind ji bo wan mirovan. Qedr û qiymet her weha bi nav û deng re mazin dibû. Pirojî jî her weha di wan rewşan de bi zanebûnê re hevdîtin çêdikir bi mirov re. Mirov ku li diwana Şêx jî dirûniştin, gelek ji wan bi pirojîyê dihatine pêşwazîkirin. Di wan mirovan de rewşên pirojîyê dihate gerîn weke ku li xazineyekê were gerandin. Di vê xalê de divêt her weha mirov taybetmendiyeka din ya civata Kurdistanê di vir de bihêne ser zimên. Ev taybetmendî jî her weke ku têt gotin, di diwana Şêx de bi ve lêgerînê re mirov tenê xwe ne digihande hizra olîtiye. Pê re nêzîkatiyên civakî yên Kurdistanê jî dihatine ser zimên. Mirov her weha bi du aliyan re têgehîştinê dikir. Aliyek jî xwegihandina rastiya Kurdistanê, bi hizira û dîrokî ve, aliyê din jî bi berdewambûna nêzîkatiyên olîtiyê re xwe bi wate dikir. Çêkirina qesîdeyan jî di wan diwaneyan de çêdibû. Qesîde jî bi xwe re hebûna di nav civakê de jî hem bi wate û hem jî bi bêjeyi dihanîne ser zimên.

Qesîde ji gelek aliyan ve xwediyên taybetmendiyên li Kurdistanê ye. Ji aliyê pirojiye ve bi çendî xwedî wate ne, evçend jî di pirojîyê de têgehîştin û hest pêş dixistin. Bi vî awayî re nêzîkatiya hestiyar her weha di pirojiyê de çêdibû û dibû xwediyê hinek taybetmendiyên zanînan. Qesîde di mejî de hiştin ji weke pirojiyekê dihate pêşwazîkirin. Lê bêguman bi vê nêzîkatiyê re ku pirojî ji di bin de xwedî wate ye di mejî de hiştin bi xwe re rastî û hizrên civakê ji diparast û dihanî pêşerojê. Bi vê yekê re bi awayê ku têt ser zimên re, hinek taybetmendiyên Kurdistanê jî li hevberên windakirinan, bi vê yekê re tenê parastinê. Parastin her weha di bingeha xwe de pirojiyê weke taybetmendiyeke pir girîng diparêze di demê de li Kurdistanê û berpirsiyariyeke mazin bi cih re tenê. Vî awayê pirojiyê divêt mirov li gor taybetmendiyên xwe şirove dike. Gava ku mirov bi vê yekê re her weha li berhemên Mihemed ji dimeyizîne, mirov vê yekê baş û pir mazin dibîne. Mirov ni kare bêje, ku bi qesîdeyan re tenê hinek hizrên olîtiyê hebûna xwe ta î roj berdewam kirin. Her weha qesîde weke belgeyeke dîrokî hebûna xwe li Kurdistanê haniye ser zimên. Ev gotinên me yên ji bo qesîde bêguman ji bo wê demê ne û ji bo

nêzîkatiyên Mihemed jî wateyekê dihênine ser zimên. bi ve yekê re bi nêzîkatiyên civakê yên olî re dibe weke arşîveke dîrokî li Kurdistanê. Qesîde di we demê de li gor rastiya civakê wate digirt. Rastiya hizir û pêşketinên hizir di dema Mihemed de her weha divêt mirov bi hinek taybetmendiyên teybet û mazin şirove bike. Tenê mazin şirovekirin bêguman ji bo wî û demê wê rastiyekê bihêne ber çavan. Ev rastî ji hebûnên ku di dema wî de çêbûne û hizrên ku di demê de pêşketina xwe çawa li rastiya Kurdistanê hanîna ber çavan, wê bi wateya xwe re werin dîtin. Mihemed jî, ji vê yekê re ji me re riyekê dide nîşandan. Rastiya civakê jî li gor taybetmendiyên xwe wê were têgehîştin. Têgehîştin her weha bi vê aliyê re bi wî re mazin xwe dide ber çavan. Mihemed zanibû bi xwe re weke saziyekê li Kurdistanê bide hûnandin û bide têgehîştin. Ger û berhemên wî her weha ji vê yekê re dibin bingeh bi wî re. Hizir çawa têt dîtin? Hizir bi dîtin û têgehîştinê re têt dîtin. Çawa xwe dike weke saziyekê û dihêne ber çavan? Gava ku bi zimanekî xweş bihata ser zimên ku di serê mirov de bimîne wî çaxî, di wir de pêşketin çêdibe. Her weha gotin û hanîna wî ya ser ziman û zanebûna wî dibû bingeha pêşketinên di civaka Kurdistanê ya demê de. Bingeha pêşketinên bi hizir her weha bi xwe re dide avakirin. Bingeha hizir û çêbûna hizir û têgehîştina dîtinan li civakê dike temenê xwe de. Ji ber vê yekê jî têgehiştina civakê divêt mirov girîng şirove bike. Hizrên civakê bi dîtinan re dizê. Her weha zabûn ji çêbûna hizir dihênê ser zimên. Mirov ku di nav civakê de, bêguman ya herî mazin ku vê yekê dihênin ser ziman. Pêşketina hizir civaknasiya (sosyolojiya) civakê di bingeha xwe de dixwaze. Ev xwastin çend bi cih hat, wê evçend mazin çêbûnên hizir bibin. Li gor vê yekê hinek nêzîkatiyên Mihemed hene. Mihemed di berhemeke xwe de li ser rast û rastteqîniyê (heqîqetê) diraweste. Her weha bi nêzîkatiyên civakî re dirabe û dirûne. Mihemed di rastîya civakê de mirovên ku li rastteqîniyê digerin hene..’Hêvî dikin ji rastteqîniyê’ gotineke ku li gerandina li pey ’rastî’ya li tenê ser ziman. Bi vî awayîre ji temenekî tenê ser ziman. Bi xwe re nêzîkatiyêkê û hizrekî ji tenê ser ziman. Di nav civakê de, li rastiyê bigerin, tenê bi wateyê re ev lêgerîn xwe na

hêne ser zimên. Bi xwe re temenekî ji xuya dike. Di nav civakê de her mirov ku her weha xwe da têgehiştinê, wî çaxî mirov dikare bêje ku xwe gihandiye rastiyekê jî bi wê têgehiştina wî re. Gotin û nêzîkatiyên Mihemed her weha bi hanîna ser ziman re bingehekî ji xwe re çêdikin. Mirov lê dihisand û gotinên wî yên ku dihanîne ser ziman di serê mirov de cih digirtin. Bi cih girtinê re têgehîştin bi mirov re çêdibû. Bi vê yekê re giredeyî, divêt mirov behsa xweşgotinê jî bi wî re bike.

Li ser xwezayê dihizire Mihemed. Xwezayê di gelek gotin û nêzîkatiyên xwe de weke ku bi ruheke dihêne ser zimên. Gava ku li nig seydayê xwe dixwand jî, her weha vê yekê dida ber çavan. Demên xwe yên xwandine gelek ji derve dibuhurandin. Ji dervemayin û xwezadîtin bi wî re dibû xwediyê hinek wateyên mazin. Her weha hizir di serê xwe de çêdikir û bi wê çêkirinê re li xwezayê vedigot. Di xwezayê de bi nêzîkatiyên xwe re hizir di ser xwe de dikire xwedî wate. Hizrên ku di serê xwe de çêdikir ji weke ku bi xwezaye re we hizir guftûgo bike nêzîkatî nişan dide. Her weha di nêzîkatiyên xwe de xwediyê wate û çêkirina hizir bû. Wate çi ye? Li ser vê yekê dihizirî. Di serê xwe de bi wate gerîna xwe re xwe bi hizir dikir. Wate xweza ye, wate ye di xwezayê de, nêzîkatiyên watedar û hwd, ji gelek aliyên ve xwe dide hizirandin. Têgehiştin wate mazin dike. Lê wate ku hate girtin ji têgehîştin jî her weha mazin dibe. Wate û têgehîştin xwediyê nêzîkatiyeke felsefi ne di nava hizir de. Her weha ji bo li wate gerînê, divêt di vir de bi Mihemed re baş û hinek mazin şirove bike. Gotin û nêzîkatiyên wî, vê yekê bi bêhtirî, di demê de dike xwedî wate. Ji ber vê yekê divêt mirov bêje ku wate bi nêzîkatiyên wî re baş û li gor ku wî dihanî ser ziman û tiştên ku dixwast bihêne ser zimên bi hev re dihanîn ser zimên. Di demên pêşketina xwe de meyizandina wî her weha bi wî re lêgerînêke di hêbûna xwe de dide derve. Di vir de evçend kur dibû ku di xwezaye de cismên ku dilebitîn, ji wî di serê xwe de bi lebat dikirin. Av dipeyivî, lê? Wî ve yekê dikir. Mirov çawa ji zimanê teyrikan têdigehê? Ew ku li ciwaniya xwe, her weha gelek nêzîkatiyên xwezayî bi xwe re bi wate dike û bi nêzîkatiyên xwe re û bi hizra xwe re dihêne ser

zimên. Çemê Dîclê radiwestiya û jê dipirsî, ’ma ka tu ji ku derê têyî û herî ku derê? Ev çi xurxur û nalîn e ji nava te tê?’ Her weha pirsên ku di serê xwe de çêdikirin pir bûn. Li ser xwezayê dipirsî. Xwe di nav hizra xwezayê de kûr dikir. Avakirina hizira di serî de, ji bo nêzîkatiyên wî, dibe xwedî wateyeke mazin. Gava ku li nig seydayê xwe dixwand û ku li nav xwezayê digeriya û dirûnişt, her weha nêzîkatiyên hûneri bi xwe re dida çêkirin. Bi hevalên xwe re gerandina li nav xwezayê, li ser teyrik û xwezayê hizra xwe ji wan re digot. Bi wan re her weha li ser xwezayê dipêyivî. Digote hevalên xwe ’zimanê teyrikan jî heye’. Hevalên wî, ji wî dipirsin ’nexwe mirov dikare bi wan re bipeyive?’ Her weha têgehîştin jî zor dihat ji hevalên wî re. Pişt re li ser ve yekê bi seydayê xwe re ji dipeyive. Ew ji teyrik û sewalan hîs dikir. Di dil û serê wî de li ser teyrûk û sewalên (haywanatên) bi nêzîkatiyên ku bi hizir û hest hati bûn hûnandin, hêbûn. Di gotin û hanîna xwe ya ser zimên de ji nimûneyên bi teyrik û sewalan re dihanîne ser zimên. Her weha nimûneyên li ser teyrik û sewalan dayin, wî dike ’feqiyê ku bi tayrûkan re diaxive’. Bi vî awayî re nave wî derdikeve. Di ciwaniya xwe de her weha navê Feqiyê Teyran distêne di nav xelkê de.

Feqiyetî ji xwandinê têt. Gotina nêzîkatiya hizrê di hundurê xwe de diparaze. Feqiyetî di wateya xwe de ciwaniya zanebûnê bi hev re dihûne û dihêne ser zimên. Her weha divêt mirov bêje ku feqiyetî di nav civakê de xwediyê rêzekê ye, ku jê re nîşan didin. Mihemed feqiyekî zîrek û zane bû. Ji aliyê zû têgehîştinê ve ji bi fahm bû. Mirov ku lê dimeyizandin, digotin ku ev mirov ne mirovê şevekorî ye, mirovekî gelekî bi fahm e. Her weha hin bi hin dihate naskirin. Bi vê naskirine re, bi navê ku lê hate kirinê dihat naskirin. Mirov ew bi navê Feqiyê Teyran nas dikir. Lê Mihemed di nav yên ku wî nasdikirin de, baş dihate naskirin. Feqiyê Teyran hin bi hin di nav civakê de dihate naskirin. Ew Feqiyekî ku bi teyrikan re dida û distand. Her wesan dihate naskirin û şirovekirin. Ku gava mirov fahm dikirin ku ew feqî ye, êdî fahm dikirin ku ew mirov zane ye jî. Jê re nêzîkatî dihate kirin. Bi vî awayî li gelek cih û waran xwe dida naskirin. Li wan cih û warên ku ew geriya bû, ew weke Feqiyê Teyran dihat naskirin. Gava ku diçe nig şêxê Îdirê, şêxê Îdirê jê re

dibêje Feqiyê Teyran. Êdî ew Feqiye Teyran e. Wek Feqiyê Teyran wê jiyana xwe berdewam bike ji wîr pê de. Mihemed navê Feqiyê Teyran ji wê demê ve li xwe girti bû. Bi kirinên xwe re bi xwe re dîtinên ku hanîne ber çavan, ji mirov re wî dike Feqiyê Teyran. Gotina Feqiye Teyran gava ku tê gotin, bi hinek wateyan re, yên ku di serê mirov de diafire, têt ser zimên. Mirov wan wateyan bi xwezayê re fahm bike, wê gavê mirov vê yekê dibîne ku bihêne ser zimên. Bêguman zanebûn jî, di wateya ku dihate ser zimên de, bi gotina Feqiyê Teyran re hebû û mazin dibû. Mirov di kesayetiya wî de her weha hûnerweriyeke didîtin û pê re dihanîne ser zimên. Gotina Feqiyê Teyran her weha weke gotinêke hûnerweri jî dihanî ser zimên. Navê Feqiyê Teyran ji aliyekî din ve jî, weke teybetmendiyeke dihate ser zimên. Mirov ku ew nas dikirin, digotin ew Feqiyê Teyran e. Feqiyê Teyran her weha nav e û navekî ku bi taybetmendiyan re têt gotin.

Hizir û ramanên wî bi navê Feqiyê Teyran re dihatin ser zimên û naskirin. Feqiyê Teyran ew mirov bû ku bi zanebûna xwe mazin bû bû. Hizra xwe bi taybetmendiyên xwezayê re dihanî ser zimên. Xweza ji bo wî xwediyê hinek teybetmediyan bûn, ku werin têgehîştin. Hizra jiyanê di jiyanê de têt ser zimên û têgehîştin. Hizra jiyanê xwediyê rastîyan e ku di jiyanê de ne. Jiyan her weha bi wan taybetmendiyên xwe re, ku were têgehîştin, wê mazin û qenc were têgehîştin. Evîndarî rastîya mirov e, ku di jiyanê de jî dibe xwedî wate. Bêguman Mihemed li evîndariyê hinekî bi teybet û mazin dimeyizand. Li ser evîndariyê mazin dirawestî. Gotinên wî yên evîndariyê her weha ji bo têgehîştinê bingehekî mazin ronahî û hizrê dide mirov. Li gor Mihemed û nêzîkatiyên wî ku her weha tê şirovekirin, têt dîtin ku hizra wî yê derbarê evîndariyê de bi hinek taybetmendiyan re têt ser ziman. Li gor nêzîkatiyên wî, mirov xwedî dil e û dil jî bê evîndarî na mêne. Ji ber vê yekê mirov dikare bêje, ku jiyan evîndariya xwediyê tûxmekî ye bi mirov re. Nêzîkatiya wî ya evîndariyê, her weha xwe bi gotinên ku wî dihanîn ser zimên, bi temen dike. Evîn di dilan de ye. Lê ew evîn jî divêt were dîtin û bê têgehîştin. Bêguman bi nêzîkatiyêke weha re mirov dikare bêje ku Mihemed dihizire ku fahmkirin di evinê de

heye. Ev têgehîştin her weha hizrekî dihêne ser zimên ku dibêje ku evîndarî bi du aliyan xwe dihêne ser zimên. Aliyek jê jî, ji dunyê ye. Aliyê din jî her weha ne dunyewî ye. Aliyê dunyewî mirov dikare têbigihê. Ji aliyê ku te têgehîştin jî, mirov dikare xwe li ser wê direjî aliyê din bike. Bi vî awayî mirov dikare têgehîştineke ku dem pêş ve diçe û mirov ji aliyê têgehîştinê ve pêş ve dibe, bibîne. Têgehîştin di vir de her weha dibêje ku evîndarî ye ku Mihemed dihanî ser zimên û ev evîndarî xwe bi wate dike bi mirov re. Li gor wî, hemû ne bi mirov re xwediyê têgehîştina jiyane ne. Ji ber vê yekê jî mirov dikare bêje, mirov dikare hin bi hin, xwe bigêhene cihên hê maztir di hizir de. Hizra mirov ji jiyanê temenê xwe digire. Jiyan ku dibe bingeha hizir, wê çaxê dikare bi mirov re bibe bingeha pêşketinên hê maztir. Nêzîkatiya wî yên her weha  ku xwe mazin dikin, hinekî xwe dirêji xwezayê dikin. Gava ku xwe dirêji xwezayê jî dikin, wê çaxê bi xwezayê re hanîna ser zimên hê maztir çê di kir. Xweza her weha li gor wî jiyana rastîyeke mazin e, ku divêt mirov jê sûd bigire. Ji xwezayê sûdgirtin, mirov mazin dike. Bi vî awayî re, têgehîştin jî çê dibe. Her weha bû ku Mirov ji berhemên wî nêzîkatiya wî û kesayetiya wî şirove dike û gelek encaman jê derdixe. Bi hizir û ramanên xwe re bi mirov re bû. Ji ber ve yekê ji sûden mazin ji nav mirovan digirt. Bi hizra xwe re jî bi bewerî bû. Ev yek ji gotinên wî pir baş dida têgehîştin. Bewerbûn bi wî re bi du awayan re xwe dida nîşandan. Yek jê ji aliyê beweriyê ve, xwe bi wate dike û yê din jî, ji aliyê bi bawerbûnê ve xwe bi wate dike. Gava ku Mirov ji aliyê beweriyê ve wî şirove dike û li berhemên wî dimeyizêne, mirov dikeve nav hizran de. Di vê xalê de berhemên wî weke ji me dixwazin ku em dîsan ji aliyê hizir û zanebûnê ve, bi destpêkirinê bikin. Di vir de em ê bi hizir û berhemên wî re nêzîkatiyên wî yên bi hizirî re şirove bikin. Ji ber ku her du alî dibin weke ku bi hev re di bin yek. Weke berhemeke tam û têr li ber çavan mane. Jiyana Mihemed jî xwe bi wate dike. Di vir de hêjayê gotinê ye ku divêt mirov bêje, ku Mihemed di nav civakê de hizra xwe bi nêzîkatiyên xwe re gelek hanîne ser zimên. Bi hanîna ser zimên re kargêriyeke mazin li ser mirov kiriye. Ji ber ve yekê ji jiyana wî û jinbûnên wî jî, pê re gelek fêrên mazin didan

ber çavan. Mirov li gor zanebûna xwe tevdigere. Mirov bi tevgera xwe re xwe dike xwedî ziman. Di vir de bi çendî zanebûn û hizir, ya herî girîng jî hesandin e. Ji bo hesandin û ji hizran, ku hene encamgirtin jî rêzek ji rastîyê re divêt, ku mirov bide nîşandan. Her weha ji aliyê rawiştiyê ve jî xweçêkirin derdikeve holê. Rawişt bi mirov re ye. Di hebûna mirov de jî xwedî wate ye. Wateyeke mirov jî li gor rawîst e. Ji ber vê yekê jî divêt bi mirov re têbigihê. Rawişt bi nêzîkatiyê re xwe dide nîşandan. Lê rawişt xwediyê hizra xwe ye, ku divêt pê re were ser zimên. Mihemed her weha ji aliyê rawişt ve, li lebat û gavavêtin, rûniştin û rabûnan, xwarin û vexwarinan, nêzîkatî dide nîşandan. Mirov ji bo wî dikare bêje ku ew xwediyê rawiştiyekê bû, ku bi mirov re rêz dida nîşandan. Gotin û nêzîkatiyên mirov wan bi hawîrdoran re dide herêkirin. Mirov dikare bêje ku gotin û nêzîkatî bi hizir re li ser mirov xwediyê tesîreke mazin e, ku di hundurû de rawişt jî heye. Hizir ku mirov hanî ser ziman, bi hizir re li nêzîkatiyan jî mayizandin û li gor wan hizran li nêzîkatiyan garandin jî weke taybetmendiyeke xwe bi mirov re dide nîşandan.

Her weha hêjayê gotinê ye ku divêt mirov bêje ku rawişt di nav civakê de xwediyê hizrekî bingeh e. Li gor nêzîkatiyên Mihemed rawişt gava ku têt şirovekirin, mirov digehîje ser taybetmendiyên girîng, yên ku ji bo we wî bi nêzîkatiyan dihêne ser zimên. Teybetmendiya herî pêşi nêzîkatî ye. Mihemed di nava nêzîkatiyan olîtiyê de, hizir û her weha nêzîkatiyên mafnasiyê, bi gotina xwe re jî dike weke taybetmendiyek. Mihemed di nav civakê de xwediyê hinek nêzîkatiyên e, ku mirov ew di bin pêrgala civake de şirove dike. Her weha maf dibe beşek ji beşa wan nêzîkatiyên wî yên ku dihêne şirovekirin. Nêzîkatiyêk ku bi zanebûnê re li serweriyê divêt bê kirin. Ev bêjeya serweriyê, gava ku em di vir de ji bo vê nêzîkatiya wî dihênin ser zimên, bi du wateyên girîng em dihênine ser zimên. Yê pêşî, bi nêzîkatiyêke ku bi rêveberiya vê jî were şirovekirin, têt ser zimên. Yê din jî li ser hizra rêveberiyê têt ser zimên. Her weha hizra dadimendiyê di nav vî hizrî de li gor nêzîkatiyên wî gelekî em di nav vi hizrî de bidine şirovekirin. Ji ber ve yekê jî, di nav civakê de li jiyana civakê

meyizandin û bi nebaşiyên ku dibin, hem ji aliyê reveberiyê ve û hem jî, ji aliyê civakê ve têt şirovekirin. Lê li gor nêzîkatiyê jî, mirov dikare bêje ku civak bi ve yekê re xwediyê rawiştiyekê ye. Di her rewşê de xwe bi pêş ve dibe. Di vir de rêvebir divêt rastiya civakê têbigehê û xwe rast ke. Ev yek jî weke xalê destûreke bingehîn e. Ji nêzîkatiyên wî têt têgehîştin, ku bi têgehîştina hizra civakê re û li gor ve yekê xwe çêkirinê re reveberi dibe rêveberiya civakê. Ew pêşketinan di vir de dibîne. Hizra wî ya jiyanê di vê xalê de bi têgehîştina nêzîkatiyên wî re mirov dikare şirove bike. Lê bêguman, ne li gor rêveberiya bi yekcarî re, di tevgereke bingehîn de ye. Mirov çawa dixwaze jîn bibe? Li kûrahiya şiroveya xwe, jiyana xwe bi taybetmendiyên rawiştiya xwe ya civakî û olîtiyê re ava dike û berdewam dike. Mirov dikare bêje ku rewanê hizra xwe ye. Bi vê rewantiya xwe re jiyana xwe bi wate dike. Têgehîştin li jiyan û kesayetiya wî re xwediyê hinek taybetmendiyên ku di jiyane de dide standin. Bêguman divêt mirov bêje ku hizra jiyana xwe bi mirov û jînbûnê re dide avakirin.

Piştî ku diçe nig şêxê Îdirê, Mihemed bi seydayê xwe re hinek biryarên ku li ser rêveçûna jiyana xwe re kifş dike. Piştî ku diçe li nig Şêx biryar dide, ku hinekî li nig Şêx jî bimêne. Li wîr jî bi seydayê xwe re hinekî dimîne. Weke domanekê li wir dimîne. Bi mayina xwe re hê bêhtir xwe kifş dike. Li herêmê û li hawirdorên herêmê digere. Li herêmê bi gelek kesên zane ne re dirûne û hizrên wan fêr dibe. Bi wan re hizra xwe ji hevpar dike. Lê her weha maeyin û hawîdor dîtin, hinekê kargeriyan jî li ser kesayetiya wî dike. Di vir de hêjayê gotinê ye ku divêt mirov bêje, ku di wê demê de li nezîkê Şêx mayin, dihate wê wateyê ku nezîki hê behtir zanistber e. Wî jî tiştê ku dixwest bêguman di radeya xwe de di nav mirovan de ev bi wate bû. Ji seydayê xwe re û ji mirovên ku naskirin, gelekî tişt fêr bû bû.  Lê wî hê jî weke tiştên ku di serê xwe de dixwastin û lê digeriyan hebûn. Mirovên ku dîtibûn ji herêmên din,  gelek gotin û dîtin bihistibûn. Tiştên ku hîskiri bû û bihîstibû hemû di serê wî de bû û bi zindî bû. Evçend zindîbûn, di serê wî de tiştên ku hesandin mabûn wî jî dixwast her weha hê hîn bibe. Li ser Cizira Botan ji biçûkatiya xwe ve gotin dibihîstin. Bi

bêhtirî jî di nav xalkên ku dima, hîs dikir. Ji ber vê yekê jî li çîrok û gotinên xelkê pir tişt dibihîstin. Di serê wî de pir tiştên ku bihîstibûn, dabû hevdû, hêbûn. Di hîskirin û bihîtinan de ji xwe re dîmenek ava kiri bû di serê xwe de. Lê bêguman weke gotinêke mazin, ku di serê wî de bi meraq hebû, ji gotinên Şêxê Teyrikan bû. Teyrê Sîmûrg çi bû, li ku derê bû? Bi vê gotinê li Kurdistanê, hema bêje ku li hamû cihan digere. Di nav gelek civatan de dirûnişt û hizra xwe ya ku di serê wî de bû dihanî zimên.

Jiyan û hûner, hizir û raman û dîtin û dîmen, di riya kî de wî bi hev re dihunand. Hizra evîndariyê di serê wî de hebû. Bi hizir re mazinbûn ji hebû. Ji aliyê hizir ve çi li serê wî mabû rawestiya. Divêt mirov bêje, ku xwediyê zanebûneke baş û mazin bû. Gotina evinê dixwest ji dil fahm bike. Li dilê dirov dimeyizand ji ber vê yekê pir dimeyizand. Dil çawa evîndariyê jîn dike? Yan jî çawa zindî dihêle? Hizra evîndariyê tenê bi hanîna ser zimên re dibû. Bi hanîna hizir li ser zimên re dibe ku bi gihana encamekê be. Lê bêguman ew ancam ne encama bingehîn bû. Her mirovek xwediyê dilêkî ye. Ji ber vê yekê jî mirov dikare bêje ku tiştê ku di dil de jîn be, hinekî li gor taybetmendiyên xwe ye. Her dil xwediyê hinek taybetmendiyên xwe yên xweser e. Evîndarî ku kete dil jî, divêt li gor taybetmendiyên we were têgehîştin. Her mirov evîndar bi ruyê xwe re awayê hestan dide der. Awayên hestan jî xwediyê taybetmendiyên xwe xwe ne. Rihê evîndariyê di jiyanê de rihekî evîndariyê ji dide avakirin. Mirov di jiyane de li gor hest û hizra xwe tevdigere. Bi rûdan û dîtina xwe re hestên xwe bi gotin û sozên xwe re evîna xwe bi lêbat û gaven xwe yên tevgerî bi xwe dihêne ser zimên. Jiyana mirov jî her weha xwe bi wate dike. Di babeta hîskirinê de Mihemed gava ku hizran dihanî ser ziman, pir bi hêz bû. Weke ku li tiştêki digere dihizire. Her ku dihanî ser ziman dîsan tiştêk di dilê wî de kem dima. Lê ji bo wê kembûnê bibîne û têbigehê jî, di lebatên xwe de gelekî tahb dida xwe. Bi wê tahbê re jî, digiha hizir ku pê re pêş diket. Jiyana xwe bi vê yekê re li nav lêgerînekê derbas dikir. Gava ku diçû nav xelkê û bi seyda û zaneyan re dikete nav guftûgoyan, ev mijar jî di serê wî de babeteke şiyar bû. Li nig şêxê Îdirê jî dema ku mabû, bi kesên

dûrên xwe re jî diket têkiliyan de û hizra wan jî hil dida. Bi seydayên li dûrên şêx re jî dikete di  guftûgoyan de. Mirov ni kare bêje ku şêx bi xwe li ser hizrên serê xwe  guftûgoyan dike. Li nig şêx rûniştî li ser arzelê û berê wan li çiyaye Araratê ji xwe re dipeyivîn li ser babeten ku di serê wan de bûn. Gelek caran çavên Mihemedî diçû ser şêx. Şêx mirovekî kal bû û riheke sipî li ser bû. Li nig wî û mala wî gelek mirîd û sofiyên wî jî hêbûn. Hamûkan ji bo wî tevdigeriyan. Şêx li nêzîkê Mihemedî rûnişti bû. Mihemed hê mirovekî ciwan bû. Mirovên ku li nig şêx rûnişti bûn, hema bêje hemû jî jê maztir bûn. Di nav wan de ew mirov pir ciwan dihate xûyakirin. Lê bi zanebûn bû ku nuha di nav wan mirovên ku hemû jî jê maztir bûn, rûnişti bû. Piranî ku dirûnişt seydayê wî jî li nig bû. Bê seydayê xwe jî, dest bi axiftinê ne dikir. Seydayê wî jî mirovekî navsere bû. Bi çûna xwe ya di nav salan de bi gotin û zanebûna xwe re, mirovekî mazin bû. Jê re rêz dihate nîşandan. Seyda bi xwe berî ku bi Mihemed re were nig şêx, berê gelek caran hati bû. Seyda bi xwe gava ku xetima xwe diqedîne, êdî pê de li mala şêx dest bi dewama xwe dike. Ji ber vê yekê jî ew bi xwe re weke mirovekî ji mala şêx dihate jimartin. Ew jî weke mirîdekî yan jî sofiyeki şêx dihate dîtin. Gava ku bavkalê Mihemed li nig bû seyda gelek alikarî jê digirt. Bavkalê Mihemed ji nêzîkî mala şêx bû. Gelek caran bi ser hev re diçûn. Ji ber vê yekê jî qadr û qiymeta wan jî ji hev re hebû. Seyda her weha li nig Şêx û mala wî xwedî qadr û qiymet bû. Mihemed jî her weha, hem ji aliyê seydayê xwe ve dihate naskirin û qadr û qiymet digirt û hem jî ji aliyê malbata xwe ve û ji ber qenciyên bavkalê xwe re jî xwediyê qadrekî mazin bû. Bi vê yekê re gava ku şêx her weha bi wan re dipêyivî û bala xwe dida wan, ev yekê ji ber çavan mirov ku li dûrên wan rûniştî baz ne dide. Dihate têgehîştin ku ewan bi xwe re mirovên mazin in. Şêx her weha kirarî bi wan re dikir. Mirov ku rûniştin bi kirarên Şêx re êdî li gor nêzîkatiyên Şêx tevdigeriyan. Her weha mirov dikare bêje ku bi vî awayî re dibûn xwediyê rêzeke pir mazin. Mirov jî wan bi vî awayî re bi dest naskirin didan. Seyda ji xwe naskirî bû. Bi wî re Mihemed ji her weha dihate naskirin di nav mirov de. Mihemed jî bi zanebûn û gotin û zimanê xwe, xweş

xwe kiri bû di dilên mirov de. Ew jî bi taybetmendiyên xwe re hati bû naskirin. Mirov ku ew naskiri bûn, digotin ku ew mirov bi zanebûn û bi fahm e û di xwandinê de çye û xwe bi zanebûn kiriye. Her weha nêzîkatiyên mazin je re dihatine nîşandan.

Bi nêzîkatî û meyizandinan re, Mihemed û Seyda li nig Şêx rûniştibûn. Seyda mirov ji aliyê di nav civatan de rûniştinê de, hema bêje ji aliyê hemûkan ve dihate naskirin. Mirov ku ji biçûkatiya xwe ve li nig mala Şêx dest bi xwandinê kiri bû û di nav zanist û pirtûkan de kûr bûbû. Mihemed jî feqiyê wî seydayî bû. Ji ber vê yekê jî divêt mirov bêje ku li ber çavan bû bi zanebûn û kesayetiya xwe ve. Her weha ku mirov li wan dimeyizand, li zanebûn û rêz û kesayetiya ku wan bi xwe dabûn rûniştandinê, dixuya. Mirov ku mazin dibe û hinekî bi xwe re serwer dibe bi kesayetiya xwe re êdî taybetmendiyên her weha, yên mazinbûn û zanebûnê bi wan re tenê lêgerehandin. Mirov ku di serê xwe de bêje mazinatiyê dihanîn ser ziman, bi hinek wateyên civakî dihanîn ser ziman. Wateya pêşi her weha di kesayetiyê de bi mazinbûne re hinek zanebûn jê lê gerahandin weke taybetmendiyekê ku dihate dîtin divêt mirov bihêne ser zimên. Bi vê yekê re, ne tenê ev yekê jî hebû. Ji xeynî vê yekê jî ji aliyê rêzgirtinê ve jî dihate ser ziman di nav mirov û xelkê de. Bêguman di nav civatan de ev yek hê maztir dihate ber çavan. Mirov ku li nav civatê dirûniştin, li kesayetiya hevdû dimeyizandin. Bi meyizandinê re ku kêmasiyeke biçûk jî hatibana dîtin, li ber çavan begûman wê ew kêmasi jî bihatibihane ser zimên û gotin di nav xelkê de. Mirov wilo li kesayetiya hevdu jî dimeyizendin di nav civatan de. Ji aliyeki din ve jî li gotin û nêzîkatiyên hevdu, bi vê nêzîkatiyê re dihate meyizandin, da ku fahm bikin, ku ka ma çend bi wate û mazin têt ser zimên. Ji aliyê kesayetiyê ve jî ev nêzîkatî gelekî girîng bû. Di nav civakê de ev taybetmendiya jî weke radeyekê dihate şirovekirin bi mirov re. Li gotinên mazinan jî dimeyizandin û li ber çavan digirtin ji bi vê yekê, weke taybetmendiyekê li ber çavan bû. Lê bêguman nêzîkatiyên mazin ên ji aliyê dana têgehîştine ve xwe dide nîşandan.

Mihemed jî di dema xwe ya ciwaniyê de bû û ji aliyê nêzîkatî û

têgehîştin û gotinên xwe ve weke ku di taqiyekê de be dihate ber çavan de. Mihemed di nav civate de jî car bi car didipeyivî. Car bi car dikete nav peyivtinan de û gotin digotin. Li aliyê Serhedê di nav civatan de car bi car li nêzîkatiyên mirovên zane û mirovên ciwan ku ji nûkeve bidest axiftinê dikirin û hinek gotinên di nav civatan de dihatin ser ziman. Her weha gotinêke bi dengê ku têt gotin ku dibêjen 'hê ne bûye cer ku ava wî nigidî be, ew hê şerbik e'. Bi vê yekê re jî digotin ku 'ka bila pêşi bibe şerbik da ku pişt re bibe sevilk, ku bû sevilkê dî wê bibe cer û ava wî bi nigidî be'. Ev gotin di qada mazinbûnê de weke radeyekê mirov dihanî ser ziman di nav xwe de. Her weha Mihemed jî di nav civatê de rûnişti bû û hê xort bû. Ji ber vê yekê ev gotin ji bo wî jî dihate ser zimên. Lê divêt mirov bêje ku Mihemed di nêzîkatiyên xwe de ne mirovekî vala dihate xûyakirin. Ev yek jî dihate dîtin ji aliyê xelkê ve. Ji ber ve yekê ji bala xelkê diçû ser wî di nav civatan de û di rûniştinan de. Mihemed gava ku dikete nav civatan de, li mirov pir bi bal dihisand û dipêyivî. Di hesandina xwe de pir fêr jî digirt. Mirov ku li nig Şêx rûniştibûn mirov ku ji aliyê olîtiye ve bihêne yan jî ji aliyê hizir ve bibine xwediyê zanebûneke pir mazin bûn. Mirov ku pir di nav civatê de li wan dihate hesandin bûn. Bi wan mirovan re ji mayin û li wan hesandin û her weha ji aliyê wan mirov yên ku li wan di hesandin jî li ber çavan girtin jî gelekî mazin bû. Mihemed bi vê yekê zani bû. Ji aliyeki din ve jî mirov ku nuha li wan dihesand, gelek ji wan mirovên berê, ji aliyê seydayê xwe bihêne yan jî ji aliyê mirovên din yên ku di nav civatê de ji wan mirovan ku dihatine nig wan û mêhvanî li wan mirovan jî dihisand ku ka ma ewçend mazin û bi zane bûn. Lê nuha jî di nav wan de bû û li wan dihisand. Ji aliyekî ve jî ev yek jê re weke xawneke dihat. Dema ku li nig Şêx mayî gelek xelk ku dihatin û diçûn, her weha weke ku axa, beg û yên ku bi nav û deng bûn dîtibû. Bi wan re jî hevnaskirin çêkiri bû. Mirov ku dihatine nig Şêx kesê mazin bûn. Hemûkan xelkê ku dihatin di nav civakê de yên bi qadr û qiymet bûn. Bi vê yekê re divêt mirov li ser şêxîtiya ku dihate kirin jî du sê gotinên bike. Şêxîtî di nav civakê de xwediyê hêzeke civakî bû. Şêxîtî di nav civakê de xwediyê wateke mazin e. Şêxîtî gotinêke ku divêt

mirov wê weke pegalake şirove bike. Gava ku ola musulmanetiyê derket êdî şêxîtî jî di nav civakê de pêş ket û bi sazî bû. Di kesayetiya şêxan de  nêzikayekê civakî û olîtiyeke wate xwe dida rû. Lê bêguman divêt di vir de mirov hinekî here temenê bêjeya şêxîtiyê. Gotina şêxîtiyê di olên ku li Kurdistanê gelekî kevn e di êzidîtiyê de hebû. Di êzidîtiyê de ji gotina şêx re *şêxan* te gotin. Ola êzidîtiyê ji aliyê kevnbûne xwe ji dema medan ve jî berjêr diçe. Dema musulmanetiyê de jî şêxîtî heye û bi pêşketineên olî yên ku çêdibin re xwe mazin û bi bingeh dike û berdewam dike. Her weha divêt mirov vê bêje, bi wateya xwe ya dîrokî û civakî re baş û qenc şirove bike. Gava ku bi musulmanetiyê re şêxeti dest pêşketinê dike êdî bi vê bêjeyê re ew gotin û wate ku pê re heyi û di nav civakê de bi pergal e, bi reng û gotina musulmanetiyê, hêbûna xwe berdewam dike. Bi vî awayî re gotina musulmanetiyê jî, li Kurdistanê hê zû û maztir pêş dikeve. Bi vî awayî pêşketina musulmanetiyê re ku mirov şiroveyeke çêke, wê ev şirove xwe di nav civakê de ji civaknasiyê (sosyolojîkî) ve bide ber çavan. Di van pêşketin û domanan de ew bêje û pêşketinên pê re ne, xwe gelek qihanek û belanan dide ber çavan. Bi vî awayî re ji aliyê olîtiyê û civakzaniyê ve ev bêje divêt li gor kûrahiya xwe were dîtin û şirovekirin.

Mihemed û seydayê wî li nig şêx demêke direj dimînin. Mihemed bi feqî û sofiyan re jî dirûnihê û dipeyivê. Mihemed dema xwe bi bêhtirî her weha bi feqî û sofiyan re û bi hinek mirov din, yên ku di nav civatê de xwedî rêz in re, dibuhurêne. Di wê demê de jî bi hesandina mirovan jî gelek tişt fêr dibe. Gotinên herêmê yên weke çîrok û dîrok û jiyangotinên mazinan dihesêne û li kûretiya wan jî diraweste. Ji wan jÎ gelekî tiştan fêr dibe. Di nav gotin û çirok û dîrokan de her weha ku dihisand, li ser Cizîra Bota û zanista ku tê de ye jî gelek gotin dihatine gotin di nav civat û civakan de. Evçend mazin û bi awayekî xweşik dihate gotin ku di dilê mirov de cih digirt. Mîretî bi zanebûnê re têt gotin bi nave Cizîra Bota re. Her mirov ku dixwand dixwest ku ji bo zanista xwe mazin bike û di zanista xwe de kûr bibe, di dilê xwe de xwestekeke mazin diparast ku ji bo ku here Cizîra Botan.

Mihemed her weha li nig Şêx û di mala Şêx de hê bêhtir bûbû xwedîfahm. Ji gotin û axiftinên di serê xwe de sûreta ku bi gotin li Cizîra Bota re dihate gotin wî jî xweş û mazin bi xwe re çêkiri bû. Mirov ku xwe gihandibihêne Cizîra Bota weke ku xwe gihandibihêne evîndariyekê. Bi xwe gihandina Cizîra Bota re ji bo pêşketina hizir û xwe gihandinê hê gelek zanistivanan jî mimkun dibû. Di rê de çûna Cizîra Bota ve weke çûna rêyeke ku di nav dîrokê de bi meşê re xweşerê dihanî ser zimên. Mihemed gava ku di nav civakê de li mirov dihisand, didît ku hinek mirov ji wan mirovan çawa behsa çûna xwe ye Cizîra Bota bi can û dil dikirin. Ku behsa Cizîra Bota dikirin weke ku behsa evînê, evîndarekî bikin ku wilo xweş bi dil, hest û zane behs dikirin. Mihemed jî ji bav û kalê xwe pêşîkê derheqê Cizîra Bota de bûbû xwediyê hinek hiskirinan. Cihê mala bavê dayika wî jî hinekî ji Miksê wîr ve bi aliyê Cizîra Bota ve dima. Ji vî aliyê ve jî hinek hesandinên wî hêbûn. Dayika wî jî jê re behsa wan herême dikir. Bi hesandina gelek gotinan re gelek gotinên ku berê ji dê û bavê xwe hîs kiri bûn û ji seydayê xwe hîs kiri bûn di wê kêlikê de di serê wî de divejinîn. Her weha bi vê vejînê re Mihemed di serê xwe de bûbû xwediyê wêneyekî ku baş û mazin a der heqê Cizîra û çûna Cizîra Bota û hebûna wê ya dîrokî. Bi wan temenan re Mihemed di serê xwe de dikete hizir û fikaran de. Her weha ji aliyê naskirina herêman û çirok û dîrokên wan ve û ji aliyê naskirin û dîtinên mazin ên wan herêmên ve jî bûbû xwediyê dîtin û zanînake mazin li nig mala Şêx. Her weha divêt mirov bêje ku bi çendî ku ew bû bû xwedî naskirin û hizirbûnaka mazin, evçend jî bi zanebûn û hizra xwe re û bi hizir re ye ku dihate ser zimên, bingehekê baş û mazin bi xwe re çêkiri bû. Li nig mala şêx gelek mirov êdî bi navê Feqiyê Teyran bang dikirinê**.** Ew êdî bûbû Feqiyê Teyran ku bi teyrikan re dipêyivî û ji aliyê mirov ve her weha dihate naskirin. Piştî ku şêx bang kiri bû bi navê Feqiyê Teyran êdî mirov jî digotine wî Feqiyê Teyran. Her weha navê wî bi zanebûna wî re û bi gotinên Şêx û mirov re bûbû Feqiyê Teyran. Mihemed bi vî awayî jî nig şêx ne tenê bi navê Mihemed vegeriya malê. Her weha bi navê Feqiyê Teyran vageriya bû mala xwe. Lê bêguman divêt mirov bêje ku her

weha bi çêbûna nave Feqiyê Teyran jê re seydayê wî û şêxê wî xwediyê gotin bûn. Bi vî awayî di demên xwe yên pêş de hevalên wî yên xwendevan jê re navê Feqiyê Teyran bang dikirin. Bi vî awayî nave Feqiyê Teyran jê re dibe navê wî yê jiyanê ya herî mazin. Navê Feqiyê Teyran bi taybetmendî û zanebûna xwe re, xwe dide hildan bi mirov re. Mirov her weha ew xwedî taybetmendî û zanebûn didîtin. Bi vî awayî re Mihemed demên xwe yên ku li nig malê Şêx bi seydayê xwe re diborîne êdî divegere malê bi seydayê xwe re. Mihemed her weha bi awayê ku diçe nig Şêx û bi awayê ku ji nig Şêx divegere malê demên ji hev cihê dijî. Çawa ku diçe her weha ne vedigere malê. Gava ku vedigere malê, weke navê wî ye ku hildayî Feqiyê Teyran di serê wî de jî bi hê hizirnên din re, ji nig şêx divegere malê. Zanebûn di emel de di kesayetiya xwe de pêş ve dibe. Di wê demê de ye ku li nig Şêxê xwe dimîne, de ha maztir hizra serê xwe mazin dike. Mihemed her weha gotin û zanebûn û evîna dilê xwe hê maztir û bi hizirbûntir û zanebûntir û fahmbûntir dike. Zanistvanek her weha bi nave Feqiyê Teyran di nav xalke de kad dide.

## II

Ro hêdi hêdi derdiket û tîna xwe dida li ser xelkê. Xelk jî ji nûke dest bi rabûna ji nav ciyan dikirin da ku herine kar û barên xwe yê rojane. Mirov ku xwedî kar bûya, diviya bû ku hinekî zû rabe da ku bikaribe bi kar û bar zû bigihêne. Jin hê zû dirabûn ji nav cihên xwe ji bo kar û baren xwe yên rojane. Ji ber ku sewalên wan bi çûyina çolê û divîbû ku bihatine dotin berî ku herin. Hinekan jî hê ji êvarî ve sewalên xwe didotin. Ji ber vê yekê jî di sibehê de ne gerek bû ku wan cereke din bidoşin. Bêguman dîsan di çûnên nav sewalên xwe de û dimeyizandin ku ka ma tiştekî ku bikin heye yan ji nîn e. Her weha çûyin di jiyana xalkê de weke berpirsiyariyeke xwezayî xwe dida ber çavan. Mirov ku hê hemûken ne rabûbûn sewalên xwe dibirin û diçûn mêrgan. Jin jî di malên xwe de dest bi kar û barên malên xwe dikirin. Peya jî karên ku kiri bana li malê

dikirin yan jî li ser bênderan de ku hebûya kar û barên xwe ve dirabûn. Yan jî diviya bû ku di dema xwe de av bidena tayeran. Mirov ji bo tayeran jî av bidana cokên ku li ber tayeran ve diçûn, çêkiri bûn. Tayerên xwe jî nêzîkê hevdu çêkiri bûn û av di xatên cokan de kişandibûn nig tayerên xwe, da ku tayerên xwe pê av bidin. Her weha di wan cokan de bi ava ku dihat, mirov tayerên xwe av didan. Di tayeran de fêkiyên weke bacanên sor û reş, pîvaj, îsot, sîrik, dulmek û bi sinatiya re hê gelek tiştên din ku wan di tayera de çandibûn, hebû. Her weha diviya bû ku gelekî ji bo tayerên xwe agahdar bin. Mirov her weha bi ava ku di cokan re dihat bi dûrekan re tayerên xwe av didan. Ku yekî avkirina xwe xilaskiri ba, êdî riya coka tayera xwe qut dikir û bi qut kirinê re yên ku di rex de ne, coka wî digirt û bi ya xwe vekirinê re dest bi avdana tayera xwe dikir. Her weha jiyaneke xweza û ku gelek bûyinên bêxeber dihate jiyinê.

Ber bi nîvro re kar û barên ku bi ber sibehê ve dest pê kirine hew dibû. Êdî wê kar û barên din yên ku yê malê ne dest pê kiri ba. Her weha ev kar û bar jî weke hevîrkirine hevir û paqijkirin û lihevdana nav malê bû. Di kar û barê rojêne de gava ku hê zû dirabûn, mijûlbûn bi sawalan re çê dibû. Sewalên ku diçûne çolê pê de, êdî cihên sewalan paqijkirin û pêvedankirin dihate kirin. Piştî paqijkirin û pêvedankirinê re hê ji êvarî de mastê ku hati meyandin dihate hanîn û dihate kirin nav meşkan de û dest bi keyandinê dihate kirin. Bi keyandinê re zarok jî hêdi hêdi ji xewa xwe ya şêrin dirabûn û dest bi şûştina dest û rûyên xwe dikirin û paşê jî taştê dixwarin. Ku taştiya xwe dixwarin êdî ew jî diçûn li nig dayika xwe dirawestiyan ta ku dayikê kayandin hew kiri bana. Dayika ku keyandin hew dikir ji meşkê dikir û dest bi valakirinê dikir. Zarok jî li hêviyê dirawestiyan. Êdî ew jî ji bo xwarinê hinekî dew û nivîşk li ser nên didan. Di wê jiyanê de nanê ku ji nûkeva tanûre derdiket hê germ û piştî keyandinê re dew û nivîşka li ser nên çêjên xwe bi tiştekî din re ne dida gûherandin. Ev yek weke teybetmendiyeke rojane xwe dide nîşandan. Piştî keyandinê re bêguman zarok jî dew û nivîşkê xwe yê li ser nên digirtin û diçûn. Ev yek ji wan re weke diyarî kirineke bû ku kêf dide wan. Bi vê

yekê re zarokan gelekî kêfxweş dibûn. Dilên wan şa dibû. Her weha ku tiştên ku dixwestin dihildan ji wan re di dilên wan de weke serkeftinekê bûç Zarokan her weha ku dew û nanên bi nivîşkê xwe dihildan û dixwarin û xwarina xwe ji hewdikirin êdî diçûn digehîştin hevdu daku bi hev re bileyîzin. Dilên wan pir xweş dibû ku tiştên ku dixwastin û dihildan. Bi vî awayî re weke dunya tev xweşî û rindî dibû. Zarok kefxweşî û dilxweşiya jiyan û malan bûn. Mirov ji wan ta ku dihat dilê zarokên xwe ne dihiştin. Lê gelek caran jî tistên li dê û bavên wan ne dihat, bi vê yekê re jî zarok bi dilşikestî dibûn. Vê yekê jî dilê dê û bavên wan diêşand. Bavek her dem dixwast ku zarokên wî tiştên jê xwest ew î bi cih bihêne. Ku ne hanîbana cih jî jê re dibû weke dilêşiyeke mazin û ev xwe pê re dida xuyakirin. Zarok bi qadr û qiymet in.Weke ava zelal in û diltenik in. Di jiyanê de zarok weke hibrê ne. Ku tu ew diberdî di nav ava de û av jî bi rengê wê hibrê rengê xwe diguharîne. Zarok jî her weha ji tiştên ku hez dikin an jî dibinin, dibin xwediyê guhenrandinan bi xwe re di pêşketina xwe de. Ev yek ku li jiyanê tê meyizandin pir baş û mazin bi zarokan re têt dîtin.

Piştî ku keyandina meşkê jî hew dibe êdî di kar û barê rojane de kar û sûxlê hundurê malê dest pê dikirin. Di malê de her weha jin bi kar dirabû. Di nav bênder û tayeran de jî  mêr bi kar bû. Lê gelek caran jî li ser bênderan de jin û mêr li nig hevdû kar dikirin. Gava ku genim dihate lihevkirin piraniya jinan li bêjingan dixist. Piştî bêjingan ji têr û nawalên ku hatine çêkirin û amadekirin jî, ji genim an jî her weha weke nîsk û nokên ji zad dihate tijîkirin û dihate barkirin û dihanîn malê. Gava ku genim an ji her weha weke nîsk û nokên ku dihanîn malê êdî vale dikirin en kewaran ku ji bo wan zadan hatiya amadekirin. Di vir de hêja ye divêt mirov bêje ku çêkirina kewaran jî karekî gelekî mazin bû. Ji bo çêkirina kewaran jî hûnerek divî bû. Kewarên ku dihatine çêkirin her weha bi salan genim di wan de weke xwe dima û xira ne dibû. Ewan kewar ji axa sor dihatine çêkirin. Ax pêşi dihate hanin û pişt re dihate neqandin ji zûgurên ku di nav de ne. Êdî piştî neqadinê, dihate hêrandin û pişt re weke ku bê meyandin demekê dihate hiştin. Gava ku ax dihate hêrandin hinek sorbûn û ka jî dikete nav de. Lê kayê ku di

kete nav de jî bi taybet dihate amadekirin. Axlabe jî kayê nîskan an ji ya nokên di nav heriya kewaran bi kar dihat. Kayê genim jî piranî ji bo tenûran bi kar dihat. Piştî ku demek ew heriya ku hatî amadekirin dimîne êdî hinekî tirş dibû. Bi tirşbûnê re têt meyandin û xasa xwe distenê. Piştî ku xasa xwe stand êdî pê de dest bi çêkirina kewarê têt kirin. Lê bi carekê an jî di rojekê de ev kar na yêt hewkirin. Her roj weke bostekê yan jî du bostan tê çêkirin ta ku baş hev bigre. Gava ku hewdibe jî divêt baş bi heriya rohn were sahikkirin û Pişt re were zuwakirin. Ku zuwa bû pişt re êdî weke agirekî biçûk tê de were kirin da ku qiyma xwe bistêne û qayim be. Piştî wan kirin û çêkirinan re kewar êdî dibe kewarekî temam ji bo ku bi kar bêt anîn. Piştî ku hati çêkirin jî ta demeke dirêj qeyimiya xwe bêhtir dike. Her weha di malekê de kewar û kadîn, kox û kulîn (metbex) weke ji bo zad û sewalan gelekî girîng bûn û ji bo vê dihatine çêkirin. Di malekê de her weha hinek beş bi hev re dihatine çêkirin. Beşên ku dihatine çêkirin jî hemû ji yên ku pêwendi bi wan re hêbûn û ji bo berdewam kirina jiyanê girîng bûn, dihatine çêkirin. Bi vê yekê re ji bo jiyana mirov kahnî jî gelekî girîng bûn. Kahnî ne tenê ji bo ava dihate bi karhanîn. Her weha ji bo parastina hinek tiştên xwarinê jî bi kar dihat. Yan jî ji bo nigidandina tiştên xwarine bi kar dihate hanîn. Her weha ji aliyê gelek pêywendiyan de dibû bersiv ji mirov re. Bi vê yekê re divêt mirov bêje ku mastê kîsê gelekî xweş e û hinekî ji xweşbûna xwe di kîs de û di kahniyê de bi rawestinê re digire. Mastê kîsê kawra xwe her weha hinekî di kahniyê de bi nigidandinê re digire. Li ser mastê ku di kîs de hiştine re gelek çirok û gotin jî di nav xalke de dihatine gotin. Ava kahniya ji binê erde tê ji ber vê yekê jî nigidî, hênik, zelal û gelekî paqij e. Ava bîran her weha ne wilo bû ji ber ku di demên direj de dima di bîran de. Ji ber ve yekê jî ku ne ji zor e bihêne ava biran bêhtir li cihên ku kahnî lê hene bi kar ne dihate hanîn. Pêywendi pê ne dihate dîtin. Mirov pir girîngî dida paqiji û jiyana xwe di mala xwe de. Paqijbûn û nepaqijbûn jî her weha li ber çavên mirov dihate xûyakirin û mirov gelek caran ji hevdû ji ber wê hişyar dikirin ji bo lawûtandin yan jî her weha nepaqijbûnê. Xelk her weha jiyaneke xwezayî bi taybetmendiyên xwe re û bi

hebûna xwe re berdewam dikir. Di jiyana xweza de mirov dikari bûn xwe bigihênen hizra nû ve ji xwe re. Ji ber ku jiyan xweza ye wan bi xweza re dida hizirandin. Dîtin û gotina xwe dike bingeha hizran ku ji nûkevê werine dîtin. Lê bêguman xweza jî di vê heyamê de xwe dike bingeha dîtin û gotinê. Bi xwezayê re têgehîştina xwe dide ber çavan û pêş dikeve. Rastiyeka mirov jî ew e ku bi xwezayê re xwe bi wate dike. Ji ber vê yekê jî têgehîştina xwezayê ji bo mirov û pêşketinên wî girîng e. Xweza qatek ji jiyanamirov e. Gava ku li xelkê dihate meyizandin, ev yek hê baş û maztir dihate dîtin bi wan re di jiyana wan de. Di jiyana rojane de keçik û kurikên ji yên ku li malê bûna yan jî gehîştibûna nig hevdû dîmen û dilê hevdû digirtin bi dîtina hev re. Bi hev re diçûn li bermalan digeriyan û her weha nêzîkatî li hevdû dikirin û bi dil û can li hev dikirin. Ciwan li çavên hevdû dimeyizandin û hestên xwe yên li hevdû ji hevdû re didane têgehîştin û digotin. Mixabin ku mirov li cihekî jin dibin ne mimkûn e ku di jiyane rojêne de li rastî hevdû neyen û hevdû ne bînin. Bi hev dîtinê re dilçûyin ser hev û dilketina hevdû jî çê dibe.

Di rewşeke weha de çavên Dîlber û Dilşad jî li hev dialiqin û hevdû dibînen. Dîlber keca agayê herêmê ye û bi xweşiketiya xwe bi nav û deng e. Ew keça serekê eşîra Zengê ye. Eşîra Zengê jî milek ji milê eşîra Babikan bû. Zengê milekî wê li herême Botanê ber aliyê Cûlemergê ye. Sorekê eşîrê wê demê digotinê de Haso Aga. Heso Axa yekî bi nav û deng bû. Lê wê kêlikê gelekî pîr bûbû û di nav ciyan de bû. Heso Axa mêrê du jinan bû. Jina wî ya pêşi sê kur û du keçik dabûn wî. Jina din jî xwediyê keç û kurekî bû. Dîlber keçeke xanim a Heso Axa ya duyemîn bû. Dîlber bi xwêşikatiyê re bi nav û deng bû. Mirov ku ew dîti ba gelekî ji xweşiketiya wê bi tesir dibûn û distailin. Gelek mirov ku xweşiketiya wê ditibûn û li ser dipêyivîn ji bo xweşikatiya wê digotin ku ’rohniya nazilê erdê bûye’. Xweşikatiyeke pir mazin li ser Dîlberê hebû. Pora wê gelekî dirêj bû. Ew bi xwe re ji peyakî ne kin bû. Milikên xeftana xwe ji aliyê dirêj ve li paş xwê ve girê dîda û pora xwe jî di ser de berdida û desmala tenik ya ciwanî di ser porê de diberda. Rûdana wê hinekî fireh bû. Gava ku mirov li rûyê

wê dimeyizand ciwaniya ku mirov didît mirov ji çavê xwe bawer ne dikir. Her weha yeka şareza dihate xûyakirin. Gava ku li rûdana wê dihate meyizandin rûdana wê jî bi çavan, hani û rûye wê yê esmer bal dikişande ser xwe. Gava ku li dûrên xwe dimeyizand gelekî bi kêf û hezkirin dimeyizand. Her weha gelekî xweşik bû û çavên gelek mirov ji li ser wê bû. Lê çavên wê tenê li yekî bû. Ew yek ji kurê mamê wê Dilşad bû. Çavên wê jî kurmamê wê Dilşad pê ve çi kesek ne didîtin.

Bi çendî Dîlberê Dilşad jî ji aliyê lihevhatina xwe ve deng dabû. Mirovê ku ew didît gelek bahsa wî jî dikirin. Dilşad yekî aliyê mêraniya xwe ve gelekî dihate gotin û behsa wî dihate kirin. Dilşad ji aliyê rûdana xwe ve yekî gelekî ciwan û sipehî dihate xûyakirin. Çavên wî bi rû û simbêlên wî gelek bal dikişand ser xwe de. Yekî hinekî dirêj jî bû. Hê ji nûke ve simbêla wî derdiketin. Lê wî ji simbêlên xwe berda bûn. Simbêlê wî bêhtir ne stûr û ne jî zirav bû. Lê bi wan simbêlan re û bi wan çavên xwe yên ku bala mirov dikişand  ser xwe, her dem diçû ser wî ku ew didîtin. Hespekî wî yê sipî û manek hebû. Hespê wî gelekî rehwal bû. Ku li ser hepê xwe sûwar dibû û wî hespê xwe dida bazdane tu kesekî ni dikari bûn xwe wî li ser hesp bigihêndanê. Gelek caran bi ciwanen ku wêke wî bi ciwanan re li ser haspan bi bazdanê re didana ber hevdu. Lê yekî ji wan ciwanan jî ni dikari bû jî wî bibuhurandiban. Her weha bi sûwarbûna xwe jî yekî bi hûner bû. Ji wan aliyan ve mirov pir caran ew weke nimûne didane nîşandan di nav hev de. Malbata Dilşad jî ji aliyê malbatiyê ve digiha malbata Dîlberê. Bavkalên wan dibûn bireyên hevdû. Lê di nav wan de galegal çêdibe êdî ji ber wê yekê ji jev dûr dikevin. Lê mirov dikare bêje ku Heso Axa ji wan re pir baş bû. Aliyê malbata Dilşad jî ne xirab bû  ji wan re. Her weha dest bi ser hev çûyinê kiri bûn. Malbata Dilşad ji aliyê ku mala Heso Axa ku lê bêhtir jev ne dûr bû. Wêke qederekê bi lingên mirov dikari bû xwe bigihane nig wan bi meşê re. Mirov ku li herêmên diman bêguman divêt mirov bêje ku bi ser hev de diçûn, ji ber ku ehlên hevdu bûn û gelek ji bi wate ne dîtin ku bi ser hev re neçin. Ji ber vê yekê û ehlbûn û hev naskirinê jî qasta hevdû dikirin. Malbatan her weha ji ber hinek peyvan  ji

hev qut bû bûn. Lê di rewşên mazin wêke di êrişên li wan de, li nig hevdû bûn. Her weha her dem pişta hevdu digirtin. Lê wêkî din jî kem bi ser hev de diçûn. Gelek mirov ji ber ku wan bihênen nig hevdû dest bi têkilîyên di nav wan de çûn û hatinê dikirin. Her weha mirov bi rêz ji xwe bi vî awayî di nav têkilîyên wan de xwe diwerdan daku wan bihênin nig hevdû. Mirov didîtin ku her weha ji hev dûr bûn û ev ji wan re dibû wêke dilêşiyekê. Dilşad bi xwe re gelek caran diçû cihê ku malapê wî li wir in û bi hevalên xwe re ji xwe re li wan deran digeriya. Hinek caran jî bi apê xwe re jî rû bi rû hati bû. Rêza wî li hevberê apê wî gelekî mazin bû. Dilşad di pîrozbahiyan de gelek caran diçû wê dere ji bo şahiyae ku têne kirin bibîne. Her weha ku pîrozbahiyên newrozê çêdibûn ew jî gelek caren diçû wî aliyê daku bikeve di nav pîrozbahiyan de. Di pîrozbahiyên newrozê de bi gelek awayan re pîrozbahî çêdibûn. Her weha weke lîstikên ciwanan, lihevkombûnên mazin ên jinên ku ji xwe re xif dihênin nû çêkirine û li xwe kirine û xwarinên ku teybetî di wê rojê de hatine çêkirin jî hatine xwarinê bi kar dihat di vê roja teybet de. Ciwanên ku dibû êvar, êdî agir pê dixistin û bi êgir re diketine rêveçûnê de, ta ku digahane nav cihê ku ji bo lihevbûnê ku ji xwe re kifş kirine. Ku gihane wê dere pê de êdî ciwan keç û xort li hev digihane hevdu û govend digirtin bi hev re. Di wê roje de cilên hemûkan ji xifdihênin rengîn bûn. Bi gelek awayên din cilên ku li xwe hatine kirin jî hebûn. Lê divêt mirov bêje ku cilên hemûkan jî rengîn û gelêrî bû.

Dilşad jî di rojeke weha de ji aliyê wan gava di pîrozbahiyan li nig wan hinekî dimîne êdî pişt re bi se hevalên xwe re li ser hespên xwe sûwar dibin û rast û rast diajon aliyê din ê mala xwe ji bo ku li şahiyên meyizênin û yan jî bikevin di nav pîrozbahiyan de. Ji agirê ku hati bû pêxistin ji hawirdorên hemûkan ji bûbû rohni. Dengên ken û şahiyên mirov dikete nav hev de û dihate gûhan. Mirov her weha ji her derdên xwe ve xwe dûr dixist di wê roje de. Ew roj rojeke jiyanê bû. Rojeke ku her kes bi hev re bi aştî bihên dor hev. Mirov ew bi kêf û şahî jin dikir. Bêguman her weha newroz ne têne rojeke şahiyê bû, divêt mirov bêje ku rojeke ku ew sala ku buhurî û sala ku wê were, bibuhure jî di nav xwe de kifş

dikir. Weke serê salê xwe bi destpêkirineke nû bi wate dikir. Mirov di wê rojê de li sala hatî buhurandin, ku te de hatî jînkirin, li başî û nebaşiyên di jiyana xwe de dimeyizandin û şirove dikirin. Mirov di wê rojê de li pêşi û paşiya xwe baş û qenc dimeyizandin da ku ka me sala buhurtî çawa çû û ya were wê çawa here. Li gor salnameya ku mirov dijimart, divî bû di meha adarê de gava ku ji heftiya sêyemîn ta derketin di haftiya çaremîn de di roja yekêmin de pîrozbahî dest pê dikir. Li gor rojê, ev roj dibû 21’ê Adarê. Di 21’ê Adarê de pîrozbahî dest pê dikirin. Lê salnameya ku ji dema medan hebûn, xwe her berdewam kiri bû di nav xelkê de. Li gor yên medî jî her weha gava ku dihate gotin 1 li gor ya zayînî (mîladî) jî dibû 14. Her weha dîrokek ji medan ve ta wê rojê hebûna xwe berdewam kiri bû. Bi vî awayî. Dilşad û hevalên wî bi hev re têne nav pîrozbahiyên ku têne kirin. Dilşad gava ku tê gelek mirov wî nas dikin û bi hev re dirûnên û ew dawêti rûniştinê kirin. Dilşad yekî ciwan bû û kelegerm bû. Her weha Dilşad yekî bi rûdan û nêzîkatiyên xwe yên zane, bala mirovên hawîrdora xwe dikişande ser xwe de. Mirov gelekî bala xwe didayê de. Lê dimeyizandin. Gava ku lê dihate meyizandin dilê mirov kef xweş dibû pê re. Dilşad bi çendî bi merxasî û rûdena xwe re bi deng bû, her weha bi hûnera xwe ya lîstikê jî bi hûner bû. Ku li hespê xwe suwar dibû, bêguman weke ku bi hespê xwe re bibe yek bi lêz û bez ji ber çavan winda dibû. Hespê wî gava ku hê cahnû bû, bavê wî dabûyê de daku ji xwe re mazin bike. Bavê wî gotîbûyê de ’ew cahnû yê te ye’. Ew jî li cahnûyê xwe xwedî derketibû û bi xwe re mazin kiri bû. Hesp li Kurdistanê bi du taybetmendiyan bi nav bûn. Teybetmendiya pêşi her weha bi serxweyiyê re dihate ser zimên. Teybetmendiya dî jî weke rûmetê dihate dîtin. Mêrekî gava ku dihate meyizandin, li hespê wî jî pê re dihate meyizandin. Ev jî divêt bû ku kevneşopiyekê bihêne. Gava ku cahnû hê biçûk e ta dayin û bi hev re mazinbûyin çêdibû ji ji gelek aliyên ve ji feda wê hebû ji wî mirove ku ew bi xwe mazin kiri re. Hasp wî çaxî gava ku ahl dibû têne xwediyê xwe bi ahlbûne xwe re baş nas dikir. Ev yek jî gelekî girîng dihate dîtin. Dilşad her weha xwediyê hespêki pir baş bû ku ji aliyê wî ve hati bû mazinkirin û ji aliyê wî ve dihate

suwarbûn. Di vir de hêja ye ku divêt mirov bêje ku her weha baş û qenc hesp mazinkirin jî weke taybetmendiyeke baş ji bo ciwanan dihate şirovekirin. Dihate gotin ku ’wî mirovî hespê xwe baş kedî kiriye. Têt wê wateyê ku mirovekî qenc e û mirov dikare jê hêviyê bike’. Hêvîkirin li ser beweriyekê bi kesayetiyê re xwe dide nîşandan. Bêguman careke din divêt mirov bêje ku ciwanên weha ji bo ku baweriyê bikişênin ser xwe, gelekî mazin tevdigariyan. Her weha bawerî bi xwe re rêz û mazinbûn dihanî ji ciwanan re. Mirovên ciwan jî wê bi vê yekê re bibûna xwedî nav di nav civakê de. Bi vê yekê re hêjayê gotinê ye divêt mirov bêje ku ciwanên pir tahb dide xwe daku her weha baş, qenc û bi taybetmendî wêrin naskirin. Mirov bi taybetî bi gotinê re ji bo ciwanan dihanî ser zimên. Dilşad bi vî awayî ji aliyê hevalên xwe ve û ji aliyê mazin en xwe ve pir baş û mazin dihate naskirin û pêşwazîkirin. mirov mazin her weha ew nirxdayina ji bo ciwanan û bi hanîna ser zimên ji wan re û ji bo ciwanan bi xwe re dayina rûniştandina taybetmendî yên kesayetiyê, wate digirt. Mirovê ciwan bi bêhtirî bi taybetmendiyên xwe re li ber çavan dihatine girtin. Mirov li wan û taybetmendiyên wan dimeyizandin û derbarê wan de biryara xwe diden. Di vir de divêt mirov bêje ku yên ciwan, bi xwe re divîbû derbihêne herêkirin di nav mirovên mazin de. Dilşad ji wan aliyan ve xwe dabû herêkirin. Mirov ku ew nas dikirin û ditibûn baweriya xwe pê hanî bûn. Ji ber vê yekê jî bû ku çawa hati bû nav şahiya mirovê mazin ew dawati rûniştinê kirin di nav xwe de. Ew bi xwe mirovê ji mala Axa bû, lê bêguman mirov bi bêhtiryi li wan taybetmendiyên ku pê re ne lê meyizandibûn. Dilşad gava ku têt nav şahiyê û mazin ew dîtin, wî dewatî rûniştinan kiri bûn hingê. Dîlberê jî li pêşiya wî bi keçen hevalên xwe re li nêzikê wî rawestiya bû. Ew jî ji cihê xwe bi gavên hêdî berê xwe ber bi wan ve zivirand û ber bi wan ve çû da ku here li nig wan rûne. Gava ku berê xwe dizîvirîne ku here rûne, di wê heyamê de çavên wî bi hêbûna Dîlberê dikeve. Dîlberê di nav hinek keçên hevalên xwe di nav şahiyê de rawesta bû. Gava çavên Dilşad bi Dîlberê ketin êdî di wê heyamê de Dîlberê jî rûyê xwe rakir ku li pêşiya xwe meyizêne ew jî di wê heyamê de bi Dilşad re rû bi rû hat. Dîlberê

weke çar pênc gavan ji Dilşad dûr bû. Lê gava ku rû bi rû hati bûn, baş li hevdû meyizendi bûn. Dîtina wan pir mazin çûbû ser hevdû.

Dilşad di wê heyamê de ji ber Dîlberê dile wî pir diguvişe. Gava ku çavên wî bi wê dikevin re êdî ew xwe ji bîr dike ku wê çûbûna nig mazin ên wê rûniştibana. Hizir û ramana wî diçe ser Dîlberê di wê demê de. Dîlberê pir xweşik bû. Dilşad ji pir spehî bû. Herduyan jî hevdu dîtibûn û di wê heyamê de çavên wan gava ku çûbû ser hevdû, çavên xwe ji hevdû qut ne kiri bûn, tenê hema wilo li hevdû meyzandibûn.Têne hema wilo di cihê xwe de rawesta bû û li Dîlberê dimeyizand. Dîlberê di nav hevalên xwe de bû. Dilşad jî li nig hevalên xwe bû. Di wê heyamê de rabû bû ser xwe ku here nig wan mirovên mazin û bi rêz rûne. Gava ku her weha rawesta bûn, hevalek wî têgehîşt ku tiştek bi Dilşad bû. Her weha ew jî li xwe zivirî û dit ku Dîlberê li heberê wî ye û li hevdû dimeyizandin. Gava ku hevalê wî ji meyizend dît ku Dîlberê çend xweşik e û li hevberê wî rawestaye û li wî dimeyizêne. Dilşad ji xortekî pir wêrek bû. Lê wê kêlikê ku mirov lê dimeyizand, dihate têgehîştin ku li ber xweşikbûna Dîlberê xwe win kiri bû. Dîlberê gelekî hêja bû. Keça axayê herêmê bû ji her aliya ve bi nav û deng bû. Roja xweşikan newroz bû. Ji evîna dilan re hevdîtin hebû bi Dilşas û Dîlberê re. Roja xweşikbûnê bû newroz. Hizrek di serî de bû lê di dil de xwedî awaz bû. Ji bo Dîlberê evîn bû. Ji bo Dilşad evîn bû. Ji dîtinê dilgerm bû. Ji meyizandina çavan kal bû. Lê hebû di neqabine de evînek ji dil dîtina wê bû. Hizra zanist a mazin bû li nivîs, digot ew evîn e xwediyê rûmet e dilîn e. Lê çi kesek ne dikare bêje ev nîn e ji ber ku hê ji nû ve diket jîn e.

Dilşad û Dîlberê gava ku çavên wan bi hevdu ket, êdî pê de hema wilo li hevdu meyizendibûn. Li aliyê Dîlberê jî keçeke hevalên wê kifş kiri bûn ku li Dilşad dimeyizêne. Wan ji gava ku kifş kirin êdî wan jî serê xwe zivirandin û lê meyizandin. Gava wan keçên bi Dîlberê re dest bi meyizandinê kir. Dilşad jî êdî weke ku fihêt bike serê xwe kire ber xwe ve û bi çavan re li ber xwe li erdê meyizand. Gava ku her weha çêbû êdî Dîlberê jî bi hevalên xwe re kar kirin ku herin. Lê Dilşad weke ku careke din di wê heyamê de wêra bide xwe, serê xwe rakir û bi ber wan ve çû. Hevalên wî di

cihên xwe de mabûn. Wê kêlikê ji wan çi gav û lêbat ne hatin. Gava ku Dilşad ber bi Dîlberê ve çû, hevalên wê jî hinekî xwe bi paş ve dan weke ku wê bi têne bihêlin di wê heyamê de. Dilşad bi dilpêriyekê re giha nig Dîlberê û li hevberê wê rawestiya. Di heyamê de Dîlberê jî bi fihêt bû. Serê xwe car bi car dikire ber xwe de û car bi car jî dirakir li ber wî li rûyê wî dimeyizand. Lê ew jî gelekî bi dilpêr li hevberê wî rawestayî bû weke peykerekî ku ji dilan re hatî çêkirin bû. Gava ku gihana dahma hevdû her weha weke kêlîkekê li hevberê hevdû bedeng mabûn. Pişt re Dilşad dest bi gotinê kiri bû û gotîbû ’slav’. Dîlberê jî bersiva wî da tene kurt: ’silaw ji te re jî..’ Dîlberê berê carekê ew dîtibû. Lê wî hê gava ew biçûk bûn ew dîtibû. Lê gava ku wê ew dîtibû nas kiri bû. Dîlberê ji hevalên keçên ku pê re ne, wê gavê ku çavên wan çûbû ser hevdû re jê re gotîbûn ku ka ew kî ye. Hinekan ji hevalên wê ew nas dikirin. Dîtibûn ku Dîlberê li wî dimeyizêne wan jî jê re gotîbûn ‘ew kuremê te Dilşad e’. Dilşad li ber wê kar kir ku bipeyive lê ew cara pêşi bû ku bêjeyên wî di nav lêven wî de bi germ û zor derdiketvin. Dilpêriyekê mazin di dilê wî de hebû. Lê di dilê Dîlberê de jî dilpêriyeke mazin hebû. Dilên herduyan her weha bi dilpêriyekê re germ bû. Di serê herduyan de jî dibit ku ji bo hevdû gotina wan hêbûn, lê ne digotin. Gotinên wan yên ji nav lêvên wan derdiketin ji hinekî bi zorê derdiketin. Ku ji hev re tiştêk gotiban, di wê heyamê de çi bigotina gelo? Tênê hama wilo ji çavên li hevdu di meyizadin. Dibit ku tiştên ku ji hev re digotin bi meyizandinekê re bi çavan re digotin di wê kêlîkê de. Dîlberê li hevberê Dilşad rawesta bû. Lê gotin ji devê yekî ji wan ne derdiket. Dîlberê ji ber çavan re weke li hevalên xwe meyizêne gava bi tihêlê xwe re avêt lê dewama wê gavê ne hanî. Hevalên wê di rex wê de lê piçekî jê dûr ve rawesta bûn. Pişt re wê jî di wê heyamê de kar kir ku here nig hevalên xwe ve. Weke ku tiştêkî wê ji bo neçûnê li wir zant kiri bû di cihê xwe de mabû ne diçû. Li xwe giha rihek da xwe ku here, lê dîsan lê zor hat. Her weha wilo li Dilşad jî dihat. Ew jî di rewşeke ku weke wê de bû. Lê Dîlberê lê divîbû here nig hevalên xwe. Li ser lingan kar kir ku berê xwe bizivirîne, bi çûnê re lê çavên wê ji Dilşad qut ne dibûn. Di wê heyamê de Dîlberê destê xwe da destê Dilşad û

desmalka xwe ya destan ya ku sipî ye da destê wî û ji wir bere xwe da nig hevalên xwe ve û bi qavzên biçûk ji wir, li nig Dilşad vaqeteha çû. Dilşad gava ku ew çû li paş wê ve weke heyamekê ma û lê meyizand. Ku Dîlberê çû ji nig Dilşad vaqeteha êdî hevalên wî jî li hevdû meyizandin û çûne ber bi wî ve. Gava ku çûn û gihan nig wî, hinekî bi ken li ruyê Dilşad meyizandin.Dilşad weke ku fihêtke li hevberê hevalên xwe di wê heyamê de serê xwe kire ber xwe de û li erdê meyizend û pişt re careke din serê xwe rakir û li wan bi rûyekî sor meyizand. Rûye wî ji fihêta wî sor bûbû. Ew sê hevalên bûn. Hevaltiya wan ji dil û ji zarokatiyê bû. Weke bira li hevdu dimeyizandin. Bi hev re diçûn nêçîrê û ciya. Lê ku li hevdû jî dimeyizandin. Hevalên wan yê biçûk li Dilşad meyizand û bi kenekî dilxweş jî Dilşad re got ‘we dil xwe da hevdû’. Dilşad ti bersiv neda vê gotina hevalê xwe yê biçûk. Lê dilê Dilşad di wê heyamê de hawirdora xwe û dunya weke ku ji bîr kiri be, xwe di ruyê wî de dide nîşandan. Ruyê Dilşad weke ku xûhdan girtibe dihate xûyakirin. Lê saqe jî ne li gor wê bû ku mirov bike ku xûhdan bigre. Saqeyekê hênik hebû. Mirov hemûkan jî ji ber pîrozbahiyên newrozê ji derve bûn. Her kesek li wê rojê bi cilên xweşik bû. Çi kesek jî kêm ne dihate xûyakirin. Ew roj bû , roja ku mirov xwe xweşik kiri ba. Mirov jî her weha xwe xweşik kiri bû û derketibûn derve û bi hev re şahiyê dikirin. Mirov gelekî bi cilên xweşik bûn. Hemawiyên li ser jinan ku hawîrdorên wê noqakiri û nexşekirî dihatine xûyakirin. Di hûndure salêkê de mirov ji ber kar û barên wan demên xwe yên vala ji bo amadekirinê re bi kar dihanîn û dibuhurandin. Wê rojê jî her weha roja ku ji hevre tiştên hatina çêkirin wêrin nîşandan bû. Ciwanan jî her weha bi cilên ku gelekî xweşik hatine amadekirin hati bûn qada pîrozbahiya newrozê. Her weha mirov hêbûna xwe didane nîşandan li ber çavên hev, bi xweşiketiyên xwe re û kirinên xwe re. Xweşikbûn, dilxweşbûn, dilşahî û her weha rihcanî gelekî mazin xwe dida nîşandan li ber çavan bi şahiya newrozê re û bi mirov re.

Dilşad gava ku Dîlberê çûbû Êdî di cihê xwe de mabû. Hevalên wî jî gava ku hati bûne nig wan weke heyamek li nig rawesta bûn bi bêdengî. Dilşad di dilê xwe de jîn dibû wê kêlîkê.

Haya wî ji dunyayê ne mabû. Dewetiya mazin ku jê re şandibû, ji wê kêlîkê li hişê wî ne mabû. Hevalên wî weke ku wî ji xewê rakin deng danê. Hevalê wan yê mazin gote wan 'divêt em herin rûnên li nig mazinan. Dewetî ji me re şandibûn' Piştî vê gotina hevalê wan a mazin, êdî ew jî bi hev re dane xwe û çûn nav cihê mazinan ku lê rûniştibûn. Gava ku çûn mirov hûrmet û rêz dana wan û ew keremê rûniştinê kirin. Di wê heyamê de ji dûrî ve çavên Dîlberê jî li ser wî bû ku li nav mazinan çawa bû û mazinan çawa rêz didanê de. Dîlberê tenê ji dûrî ve rawestiya bû û hema wilo li Dilşad dimeyizand. Çavên wê li ser Dilşad bûn.Wê kêlîkê jî,  ji dûrî jî ketibû dilê wê ne dixwast ku wî ji ber çavên xwe dûr bixe û here. Lê divîbû bi hevalên xwe re gavê xwe bi avêje. Ni dikari bû bê wan gavê xwe biavêje ji ber ku ji wan vaqeteha wê bi tenê maba. Wê ji ne dixwast bi xwe re bimêne bi têne. Di nav şahiya newrozê de bi tenêmayin ne baş dihate dîtin. Di şahiya newrozê de çi kesek ji çi kesekî ne biçûk û ne ji maztir bû. Dilşad di wê heyamê de ne di kifşê de bû ku Dîlberê ji dûr ve li wî dimeyizand. Lê Dîlberê bi dilxweşiyekê lê dimeyizand û di dil de jî ji xwe re bi xwe re dikenî. Bi ken re di dilê wê de xweşî û di rûdana wê de jî geşî xwe dabû ber çavan. Rûdana wê bi hinarikên xwe re sor bûbûn. Lamên xweşik di hinarikên wê de çêbûbûn. Demên ken di ruyê wê de xwe didane derve de. Ji dûrî ve gava ku li Dilşad dimeyizand didît ku çend rûgeşî pê re hebû. Çavan ew hinekî mazin bû lê ne bêhtir mazin bû. Simbêlên wî hê ji nûke ve derdiketin ne bêhtir mazin bûn. Lê ji dûrî ve, wan herdu taybetmendiyên wî xwe didane kifşkirin li ber çavên mirov. Cilên ku li xwe kiri bûn pir lê dihatin. Her weha pir lihevhatî bû. Bi meyizandina li xwe dilê mirov xweş dikir. Kêfek dikire dilên mirov. Her weha ji rûdana wî ji başbûna dilê wî xwe dida der. Gava ku li hevberê Dîlberê rawesta bû Dîlberê bi hinarikên xwe re pir sor û fihêt bûbû li ber wî di wê heyamê de. Her weha Dilşad jî bi fihêt bû. Gava ku Dîlberê ji dûrî ve li Dilşad dimeyizand weke ku disa her weha wilo lê were lê dihat. Wê kêlîkê ku Dîlberê lê meyizend û ta Dilşad jê ne bû jî disa weke ku li hevberê wê be û lê meyizêne hinarikên wê sor bûbûn. Lasê wê gelekî germ bûbû. Ji rûdana wê her weha ev yek pir baş

dihate têgehîştin. Dîlberê miroveke her weha bû ku dilê wê pir mazin bû. Dilê wê ji nuha li ber kuramê wê bû. Di nav şahiyê de ew bi şahiyekê re bû ku di dilê xwe de ew bi têne wê şahiya jiyanê dibû. Di dilê xwe de gelekî kêfxweşiyeka mazin xwe dida der. Lê fihêtbûn ji wê kêlîkê pê re hebû û bê ku hinekan li hevberê wê hebin ku ji wan fihêtke. Gava ku di dilê xwe de car bi car geş dibû, weke ku di hinek kêlîkan de xwe ji bîr bike bi ken diket. Pişt re ku demek çû, êdî hinekî rawesta û weke ku hinek mirov ji dûrên wê li çavan wê meyizênin lê dihat. Wê jî bêsedem li dûrên xwe dimeyizand. Lê sedemekî wê hebû ku ew her weha li hevberê hawîrdora wê bi bal dikir. Lê sedema wê têne bi wê re bû. Wê xwe di nav şahiyê de wê kêlîkê weke ku xwe bi tenê bibine lê dihat. Ku çavên xwe miç kiri ba û çi kesek li vir li hawîrdora min nîn e ez bi têne me di şahiyê de û şahî her weha hizirîba ma galo wê ji wê re wilo bibûya? Ev çend bi xwe re bû ku di nav şahiyê de ta wê jî çi kesekî ne mabû di wê heyamê de. Dilê wê bi kef bû lê ni dikari bû wê bi yekcarî bihêne ser zimên ji ber ku fihêt dikir. Dilê wê bi şahî bû û bi wê şahiya xwe re bi têne bi xwe re bû di nav evçend mirovan de. Kêfxweşbûna di dilê wê de ew ji dunyayê dûr û dûr biribû. Di hundurê xwe de diçû û diçû weke ku di riyekê de be û ew rê bêdawi be, bi awayekî bi dil têde diçû û diçû. Lê ji dil bû. Jînbûnên wê yên wê kêlîkê hemûkan jî ji dil bûn. Di dilê xwe de ew di rastiyê de bû.Wê xwe her weha wilo didît. Dilê wê safi bû weke rûdanên wê yên ku ber bi sipî ve diçû. Hestên wê ew di dest kiri bû. Di nav şahiya pîrozbahiyê de hem xwe bi têne didît û hem jî ne bi têne bû. Bi hest bû wê kêlîkê hem jî gelekî bi hest bû. Dilê wê bi wê hestbûna wê re şa bû. Şabûna wê jî mazin bû. Bi wê şabûna dilê wê re ku li mirov dimeyizand, wê ji şabûna dilê wê, zanîn û wan mirov jî bi wê re wê şabûna wê şa dibûn. Mirov li hawîrdorên wê hemûkan jî bi şabûn. Dengên kenên wan bilind bû. Wê kêlîkê her kesek bi şabûna xwe re li ya dorên xwe û li yên nig xwe dimeyizandin. Şabûn şabûna newrozê bû. Ew roj roja newrozê bû. Her kesek şa bû bi dilê xwe re. Her kesek şabû di dilê xwe de. Evîndarên wê roje li hevdu dimeyizandin bi evînê re. Ronahî û evîna di dilan de xwe dida derve de bi wan re. Di dilê her kesekî de

şahiyek hebû. Lê di dilê Dîlberê de şahiyekê gelekî mazin hebû. Dilê wê xwediyê şahiya mazin bû. Newroza wê rojê newroza wê bû. Mirov ku dil digirtin dihate meyizandin, dihate dîtin ku mirov bi şahî di destê hevdu de govendê dikir. Mirov di dîlanê de jî bûn gelek ji wan yên ku hîsê hevdû kiri bûn. Hemûkan jî yên ku dilên wan ji bo hevdu diavêt bûn. Di dîlanê de di destên hevdû de li govendê bûn. Hemûkan jî yên ku govend dikirin bi şabûn û bi şabûna dilên xwe re li hawîrdorên xwe dimeyizandin. Yên ku li evîna xwe dimeyizandin û yên ku li hevalên xwe, yên ku gelekî ji yê gelekî hez dikir dimeyizandin. Hemûkan jî wê kêlîkê li nig hevdu bûn û deste wan di deste hevdu de bû bi şahî û kêfê re di newrozê de bûn.

Şahîyên newrozê bi gelek awayan re hêbûnên xwe berdewam dikirin. Mirov di wê rojê de diçûn nig hevdu û bi hev re dipêyivîn û didan û distandin. Piştî şeva newrozê ya pêşi re êdî mirov gelek diçûn herêmên din jî ji bo mêhvandariyê li nig yên ku nas dikirin. Her weha şahiya newrozê weke hefteyekê hêbûna xwe berdewam dikir. Bi mêhvandariyê jî ji aliyê mala bavê Dîlberê jî gelek mirov diçûn aliyê mala bavê Dilşad li nig yên ku nas dikirin. Di wê roje de jî gelek ji hev xeyda bûn an jî her weha nêzîkatiya weke berberiyê di nav wan de hêbûn, gelek mirov ji wê rojê gerek nêzîkatiyên xwe ne buhurtibin piştî newrozê re. Yên ku bi hev re ne didan û ne distandin ji piranî di wê rojê de dest bi peyivtina di nav xwe de dikirin. Ji pirsgirêkê re her weha lihevhatin di wê roje de weke taybetmendiyekê xwe dida ber çavan di nav mirovan de. Di şeva pêşî ya newrozê de hinek nêzîkatiyên girîng hebûn. Di şeva pêşî de di newrozê de ji newroza berê ta wê newroza di hundurê salê de, ciwanên ku zewîbûn piranî li pêşiya pîrozbahiyan cih digirtin. Ev yek jî weke kevneşopiyekê xwe dida ber çavan ji bo wan. Di wê newrozê de jî yên ku wê ji nû ve bizewîcin an ji karê zawêce dikirin, ji tevlî wan dibûn. Wateya vê yekê jî ji bo wan ji nûke ve gavavatina ji jiyanê bi zewac bû. Piştî zewacê ji newrozê pêşi jî ji wan re girîng dihat. Her weha dihate şirovekirin ku ew newroza pêşi ye ya bi zawacê ye, ji bo wan e. Yên ku di salê de ji zewicî bûn xwe didane pêş ji ber ku dixwestin xwe weke maliava bidin

naskirin û ber çavan. Her weha ev yek jî ji bo wan girîng bû ku ji ber ku bi xwe nîşandanê re xwestina rêzê ji mala xwe re dihate ser zimên. Mirov jî êdî wê rêzê dabana wan weke ku xwedî mal in. Newroz her weha di nav civakê de hêbûna xwe ye komelgeyî xweş dida ber çavan. Komelatiya newrozê bi pêşketin û hêbûna xwe re xwediyê hinek taybetmendiyan e. Ji aliyê civakî ve bingehekî mazin e ji pêşketine civakê re. Newroz mirov ni kare têne weke hinek mirov ku wêrin nig hevdu û şahiyêkê çebikin, şirove bikin. Bi bêhtirî jî divêt mirov bi civakê re şirove bike. Bêguman li Kurdistanê gava ku mirov civakê ji aliyê civaknasiyê û sincê ve şirove bike divêt mirov newrozê jî weke nêzîkatiyeke komelayetî û sinc di bingeh de şirove bike. Ji aliyê din ve jî newroz di kevneşopiyên ku di nav civakê de çêbûne bingeh e. Nêzîkatiya mirov bi newrozê re mazin dihênin ser ziman. Ji aliyekî din ve newroz bi hêbûna xwe ye komelgehî, sincî û bi kevneşopiyan ku di nav civakê de bi hizir e ku xwe avakirina pêrgaleke civakî ye, dide avakirin. Komeletiya newrozê her weha xwe bi wate dike di nav civakê de. Hizrên Kurdistanê yên olî ji xwe ji vê civaknasiyê ne buhurandine. Piranî xwe di nav wê pêrgala de bi wate kirine. Li ser wê bingehê li Kurdistanê xwe çêkirine. Her weha nêzîkatiyên Kurdistanî bi newrozê re divêt baş û qenc were têgehîştin da ku pêşketina wê were têgehîştin. Newroz di pêşketina xwe de ku mirov xwe bide têgehîştine wê mirov bibîne ku riheki bi hazar salan re di xwe de hatiya ser zimên. Her weha di civakê de xwediyê taybetmendiyên dema ku tê de tê jiyinê bi demên berê re yên ku divêt mirov têbigihê û bihêne ser zimên. Bêjeya newrozê ku têt ser zimên wateya serhildaniyekê bi xwe re têne ber çavan. Her weha divêt mirov wê mazin şirove bike û bihêne ser zimên. Lê divêt li gor dîroka wê mirov bihêne ser zimên ku ta ku wateya wê ya mazin were girtin.

Gava ku bi Dîlberê û Dilşad re bi şahiya newrozê dihate jiyîn û Lê dihate meyizandin, dihate dîtin ku hebûneke mazin ji aliyê zanebûnê ve xwe dide ber çavan. Jinên ku ji aliyê cilan ve xwe xweşik girê dabûn û peyayên ku cilên nû li xwe kiri bûn xweşikatiyeke mazin bi şahiya newrozê re dihanîn ber çavan bi

xwe re. Her kesek bi serê xwe re bû. Ji aliyekî din ve jî her kesek bi hev re bi şahî bû. Bi şahîbûna newrozê bi serxwebûnek re xwe dide mirovî. Ji aliyê tevgerên xwe ve mirov di newrozê de xwe ne dişidandin. Keç û xort, jin û mêr, bav û keç, dê û kur wê roje li ku derê jî bin, destên xwe digihandin hevdu û şahiya xwe bi hev re dikirin. Di wê rojê de ne çi bav û dê û ne jî çi keç û kur ne dixwastin ku bi têne bimênin. Di wê roje de bi tênemayin di dilan de xemgîniyekê çêdikir bi mirov re. Ji ber ve yekê jî kesekî ne dixwast ku bi têne bimêne. Lê yên ku ji naçariyê bi têne maban jî, ji aliyê mirovên dûrên wan ve û yên mermalên wan ve bi têne ne dihatine hiştin. Bêguman divêt mirov bêje ku mirov di rewşên her weha de dixwastin bi ser mirov de herîn. Her weha çûyin hem weke kevneşopiyekê bû û hem jî weke berpirsiyariyekê jî dihate dîtin. Di nav civakê de mirovên dijiyan hemû didikari bûn tevlî vê berpirsiyariyê bibin. Di vê berpirsiyariyê de çi ji destê kê hatiba dikirin. Ev kirin ji mirov re weke berpirsiyeriyeke bi rêzê dihate dîtin. Gava ku ji destê mirov tiştêk hatiba û ne kiri bana êdî weke mirovên bêberpirsiyarî dihatin dîtin. Çi mirov jî ne dixwast ku xwe weke bêberpirsiyarî nîşan bide. Mirovên bêberpirsiyar bêguman bêrêz dihatine dîtin. Her weha li kirinên mirov jî dihate meyizandin û biryar dihate dayin, ku ew mirov bi pirsiyar e yan jî bêpirsiyar e. Civak bi vê yekê re li ser pergalake komelgehî ava bû. Dilşad jî gava ku dihate nav şahiya newrozê de û jê re rêz dihata nîşandan bi vê yekê ve jî girêdayî bû. Her weha bi vê yekê re girêdayî divêt mirov bihêne ser zimên ku kirinên wî di nav civakê de ew kiri bû miroekî bi rêz. Gava ku ne kari ba ne dikete çavên mirov de. Wî çaxî mirov jî her weha jê re rêz ne dide nîşandan di nava civakê de. Di wê nêzîkatiyê de kûr bû ku mirov rastiya xwe bibînen û li ser xwe bimînin. Ango her weha xwe bi vala ne berdane tiştê ku ji destê wan were bikin. Ev yek jî bi çendî ji bo peyayan wilo bû, ji bo jinan jî wilo bû. Jin jî di kar û barê malê de û di hevgirtin û tevlihevdana malê de jêhatî bûn divî bû were nîşandan. Pergala malan ji jinên jêhatî dihate xwastin. Diviya bû ku ew jî vê yekê bi cih bi haniyana. Jin ji rûmetê dihate dîtin. Her weha diviya bû ku rûmeta xwe jî bi parêzin. Mal wênaye mirovan e. mirov ku diçû

cihêki yan jî li malekê dimeyizandin ka ma mirov baş e yan jî ne qenc e dihate şirovekirin di wê heyamê de. Malê baş ji rûmeta jin û mer dihate jimartin. Her weha ev zanebûn ji demên kevn ve hêbûna xwe berdewam kiri bû. Bi vê yekê re li hev xwedî derketin ji aliyê civakê ve weke nêzîkatiyeke komelgehî jî divêt mirov şirove bike. Divêt mirov bêje ku civaknasiya mirov li pêş bû. Mirov li hev dimeyizandin û alîkarî didane hevdû. Weke nimûneyekê divêt mirov ser ziman ku li bênderan di paleyiyê de bi dûran re alîhevdu dikirin weke kevnesopiyekê bû. Her weha kesekî di rewşeke zor de ne dihişt. Gava ku kar hat hewkirin jî her weha şahî jî bi hev re çêdikirin. Li nav bênderan gava ku dihate ketin û diketine ber paleyiyê de hêlbestan ji hev re digotin û li hev vegerandin jî nêzîkatiyeke bi teybat bû. Di ber palayiyê de di gotinê hêlbestan de mêr li jinan vedigerandin, jin jî li mêra  Jin li jinan jî vedigerandin û mêr jî li mêran. Gava ku ev yek çêdibû jî gelekî di dilên mirov de şabûn çêdibû. Gelek caran mirov ji ber ku her weha li gotina helbesten diçûn nav bênderan. Çûna nav bênderan her weha dibû ji bo kar û guhdarkirineke bi dilxweşî ji mirov re. Bi vî awayî jî ji bo gotina gelek hêlbestên civakê û dirêj hêbûn û dihatine gotin di rewşên weha de. Yan jî mirov ku di serê xwe de kari ba li hev bihaniya wan dest bi gotinan dikir. Bi vê yekê re divêt mirov bêje ku dengê Dîlberê jî gelekî xweş bû û mirov hez dengê wê dikir. Dîlberê jî car bi car ji bo ku li gotinên wan hêlbestvanan karker bi hisêne, diçû li nig wan li nav bênderan. Diçû nav paleyan de dima ji bo ku li dengê xweş bihisêne. Hezkirin jî dihate ser ziman, di nav wan helbestên ku digotin de. Gelekî xweş, baş û mazin dihanîn ser zimên. Dîlberê gava ku diçû nig paleyan ji bo ku li wan bihisêne, ew jî tevlî wan dibû di gotinan de car bi car. Dengê mirov her weha xweşikatiya xwe baş û mazin dihanî ser ziman. Dengê Dîlberê gelekî xweş bû. Mirov ku li dengê Dîlberê dihesandin bi dengê wê re pir bi hest dibûn. Ku Dîlberê dest bi gotinê dikir mirov ne dixwast ku helbesta ku wê digot bi dawî were ji ber ku gelekî bi hest û ji dil digot. Mirov hez ji Dîlberê dikir. Xweşikatiya wê di devê wê de jî hebû.

Şahiya Newrozê gava ku bi dawî dibû êdî mirov ji jev bela

dibûn. Lê wê rojê Dîlberê gelekî xwediyê cûdabûnekê bû di dilê xwe de. Dilê wê gelekî bi kêf û şahî bû. Dilê wê zû bi zû diavêt. Dîlberê piştî şahiya Newrozê re hê behtir bûbû miroveke cûda ji aliyê nêzîkatiya xwe ve. Dilê wê zû bi zû diavet û weke ku xwêhdan pê bikeve lê dihat. Wê roja gava ku dilê wê diavêt gelekî bêhtir hişê dilê xwe hîs dikir ku çawa zû bi zû diavêt. Dîlberê Dilşad ji bîr ne dikir. Dilşad ji hişê wê ne derdiket. Gelekî hizra wê li ser wî bû. Dikir me dikir ew ji hişê wê ne derdiket. Bêguman wê ji ne ne dixwastku ew ji hişê wê derkeve. Ew jî bi wî re gelekî şa bû di hûndûre xwe de. Beharê di dilê wê de dest pê kiri bû. Piştî ku wê Dilşad dîtibû, dilê wê bi şahî bû û şahî di dilê wê de weke avzemeke ku ji xwe re bi herike bû. Newroz di dilê wê de wê roja bûbû weke avzemeke zelal ku diherikî ji xwe re. Dilê wê her weha di wê avzemê de xwe hênik dikir. Hênikayiya dilê wê jî her weha bi Newroza ku bi Dilşad re hevdîtin kiri bû. Lê gava ku şahî di ber êvarê de ber bi dawiyê ve dihat, êdî dilê wê ji bi ber hazneke wê diçû. Dilê wê ne e dixwast ku şahî hew be ji ber ku ne ne dixwast Dilşad ji ber çavên xwe winda bike. Şahiya dilê wê bi şahiya Newrozê re dest pê kiri bû û ne dixwast ku her weha hew bibe. Ku dihizirî dibû wê şahî hew bibe hê behtir hazneke xwe dide dilê wê di wê heyamê de. Ew hazne ku di dilê wê de bû ku xwe dide rûdana wê, weke tirseke ku ês dida. Hê şahî hew ne bûbû. Lê wê ji ber ku hew bibe di dilê xwe de dest bi hizirandina hewbûna şahiyê kiri bû, ji ber ku di dilê xwe de her weha bi Dilşad re dihizirî. Mitala hewbûne şahiyê û çûna Dilşad jî, her weha ji zû de ketibû di dilê wê de. Ji ber vê yekê jî ni dikari bû bêhtir xwe bide şahîya ku heyi û hê berdewam dikir. Çend xwe dida zorê jî ne dikire ku xwe bide şahiyê di wê heyamê de. Di dilê xwe bi yekcarî ne di nav şahiyê ku dibû de bû. Lê dilê wê bi şahî bû. Gava ku dikenî di kenê wê de dihate têgehîştin ku tiştêk di dilê wê de hebû. Weke ku di dilê xwe de na rehet bû û li ser tiştêkî dikirkirî dihate xûyakirin. Gava ku dikenî hinarikên wê jî bi dem dibûn û gelekî wê xweşik dikirin. Dîlberê bi vê rewşa ku pê re ye di nav şahiyê de diçû û dihat. Lê ku diçû ku derê ji hinek çavan ku ne debana hawîrdora xwe, ne disekinî di cihê xwe de. Dîlberê keça Axa bû ji ber vê yekê jî çavên

mirovan li serê bû. Her weha bi rewşa pê re jî zû bi zû dihate têgehîştin ji aliyê xelkê ve. Gava ku hati bû nav şahiyê jî bi hevalên xwe re gelekî bi rih û can bû. Lê nuha hinekî bêdeng di cihê xwe de disekini. Ji axatiyea xwe ve û her weha wê kêlîkê bi bedengiya xwe re bala mirov dikişande ser wê di nav şahiyê de. Mirov di dilê xwe de dipirsîn ku ka ma çima gelo her weha bêdeng e? Gava ku di serî de hati bû nav şahiyê çend bi deng bû. Lê nuha çend bêdeng maye di cihê xwe de. Dîlberê bi mirov re dilxweş bû. Mirov hez jê dikirin. Ji ber vê yekê jî bala wan li ser wê bû. Bêdengiya wê jî bala mirov dikişande ser wê. Bi vî awayî ta ku di şahiyê de gihana ber dawiya şahiyê ku mirov dest bi belavbûnê dibin jî bêdengiya wê hebûna xwe berdewam kiri bû. Mirov li rûdena wê dimeyizandin fahm dikirin ku di dilê xwe de tiştêk heye di wê kêlîkê de. Lê belê ni zanibûn ji ku ji ber çi her weha di dilê xwe de bê şahî ye. Mirov ku bi lêbat û gav dest bi şahiyê kir êdî her weha berdewama pê re bi lêbat û bi gaviyê berdewam ne kir têt têgehîştin ku tiştek di dilê wê de heye. Bala mirov ku li dûrên xwe ne, dikişêne ser xwe ve. Dîlberê jî bi vî awayî bala mirov dikişande ser xwe.

Bêguman divêt mirov vê yekê ji aliyê kesayetiya Dîlberê ve jî şirove bike ji ber ku ya ku herî mazin dihat qada jiyanê, kesayetiya wê bû. Di nav şahiyê de her weha bêdeng mayin jî bêguman wê jî didît ku bala mirov dikişêne ser wê di wê heyamê de. Lê ya di dilê wê de ew di wê heyamê de bêdeng dihişt. Wê ya di dilê xwe de jî têne di dilê xwe de hîs dikir. Ma gelo hinekên din jÎ ya di dilê wê fahm dikirin? Gava ku li dûrên xwe dimeyizand û çavên xwe digerandin bi derûniyekê re, ku her weha ji xwe dipirse,  li dûrên xwe dimeyizand. Weke ku tiştêkî ku bi dizikê kiri be û li dûrên xwe meyizêne ka ma hinekan ew fahm kirine yan ji fahm ne kirine, wilo dimeyizand. Bi vî awayî gava ku mirov li ruyê wê dimeyizand mirov gelek tişt ji ruyê wê fahm dikir. Lê car bi car jî mirov gava ku hizir û ramana wan çû ser tiştêkî ji wan wê ve jî çi kesek ji wan pê ve di wê dunyê de na jî. Her weha li Dîlberê jî dihat. Dîlberê wê kêlîkê xûh dida, germ dibû, di serê xwe de kûr û kûr diçû û her weha car bi car jî bi tirseke ku bi fihêt bû dihate xûyakirin. Lê

bêguman dilê wê gelekî wê kêlîkê zû û zû diavêt bi ve rewşê re. Bi vî awayî gava ku şahî giha ber bi dawiyê jî, ew jî xwe bi hink lêzê gihande malê bi hinek hevalên xwe re. Hinek hevalên wê jî pê re bûn ta ku ew hate malê. Lê gava ku hate malê jî di rê de ne dipeyivî. Çi peyv ji nav lêvên wê ne derdiketin û ne jî ji nav lêvên hevalên wê yên ku pê re diçûn di wê heyamê de. Her weha bêdengî weke qanûneke serekê desthilatdar, xwe di nav wan de dihesand. Lê di dilê wan de her weha bêdengî serwer bû. Bêguman mirov ni dikari bû ku ji bo Dîlberê bêje ku di dilê xwe de wilo bû. Dîlberê di dilê xwe de gelekî weke ku bi hest bû dihate xûyakirin. Bi vê yekê re gelek caran Dîlberê gava ku carinan li hevalên xwe dimeyizand jî, bêhtir çavên xwe li wan ne digirt. Mirov gava ku di dilê xwe de bi hest be, her weha ew çaw bi çaw were li hevberê yekî bisekine ku bimeyizêne ji ber ku kesayetiya hestiyar xwe dide diyarkirin. Di vê diyarkirine de jî gava ku hest serwêr bûn hinekî zor dibe meyizandin û her weha hanîna ser zimên zor dibe. Dîlberê jî mirov dikare bêje ku xwediyê kesayetiyeke ku gelekî bi hestiyar bû. Dilê wê kelegerm bû. Dilê wê zû bi zû tijî dibû. Gava ku li hawîrdora xwe jî dimeyizand bi hestiyarî dimeyizand. Li gor dilê xwe gavavatin weke taybetmendiyeke hestiyariya kesane ya wê bû. Gava ku mirov li çavên wê dimeyizand, bêguman mirov digot qey bi hestir in dihatine xûyakirin. Li çavên wê gava ku dihate meyizandin weke ku rohniyeke tirêja xwe dabayê, dihate xuyakirin. Vê yekê jî li ser mirov ku pê re ne û lê dimeyizandin, tesîrekê diberde. Ev tesîr ji tesîreke xwezayî bû. Gava ku mirov li çavên wê dimeyizand mirov digot hema wilo li çavên wê meyizêne li mirov dihat. Ev yekê jî ji tesîrên ku ji çavan dihatine ser mirov bû. Dîlberê her weha bi çavên xwe re mirov dikare bêje ku xwediyê xweşikatiyeke xwezayî bû. Çavan wê gelekî xweşik bûn. Lê carina ku kil jî li çavên xwe dida, çavên wê hê behtir bi balkêş dibûn. Bi kil re çavên wê bi mijgulan re xwe bêhtir dide kifşkirin. Lê bêhtir jî ne dihişt ku bi kil re were kifşkirin. Her weha ku wê kil li çavên xwe dida bi awayekî ku ne dihişt ku kil li ser çavên wê re were xûyakirin, bi awayekî xwezayî distand. Wan çavên wê yên ku ne bêhtir biçûk in û ne

bêhtir jî mazin in, bi awayekî xwezayî re ew bi çavên kil dide nîşandan. Pora wê gelekî dirêj bû. Pora xwe li ser pişta xwe dikire weke kursakê pahn û diberda. Ew kursa pahn jî girê dida bi hinek bendê ku bi rengên gelekî xweşik dihatine xûyakirinê. Lê bendê ku pê pora xwe girê dida jî ji xiftanên wê jî bêhtir ne cuda dihate xuyakirin. Xiftanê xwe jî bi milikan re dikire du qat li ser çengê xwe re. Qatek diavête ser pişta xwe re û bi ev re girê dida û qata dî jî digihande gûzeka destê xwe re û li ser gûzekê bi bendekî re girê dida. Gava ku bi bend girê dida jî li ser destê wê re ji destê wê dibû weke gûleke ku destên wê di nêvî de be. Destê Dîlberê jî weke ku tiliyên wê dirêj bûn dihatine xuyakirin. Destê Dîlberê xwediyê sipîtiyekê xûngir bû. Her weha destên wê dibûn weke ku di nav ava mûmê de kiri be, dihate xuyakirin. Gava ku bi xiftan re bû weke ku desmalkekê jî dikire destên xwe de. Ew desmalka jî piraniya di destê hemû keçikan de dihate xuyakirin ji ber ku weke semboleke keçkaniyê dihate nîşandan. Desmalka destê weke nişana keçkaniyê dihate zanîn. Keçên ku bi dergîsî dibûn yan jî her weha hez j'yekî kiribin, bi piranî desmalê xwe di destê xwe de diberda destê wî de. Ev yekê jî dihate wê wateyê ku dilê min ya te ye û ez gelekî hez j'te dikim. Bi vê nêzîkatiyê re Dîlberê desmalê destê xwe berda bû di deste Dilşad'î de.

Dîlberê piştî ku şahî hew bûbû êdî hati bû malê û di odeyê de rûniştibû û dihizirî ji xwe re. Her weha ew çi hizir bûn ku di serê wê de hebûn ku ew di nav xwe de wisan kûr û dûr çû bû. Gelekî dihizirî û dihizirî. Lê belê wê kêlîkê tenê dihizirî. Ji wê pê ve tiştêk ne dikir. Dîlberê yeka bi fahm bû. Gava ku li rewşa mirov dimeyizand jî fahm dikir ku derdekî mirov heye yan nîn e. Bi vê yekê re jî li hevberê pirsgirêkên wan yên ku didîtin an jî hatibana hevberê wê, ne bêpirsiyar bû. Her weha mirov dikare bêje ku yeka bi berpirsiyar bû. Ji ber vê yekê jî neqebine wê û mirovan hebû. Ji ber ku gava ku pirsgirêkeke wan hebûya, diçû nig wan û ku ji destên wê dihat ji wan re dibû alikar. Ji ber vê yekê jî navbera wê û mirovan hebû û germ bû. Bi vî awayî re mirov dikare bêje, bi hemû mirovan re têkilîyên wê he bûn û germ bûn.  Miroveke bi ruh û can bû. Ji ber vê yekê jî ji bi mirov re germ dihate xuyakirin.

Miroveke ku piceki ji guharandin pê re hatiba çêkirin, dihate xuyakirin ji aliyê mirovên li dûrên wê ve. Ji ber ku ew bi agehdar bû li hevberê mirov û pirgireken wan ku hene. Bi vî awayî jî baleke xwezayî ji aliyê mirovan ve dikete ser wê de. Her weha bala mirov jî li ser wê hebû. Mirov ku bi pirsgirêka hevdû re mijûl dibûn, êdî bi dilêkî xweş di dilê hevdû de cih digirtin. Bi vî awayî re jî, hinekî navê wê jî derketi bû. Carinan ku mirov pirsgirêkên wan çê dibûn û bi tenê maban û diçû nav mirovan û digot bi pirsgirêka xwe re bi têne û rû bi rû mabû. Mirov jî digotiyê de Dîlberê zanibana te bi têne ne dihêşt. Bi vî awayî mirov li ser wê hinek gotinên kevn yên xelkê jî digotin. Her weha gotineke kevn û gelekî bi nav û deng hebû, ku ji bo wê mirov dihanî ser zimên. Mirov ev gotin her weha digotin ji bo bi wê gotinê re ’şêr şêr e, çi jin e çi mêr e’ digotin. Rast bû ’şêr şêr e, çi jin e çi mêr e’. Gava ku mirov xwast tiştekî bike, zanebûn û xirabbûn diviya bû hatiba ber çav. Gava ku xirab nebûne wî çaxî mirov dikare bêje ku bi serkeftinê re jî hinekî zor dibû. Bi gotina xitatê re mirov bi du awayan hizir dihanî ser zimên di nav civakê de. Her weha, ya pêşî ji aliyê kirinê ve dihate ser zimên. Di vî aliyî de bi bêhtirî ji aliyê hizir û hestewariyê ve dihate ser zimên. Nêzîkatiyeke bi rûmet jî bi vê yekê re dihate şirovekirin. Ji aliyê karguzariyê ve jî weke ku mirov di kar û barên xwe de wê hêzê di xwe de bibîne û kar û barên xwe bike, ji vê yekê dihate ser zimên. Ji vi aliyê vê jî mirov li jiyana hevdu dimeyizandin ku ka ma çend zîrektî heye. Ev nêzîktî jî her weha weke xiyreteke dihate şirovekirin. Ewan nêzîkatiyan, nêzîkatiyên civakê û yên civakî bûn. Her weha mirov dikare bêje ku wateyeke wan nêzîkatiyan jî weke kevneşopiyê bû. Ji xeynî vê yekê jî mirov di nav civakê de wateya wan bêjeyên di hevdu de jî lê digeriyan. Ev yek ji aliyê kesayetiyê ve jî weke taybetmendiyekê dihate ser zimên. Bi vê yekê re mirov di jiyana xwe de hinekî taybetmendiyên ku xwe pê di jiyanê de bidin naskirin dabûn çêkirin. Weke taybetmendiyeke mazin û ku lê agehdar bin nêzîk dibûn. Di jiyana civakê de alîkariya hevdu kirin û bi hev re bi dilbûn mayin jî weke nêzîkatiyên girîng bûn, ku xwe didane nîşandan. Mirov her weha li çavên hevdu dimeyizand ka ma dilbûneke çawa heye yan ji nîn e. Bi vê yekê re nêzîkatiyeke ji

dil li hevdu dihate kirin. Dîlberê jî di nav mirov de ji aliyê wan taybetmendiyan ve pir baş û mazin dihate dîtin û şirovekirin. Carina ku mirov lê dimeyizand û digotin ku bi mirov re başbûn ne têne bi temen re ye di mêjî de ye. Têne mirov gava ku ji aliyê temen ve hinekî mazin dibe, hê bêhtir dibîne û nas dike. Bi vê yekê re jî jê taybetmendiyên weha têne xwastin. Gava ku ji aliyê taybetmendiyên weha ve ne temam bûna jî kêm dihate dîtin. Li ser vê nêzîkatiyê re ji rexne ji lê dihatine kirin ji ber ku di nêzîkatiyên xwe de kêm in. Gava mirov digihana temenekî mazin û navser dibûn, êdî ji wir pê de kêmasî ji wan ne dihatine pêjirandin ji aliyê mirov ve di nav civakê de. Divîbû bi temenê xwe re çend mazinbûna, evçend jî di nêzîkatiyên xwe mazin bûna. Her weha ev yek jî weke felsefeyeke civakî ya nêzîkatiyê xwe dida nîşandan. Lê gava ku jî kêmasîyeke mazinan bihatina dîtin jî, mînaka nêzîkatiya zarokekî didanê de. Her weha jê re dihate gotin ku 'wê xirabiyê kir lê li wê zarokê ha yê biçûk meyizêne û ji xwe re fêr bigire, bila ew bibe mamosteyê te lê meyizêne.' Bila ew bibe mamosteyê tev gotin ji aliyê nêzîkatiyê ve ku ne baş hatibana pêjirandin bi vê mînakê re ji bo ku kêmasiya xwe bibîne, dihate gotin. An jî her weha bi vê yekê re girêdayî dihate gotin ku ev xeletiya ku bi mazinatiyê re hate kirin ji bo ku careke din neyê kirin. Bila li zarokekî biçûk were meyizandine êdî careke din ew xeletî neyêt kirin. Wateya vê gotinê jî ji aliyê hizirandinê ve dihate ser zimên. Ango hişê biçûk bi zanebûnê dikeve xeletiyan de.

Dîlberê ji aliyê nêzîkatiyên xwe ve jî ji aliyê gelek mirovan ve weke nimûne dihate nîşandan. Ji aliyê gelek nêzîkatiyên xwe ve, li ser zimanan bû. Hê ciwan bû lê gelekî jîr bû. Ji aliyê xwandinê ve jî li nig saydayên ku bi zane bûn fêrên xwe hilda bûn. Xwediyê perwerdeyeke baş û mazin bû. Di nêzîkatiyên xwe de civakî bû. Li ser hizra civakê ve diçû. Her weha mirov dikare bêje ku nêzîkatiyên wê ew dikişande nav mirovan di aliyê xwe de. Li hevberê pirgirekên civakî ne bi bêberpirsiyar bû. Wê xwe bê xem ne dikir. Miroveke li hevberê pirsgirêkan bi xem bû. Pirsgirêkên ku yên li hevberê wê ne, wê weke pirsgirêkên xwe didîtin. Bi vî awayî xwe dida nîşandan. Mirov bi berpirsiyariya mirovan bi qadr û

qiymet bûn. Ji ber vê yekê jî mirov gelekî hez ji Dîlberê dikirin. Dîlberê ji vî aliyê ve di nav mirovan de keçeke delal bû. Mirov her weha lê dimeyizandin. Keça delal xwediyê hinek taybetmendiyên hestiyar û berpirsiyar e. Ji aliyê kesayetiyê ve jî hestiyar e. Bi têgehîştin û jiyana xwe re jî bi zanebûn û tenik e. Dîlberê di nav mirovan de her weha dihate naskirin. Ji aliyê nêzîkatî û zanebûna xwe ve jî her weha bi wate bû. Dîlberê her weha miroveke wilo bû ku nêzîkatiyên vala ne didane nîşandan. Nêzîkatiyên wê xwediyê wateyeke mazin bûn. Bi axiftin û gotinên xwe re mazin bû. Her weha bi nêzîkatiyê jî mazin bû. Zanibû wate hizir çi ye yan jîne çi ye. Serê wê bi mejî bû. Gava ku dipeyivî fahm dikir ku diviya bû li gotina xwe baş bihizire û pişt re bêje. Di vêgotinên xwe de xwediyê gotin û nêzîkatiyên jîr bû. Nêzîkatiyên mirov di ser wê de gelek hêbûn. Bêguman jî diviya bû wilo bihêne ji ber ku gelekî bi pirsgirêkên mirov ve mijûl dibû. Ji nêzîkatiyan an jî her weha ji tevgerên mirov di nav axiftina xwe de mînakdayin wê çêtir nav mirov de dide têgehîştin. Gava ku mirov ew fahm dikir jî, hê bêhtir ew dikete dilê wan de. Gelek mirov bi jê re digotin Delalê Dîlberê. Delalê Dîlberê bêjeyeke ku nêzîkatiyeke bi hest û bi hezkirinê dihate ser zimên. Ev gotin  ji dilê mirov dihat û jê re dihate gotin. Ji aliyekî ve ji hezkirine mirov ve bêje dihanî ser ziman. Lê ji aliyekî ve ji ji aliyê hestên ve mirov xwe û ew bi hev re û nêzîki hevdu dîtin ji ber ve yekê ji tenin ser ziman. Bêguman her weha ji aliyê qenciyê ve gelekî di dilê mirov de bû. Vê yekê jî ji aliyê nêzîkatiyeke xweza ve di navbera wê û mirovan de bingehekî mazin dabû avadikirin. Bi wan aliyên xwe re hemû aliyên wê dihate naskirin û têgehîştin. Lê divêt di vir de mirov bêje ku piştî şahiyê sakinandina ku pê re çêbû ji aliyê xelkê ve pir baş û mazin dihate xuyakirin. Mmirov ku lê dimeyizandin beri hingi çend bi kef û şahî bû û wê kêlîkê ji her weha wilo bêdeng bû di cihê xwe de mabû. Lê ew şahî û kêfên wê kêlîkê pê re ne didîtin. Tenê gava ku jê dihate pirsîn ku ma çi wê heye, hinarikên wê dem digirtin û sor dibûn. Gava ku jê dihate pirsîn jî çi bersiveke wilo mazin ne dida. Vê yekê jî bala mirovan dikişand ser wê ji ber ku Dîlberê ne yeka ku pirsên ku jê dihatine pirsîn bêbersiv bihişta. Di wê kêlîkê de

gava ku jê hatiba pirsîn bersiv dida. Lê wekî din jî bêdeng dima di cihê xwe de. Piştî şahiya Newrozê li nig Dîlberê guherandinek çêbû bû. Ev yek jî gelekî bi bal dihate xuyakirin û li ber çavan bû. Mirov ku lê dimeyizandin dixwastin fêhm bikin ku ka ma çi pê re heye ku weha diket hizirandinan de. Dîlberê gelekî di dilê xwe de bû wê kêlîkê. Gava ku li ruyê wê dihate meyizandin, dihate dîtin ku tiştêk di dilê wê de hêbû ku ew tiştê ku di dilê wê de bû hem wê şa dikir û hem jî dilê wê diguvişand. Piştî şahiyê gelekî dikete huznan de. Li ber Dilşad jî diket. Gava ku di serê xwe de li ser wî dihizirî kûr diçû. Lê bi hizirandina Dilşad re di dilê wê de şahiyek jî çê dibû. Ev yek jî pir baş û mazin dihate dîtin û têgehîştin ji aliyê mirovan ve. Mirov ku zaniba ew li ser Dilşad dihizire, wê hinekî fahm kiri bana ku ji ber çi ye û çima ev çend dihizirî. Lê gelekan vê yekê ni zani bûn. Têne gava ku bi Dilşad re rû bi rû dibû, sê çar keçên hevalên wê bûn û di wê heyamê de pê re bûn û li nig wî bûn û hwd jî pê deçi kesekî tiştêk ni zanî bû derheqê di dilê wê de. Keçên hevalên wê jî gava ku lê dimeyizandin hinekî weke ku di nav xwe de dibeşisînin ji lê dimeyizandin û ew jî tevî bêdengiya wê dibûn.

Dîlberê gelekî di rewşeke cûda de bû wê kêlîkê. Lê gava ku lê dihate meyizandin jî dihate têgehîştin ku bi kef û dilxweşî bû. Her weha bi vê rewşê Dîlberê re gava ku mirov li Dilşad jî dimeyizand mirov didît, ku ew jî gelek weke awayê Dîlberê de bû, dihate xuyakirin. Dilê wî jî pir bi kêf û bi xweşî bû. Gava ku Lê dihate meyizandin ev yekê pir baş û qenc dihate têgehîştin û dîtin. Di şahiyê Newrozê de Dilşad gelekî bi kêf bû. Ew bi xwe re û bi hevalên xwe re jî hinekî dûr hati bû lê ev yek ji bo wî ne li ser gotinê jî bû. Ji ber ku ew têne li şahiyê dihizirî. Ji aliyekî din ve jî Dilşad mirovekî ciwan bû û gelekî jî kelegerm bû. Ev yek jî gava ku lê dihate meyizandin dihate dîtin. Mirov weke ku hez ji Dîlberê dikirin, her weha hez ji wî jî dikirin di herêmê de. Dilşad jî bi jêhatîbûn û zîrektiya xwe ve di dilê mirovan de cih girti bû. Mirov ji aliyê kesayetî û qenciya wî ve li civatan ew weke mînakeke didane nîşandan di nav gotina de. Bi rastî jî Dilşad mirovekî gelekî zîrek û jêhatî bû. Di nav şahiya Newrozê de ev aliyên wî pir baş û qenc li

ber çavên mirov bûn. Ji ber vê yekê bû ku gava ku çawa hati bû nav şahiyê, mirovên mazin û serwer jê re xeber şandi bûn ku were li nav wan rûnihê. Dilşad her weha bi kesayetiya xwe re li ber çavan bû. Bi kirinên xwe re jî xwe kiri bû çavên mirovan ku li dûrên wî bûn. Dilşad gava ku hati bû nav şahiyê jî bala mirovên ku li şahiyê bûn di cih de kişandi bû li ser xwe de. Her weha her mirov ku ew kifş kiri bû Dîlberê jî ew kifş kiri bû di nav şahiyê de. Dîlberê gava ku ew dîtibû bala xwe da bû ser wî di nav şahiyê de. Dilşad mirovekî ku bi nêzîkatî bal dikişand ser xwe. Lê gava ku Dilşad bi Dîlberê re rû bi rû hati bû, êdî Dîlber j'hizrên wî ne derdiket. Di nav mirovên mazin de gava ku rûnişti bû jî car bi car ji xwe ve diçû. Bala wî ji xwe ve diçû ser Dîlberê di wê heyamê de. Dilşad mirovekî di nav mirovan de zanibû ku çawa bipeyivebe û tevbigere. Gava ku dipeyivî jî mirov lê pir baş û mazin dihesand. Di nav civatekê de her weha axiftin hinekî mazinbûn diviya bû ji ber ku bi axiftinê re xwe di nav civatê de dide guhdarkirin. Her weha ji aliyê taybetmendiyan ve jî be û ji aliyê kesayetiyê ve jî be jêhatî û mazin bû. Li gor wan mirovên ku di nav civatê de rûnişti bûn ew ne mirovên ku bêhtir mazin bû. Lê dîsan her weha weke mazinekî li nav wan dirûnişt û xwe ji aliyê wan ve dide hesandin. Ev yek ji tiştekî gelekî girîng bû û diviya bû mirovên mazin û girîng şirove bike. Mirov di nav civatan de bi zanebûn û mazinatiya xwe ve xwe dida herêkirin û hesandin. Her weha divêt mirov bêjê ku bi zanebûnê re jî gavên xwe avêtin jî gelekî girîng bû. Dilşad bi wan aliyên xwe ve jî hinekî li ber çavan bû di nav wan de. Dilşad ji aliyê zanebûnê ve jî ne mirovekî ku nezan bû. Mirovekî xwende bû. Li nig seydayên dest bi xwandina xwe kiri bû. Her weha gava ku biçûk bû, jî bi fahmbûnê ve ketibû çavên mirovan de. Mirov lê dimeyizand ku zû fahm dikir û pêde diçû êdî bala xwe didanê de. Lê bêguman Dilşad mirovekî bi gelek derfetan mazin bûbû. Malbata wî malbateke ku ji aliyê taybetmendiyên xwe ve serwer bû. Wan taybetmendiyên bi Dilşad re jî bi du aliyan re jê re bûbû bingeh di pêşketinên wî de. Aliyekî ve bi serxwebûna wî re jê re bûbû temen û kesayetiya wî ava kiri bû. Ji aliyê din ve jî di nav mirovan de ku ji bo wî ji aliyê rêzê ve dihate ber çavan weke

bingehekî teybet. Di pêşketin û mazinbûna wî de û rêzdayina wî de bêguman gava ku mirov şirove bike divêt mirov wan taybetmendiyên jî bir neke.

Mirovê ku ji nav malbateke serwer were, wê xwediyê hinek taybetmendiyên ku di malbata wî de hene jî pê re be. Lê ew bi xwe re bi kesayetiya xwe re di demê de bi dîtinên xwe re xwe dide rûniştandin. Lê gava ku ji aliyê kesayetiyê ve xwe ne jêhatî daba nîşandan jî, wê çaxê mirov ne dikarî bêjê ku wê di nav mirovan de mazin bihata dîtin. Di demên kevin ve mirovên ku ne dixwastin xwe bidin ber çavan, diçûn tiştekî mazin dikirin. An jî wê çûbana nêçîrê, nêçîreke baş kiri bana ku mirov jî li ser wan bipeyiviyana. Ev taybetmendiyên di demê de hinekî bi fahm bû û xwe di gelek tiştan de dida ber çavan. Her weha bi tiştekî baş re hatina ber çavan û navê wî bi tiştekî baş re hati be hildan jî gelekî girîng bû. Ew taybetmendiyan jî ji wê demê ve ta ku giha dema Dilşad weke, darekî ku bi çiqilên xwe re xwe bêhtir bike her weha xwe gelekî bêhtir û kûr kiri bû di jiyana civakê de. Di wê demê de jî her weha ji aliyê hûnerên dest û mejî ve be jî gelekî aliyên  xwe ve di ceribandin û dayin li ber çavan jî çê dibû. Xwastin hildana nav bi mejî re pêş dikeve. Her weha taybetmendiyên kesayetiyan yên ku li jiyanê bi wate ne bi zanebûnê re xwe didane ber çavan û dihanîne ser zimên. Dilşad di nav wan gotin û taybetmendiyên xwe de hinekî bi taybetmendiyên kesayetiyê yên ku kûr û bi zane ne dihate ber çavan de. Her weha divêt bi Dilşad re hinekî taybetmendiyên ku di demê de weke rade dihate dîtin jî, mirov bihêne ser zimên. Ewan taybetmendiyan bûn ku ew dikire ber çavan. Bi vê yekê re bûyina suwarekî baş û jêhatî jî, bi wê taybetmendiyê re hatine naskirin, ev taybetmendiyeke girîng bû. Bi vê yekê re jî taybetmendiyên nêçîrvanekî baş û şivanekî qenc jî dihate lêgerîn di mirovên ku weke Dilşad de. Nêçîrvanekî qenc bazên xwe baş dida gerandin û di şevînan de xwe baş bi cih dikir. Nêçîrvanî jî her weha weke şivantiyê jêhatiniyê û zîrektiye dixwaze ji mirov. Nêçirvanekî baş ji mirovekî gelekî zîrek pêk tê. Ji wan aliyan ve jî hinekî Dilşad bi nav û deng bû. Ew ne dima li ber sewalên bêhtir. Lê her weha kirinên wî hebûn û kirinên wî dihatin

zanîn di nav mirovan de. Di nav şahiyê de ji aliyê mazinan ve hati bû dewêtkirin ji bo ku here û di nav wan de rûnê. Di wê heyamê de jêhatîbûna wî û mazinbûna malbata wî her weha di serê mirovan de bû. Çend cihêkî hinekî dûr ve jî hatibe, dîsa divêt mirov bihênê ser zimên ku li wir jî dihate naskirin û gelek caran jî bi hevalên xwe re hati bû wê cihî. Ew der cihê mala apê wî bû. Mala apê wî li wir sereke bû di nav civakê de. Ew jî ji mala apê her weha dihate naskirin. Bi rastî jî her weha jî bû. Mirov ku ew bi xwe ji mala axa û bega bû. Hinekî ji wî aliyê jî mazinbûna wî hebû. Lê bêhtir mirov li kesayetiya wî dimeyizandin û ew şirove dikirin. Kirinên baş mirov mazin dikin. Ew jî her weha xwediyê kirinên çak bû. Her weha ma ku Dilşad jî ne mirovên ku bikaribin bi wî awayî re wilo baş û mazin û qenc hati ba naskirin? Bêguman divêt mirov bêjê ku mirov ku wê bi keri xwe baş wê wêrin dibin xwediyê naskirin. Tiştê ku ew dide naskirin jî kirinên kesayetiya wan e. Mirov ku di cihên xwe de rûniştibin wê çawa bihatana naskirin û bibûna xwedî rêz di nav mirovan de. Kirinên mirov rastîya wan derdixe ber çavan ji bo ku mirov wan bibînin. Mirov bi kirinên xwe re tên dîtin û aliyê têgehîştin û hizirên xwe ve jî bi vê yekê re dibin xwediyê hinek taybetmendiyên mazin. Mirov wan taybetmendiyan jî bi sinc û kevneşopiyan re dide ber çavan. Her weha nêzîkatiyên wêrin ser ziman jî wan taybetmendiyan re ji xwe re bingehekê didine çêkirin di jiyanê de. Gava ku di nav civatê de rûnişti bû ku fahm kiri bana jî ku Dîlberê lê dimeyizand, diviya bû ku gava xwe li gor civatê biavêta. Gava ku ew û Dîlberê hati bûn hevberê hevdu û li hevberê hevdu sekinî bûn ji çend Dîlberê di serê wî de cih ji girti bû û wê kêlîkê di aqlê wî de jî bû û xwe dide kifşkirin. Lê gelekî bêdengmayin jî bi wî re ji bo vê yekê bû. Desmala Dîlberê bi wî re bû. Danîbû di bin îşliga xwe de li ser dilê xwe de. Desmala Dîlberê gava ku li ser dilê wî bû weke ku deste Dîlberê li ser dilê wî be lê dihat. Hizra wî jî li ser desmalê bû û bi desmalê re li ser Dîlberê bû. Li hawîrdora wî mirov ku şadibûn û diçûn û dihatin di nav şahiyê de dimeyizand lê hizra wî li ser Dîlberê bû. Mirovên mazin yên ku ew di nav wan de rûnişti bû jî ji xwe re dipeyivîn û pirs ji hevdu dipirsin û bersiv didanen hevdu di wê kêlîkê de. Diviya bû ku ta wî

û hişê wî li ser mirov ku didipeyivîn bihêne di nav civate de. Ji ber ku hatiba têgehîştin ku ta wî ne li ser peyvên ku dihatine kirin û li dereke dî yan jî li ser tiştekî din bihêne wê ev yekê weke nêzîkatiyeke birêz hati ba şirovekirin. Ew bi xwe li wir bû lê hişê wî ne li wir bû wê kêlîkê. Hişê wî li ser Dîlberê bû. Di hişê xwe de li ser Dîlberê dihizirî û mûjûl dibû. Dîlberê, piştî ku hati bûn nig hevdu û desmala xwe dabûyê de êdî hizrên wî hemûkan bi wê re bêrawastan bû bû.

Dilşad piştî ku şahî hew bû bû êdî ew jî bi hevalên xwe yên ku pê re hatine, xatirê xwe dixwazin û riya xwe ya malê digirin diçin. Dilşad gava li hespê xwe suwar dibe û hevalên wî jî li hespên xwe suwar dibin û didin rex hevdu de û diçin di rê de. Di wê heyamê de gava ku li Dilşad dihate meyizandin dihate têgehîştin ku tiştin di serê wî de hebûn. Bi wî re jixweçûbûn li ser hespî çêdibû. Hevalên wî yên ku pê re ne wan jî vî yekê fahm dikirin. Lê wan jî tiştêk ne digot. Bêdengî weke qanûneke sereke hukmê xwe li ser wan dabû avakirin. Hevalên wî jî ne dipeyivîn li ser hespan. Ewan ji her weha tenê li ser hespan bi bêdengî diçûn. Lê Dilşad gelekî  ji xwe çûbû. Ji rewşa wî ew yek pir mazin dihat têgehîştin. Dilê wî pir zû diavêt. Lê dilê wî şad bû. Di serê xwe de hizra wî li paş wî ve mabû. Gava ku wê kêlîkê li ser hespê xwe diçû û ji wir dûr diket digot qey tiştekî xwe li paş xwe ve ji bîr kiriye, wisa lê dihat. Dilê wî di wê heyamê de dualî bû. Aliyekî ew bi paşve dikişand û digotiyê de vegere. Li aliyê din jî ew bêdil dibire malê. Lê gava ku bi wî awayî re mirov li Dilşad dimeyizand, mirov didît ku di hûndûre wî de her weha tiştin ku wî paş ve dikişandin bêhtir di dilê wî de germ û bi tesîr bûn. Lê wî ne dida kifşkirin. An jî ne dixwast wêrin kifşkirin. Weki din jî ne dixwast ku yê ku di dilê wî de were kifşkirin. Gava ku hevalên wî li ruyê wî dimeyizandin, dida xwe ku xwe bi hêz bide nîşandan. Gava ku hevalên wî lê dimeyizandin wî jî bi rûyekî beşişî li wan dimeyizand û ku di serê wî de gotinên xwe digotin ji wan re di wê heyamê de.  Lê diviya bû ku mirov bêjê ku Dilşad bi awayekî hati bû ji bo şahiya wê derê, lê bi awayekî din jî di vegera malê de bi hevalên xwe re vegere. Di vegerandina xwe de desmalkek pê re bû û li ser dilê wî bû. Wateyek wê desmalka mazin û girîng hebû ji

bo wî. Dilê wî ji ber vê yekê jî pir bi dilpêrîn diavêt.

Dilşad di bin stêrên ezmana de riya xwe digirt û diçû. Li ser wî li ezmana gelek stêrên ku rohniya wan xurt bûn dihatine dîtin bi çavan re. Di wê demê de weke ku azman hê bêhtir nêzîktîri mirov bibe stêrên azmana mazin û bi rohnî dibûn li ber çavan. Heyv jî dihate xuyakirin. Li ser hespên xwe di nava reşê şevê de diçûn û diçûn bi bêdengiyekê ku li ser wan serwer bû. Dilşad wê kêlîkê gava ku lê dihate meyizandin dihate dîtin ku hişê wî ne li wir bû. Bi hişê xwe re ne bi xwe re bû wê kêlîkê. Li ser hespan gava ku diçûn hevalên wî car bi car gotin di avêtin holê da ku deng derkeve û axiftin çêbibe. Lê dîsa bêdengî gran bû. Weke carina mirov ku dixwast hinekî bêdengiyê çêke û ji bêdengiyê weke demêke kin jî hew bibe vê carê jî ji bêdengiyê derketin û xwastin deng derkeve û bi axiftinê re kurne dikirin. Bêdengî dîsa li ser serê wan serwer bû. Hevalên wî pir dixwastin ku jî wê bêdengiyê derkevin lê kurne dikirin ni dikari bûn xwe derxin. Wê kêlîkê wan çi kiri ba jî ne dibû alîkar ji wan re ku ji bo ji bêdengiyê derkevin. Têne dengê lingê hespên wan dihat. Gava ku lingê hespên wan li keviran diket deng derdixist. Wan jî ewan dengan hez dikir. Ji wî dengî pê de ve çi dengên din ji wan ne dihat. Li ser hespên xwe gava ku diçûn weke ku reşikên li ber çavên wan bikevin li wan dihat. Her weha wilo li ber çavên wan dihat. Gelek caran jî weke ku tivlinkê bibînin li wan dihat. Lê şev bû û bêhtir jî mirov ni dikari bû ku kifş bike bi çavên rût re. Tivlinkên şevê piştî ku reş dikete erdê de digeriyan. Bi rojan jî di cihên xwe de diman. Her weha kund jî bi şevê car bi car derdiket. Kund bi rojê re jî derdiket. Çavên kundî di reşayiyê de dibin weke çirayekê û dibiriqin. Gava ku di re de diherin her weha li cihna rastî kundan jî hati bûn. Di wan kêliyan de hevalên wî ji bo ku bêdengiyê xirabkin gava ku teyrikek didîtin navê teyrikekî din digotin daku bi Dilşad re jî bikevine di nav peyivtinê de û bêdengî xira bibe. Carekê her weha gava ku digihêjin dehma kundekî, hevalekî wî li wan dizivire û dibêje ’ma gelo nuha yê ku em di ber re çûn, kund bû yan ji pepûk?’ Yeki ji wan gut ’ma di vê reşê şevê de wê papûk çawa derkeve?’ Pişt re yekî din ji wan tevlî gotinê bû û behsa xwandina papûkê kir. Li ser vê yekê her weha du hevalên

Dilşad di nav xwe de dest bi peyivtinê kirin. Yeki gut ’ma gelo pepûk gava ku dixwêne dibêjê çi? Yê din ji got ’dibêje pepû kê kuşt min kuşt’. Hevalê Dilşad yê ku pirsî, careke din jî her weha pirsî ’ma gelo ji ber çi dibêje ’min kuşt?’. Careke din hevalê wan yê ku dipeyivî bersiv dayê de û her weha berdewam kir di gotinê de.’Dibêjin ku rojêkê keçikek û birayê wê hebûn. Keçik gelekî hez ji birayê xwe dikir. Lê rojêkê li ser karekî guftûgoyek di navbera wan de çêdibe. Kecik jî destê xwe li singê birayê xwe dixe û birayê wê bi paş ve gava xwe davêje ku lingê wî li kevirekî ku li paş wî ye dikeve û ew ber bi paş ve li erdê dikeve. Lê gava ku dikeve erdê, êdî birayê keçikê na rabe ser xwe ve. Di wê heyamê de lawik dimire. Keçik jî dilê wê gelekî diêşe û bi wê dilêşa xwe re di efûya xwe ji Xudayê xwe dixwaze ku wê bike ajelek ku di nav mirovan de be. Têt gotin ku Xuda jî dua wê erê dike û ew dike pepûk. Pepûkiya wê ya li ser birayê wê jî dibe navê wê ye teyrikatiyê ku. Pepûkatiya wê her weha ji papûkatiya wê tê’. Hevalên wan ê sêyemîn ji tevlî axiftinê dibe û ew jî her weha dibêje ‘herê rast e, Lê ji xeynî vê gotinê bêhtir û cudatir jî hene û têne gotin di nav xelkê de’. Hevalê ku peyivî lê zivirî û got ‘herê rast e, min tenê yek ji wan vebejînan got’. Pepûk bi dilêşiyê re heye. Mirov ku ew vebêjînan dihanîne ser zimên, gelekî pê bi dilêş dibûn. Gelek mirov jî digotin ku mirov dilêşiya pepûkê fahm bike, mirov wê wî çaxî jî dilêsiyên ku wê fahm bike. Mirov ku dilên wan gelekî bi êş bin digotin ku ‘weke pepûkê’ye. Şibandina pepûkê ji di nav xelkê de çêdibû. Şibandin ji aliyê dilêşiyê ve dihate ser ziman.

Dilşad jî vê vegotinê dizanî bû. Lê her çend hevalên wî guftûgo kirin jî, ew tevlî guftûgoyên wan ne dibû ji ber ku hizra wî ne li wir bû. Dîlber di serê wî de bû. Hizir û ramanên wî li ser Dîlberê bû. Ji ber vê yekê jî mirov dikare bêjê ku dibû ku axiftina ku li nig hevalên wî dibû hez jî ne dikir ji xweçûna xwe ve. Hizra wî ne li wir bû. Lê hevalên wî jî gelek caran gava ku dipeyivîn û gotinên xwe digotin jî di daviya gotinên xwe de bêjeyên pirsê wekev ’ma na’ yan ji ’ma ne wilo ye’ bi ser ve dikirin û digotine Dilşadî. Dilşad jî çi gotin hatiba gotin baş guh ner li ser bû. Gava ku li Dilşad dihate meyizandin, dihate têgehîştin ku hizra wî ji gotinên ku dihatina

kirin dûr bû. Ji ber vê yekê jî dana bersivê jî dijwar bû. Ji vê yekê wirdetir jî hizra wî dûr û kûr bû. Ew bi Dîlberê re ma bû. Yekê ku hizra wî ne li wir ba, wê çawa bersiva pirsan bida. Yan jî wê çawa tevlî gotinên ku têne kirin bi ba. Bêguman di wê kêlîkê de gava ku li rewşa Dilşad dihate meyizandin dihate têgehîştin ku bi hizir û ramana xwe re li dûriyê bû. Di serê xwe de li cihêkî dibû yan jî li ser tiştnên din dihizirî bi Dîlberê re. Her weha gava ku lê dihate meyizandin, dihate têgehîştin ku bi hebûna xwe re, bi hevalên xwe re bû lê bi hez û hizra xwe ve ne li wir bû. Hevalên wî jî gava ku lê dimeyizandin, ev yek pir baş û mazin fahm dikirin. Hevalên hevdu yên kevin bûn. Hevalên hevdu yên zarokatiyê bûn. Ji ber vê yekê jî hevdu baş nas dikirin. Çi kar û barên wan heba bi hev re dikirin. Ji hevdu qut ne dibûn. Hezkirina wan bi hevdu re gelekî mazin bû. Weki din jî her weha ciwan bûn. Ciwanbûn û hevaltî di laşekî de ku digehê hevdu, dibe weke hêzeke serwer ji bo kesayetiyan. Ciwan wî çaxî hinekî din bi xwe re bi bawer mazin dibin û pêş dikevin di jiyana xwe de. Rihê hevaltiyê ji vi aliyê ve her dem jî xwe ciwan dihêle. Lê di deman de bi zanebûn dibe. Ev zanebûn jî dibe bingeha gelek pêşketinên kesane û yên psîkolojîkî û civakî di kesayetiyan de. Bi ciwanan re hevaltî weke taybetmendiyeke çandî ji di jiyanê de xwe dide ber çavan. Her weha di vir de divêt mirov bêjê ku di bingeha hevaltiyê ji hev bawerkirin, naskirin, nêzîkatî û li hev hesandin jî weke taybetmendiyên girîng in têne ber çavan. Hevaltiya wan jî her weha xwediyê bingehekî mazin bû. Ji aliyekî din ve jî her car jî li cihêki bûn û bi hev re mazin bû bûn û her kar û barên xwe jî bi hev re kiri bûn. Bi vê yekê re mirov dikare bêjê ku ji hev re weke bira bûn. Hevaltiyeke wan hevaltiyeke baş û bingeha wê weke biratiyekê bû ku di nav malê de bû. Dibit ku gelek caran jî ji biretiya di nav malê de jî bi rastî û hizir û nêzîkatiyên xwe re bibuhure. Çand û hunera hevaltiyê di rastiyê de ji aliyê hizir û civaknasiyê ve nêzîkatiyên xwe ava dike. Lê gava ku dihêne ser ziman jî, di bingeha xwe de bi wate dike. Dilşad her weha mirov dikare bêjê ku xwediyê hevaltiyeke mazin bû. Lê nuha wê kêlîkê hestên dil li ser wî serwer bûn. Hestên hevaltiyê û yên evîndariyê xwediyê taybetmendiyên xwe ne. Dilşad vê yekê zani

bû. Gelekî jî hez ji hevalên xwe dikir. Hevalên wî jî gelekî hez ji wî dikirin. Lê ew wê kêlîkê li ser vê yekê ne di hizirî. Ew li ser dilê xwe dihizirî û dirawestiya. Dîlberê di dilê wî de bû.Wê kêlîkê weke ku di xew ve herê ji xwe ve diçû gava ku li ser Dîlberê dihizirî. Dilê wî ew cara pêşî bû ku her weha zû bi zû diavêt û dilperiyeke mazin di hundurê xwe de dida nîşandan. Di dilê xwe de wê kêlîkê ji Dîlberê weke ku ne dûr bû. Wilo lê dihat ku destên xwe dirêj kiri ba wê xwe bigihandayê. Dîlber di hundurê wî de bû. Lê di jiyanê de wê careke din çawa xwe gihandibaya Dîlberê û ew dîsan dîti ba? Ev pirs di serê wî de mazin bû. Ew li ser vê yekê jî dihizirî di hundurê xwe de, da ku çareseriyekê bibîne ku careke din wê bibîne.

Dilşad her weha di vê rewşê de bû. Li ser hespên xwe riyekê dirêj çûn da ku bihatina malê. Di rastiyê de riya wan bêhtir ne dûr bû. Lê belê ji wan re dûr hati bû. Hevalên wî jî bi wî re di ruyên xwe de didane derve ku rê li wan dûr dihat. Ew jî bi bêdengiyeke mazin û dirêj re riya xwe qad kiri bûn. Ji ber vê yekê jî ji wan re dûr hati bû. Berî vê carê gelek carên din hati bûn wê derê ji bo ku bikevine di nav şahiyan de. Lê ve carê ji wan re cuda hati bû. Ji Dilşad re her cudatir bûbû. Ew bi awayekî çû bû û bi awayekî din jî wê kêlîkê divegeriya malê. Wê kêlîkê divegeriyane malê. Lê gelo piştî ku çûna malê pê de êdî wê çi bibe? Hişê Dilşad li paş wî ve mabû. Dihizirî li ser demên pêşiya xwe de ka wê çi bibe. Di ser wî de tiştek ne dihate hişê wî di wê heyamê de. Lê gelek pirs di serê wî de hebûn. Ew jî li ser wan pirsan gelekî dihizirî. Pirsên di serê wî de bûn bersiv dixwastin ji wî di wê kêlîkê de. Lê çi bersiv pê re ne bûn ku bide. Her weha di serê xwe de çû bû û çû bû di nav hiziran de. Di serê xwe de li bersivan digeriya da ku xwe ji bo wan pirsan bibine ku di serê wî de ew pirs bi bersiv bin û ew jî di serê xwe de rehet bibe. Lê lêgerînên wî yên ku di serê xwe de jê re ne dibû çareseriyek di wê kêlîkê de. Têne dihizirî û ji xwe ve diçû û kur diçû di hundurê xwe de. Ma mirov dikare di serê xwe de bi têne ji pirsên xwe re bersivan bibîne? Gava ku pirs der heqê du mirovan de be, wî çaxî hinekî zor dibe ji ber ku di wê rewşê de çi pirsên ku bi xwe re du bersivan dixwazin di wê kêlîkê de. Her weha weke ku di wê kêlîkê de pirsên ku di serê Dilşad de bû çawa ku hizra

Dîlberê jî ji bo bersivbûnê dixawze her bi vî awayî re bersivbûneke du alî diviya bû were dayin. Dilşad li ser Dîlberê kûr dihizirî. Dihizir ku ka ma Dîlberê hizra xwe gotiba, wê çi bersiv daba wî her weha di wê rewşê de. Ji bo wan pirsên ku di serê wî de ne bersiva Dîlberê çi bû gelo? Her bervisa ku dida ji di dawiyê de nêzîkatiyeke hizrî ya xwe pê ve dide nîşandan. Wî weke ku dixwast bersiva Dîlberê jî di serê xwe de çêke ka ma wê çawa be. Lê dikir û ne dikir besiveke di serê xwe de çê ne dikir. Vê yekê jî hê bêhtir ew dikire eş û bêtebatiyê de. Bêtebatî weke ku ji xwe xwediyê hinek taybetmendiyên kesane ye ji te xuya dike. Di rewşên weha de bêtebatî hê bêhtir xwe dide nîşandan. Gava ku Dilşad dixwast bersiveke ji dêla Dîlberê jî bibîne û ne didît û vê yekê jî çend jê re zor dihat. Dilşad di serê xwe de her weha xwediyê gelek pirsan bû di wê kêlîkê de. Lê pirsên ku hemûken jî bêbersiv bûn, dihatine xuyakirinê de. Dilşad car bi car ji xwe dipirsi li ser pirsên ku di serê wî de bûn. Her pirseke ku hinekî der heqê Dîlberê de jî bihêne ji dêla wê jî bersiv di serê xwe de çêdikirin. Lê ew bi xwe re li ser wan bersivên ku wî ji dêla Dîlberê di serê xwe de çêkirine ne qanih bû. Piştî her bersiva ku wî ji dêla Dîlberê di serê xwe de dida, hê zora wî bêhtir dibû. Wan bersivên ku wî di serê xwe de ji bo wê didîtin jî di serê wî de bi xwe re hinek pirsên din dihanîn û bersivnên nû yên din ji wan bersivên weke pirsên dixwastin ji wî di wê heyamê de. Her weha di serê wî de pirs li dûv pirsê û pirs û bersiv li dûv hevdu çêdibûn. Bersivên wî di wê kêlîkê de di serê wî de ne dibûn bersiv ji bo yên ku di serê wî de bûn. Her bersiveke ku dihate dîtin lê dibû pirseke dî serê wî de. Lê ser hespê xwe bû û di riya xwe de diçû ku here malê. Di riya xwe de li dûrên xwe dimeyizand. Di her meyizandinên wî de di wê heyamê de weke ku bi nêzîkatiyeke bi hêvî dimeyizand. Lê di her meyizandinên wî de jê re çi çareserî ne dihate hanîn di wê heyamê de ji bo hizir û pirsên di serê wî de.

Her weha weke heyamekê di riya xwe de çûn. Pişt re bi hizir û ji xweçûbûna di serê xwe de digehin malên xwe. Dilşad û hevalên wî gava ku digehine nêzîkê malan şevbaşî ji hev re dixwazin û jêv bela dibin û her kesek diçe di malaê xwe de. Dilşad gava ku ji

hevalên xwe qut dibe û riya malê digire û têt malê, di rê de li ser hespê xwe hê di hiziran de bû. Hespê wî ew tîne malê. Hespê wî hespekî jîr bû. Dilşad bi wan pirsên ku di serê wî de ne li ser pişta hespê xwe suwar dikeve hewşa malê. Ew bi xwe re barê hespê xwe yê li ser pişta hespê xwe û pirs û hizrên wî ji di serê wî de weke barekî mazin di serê wî de jê re di bin barek wê heyamê de ye. Çend hespê wî barîtiya wî dikir her weha wî ji barîtiya pirsên di ser xwe xwe de dikir. Pirsa bêbersiv barekî giran e li ser mirov. Her weha barê wî jî mirov dikare bêjê ku giran bû. Di serê wî de barê wî çend diçû hê bêhtir jê re grantir dibû. Ji ber bersiv nedîtinê û bêhebûna Dîlberê.. Hebûna Dîlberê di serê wî de mazin bû. Çend dem diçû hê bêhtir di serê wî de mazin dibû û cih digirt. Dîlberê di serê wî de bi gelek pirsên re hebû. Lê di serê wî de bi kêfeke mazin re jî hebû. Dîlberê rastiyek bû di serê wî de. Ew jî bi ve rastiyê re bi jînbûne re ne aciz bû. Lê ew ne li nig hevdu bûn û bêbersiv bûn wî aciz dikir. Gava ku dixwast bersiveke bibîne jî, di serê xwe de lê ku di serê xwe de bersivek çêdikir û digot ev bersiv baş e. Lê jê re ne têr bû,  dibû bingeha eş û acizbûnekê li nig wî. Lê divêt em bejin ku ew jî di rewşa xwe ya ku wê kêlîkê dijiya, pir bi kêf bû jî. Ev kêfxweşbûn û pirsên di serê wî de di dilê wî de car bi car li hevberê hevdu bûn. Wî ne dixwast ku kêfxweşiya wî xirab bibe. Wî ne dixwast ku pirsên ku di serê wî de ne, wî gêj bikin. Ji ber ve yekê ji weke ku hinek tirs ji dilê wî de çêdibûn. Ma gelo gava ku ew bêkêf bû, wî çaxî Dîlberê jî ji wî dûr dibû? Ew pirs jî ew bêkêf dikir. Hebûneke her weha xwe pê re dida ber çavan di nêzîkatiyên wî de. Di wan rewşan de jî li desmalka wê ya ku dabûyê de, dimeyizand. Desmalk hinekî dilê wî rehet dikir. Lê ne bi yekcarî bû ev rehetiya ku pê re çêdibû. Gava ku li desmalkê dimeyizand, Dîlberê dihate bîra wî. Wî jî gava ku ew dihate bîra wî, wî ew di serê xwe de dikire weke wênayekî ku gelekî zelal bû û di hizra wî de bû. Gava ku Dîlberê dihate bîra wî gelekî bi wê hatina bîrbûnê dilxweş dibû. Di wê heyamê de bi piranî jî xwe ji bîr dikir. Gava ku Dîlberê dihate bîra wî, êdî ji xwe diçû û ta wî ji dunyayê ne dima. Weke ku here dunyayeke din lê dihat. Hizrên di serê wî de hemû kêm dibûn di wê heyamê de. Tenê wêneyek dihate ber

çavên wî. Ew wêne jî hebûna Dîlberê bû. Gava ku li ser Dîlberê evçend dikir hizra, Dîlberê bi hebûneke rast di serê wî de xwe diyar dikir ku wî digot qey wê kêlîkê ne di hizir de ye, di rastiya jiyanê de li nig wê bû û lê dimeyizand, welê lê dihat. Her weha jê re rast dihat. Lê di jiyanê de Dîlberê wê kêlîkê ne li nig wî bû. Dîlberê li derekî din bû û ew ji derekî din bû. Ji hevdu wê kêlîkê hinekî dûr bûn. Wî vê yekê di wê kêlîkê de zanibû. Lê weke ku vê yekê ne xwaze bihêne bîra xwe, tevdigheriya di wê heyamê de. Di serê xwe de gava ku ew di serê xwe de her weha dihizirî, bi vê yekê re pir kêfxweş dibû. Lê car bi car jî gava ku dihate xwe, dimeyizand û Dîlberê ne li nig wî ye, gelekî lê giran dihat. Gava ku dihate xwe, kûr û kûr dikete di hiziran de. Her weha di vê rewşê de hê bêhtir êş dikete di dilê wî de. Ji ber ku ew li nig xwe dihizirî û pişt re dihate xwe û didît ku ew ne li nig wî ye. Vê yekê gelekî tesîreke mazin li ser wî çêdikir. Di wê heyamê de wî xwe hinekî bêçare didît. Ew bêçaredîtin jî jê re gelekî dibû weke êşeke mazin di dilê wî de. Di dil de beçareyî jî nexweşiyekê bêhtir êşeke jî dide mirov bi hebûna xwe re. Ew êşa ku mirov dide erdê û dike nav kul û eleman de bi vê bêçareyiyê re dest pê dike. Bêçareyîtî gava ku di dil de bû, êdî di dil de riheki jî dide avakirin. Gava ku rihê bêçarebûne hat avakirin, êdî mirov dikare bêjê ku ketin dest pê dike. Di dilê evîndariyê de hestê bêçareyiyê weke birînekê ye. Bêçareyî gava ku bi hest û bi rih bû, êdî di hûndur de mayin dibe. Dilşad di serê xwe de xwediyê gelek hizran e ku pê gavên xwe avêtibûn. Lê wê kêlîkê sekinîbû û dihizirî ji xwe re. Dilşad riyeke dirêj qet kiri bû çûbû nav şahiya Newrozê. Li wir bi Dîlberê re hevdîtin çêkiri bû. Pişt re careke din ketibû ser riya xwe de û hati bû malê. Nuha ji li mal bû û di fikaran de bû. Di wan deman de xew neketibû çavên wî de. Nuha dem ber bi sibehê ve bû lê hê ew şiyar bû û li ser cihê xwe rûniştibû. Xew ne dikete çavan. Gava ku hati bû malê jî bêhtir tiştek ne kiri bû rast e rast riya odeya xwe girti bû û çûbû û xwe di odeya xwe de dirêj kiri bû, lê xewa wî ne dihat. Her weha piştî ku hati bû odeya xwe ji bo ku razahê, lê xewa wî ne dihat. Hema li ser ciha xwe dirêj kiri bû û dihizirî ka ma diviya bû çi bikira. Bêguman diviya bû bihizire, ji ber ku di navbera

malbata wî de û di malbata apê wî de nexweşî jî hebû. Ev yek jî diviya bû ji aliyê wî ve pir mazin bihata hizirandin.

Dilşad diviya bû bihizire ku ta çareseriyekê jî bidîtina ji ber ku careke din Dîlberê bidîta. Her weha di hundurê Dilşad de weke ku li ser êgir germ bibe bêsebir bû. Wê çi kiri bana ku ta ku careke din Dîlberê bidîtina? Dîlberê her weha di wê kêlîkê de di serê wî de bû. Hizra wî li wê bû. Çi kiri ba ji hizir û ramana wî ne diçû ser tiştekî din di wê kêlîkê de. Bi vî awayî re mirov dikare bêjê ku hem ji aliyê hestên wê pir şad û bi kêf bû û hem ji aliyê hiziran ku di serê xwe de dikir ku weke wê çi bibe her weha dibe kifşbûnek. Ev bêkifşbûn ruhê wî teng dikir û gelekî eşkere mazin ji dixiste di dilê wî de. Car bi car ji ber ku ew xwe ji wan bêkifşbûn û tangasiyên ku pê re çêdibûn xwe dûr bike û hew bike pir tahb dida xwe da ku tenê li ser şahiya ku di dilê wî de heye, bi Dîlberê re bifikire û xwe ji tengesiyan û bêkifşbûnên ku çêdibûn, hew bike dida zorê li ser xwe di serê xwe de. Lê belê ewan nekifşbûn û tengasiyên ku bi wî re xwe didan rû, xwe dûrxistin ji wî re zor dibû. Wan bêkifşbûnî û tangesiyan zoreke pir mazin didanê de. Zora ku pê re xwe dida nîşandan di ser û dilê wî de bi wî re xwe dida der di wê heyamê de. Dilşad mirovekî ku bawermend bû. Mirov jî wî her weha nas dikir. Gava ku diçû derve ji xwe re digeriya û mirov ew didît û wê bi vê dîtinê re nêzîkatiyên ku jê re dihatine kirin, lê dihate meyizandin, ev yek pir baş û mazin dihate dîtin. Mirov gelekî nêzîkatiyeke mazin û gelekî bi rêz jê re didan nîşandan. Mirov hez ji wî dikirin ji ber vê yekê jî çavên wan li ser wî bû. Bi ciwanî û hebûna xwe re ji mirovan re weke mînakeke ku mirov her dem bala xwe didinê de û lê dimeyizandin. Mirov jî bala xwe didan ser wî di wê demê de. Mazinayetî bi wî re di nav mirovan de bi du aliyan re dihate şirovekirin. Bi aliyekî re ciwanî û nêzîkatiya wî dihate şirovekirin. Bi aliyê din re jî hizir û hebûna wî ya di nav mirovan de dihate şirovekirin. Di nav mirovan de rûniştin û hizrên xwe ji mirovan re hanîna ser ziman, ji aliyê hizir û raman ve mazinatiyekê dihêne ser ziman. Dilşad bi vî awayî re gava ku dihate şirovekirin, mirov didît ku xwediyê kesayetiyekê ye ku xwediyê zanebûnê ye.

Dilşad gava ku divegere  malê de di dilê xwe de gelekî teng

dibû. Bala wî piştî vegerandina wî ne diçû li ser tiştekî ku bikira. Dîlberê di mejiyê wî de bû. Wê şevê ku vegeriyai malê her weha ta sibehê şiyar mabû li ser xwe di odeya xwe de. Gava ku dem gihabû ber sibehê ji nav cihê xwe rabûbû ser xwe. Bi wê zûrabûnê re bala mirov diçû ser wî ku çima her weha zû rabûye. Dilşad rojên din jî zû dirabû ser xwe ji nav cihan. Lê wê rojê di rewşa wî de cûdatiyeke ku xwe baş dida ber çavên mirov hebû gava lê dihate meyizandin. Ji mala bi ahlê malê hemûkan ve her weha ev cudabûn kifş dikirin. Mirov hema li hevberên wî disekinîn û lê dimeyizandin. Lê çi kesekî ni zanibû ku ka ma çi bi Dilşad re hebû yan jû tune bû. Dilşad zû rabûbû ji nav cihên xwe û bêdengiyek li ser wî hebû ji ber vê yekê jî ev bêdengî ji mirov re asayî ne dihat. Bêdengiya ku pê re bû jî hê bêhtir bala mirov dikişand ser wî di wê heyamê de. Dilşad gava ku zû rabûbû, çûbû ber hênikayiya sibehê ku hinekî ji xwe re bimîne. Şev jî xew ne ketibû çavan de. Ev yek jî ji rûdana wî pir baş û mazin dihate têgehîştin. Mirov gava ku li wî dimeyizand, di wê kêlîkê de gelek tişt ji rûdana wî fahm dikirin. Dilşad her weha gava ku lê dihate meyizandin dihate têgehîştin ku tiştên di dilê wî de hebûn, dihate û ew dikire di hiziran de. Dilşad kurê Sîwan beg bû. Sîwan beg jî birayê Heso Axa bû û ew jî mirovekî gelekî bi sifre bû. Sîwan beg mirovekî ku bi navseriya xwe re mazin bûbû. Sîwan beg birayê Heso Axa yê bin re bû. Lê bin Sîwan begê re hê du birayên wan ên din jî hebû.Ewan jî bi navê xwe yê dûrêne her weha navên wan Hamo û Simo bûn. Simo yê biçûk bû. Lê yê ku gelekî bi zanebûn dihate naskirin bû. Wî xwe dabû zanist da ku bixwîne û pêde biçe bibe zaniyar û alimekî mazin. Baweriya mirov jî bi vê yekê re ji bo wî hebû. Sîwan beg mirovekî gelekî hez dikir ku di nav sewalan de kar û bar bike û ji ber vê yekê jî, jê re navê Sîwan beg hati bû gotin. Lê wêki din jî navê wî yê ji dayikê jî Sîrwan beg bû. Lê mirov bi navê Sîwan beg re ew naskiri bû û di bakirinê. Her weha navê Sîwan jî jê re bû bû weke navê wî ye navokê di demê de. Heso Axa gelekî hez ji Sîwan begî dikir. Lê jêv cûda bû bûn. Sedema cudabûna wan ji bi guftûgoyekê re çê bû. Rojêkê li nig bavê xwe herduyên rûniştî bûn û dikevin guftûkyekê. Guftûgoya wan jî li ser dayika Dilşad bû.

Gava ku Sîwan û Kokanar hez ji hevdu dikin Heso Axa li hevberê wan dirabe. Bavê wan bêdeng dimîne di wê heyamê de. Lê Heso Axa bêdeng na mîne. Heso Axa jî ji ber ku di navebra wan û malbata Kokanarê de li ser hinek erdan pirsgirêk derketi bûn loma jêv dûr keti bûn. Lê gava ku Sîwan beg behsa Kokanarê dike û dibêjê ez hez jê dikim, êdî li wir li bavê xwe Heso Axa û ew dikevin guftûgoyê. Di wê heyamê de gotin ji devê Heso Axa difilite û dibêjê Sîwan beg 'vebre, bese li nig bavê min her weha ne peyive!' Piştî vê gotinê Sîwan beg dilê wî di vê gotinê de diêşe û diçe û êdî ne divegerê malê. Pişt re ku di navbera malbate Sîwan û Kokanarê lihevhatin çê dibe dîsan ew na vegere. Ew ji êdî mala xwe ava dike li nêzîki mala beve xwe di navbera herêma malêbavê xwe û herême malbavê Kokanarê de. Dilê wî ranagire ku here cihekî din yê dûr. Ji bo ku ji wan dûr ne keve li wir di rex wan de dimîne. Piştî ku Kokanarê û Sîwan beg digehîjine hevdu ji ew erdên ku li ser pirsgirek heyî jî, ji Sîwan û Kokanarê re dimîne. Ewan ji li ser wî ardî malê ava dikin. Gava ku Sîwan malê li wir ava dike êdî ji wê demê pê de gelekî mirov jî mala xwe birin nig malê wan. Di demê de dibine weke eşîrêke mazin di wir de. Navê herêmê ji Sixqê weke ku mirov bi navekî din jî digotin Sarinckê bû. Herêmek pir mazin û xweş bû. Mirov ji bo şevînê sewalên xwe jî dihanîn wê derê di demên sevînê de. Wekî din jî herêmeke ku ji aliyê siniyatiyê ve jî pir dewlêmend bû. Ji aliyê kerengê, tolîkê, xerdelê, qifaran, sirdanokê, nefelê û hwd gelek tîpên giyayê cûr bi cûr lê şin dihat. Nefelê wê derê mazin dibû. Mirov ji wê nefelê reşî jî çê dikirin ji sewalan re û dihilandin. Ji bo sewalan jî li ser latan jî ji bo weke dalavên bi kar bihênin cihên xwarina sewalan jî hati bû çêkirin. Bi vê yekê re jî nigekî ava jî di wir de diçû. Li gelek cihan jî mirov ji xwe re ji bo ava weke bîran an jî colcûlekan çêkiri bûn. Ji xeynî vê yekê jî li cihên ku av ji binê erdê derdikeve, ji kezin hati bûn çêkirin û di wan kezinan de mast di kîs de dihiştin. Cihên ku zebeş dixistin di nav avê de ji bo nigidandinê û hwd, hati bûn amadekirin. Her weha bi vî awayî re mirov dikare bêjê ku cihê ku Dilşad û malbata wî têde dijiyan pir xweş bû. Gava ku mirov ji dûr ve li wê derê dimeyizand, mirov digot qey xweza ji bo jînbûna xwe

weke merşeke rast kiriye, dihate xuyakirin. Gava ku mirov ji dûr ve lê dimeyizandin jî ew malên ku hati bûn çêkirin di nav wan daran de bi hev re û bi wê sinatiyê re dîmenekî ku ji mirov re gelekî xweşîk dihat ber çavan. Ji bo jiyanê jî her weha ji her alî ve derfetên mazin hebûn. Her kirinek di nav wê jiyanê de bi awayekî xwezayî re bi kar û barê xwe ve diçû û dihat. Riya çi kesekî li ya çi kesekî ne dibû asteng. Her kesek di rewşa xwe de diçû û dihat. Her weha mirov dikare bêjê ku piştî ku Sîwan beg li wir bi cih bûbû êdî pişt re pergala jiyanê jî li wir hati bû avakirin. Merc û hoyên jiyanê jî li wir mazin bûn ji ber vê yekê jî zû li wir bûbûn mirov û gelek û pêş ve diçûn. Dilşad demên xwe bi piranî li wir dibuhurandin. Lê bi gelek jî li aliyê mala apê xwe dima. Gelek hevalên wî hebûn li wir .Car bi car li wir dihatine nig hevdu û ji xwe re dirûniştin û dema xwe dibuhurandin. Car bi car jî li cihê mala Dilşad digihan hevdu û ji xwe re digeriyan li beyaran. Li nêzîkê wan daristaneke jî hebû. Gelek caran jî ji bo nêçîrê diçûn nêzîki daristanê bi hev re.

Dilşad wê sibehê zû rabû bû û xwe bû ber hênikayiya sibehê ji der ve. Sibeh li wir gelekî xweş dibû. Sibehê gava ku hê ji nûke ve dihate rabûn, xwezayê bêhneke xweş bi dimena xwe re dida mirov. Lê wê sibehê hizra Dilşad ne li wir bû. Gava ku zû rabû bû çû bû ber sintekê ji xwe re bi têne rûniştibû bû.  Ta ku tav derketibû û her der hêdi hêdi germ bûbû li wir mabû. Piştî germê re êdî ew jî ji cihê xwe rabû bû û çûbû hindûrû de ku taştêya xwe bixwe bi bavê xwe re. Lê bi hizir bû. Gava ku hat hundur jî dît ku bavê wî ji xwe kar dikir ku li ser xwarina taştê rûne. Gava ku hat hevberê bavê xwe jê re rojbaş got û pişt re ew jî çû û li nig bavê xwe rûnişt li ser sifra taştê bi wî re. Bavê wî gava ku ew rûnişt lê meyizand. Lê ji wî re çi gotin ne got. Her weha bêdengî li ser sifra xwarinê hebûna xwe berdewam kir di navbera wan de. Dilşad li ser sifrê pir bi hizir dihate xuyakirin. Bavê wî devê xwe vekir weke ku bipeyive bi wî re nê ne dipeyivî, tiştê ku di serê wî de jî her weha di serê wî de ma. Hizra ku bavê wî ku di serê xwe de çê kir ku her weha jê re bêjê dîsan bi xwe re di serê xwe de hêşti bû û ne goti bû. Dilşad ta ku li ser sifra taştê bû çi gotin ji nav lêven wî derneketin. Bavê wî car bi

car berê xwe dida Dilşad û li wî dimeyizand. Her carê ku lê dimeyizand jî weke ku bixwaze tiştekî jê re bêjê lê dimeyizand lê tiştek ne digot. Dilşad gava ku ji nav şahiyê ji bo ku wherê malê derdikeve bi hevalên xwe re piştî dana razanê digihê malê. Lê bi sibehê re hê dana paza rabû bû û li ser lingên xwe bû. Bavê wî gava ku li ruyê wî dimeyizand, fahm dikir ku bi şeve xew ne ketiye çavên wî de, ta wê kêlîkê ku li nig wî li ser taştê sekinî bû. Gava ku sibehê Sîwan beg dirabû ser xwe de amadekariyên xwe dikirin û dihate ser sifrê de da ku taştê kiri bana. Piştî taştê hat xwarin êdî Sîwan beg li odeya mazin ya civatê dirûnişt û hêdi hêdi civata wî lê digaha hevdu. Gava ku civat li hev giha êdî ew derdikete ji derve û diçû nig hevalên xwe ji bo ku bi wan re were nig hevdu. Piranî jî derdiket diçû nig hevalê xwe yên ku li nig saydayê wî dixwandin. Piştî demê taştê hevalên wî piraniya li nig seyda li hev digahan û fêrên xwe dihildan. Dilşad gava ku diçû li nig seydayê xwe, her weha piraniya di demê fêran de diçû da ku li fêran guhdar bike. Ew bi xwe re jî dema fêran bingeh buhurtibû bû. Ew gihabû demê ku pitûken mazin bixwêne û li nig seydayê xwe û di nav hevalên xwe de li ser wan pitûkan bipeyive. Hevalên wî, hinekan ji wan piştî ku perwerdeya xwe ye bingehîn hew kiri bûn êdî çûbûn Cizîra Bota ji bo ku perwerdeyeke hê maztir hildin. Gelek caran bavê Dilşad jî di nav axifçinên xwe de gava ku bi wî re dipeyivî digot ku divêt tu jî herî Cizîra Bota. Mirov navê Melayê Cizîrî hez kiri bû û çend mirov bi zanebûn jî bû dihate zanin ji aliyê mirovan ve. Her weha zanistvanên mazin li Cizîra Bota dimînin. Berî hingê hinek suwarên Mîrê Bota di wir ve çûbûn. Mirovên ji herêmê, her weha gelek mirovên ciwan bi wan re şandi bûn  Cizîra Bota. Gava ku suwaren mîr di wir ve hatiba û ciwan bi wan re çûba wî çaxî ji bo ewlekariyê ciwanên baş hebû. Her weha car bi car suwarên Mîrê Bota digeriyan li herêman. Mirov gava ku ew didîtin jî bi wan re bi dilrehetî zarokên xwe dişandin. Her weha carekê gava ku suwarên mîr di wir ve diçin, hinek hevalên Dilşad jî bi wan re çûbûn Cizîra Bota ji bo xwandina xwe berdewam bikin. Gava ku hevalên Dilşad çûbûn wî çaxî hê Dilşad fêrên bingeh dihildan. Lê li ber hewbûnê bû. Sedayê wî jî mirovekî ku perwerdeya xwe ya mazin li Cizîra

Bota hildabû. Seydayê wî demeke dirêj li Cizîra Bota mabû ji bo fêrbûna zanist. Navê seyda Feqî Seîd bû. Lê piştî ku perwerda xwe ya bingehî hew dike, pişt re mirov jê re digot Mele Seîd. Mele Seîd mirovekî ku zanebûna xwe pêş xistibû Di zanista zanebûnê de xwe kûr kiri bû. Lê mirov ku bêhtir pêwîst ne dîti ba ne dipeyivî. Mirovekî  bêdeng bû. Baweriya mirov jî gelekî lê mazin bû. Dilşad li nig wî bingeha xwe ya perwerdê hilda bû. Dilşad gelekî hez ji seydayê xwe dikir. Mele Seîd mirovekî ku bi Melayê Cizîrî re ji mabû bû. Lê gelek kal bû bû. Ji aliyê zanist ve bihêne an ji ji aliyê kalbûne ve jê re rez dihate girtin. Gelek caran jî di nav civata mîr de rûniştî bû û dipeyivî. Mirov gava ku dipeyivî jî pir lê dihesandin. Ew rewşa wî ya bêdengiyê jî jê re di nav civatan de yan jî li dûrên wî dijiyan, dibû bingeha rêzeke mazin ji bo wî di nav xelkê de. Mirovekî xwediyê hizra rast bû. Gelekî li ser xwendina mirov ku li nig dixwandin di dirawestiya. Bi gotin û zimanê xwe re fêrên ku didan baş û qenc dida rewakirin.

Dilşad gava ku bi bavê xwe re taştê xwari bû û hinekî ji li nig rûnişti bû pişt re çûbû nig hevalên xwe yên ku dixwandin. Piştî ku wan jî xwandina xwe hew kiri bû, êdî dabûn rex hevdu û derketibûn derve bi hev re. Dilşad jî û hevalên wî jî mirovên ciwan bûn. Gava ku bi hev re ne çûban nêçîrê yan jî her weha dernên din, dihatine nav civatê û ji xwe re dirûniştîn li gotina mirovên mazin dihesandin. Ew jî êdî mirovên mazin bûn û simbêlên wan derketi bûn. Gava ku simbêlên wan dest bi derketinê dikir, êdî ew jî ji mazinan dihatine jimartin. Êdî biçûk ne dihatine dîtin. Her weha ji wan êdî hêviyeke mazin dihatine kirin. Gava ku her weha simbêlên wan derdiket, êdî hêdî hêdî diviya bû ku ew xwe li ser linga bigirtana di jiyanê de. Ji wê demê pê de êdî kêmasiya ciwanan jî weke yên mazin dihatine rexnekirin. Nêzîkatiyeke çawa li mazinan bi hatine kirin. Êdî li wan jî her weha nêzîkatiyeke wilo mazin dihate kirin. Gava ku yekî piştî vê demê wir de êdî kêmasîyek kiri bana jê re dihate gotin ku ’ne êdî simbelê te derketine!’. Wateya vê gotinê jî her weha ’êdî tu mazin î û divêt tu bibe xwedî berpirsiyariyan ku li pêşiya te ne, ma çima çi her weha bêberpirsiyar tu digerî’. Demê simbêl derketinê demeke weke ku ji

dema ciwantiyê derketin û ketina demeke nû dihate pêjirandin. Dilşad her weha di dema xwe ye ku mazin dibû. Hizra wî û dilê wî mazin bû. Mirovê ku ne berberpirsiyar bû li hevberê rastiyan û pirsgirêkan. Wateya rastiyê û jiyanê di serê wî êdî xwe girti bû. Bi vê yekê re mirov dikare bêjê ku mirov bizane û bi berpirsiyar jê derketibû. Ji malbata wî û ji mirovên dûrên wî ji hêdî hêdî hêvî jê dihate kirin. Gava ku gavên xwe di avêtin ji aliyê mirovên dûrên wî ve dihate dîtin. Qençiyek kiri bana mazin dihate şirovekirin û kêmasiyek jî kiri bana her weha mazin dihate şirovekirin. Her weha mirov heger bêjê ku ji aliyê kesayetiya xwe ve li ber çavan bû. Ji bo ku mirov her weha di ber çavan de were buhurandin tenê hebûna wî û zanebûna wî ne sedem bû. Ji xeynî wê yekê jî malbeta wî ji sereke bû û ev sedemek bû ji bo wî di vê rewşê de. Malbeta wî malbeteke ku bi nêzîkatiyên xwe re li ber çavan bû. Bi malbata xwe re ew jî li ber çavan bû. Ji vî aliyê ve jî li ber çavan girtina wî xwedî wate bû. Dilşad her weha ji gelek aliyan ve li ber çavan bû. Lê Dilşad divêt mirov bêjê ku di nav mirovan de ne weke kurê begekî yan jî her weha maleke mazin tevdigeriya. Mirov her weha bû ku li gor kesayetiya xwe ttevdigeriya di nav mirovan de. Mirov ev yek baş û qenc didît. Ji ber vê yekê jî hez jê dikirin. Mirov ku xwe mazin û qabih dîti bana di nav mirovan de bêhtir çi rêzê ne didîtin. Dibit ku li nig wan ne hatiba gotin ka mirovekî çawa ye. Lê bi nêzîkatiyan re mirov kûr dikir ku ew rastiyê bibine û fahm bike. Lê herêkirina wan jî bêguman di serên xwe de bêhtir ne dihate kirin. Herêkirin ku di serên de ne dihat kirin êdî sereketiya wan jÎ bi zorê re bidest meşê dikir. Têgehîştin û xwe dana herêkirin du taybetmendiyên ku di nav civakê de ji bo reveberiyan yên herî mazin bûn. Bê têgehîştin û xwe nedana herêkirin diketine reveberiyê de tenê li ser hêzeke bûyina xwe dida herêkirin. Di vê rewşê de jî zor ji bo pirsgirêkên çareseriya herî mazin dibe. Mala bavê Dilşad xwediyê hêzeke mazin bûn di nav civakê de. Lê bêguman rojekê ji mirov ne dît ku wî ji devê xwe derxist û got ku ez ji maleke mazin im. Mala mazin bi zanebûna mirovên malê re xwe bi wate dikir. Her weha zanebûna mirovên mazin hebû. Yê ku Dilşad di nav mirovan de xwedî rêz kiri bû jî,

her weha zanebûna wî bû. Di nav mirovan de zanibû bipeyive. Mirov ku di nav mirovan de zanibû bipeyive, ji xwe re rêz çêdikir. Lê bi vê yekê re nêzîkatî jî gelekî mijareke girîng e, ku divêt mirov bihêne ser zimên. Nêzîkatiyên wî jî xwediyê wateyeke mazin bûn. Bi nêzîkatiyên xwe re, ne xwe ji mirov dûrdixist an jî mazin dida nîşandan. Wê yekê jî wî di nav mirovan de mazin dikir. Mirovekî ku di nêzîkatiyên xwe de ji dil bû. Bi wan taybetmendiyên xwe re Dilşad di nav mirovan de xwe mazin kiri bû. Bi wan taybetmendiyên re gava mirov li kesayetiya wî dimeyizand, mirov didît ku xwe bi bingeh kiri bû. Li ser wî bingehî ku bi xwe re çêkiri bû, nêzîkatiyên xwe didane nîşandan. Mirov bi vê yekê re, rez didanê de. Mirovekî ku hê ciwan bû. Lê divêt mirov bêjê ku bi wan nêzîkatiyên xwe re mirovekî ku jê mazintir jî bûn, rêz didanê de. Gava ku çûbû nav şahiya Newrozê jî her weha ji ber vê yekê bû ku mirov çawa ku ew dîtibûn, ew dawetî rûniştina li nav mazinan kiri bûn. Vê nêzîkatiya mirov karÊ bi vÊ yekê re şirove bike. Dîlberê jî ji wan aliyên ve navê wê naskirî bû. Divêt mirov bêjê ku bi vî awayî re di dilê wê de cih girti bû. Dilşad di dilê wê de berî ku wî di şahiyê de bibîne cih girti bû. Lê ji ber ku malbetên wan jêv xeyidî bûn, tenê di dilê xwe de hêştibû. Ev xeyda malbatên Dilşad û Dîlberê bûbû bingeha bêdengiya wê di dilê wê de. Lê di serê wê de hêdî hêdî hizra wê jî mazin dibû. Her weha wêrbûna wê ji çêdibû. Dîlberê miroveke ku bi mejiyê xwe re miroveke ku gelekî şareza û qenc bû. Her weha dihate naskirin.

Dilşad û Dîlberê hê ji biçûkatî ve hevdu nas kiri bûn. Zarokatiya wan bi hev re mazin bû bû. Di demên zarokatiya xwe de gelekî bi hev re bûn û di leyistin. Lê piştî ku di navbera malbatên wan de xirabûn çêdibe, êdî jêv diqacihin. Lê çend dem jî ji ser hev veqetîna wan re diçe jî, dîsan hevdu ji bîr na kin. Kesên her weha bûn, ku hê di biçûkatiyê de hevdu nas kiri bûn. Dîlberê miroveke ku gelekî bi hest bû. Kesayetiya wê kesayetiyeke bi hest bû. Mirovên bi kesayetiya bi hest, zû bi zû tiştên ku pê re ne, dihênin jînkirin. Dîlberê jî her weha ji zaroketiya xwe ve çi jîn bû bû di mejiyê wê de bû. Dilşad jî her weha mirov dikare bêjê ku yekî bi kesayetiya hestperwer bû. Mirov dikare di vê xalê de ji bo wî bêjê

ku mejiyê hestiyar bi wan re peşketî bû. Mejyê hestiyar bingehekî xurt bi wan re dabû avakirin. Ji ber vê yekê bu ku gava Dîlberê û Dilşad hevdu dîtibûn, weke ku berê gelekî hevdu dîtibûn li wan hati bû. Gava dihênin hevberê hevdu bi Dilşad re jî û bi Dîlberê re jî ji bo hevdu hestiyariyeke hevnasîn a mazin xwe bi wan re dabû nîşandan. Bi meyizandinekê ku te digot qey ji dema ku ji hevdu qatahane, li hevdû dihizirîn, li hevdû dimeyizandin.

Dilşad ji şahiya Newrozê bi hestiyariyeke mazin vegeriya bû malê. Gava ku vegeriya bû malê jî mirov hemû jî fahm dikir ku cudatiyek pê re heye. Piştî şahiyê û dîtina Dîlberê re cudatiyeke mazin bi Dilşad re çêbû bû. Piştî şahiyê pê re bêhadanî mazin bû bû. Li ser taştê bavê wî ev yek baş û mazin fahmkiri bû. Dibit ku bavê di wê heyamê de wî gava karkiri bû ku bipeyive hingê jê pirsîba, ka ma sedema vê bêhadanbûnê çi ye ku xwe pê re dide xuyakirin. Lê wî jî tiştek jê ne pirsî bû. Her weha tiştê xwastibû ji wî bipirse yan jî gotibana di serê xwe de hêştibû. Lê mereq jî pê re hebû, ji ber ku ka ma çima her weha Dilşad bêdeng bû. Lê xwe bi mêreqa xwe re hêştibû. Carina mereq xwediyê zoreke pir dijwar e. Gava ku mirov xwast bipirse û mirov ne pirsî wî çaxî dijwaritiya mereqê dest pê dike. Bi bavê wî re jî her weha mereqa dijwariyê xwe bi xwe re hêşti bû. Dilşad gava ku bi bavê xwe re rabû bû çû bû odeya rûniştinê jî carekê bavê wî karkiri bû ku jê bipirse, ka ma çiyê wî heye, lê dîsan xwe girti bû û tiştek ne pirsî bû. Dibit ku li hêviya wî bû, ku ew bi xwe jê re tiştan bêjê. Lê Dilşad ji hizra wî wê kêlîkê ne li wir bû ku vê yekê fahm bike. Di serê xwe de hizra wî li ser Dîlberê mabû. Dîlberê gelekî di ser û dilê wî de cih girti bû. Piştî ku civatê bavê wî lihev gihabû hevdu û pişt re ew jî ji wir karkiri bû ku veqete here nig hevalên xwe, lê hê jî bavê wî li hêviyekê bû ku ew bi xwe tiştekî jê re bêjê, ka ma çi bi wî re heye. Lê Dilşad jê re çi gotin ne gotîbû û ji nig veqetiya bû. Rewşa wî bavê wî jî kiri bû nav fikaran. Ne bavê wî û ne ji mirovên ku ew nas kiri bûn berê hingi Dilşad her weha bêdeng ne dîti bûn. Ji ber vê yekê jî mereqan dikirin. Dilşad gava ku hati bû nig hevalên xwe jî her weha rewşa wî, ji rû û tevgerên wî dihate têgehîştin. Bi vê yekê re bala wan jî çûbû ser wî di wê heyamê de. Weke hevalên wî

seydayê wî jî ji bêdengiya wî fahm kiri bû ku tiştin di serê wî de bûn. Seydayê wî gelekî ji vê yekê bû ku gava ku Dilşad dabû devê derî û hati bû hundurû û gava ku rûniştî bû, gotîbûyê ma ti çawa yî. Lê Dilşad gelekî bi hizir bû. Dilşad her weha weke qederekê bi hevalên xwe re dimîne û bi wan re digere. Pişt re ku dibe ber êvarê, êdî ew jî kar dike ku were malê. Lê ji rewşa wî dihate têgehîştin ku ne rehet bû. Bi ber êvarî re Dilşad ji hevalên xwe diveqete û tê malê. Lê hevalekî wî jî pê re tê malê. Ew hevalê wî yê ku pê re tê malê hevalek ji wan hevalên wî ye ku di şahiyê de pê re bû. Dilşad gava ku bi hevalê xwe re hat malê, bi hevalê xwe re buhurîn odeya mazin, ya ku di rex odaya civatê de ye, lê ji bo xwandin û nivisînê bi kar dihate hanîn. Dilşad bêdeng bû. Wê kêlîkê çi gotin ji nav lêvên wî ne derdiketin. Dilşad gava ku bi hevalê xwe re buhurtin odeyê bi hev re li wir hinekî rûniştin û ji xwe re peyivîn. Dilşad bi hizir bû. Dilşad û hevalê wî di odeyê de weke heyamekê mebûn. Di odeyê de rûniştî bûn û ji xwe re dipeyivîn.

Dilşad û hevalê xwe yê ku pê re ye bi hev re weke heyamekê li odeyê dimînin, êdî pişt re ji odeyê derdikevin. Gava ku ji odeyê derdikevin dihên odeya ku lê civat kom dibû. Bavê Dilşad jî li hevberê wan di nav mirovan de bû û ji wan re dipeyivî. Dilşad û hevalê wî jî gava ku rûnişti bûn, çi deng ji wan ne diderket. Bêdeng di cihê xwe de rûnişti bûn û dihesandin. Dilşad dikir ku guhê xwe bide axiftinên bavê xwe, lê wê kêlîkê ev yek weke ku jê re hinekî zor dihat. Di serê wî de hinek mijarên din hebûn û hizrên wî li ser wan mijarên bû. Vê yekê jî ne dihişt ku kari ba ku li ser axiftinên di civatê de dihatine kirinê bihizire. Dilşad di cihê xwe de rûnişti bû û car bi car jî ji xwe ve diçû di cihê xwe de. Hevalên wî yê ku li rex wî rûniştî bûn, car bi car jî fahm dikirin, ku Dilşad di serê xwe de çûye derne din. Gava ku ev yek ji aliyê hevalê wî ve dihate têgehîştin, hevalê wî jî destê xwe li milê wî didan û ew bi bal dikirin li ser peyivtinên ku dihatine kirin di wê heyamê de. Lê gava ku li Dilşad dihate meyizandin, dihate têgehîştin ku lê zor dihat ku hizra xwe bide li ser dora xwe û bihesîne. Lê wî ji dida xwe da ku xwe bide hesandin. Wî li wan mirovên ku dipeyivîn dihesand, lê belê bala wî jî ne li wir bû û ne li hawîrdora wî bû. Dilşad mirovekî

zane bû. Ji xeynî vê yekê jî ji aliyê rêzdayin- û hildanê ve jî, mirovekî ku baş dihate naskirin bû. Nêzîkatiyên wî baş û mazin dihatine dîtin. Dilşad kurê Sîwan beg bû û li nig Mele Seîd xwandibû. Ev herdu taybetmendî bi serê xwe re jî, wî baş û mazin dihanî ber çavên mirovên ku li dora wî bûn. Gava ku di nav civatê de rûniştî bû jî, dihate dîtin, ku bala wî li hinek kesan bû, ku di nav civatê de rûniştine. Ev yekê wî ji gava ku li hawîrdora xwe dimeyizand, fahm dikir. Gelek caran jî gava, ku li dora xwe dimeyizand, didît ku bala mirovan li ser wî bû. Wî jî weke ku ji wan re bide nîşandan, ku bala wî jî li ser wan e, deste xwe dibire ser simbêlên xwe û bi rewşekê re ku weke ku li ser gotinên wan dihizirî.. Her weha Dilşad ta ku civat li dar bû, li nav civatê mabû rûniştibû bi hevalê xwe re. Ber bi dana razanê ve civat êdî dest bi ji hev belavbûnê dikir. Gava ku bû dana razanê, civat hemû ji hev belav bû. Gava ku civat tev rabûn û çûn ber bi malên xwe ve, êdî Dilşad jî karê xwe kir ku here odeya xwe ya razanê û xwe dirêj bike. Gava ku civat tev ji hev belav bû û mirov dest bi çûna malên xwe kirin, êdî Dilşad jî ji bavê xwe re şevbaşî xwastibû û çûbû odeya xwe ji bo ku xwe dirêj bike. Dilşad gava ku ji odaye civatê derket, hevalê wî jî bi wî re derket. Hevalê xwe bire ta devê derî û lê şevbaşî kir û ew jî vegeriya û çû odeya xwe ji bo ku xwe dirêj bike. Lê xew jê re tune bû. Hinekî wastahî dihate xuyakirin. Di serê wî de gelek hizir û efkar hebûn. Ji ber vê yekê jî di serê xwe de ne rehet bû. Gava ku hati bû odeya xwe tenahî bi dilê wî wê kêlîkê girti bû. Tenahî ku êş didayê de, lê serwer bû bû. Çi kiri bana ku wê xwe ji wê tenahiyê hew kiri bana? Bersiva vê pirsê di serê wî de weke ku bi bersiv bû û ne bê bersiv bû. Gava ku Dîlberê dihate bîra wî, weke ku bersiva pirsê di serê wî de çêdibû. Lê gava ku di wê rewşê de xwe bi têne didît jî, êdî weke ku pirs bêbersiv maba lê dihat. Gava ku ew dihizirî kûr û kûr dihizirî. Di serê xwe de gelekî kûr diçû û dihizirî. Her weha piştî ku hati bû odeya xwe ya razanê û xwe li ser cihê xwe dirêj kiri bû, giraniyekê jî pê re dest pê kiri bû. Xew li ser çavên wî weke ku ne bû. Mejiyê wî ji gelek aliyan ve dihizirî û bi lebat bû. Li ser cihê xwe dirêjkirî li ser xwe re dimeyizand û dihizirî. Esreqe weke ku wêneyên li ber çavan wî

çike lê dihat. Li esreqe gava ku dimeyizand, di serê wî de gelekî wêneyên bi hizirên ku di serê wî de hebû çêdibûn. Ewan wêneyan jî gava ku di serê wî de çêdibûn, wî di nav fikaran de kûr dibirin û dibirin. Esreq wê kêlîkê li ber çavan wî dibû weke tabloyekê gelekî mazin. Ji hizirandinê êdî gelekî westiya bû. Bi meyizandina li esreqe re hêdî hêdî giranî xwe di ser wî de diberda. Heyamekê, bi hizir û ji xwe çûndinê re û bi meyizandinê re dikeve xewê. Ketina wî ya xewê ji wastandina wî dihat.

Ew şev Dilşad ta ber sibehê dimîne razahî. Lê ku hêdî hêdî rohnî derdikeve êdî ew jî ji xewê dirabe ser xwe. Lê gava ku ji xewê rabû bû, hê çi kesek ji xewê ne rabû bû. Gava ku şivanên kar kiri bû ku sewalên xwe ji koxan derxin, dengên wan diçû wî di wê heyamê de, êdî ji wî dengî ew ji xewê rakiri bû. Gava ku Dilşad ji xewê rabû bû, serê xwe rakiri bû û teqînek da bû ji derve. Gava ku Dilşad diq kiri bû dîtibûn, ku şivan sewalên xwe ji koxan derdixistin, ku bibin çolê. Çend pezên wan ji koxan derdiket tura tura şivanan jî bêhtir dibû. Pezên wan gava ku derdiket, weke tura tura wan fahm dikir, ku wan bi kîjan aliyê ve dide, ew jî bi wî aliyê re riya xwe digirtin û diketine di ser rê de û diçûn. Gava ku pezên hemûkan derket, êdî ji êvarî ve hê pezên ku nû hatîbû duhçin xatûnên ku sîtil di destên wan de, dihatin da ku pezên bidoşin. Gava ku pezên ku dihate dotin, êdî weke heyamekê ku çêlek bihêne, golikên wan diberdan berde, ku hinekî bimihên. Lê ku mih bihêne berxik û bizin jî bihêne kahrikên wê diberdin da ku herien hinekî bimihênin. Lê pezên ku ne dihate dotin,weke gîskan jî dihatine neqandin û derxistin ber pezên ku wêrin dotin. Bi vê yekê jî re gava ku pezên ku ne dihate dotin weke beranên, nêriyên û gayên hê zû dihate derxistin. Ji koxa sewalên mazin û yên ku ne dihatina dotin jî, her weha weke nêriyan û baranên, conegayên û nahkunan jî zû dihatine derxistin. Sewalên ku ne dihat dotin, li hêviya sewalên ku dihate dotin ne dihat hiştin, ku bi hev re bê derxistin. Gava ku li hêviya hevdu hatiba hiştin, êdî wê hinekî ji wan re zahmet bûba. Ji ber ku ne be zahmet jî, weke komeke ku neyêne dotin pêşî û yê ku dihate dotin jî pişt re weke komek dihate derxistin. Her weha ji ber ku nebe zahmet ji wan re di serî

de. Bi vî awayî re naqandinek dihate kirin. Ev naqandin jî ji êvarî ve dihate kirin. Şivanên her weha zanibûn ku ka wê çawa bikin.

Dilşad gava ku rabû ser xwe û xwe amade kir ku derkeve ji derve. Lê berî ku derkeve jî çawa ku xwe amade kiri bû li ser keviya nivînên xwe bêdeng rûniştibû. Bi rûniştina xwe re gelekî dihizirî. Dilşad her weha weke heyamekê li ser kaviya nivînên xwe rûniştî bû û ketibû nav fikaran de dîsan. Dengên xatûnan û zarokan gava ji derve hinekî bêhtir bûbû, êdî li dengên wan hati bû ser xwe ji xweveçûna xwe de. Dilşad gava ku hat ser xwe ve êdî ji ser nivînên xwe rabû û berê xwe da devê derî û derkete ji derve daku here hinekî behn bi wê hênikayiya sibehê re bikişêne hundurê xwe de. Dilşad gava ku derkete devê odeya xwe bi bavê xwe re rû bi rû hat. Bavê wî ji rabû bû û kar kiri bû ku here ji derve hinek behn bistêne ji xwe re. Gava ku Dilşad bavê xwe dît, jê re got rojbaş. Bavê wî jî jê re got roj baş. Pişt re gihane hevdu û dana rex hevdu û çûn derve da ku hinek saqe ya paqij bikşênin di hundurê xwe de. Dilşad û bavê wî dana rex hevdu û çûnen ji derve û ji xwe re hinekî li bin wê saqeye hinik dest bi gerandinê kirin. Bavê Dilşad gava ku di rex wî de dimeşê, lê bi meyizandineke ji dil lê meyizand. Pişt re bavê Dilşad li ser wî zivirî û jê pirsi; 'kurê min ma tu çawa yi?' Dilşad li bavê xwe zivirî û bersiva wî da û got 'ez baş im yabo.' Bi vê bersivê re bavê Dilşad weke ku xwast ku fêr bibe, ku ka ma çi bi wî re heye. Lê Dilşad tiştek ne goti bû. Piştî wê pirs û bersivê re, bêdengiyeke kin di navbera wan de çê bû. Dilşad ew bêdengî xira ne kir, lê bi wê bêdengiyê re li bavê xwe meyizand, weke ku bixwaze jê re tiştekî bibêjê. Lê çi gotin ji nav lêvên wî ne derketin. Her weha di meşê de weke du sê caran Dilşad bi wate li bavê xwe meyizandi bû. Bi vî awayî re weke heyamekê bêdeng ji xwe re di bin saqeya sibehê de geriyan. Piştî ku tav hinekî derket, êdî ew jî berê xwe dane hundurû ku herin taştêya xwe bikin. Wan jî bi vê yekê re berê xwe dane hundurû û hatine hundurû ku taştêya xwe bikin. Gava ku hatine hundurû dîtin ku sifrêya taştê wa ye hati bû amadekirin. Dilşad û bavê wî bi hev re buhurîn ser sifrê. Dilşad hîna jî pir bi hizir dihate xuyakirin. Bavê wî jî vê yekê baş û qenc didît. Ji Dilşad ta wê kêlîkê tiştek di haqê vê bêdengî û hizirandina

wî de jê ne pirsî bû. Dibit ku li hêviyê bû ew bi xwe jê re bêjê, ka ma çiyê wî heye.

Dilşad bêdengiya xwe xira ne kir û tiştek ji bavê xwe re ne got. Her weha bi vê rewşê re taştêya xwe hew kirin bi hev re. Gava ku taştêya xwe hew kirin ji ser sifra taştê bi hev re rabûn û çûnen odaya civatê rûniştin. Dilşad jî bi bavê xwe re bû gava ku hati bûn odaya civatê ku ji xwe re rûnihên. Dilşad gava ku bi bavê xwe re hati bû odaya civatê bêdeng di kurçikekê de ji xwe re bi wê rewşa xwe ya bi hizir rûniştî bû. Her weha weke heyamekê di cihê xwe de bi bêdengiyekê re ji xwe re rûniştibû. Piştî heyamekê ku rûnişt êdî ji cihê xwe rabû ser xwe û berê xwe de devê derî ku here ji derve. Bavê wî kifş kir ku Dilşad wê derkeve. Wî jî bi dengêki nerm bang kiriyê de û jê pirsî; ’kurê min tê çi kê?’ Dilşad bersiva bavê xwe da û gotiyê de; ’yabo ez ê çime derve.’ Dilşad gava ku bersiva xwe da û berê xwe da devê derî û derket, gelekî bi hizir dihate xuyakirin. Gava ku derket devê derî, bi du hevalên xwe re rû bi rû hat. Hevalên wî lê meyizandin. Bi meyizandinê re slav dane hevdu. Lê çi gotin di wê heyamê de ji devê wan ne derketin. Dilşad gava ku li pêpeloken devê derî bû, berê xwe da bû cihê ku hespê wî lê dima. Hevalên wî jî gava ku ev yek dîtin, êdî wan jî da dûv wî. Gava ku Dilşad giha nig hespê xwe û kar kir ku seferê hespê xwe lê bike, hevalên wî jê pirsîn, ku wê çi bike. Dilşad gava ku hevalên wî jê pirsîn wî li aliyê cihê ku Dîlberê ve meyizand. Gava ku meyizand, hevalên wî têgehîştin ku wê çê ku. Wan jî karê xwe kirin, ku pê re herin, Dilşad gote wan ‘ma hûn ê wêrin çi kin?  Ne gerek e ku hûn wêrin!’ Lê dîsan hevalên wî gotinê de em ê werin. Gava ku her weha wan jî got em ê jî wêrin, Dilşad tiştekî din  ji wan re ne got. Hevalên wî gotin em ê jî werin, êdî ew jî çûn ku seferê hespên xwe lêkin û xwe amade bikin û pê re herin. Dilşad seferê hespê xwe li piştê kir û li ser hespê xwe suwar bû û kete ser riya ku here navenda ku malê bavê Dîlberê lê ye. Gava ku li hespê xwe suwar bû û derkete derve, çawa ku weke se çar gavan çû, êdî dît ku hevalên wî jî li ser hespên xwe, ber bi wî ve tên. Hevalên wî çawa ku ber bi çavan ketin, êdî gîhane wî û bi hev re ketine ser rê ku herin aliyê din, ku Dilşad bi Dîlberê re hevdîtinê çêke. Gava ku

hatine ser rê, êdî, hespên xwe dana bi bazdanê. Dilşad li ser hespê xwe bi Lezê diçû. Gava ku di wê heyamê de jî li ruyê wî dihate meyizandin, dihate têgehîştin ku gelekî bi hizir bû. Lê li ser hespê xwe gava ku diçû, dihate dîtin ku dilperiyeke mazin jî pê re hebû. Di wê kêlîkê de ruyê wî hinekî fihêtokî dihate xuyakirin. Dilşad ne mirovê ku ji xwe ne bawer bû. Mirovê ku ji xwe pir bi bawer bû. Ew fedya ku li ser ruyê wî dihate xuyakirin jî, ji dilperiya di dilê wî de dihat. Dilperiya di dilê wî de pir mazin dihate xuyakirin. Bi wê dilperiyê digot qey ne li ser hespê xwe suwar bû diçû, digot qey bi hespê xwe re bi bazînê diçû. Bazîn di dilê wî de bi wî re hebû. Lê gava ku mirov li ruyê wî di wê heyamê de dimeyizand, mirov didît, ku gelekî jî dihizirî. Li ser hespê xwe bêdeng û lezê re diçû. Li ser hespê xwe hevalekî wî kar kir ku bipeyive. Du sê gotin jî gotin. Lê vê yekê têne bi wî re ma. Dilşad di serê xwe de weke ku ji xwe ve çûbe dihate xuyakirin. Hevalên wî yên din jî êdî bêdeng man. Bi Dilşad re bêdengiyekê wilo dihate xuyakirin ku mirov digot qey ku dengek derketiba weke ku camek bişkê û bi şikestina xwe re, gelek qatên her weha wê ezmûneke pir mazin bihaniya bi xwe re. Dilşad li ser hespê xwe bi lêze re ber bi Dîlberê ve diçû. Her weha ku çend nêzîkê wê dibû û bi ber bi wê ve diçû dilperiya ku di dilê wî debû, hê bêhtir dibû. Xwîna laşê wî digot qey baz dide serê wî, her weha lê dihat. Bi rewşeke weha re Dilşad û hevalê wî gîhane nêzîkê malên ku navendê . Gava ku gîhane ber navendê êdî hespê xwe hinekî rawestan dan û hêdîke dest bi çûnê kirin. Dilşad hespê xwe hêdîka dimeşand. Hevalên wî jî bi wî re hespên xwe weke wî hêdîka dan meşandin. Gava ku gîhane nêzîki navendê, Dilşad li hevalên xwe meyizand lê çi gotinek bi deng ji nav lêvên wî ne derketin. Bi meyizandina xwe re weke ku bêjê wan hûn li vir li hêviya min birawestin, ta ku ez vegerim. Gava ku Dilşad li hevalên xwe meyizand, êdî li ber navenda wan pa. Ew bi xwe re li ser hespê xwe ber mala bavê Dîlberê ve çû weke heyamekê li ser hespê xwe bi meşînê diçe û bi çûna xwe re ku giha navendê li nig mala bavê Dîlberê, êdî ji hespê xwe peya bû û bi piyade çû. Gava ku her weha Dilşad digehê navendê, ew jî li ser hespê xwe peya dibe û bi piya ber bi mala bavê Dilbare ve riya xwe digire û

diçe ku here û wê bibîne.

Dilşad bi wê armancê hati bû ku wê bibîne. Lê ka wê çawa dîti bana? Wê jî li ser vê yekê gava li ser hespê xwe diçû, dihizirî. Ew jî hema wilo bi hespê xwe re tenê ber bi mala wê ve diçû. Her ku diçû, dilperiya dilê wî jî hê bêhtir dibû. Dilşad gava ku dikeve navendê de, hinek mirovên ku wî nas dikirin dibîne. Li nig wan diraweste. Hinekî bi wan re dirûne û dipeyive. Di wê heyamê de bi hevalên wî re jî gava ku li ser çûna wî re dem diçe û ne divegere, êdî ew meraqan dikin. Ew jî hinekî din jî dimênin û pişt re, bi hev re dihên ber bi navendê ve. Gava dihên û dikevin nav navendê de û ku hinekî jî dimeşin, dibînin ku hin kes û Dilşad li nig hev dirûnin û ji xwe re dipeyivin. Hevalên wî jî gava ku her weha wî dibînin êdî ew jî diçin nig wî û mirovên ku li nig rûniştine.Gava ku diçin, pêşîkê li wan slav dikin û pişt re li nig wan dirûnen. Hevalê wan ê mazin li hevalên xwe yên din meyizand û pişt re jî li Dilşad meyizand û karê xwe kir ku rabe. Gava ku li Dilşad meyizand, dît ku hinekî aciz e. Hevalê wan ê mazin hinekî bi jîr bû. Ew ji kurê serekekî bû û gotina bavê jî dihate hesandin. Bi wê kifşkirina xwe re, ew jî dikeve di hiziran de. Mala hinek xizmên wî jî, li wê navendê bûn. Piştî ku hinekî hizirî, li hevalên xwe û li mirovên ku dûrên wan rûniştine meyizand, kar kir destûrê ji wan bixwaze û here. Hevalên wî hinek çavan ku bê kifş lê meyizandin. Lê wan jî tiştek fahm ne kir. Gava ku destûr xwast, gote hevalên xwe jî; ‘ez ê behneke din wêrim’ û ji wir rabû û bi tenê kete rê û çû. Peyayekî ku li wir rûnişti bû li hevalê wî yê biçûk meyizand û pirsi ku; ’ma hevalê te çû ku derê?’ Wî jî ni zanibû. Wî jî li peyayî meyizand û got ku; ‘dibit ku here mala xaltîka xwe ya ku mala wê li vir e’. Piştî wê bersivê re êdî deng ji çi kesekî ne derket. Lê di serê hevalên wî de meraqa wî ya ku çûbû ku derê, hebû. Ew jî li nig hevdu rûnişti bûn û ji xwe re dipeyivîn. Dilşad hati bû ku Dîlberê bibîne. Lê mirovê mazin ew girti bû û li nig xwe dabûn rûniştandin. Tiştekî ku kiri ba jî her weha wê kêlîkê tune bû. Weke heyamekê li nig hevdu rûniştin û bi hev re dipeyivîn. Piştî heyamekê êdî hevalê wan ên mazin jî hat nig wan û rûnişt weke tiştek ne bûye. Ji ruyê wî dihate xuyakirin ku ew di serê xwe de xwediyê hinek hiziran bû. Lê çi di

serê wî de hebû, wê kêlîkê çi kesekî ni zanibû û fahm ne dikirin. Li bi vê rewşa ku bi wî re bû, hevalên wî ye din jî bi mereqan lê dimeyizandin. Gava ku wî jî li wan dimeyizand, weke ku bi awirên xwe re bêjê wan; rehet bin, li wan dimeyizand. Awira wî zelal bû. Gava ku mirov jî li çavên wî dimeyizandin, ev zelalî didîtin. Her çi ku di serê wî de hebû jî, wê kêlîkê gava ku li çavên wî dihate meyizandin, dihate têgehîştin, ku ji xwe bi bawer bû. Lê ew bawerî çi bû ku di ruyê wî de dihate xwandin, ew yek jî, ji aliyê hevalên wî ve, ne dihate kifşkirin. Her ku çûba, tenê wê kêlîkê di serê wî de bû. Wî tenê zani bû. Dilşad û hevalên xwe demeke dirêj li nig wan mazinên ku ew dane rûniştandin, rûnişti bûn û pişt re ji hev destûr xwastin ku biçin. Piştî heyamekê êdî kar dikin ku rabin. Mazinan jî êdî gava ku destûr dana wan ku rabin û herin. Lê hevalê wan yê mazin gote wan pêşîkê em herin malê xaltîka min. Piştî ku hevalê wan ên mazin ev yek gote wan, êdî wan jî tiştek ne got. Mala xaltîka wî nêzîki malê Axa bû. Peyayê xaltîka wî jî digotinê de Arfan. Ew mirovek zane bû. Axa li ser gelek biryarên xwe bi wî re jî dişêwirî. Arfan sêwirmendekî pir baş bû ji Axê re. Navê xaltîka wî ji Delalê bû. Delalê yeka hinekî pîr bû. Zarokên wê mazin bûn. Delalê dayika çar keçan û du kurekan bû. Delalê yeka ku di keçaniya xwe de bi xweşikatiya xwe re bi nav û deng bû. Gelek caran gava ku Dilşad û hevalên xwe li wir mabûn, li mala wê bûn. Hevalên Dilşad û wî dabûn rex hevdu û diçûn mala xaltîka hevalê xwe yê mazin. Weke heyamekê ku rê ve çûn, gîhane mala xaltîka hevalê xwe yê mazin. Gava hatina mala wê bi qadrekî mazin ji aliyê malîvanan ve hatin pêşewazîkirin. Gava dikevine hundurû de û têne pêşwazîkirin jî êdî pişt re diçin odeya rûniştinê û bi hev re dirûnên. Dayika Delalê jî gava ku ew dirûnên li nig wan dirûne. Her weha weke heyamekê ku rûniştibû dimînin keça dayika Delalê ya mazin ku navê wê Zînê ye dikeve hundurû de û di guhê dayika xwe de tiştekî dibêjê. Di nav civatekê de devê xwe dayin ber guhan û tiştgotin rast ne dihate dîtin. Lê ji ber ku hinek gotinên jinan jî hebûn û ne dibû ku hemû kesek pê bihesiyana, ji ber vê yekê dikirin. Piştî ku Zînê di guhê dayika xwe de dipeyivî, êdî dayika Delalê jî li Dilşad meyizand û gotîyê de; ’kurê min de ka bi

min re were, em herine derve piçekî’. Piştî ku dayika Delalê weha gotîyê de, dayika Delalê rabû ser xwe di cih de û li hevberê wî rawesta. Dayika Delalê ew da di rex xwe de û çûn devê odeya din, ku devê di heman delanê de çûn li ber devê wê rawestiyan. Dayika Delalê gava ku giha devê derî ew rawesta û gote Dilşadî; ’kurê min here hundurû yek li hêviya te ye di odeyê de’ Dilşad şaş mabû li ber vê yekê. Ki bû ku li hêviya wî bû di odeyê de? Her weha bi hinek awirên ku şaşbûnê li dayika Delalê meyizand û pişt re deste xwe da derî ku weke û bikeve hundurû de.

Dilşad gava ku derî vekir di wê heyamê de hê bêhtir şaş ma ji xwe re. Şaşbûn û dilperiya wî ya ku pê re bû pir mazin bû bû û di nav hevdu de xwe bi ruyê wî re dida derve. Dilşad çawa ku derî vekiri bû, Dîlberê li hevberê xwe dîtibû. Gotinêke di nav xelkê de hebû. Ew gotin jî her weha ku dihate gotin, ’sed salî ez hizirîbama min ev yek zen ne dikir.’ Bi vê gotinê re mirov her dem şaşbûneke xwe dihanîne ser zimên. Wê kêlîkê bi Dilşad re ji bo vê yekê sehkirinek pê re çê ne bû bû bi hevalê wî re. Lê gava ku Dîlberê li hevberê xwe dîtibû, gelek dilxweş bû bû. Dilê wî wê kêlîkê gelekî rehet bû bû. Dilê wî bi dîtina Dîlberê re bûbû weke perperokekê û sivik bû bû. Weke bêhneke ku li Dîlberê li ser lingan re lê meyizand, êdî pişt re bi gavên biçûk re çû nig wê û li hevberê wê rawesta. Gava ku li hevberê wê rawesta jî, weke bêhneke bêdeng mabû û pişt re desmalka wê şanî wê dabû. Dîlberê weke ku fihêt bike serê xwe kire ber xwe de û careke din serê xwe ji ber xwe rakir û li ruyê Dilşad meyizand. Pişt re Dilşad û Dîlberê destê xwe dane hevdu û her weha bi hev re çûn û li nig hevdu rûniştin. Car bi car bi gotinên biçûk bi hev re dipeyivîn û car bi car jî bêdeng li hevdu dimeyizandin. Dilşad li Dîlberê meyizand û gotiyê; ’Tu ya dilê min ji bo xwe, ji xwe dizanî ne wilo?’ Dîlberê jî bi meyizandineke ku bêjê; herê, re lê meyizand. Dilşad û Dîlberê demeke di odeyê de li nig hevdu bi têne man. Her weha ji xwe re dipeyivîn, li hevdu dimeyizandin û bi hev re dikeniyan û bêdeng li hevdu dimeyîzandin. Ya di dilê xwe de ji hev re bi meyz û nîşanokan ji hev re hanîn ser zimên. Demeke xweş buhurandin bi hev re. Dema ji odeyê derkevin bi destê hevdu girtin. Gava ku derdikevin der, bi

dayika Delalê re rû bi rû tên. Dayika Delalê dît ku wan destê hevdu girtiye. Gava ku wê ev yek dît ku wan deste hevdu girtiye, bi hev re bi wê dîtina wê re xemgîniyek di dilê wê de çê bû. Dayika Delalê di wê heyamê de gote wan; ’zarokino gava ku ez li wê dimeyizênim hem dilê min bi wê xweş dibe û hem ji xemgîn dibe, ji ber ku malbetên we bi hev re ne li hev in. Hûn ê di vê rewşê de çi bikin?’ Li hevberê ve gotinê dayika Delalê, herdûkan pêşîkê li hevdu meyizandin û paşê Dîlberê bersiva dayika Delalê da û her weha got; ’meraqa ne ke dayika Delalê hûn ji malê ne. Dibit ku bi hevrebûna me ji wan re wê bibe sedemek ku werine nig hevdu. Ew ji dixwazin ku werin nig hevdu. Ji aliyê din ve jî em bawer na kin ku piştî mêr wê werin hevberê hevdu.’ Dayika Delalê gotiyê; ’keça min, ez jî dixwazim ew werin nig hevdu. Ez her dem bi we re me, vê yekê zanibin, hûn zarokên min jî ne.’ Piştî wê gotinê dayika Delalê jî Dilşad ji dayika Delalê re weha got: ’dayê me biryar da ku demek em ji vir herin. Em diçin derekî din weke heyamekê û em ê paşê dîsan vegerin mala xwe. Em ê biçin herêma Silo Axa. Navê kurê wî jî dibêjin Reşîd beg e. Bavê min û apê min bi wî re hev baş û qenc bû û mazin nas dikirin. Lê nuha ew ne mane û kurê wî dibêjin ku ketiye dewsa wî de. Lê kurê wî mirovekî çawa ye ez bêhtir ni zanim. Gerek ew jî ji bavê xwe ne kêm be. Bavê wî baş û qenc dihate naskirin.’ Piştî vê gotinê Dîlberê û Dilşad karê xwe kirin ku derkevin herin derve. Hevalên wî ji di wê heyamê de hati bûn devê deriyê odeya rûniştinê û li wan dimeyizandin. Gava ku Dilşad û Dîlberê karê xwe kirin ku derkevin ji derve, êdî wan jî karê xwe kirin û bi wan re derketin. Gava ku derketin bi hev re hatin ber hespên xwe ku lê suwar bin. Hespêkî din jî ku mahînek bû hat amadekirin ji bo Dîlberê, da ku lê suwar be. Gava hêsp jê re hat amadekirin, bi hev re li hespên xwe suwar bûn û dane ser rê ku herin. Dilşad û Dîlberê jî li hespên xwe suwar bûn û berê xwe dane devê derî û ber bi pêşeroj û bextên xwe ve herin.

Dilşad û Dîlberê herdûkan jî her yek li hespê xwe suwar bû bûn û keti bûn di rê de. Gava ku amadekariyên xwe kiri bûn û ji wir dest bi derketinê kiri bûn, hevalên Dilşad jî bi wan re hati bûn. Ew jî li ser hespên xwe suwar bû bûn û da bûn pey Dilşad û Dîlberê.

Dilşad gava ku li hespê xwe suwarbû bû li Dîlberê meyizandibû. Dîlberê jî bala wê li ser Dilşad bû û di her kêlîkekê de lê dimeyizand. Bala herdûkan jî li ser hevdu bû. Lê dilperî bi wan re hebû û bêhtir bû. Gava ku li ruyên wan dihate meyizandin jî, ev yek pir baş dihate dîtin. Dilşad ji malê derketi bû xwe gehandi bû Dîlberê. Nuha bi Dîlberê re bû û bi hev re diçûn ku ka wê çi hati ba pêşiya wan di pêşerojê de. Jiyaneke çawa li bendî wan bû ew ji ne xuya bû. Têne tiştê ku di serê herdûyan de jî wê di wê kêlîkê de ji wir çûbana û pişt re careke din vegeriyabana mala xwe û bi hev re jiyana xwe berdewan kiri bana. Gava ku di wê kêlîkê de li wan dihate meyizandin jî, gelekî dilxweş bûn. Gava ku li wan dihate meyizandin mirov digot qey di wê kêlîkê de Newrozê dijîn, evçend di dilên wan de kêf û şahî hebû. Ma gelo çi asteng li pêşiyê wan mabû ku hê jî derbas bibin? Va ye gîhane hevdu û di rex hevdu de keti bûn ser rê de û diçûn. Bavê Dîlberê çend bi bavê Dilşad re ne lihevhatî jî bû, lê dîsan diviya bû ku mirov bêjê ku ji Dilşad xweş bû. Gava ku di şahiyan de Dilşad dihate wê derê gelek caran hevdu didîtin û li nig hevdu jî dirûniştin. Dilşad jî her weha hez ji apê xwe dikir. Bi vî awayî re mirov dikari bû bêjê ku Dilşad û Dîlberê bêasteng keti bûn ser riya pêşeroja xwe û diçûn.

Dilşad û Dîlberê li ser hespên xwe dabûn rex hevdu û diçûn. Hevalên Dilşad ji bi wan re keti bûn ser rê. Weke heyamekê ku her weha çûn êdî Dilşad li hevalên xwe ziviribû û ji wan re gotîbû; hûn êdî ji vir pê de ne yên. Bila meraqa me jî bi we re ne mîne. Gava ku Dilşad her weha ji wan re got, wan jî li hevdu meyizand û paşê li nav çavên Dilşad û Dîlberê meyizandin. Lê destê wan ji wan ne dibû. Ji ber vê yekê jî gotin Dilşad ku ew ê bi wan re hinekî din jî werin û ew ê paşê vegerin. Dilşad ji vê yekê re ji wan re negot na. Dilşad hêşt ku ew bi wan re hinekî din jî werin. Her weha weke heyameke din jî hevalên wî bi wan re hatin. Piştî heyamekê çûn, Dilşad carekê din li wan ji zivirî û gote wan ‘êdî ji vir ve divêt hûn vegerin, heger hûn bêhtir werin, hûn ê bêhtir dûr kevin.’ Hevalên wan ê mazin li Dilşad zivirî û gotiyê: ‘meraqa me ne ke, têne hûn bi xêr û ewletî herine cihê ku hûn ê herinê de.’ Êdî hevalên wî li ser xwesteka wî ji wan xatirê xwe xwastin û berê xwe dan malê. Lê

gava ku li ruyê hevalên wî dihate meyizandin, dihate dîtin ku hinekî xemgîn bûn. Hevalên wî goti bûnê; em ê bi wê re werin ta cihê ku hûn ê herinê de. Lê Dilşad vê yekê gerek ne dîti bû. Goti bû wan hûn vegerine malê. Gava ku hevalên wî berê xwe dane malê û ew bi têne û xemgîn bûn. Gava ku hevalên wî ji wan veqetiya bûn, êdî Dîlberê û Dilşad jî li ser hespên xwe dabûn lezê da ku li wan ne be şev û xwe bi gihînin cihê ku wê herinê de. Çawa hevalên wî ji wan qerehabûn, êdî hespên wan jî keti bûn bezê. Dîlberê suwareka gelekî baş bû. Gelek carên berê li hesp suwar bû bû. Hespê Dîlberê car bi car jî dida pêşiya hespê Dilşad di bezê de. Dilşad gava ku ev yek didît, êdî wî ji zor dida hespê xwe, da ku li pêş be. Gava ku hespên wan dibeziya ew jî car bi car di bin çavan de li hevdu dimeyizandin. Lê car bi car jî gava ku li hevdu dimeyizandin û çav bi çav dihatin rûsorbûnekê re serê xwe dizivirandin ber xwe ve. Hespên wan mahîn bûn û gelekî bi bez bûn. Ji ber vê yekê jî riya ku diçûn, zû diçûn. Her weha bi wê lêz û bezê re xwe digehênin nêzîkê çiyayê Mava. Li çiyê na rawestin û jê dibuhurin. Gava ku diçin, Dîlberê bi hinek çavnên ku ne dixwast nas bike lê dimeyizand. Bêhtir ne dimeyizand ji ber ku li ser hespan bûn û di bezê de bûn.

Dilşad û Dîlberê gava ku ji çiya hinekî buhurîn, di aliyê rastê de li zelaloneka ava ku heyî û li pêşiya wan dima, lê rawestiyan. Di zelalonekê de av ji binê erdê derdiket û hinekî li dûrên xwe bela dibû û êdî ku bela dibû pişt re diçû û hinekî jê wir de jî dibû weke golekê ku av tê de li hev digeha hevdu û ji golê jî dibû weke besteke û diherikî diçû di riya xwe de.  Lê di herikandina xwe de û di colçûlika xwe de diherikî, gelek kezin di bin kevirên mazin de pê re çêkiri bû. Lê av gava ji keviran dibuhurt û digeha cihê ku weke keviya colçûlika ku axîn li wan deran weke rengê ku ji zêr bi bêr ji binê çiyê ve diçû. Mirov gava ku li rex dimeyizand digot qey ew der erd e û sinaçî li ser çê bûye, dihate xuyakirin. Her weha cihnên ku bi vî awayî hebûn, li nêzîkê cihên kezînan jî hebûn. Li wan deran jî baqên ku diqevzin dihatine xuyakirin. Dilşad û Dîlberê hespên xwe li ber wê avê rawestandi bûn û ji hespên xwe peya bû bûn ku hinek av li dest û ruyê xwe bikin, hinekî behna xwe fireh kin.

Her weha wilo kirin. Gava ku peya bûn ji hespên xwe û bi avê re hinekî behne xwe jî berdan êdî weke heyamekê jî ji xwe re rûniştin li ber wê avê. Dayika Delalê gava ku ew bi rê kiri bûn, hinek lolîkê şîrkirî û penîr ji di nav de hatî hûrkirin bi hinek xurakên din re ku were xwarin amade kiri bû û bi wan re şandi bû. Wan jî hinek ji wê xwarinê bi hev re xwarin li ber wê ava ku hênikatiyeke xweş dida mirov. Gava ku her weha xwarina xwe jî xwarin, êdî careke din li hespên xwe suwar bûn û ketine ser riya xwe de da ku berî ku li wan bibe şev xwe bigehînine cihê ku wê hernê de. Dilşad gava ku kar kir, ku li hespê xwe suwar bibe, dît ku Dîlberê hat nig hespê xwe ku lê suwar be. Êdî wî jî di wê heyamê de dest xwe ji suwarkirinê berda û çû nig Dîlberê daku alîkariyê bidiyê de, ku ew li ser hespê xwe suwar be. Dîlberê bi alîkarîye wî re li hespê xwe suwar bû. Lê Dîlberê gava ku li hespê xwe suwar bû, hespê xwe ji cihê xwe ne da lebitandin, ta ku Dilşad jî li hespê xwe suwar bû. Gava ku Dilşad jî li hespê xwe suwar bû, êdî hesp dana rex hevdu û ketine rêveçûnê de. Riya wan hê hinek mabû. Lê bêhtir ji ne ma bû. Gelek re hati bûn. Gava ku di riya xwe de hati bûn di ber gelek cihên ku mal lê hebûn. Di riya xwe de li rastî gelek mirovên ku di nav erdên xwe de ku kar dikirin hati bûn. Gava ku digîhane wan mirovan silav didane wan û ji wan dibuhurîn û riya xwe berdewam dikirin. Li ser riya xwe di ber daristaneke ku ji çilo ji pêk dihat, buhurî bûn. Qirşikên çilo ji şewatê re gelekî baş bûn. Ji xeynî wê yekê jî gelek darên behivan û baruyan ji dîti bûn. Di wê herêmê de darên kuhîjan û tawan jî hinek dihatine dîtin. Lê mirov bêhtir bi wan deran re pêwendîdar (eleqeder) ne dibûn. Bi bêhtirî li pey dîtina darên tuyan bûn. Darên tuyan jî mirov li ber xetên rez û werzên xwe car bi car diçandin. Gelek mirov xetên erdên xwe bi darên tuyan re kifş dikirin. Darên tuyan ji çandinê re ji gelekî rewa bûn. Darên tuyan her weha darên ku zû mazin dibûn ku dihatine çandin. Lê piranî ji li gelek cihan jî ji ber xwe çêdibûn, ji ber ku ax û saqe jê re gelek rewa bû. Gava ku Dilşad û Dîlberê di riya xwe de diçûn, her weha rastî gelek hebûnan dihatin. Gava ku wan jî her weha li dûrên xwe dimeyizandin, behna wan fireh dibû. Mirovên ji wê heremê gelekan malbata Dilşad û Dîlberê nas dikirin. Lê li wan

ne dîsankinîn ji ber ku dixwastin ku hinekî hê zûçir xwe bigihînin cihê ku wê herinê de. Her weha kêlik li ser kêlîkê, dem li ser demê dihatin û diçûn. Dilşad û Dîlberê ber bi êvarî re xwe digehênin cihên ku wê herinê de. Gava ku xwe gihandin ber cihê ku wê herinê de û ku hê bêhtir nêzîktîr dibûn, di riya xwe de hê bêhtir rastî mirovên ku diçûn û dihatin û kardikirin dihatin. Cihê ku Dilşad û Dîlberê hati bûnê digotine Azînê û wekî din jî jê re digotinê de Mêrgeberava. Cihekî ku gelekî xweş bû dihate xuyakirin. Çend ku hê bêhtir ku nêzîkê navende dibûn hê bêhtir mirovên ku di ber wan de diçûn û dihatin çêdibû. Gava ku gihabûn ber navendê li ser hespên xwe bûn lê ne bi lez bûn. Çûna wan êdî ne bi lez bû. Êdî gihabûn nêzîkê navendê û di ber wan ve jî mirov dibuhurîn, pir bi bal li wan dimeyizandin. Ji cilên ku li ser wan bûn jî dihate têgehîştin, ku mirovên ku zadegan bûn, dihatine xuyakirin. Gava ku her weha digihen navendê Dilşad jî hinek mirovên ku xwe digihande wan, wan dipirsî mala beg şanî wan bêxin û herinê de. Bi êvarî re xwe digehînin mala Reşîd beg.

Gava ku digihîjin wir gelekî wastahî bûn. Li ser pişta hespan jî bêhtir çûyin, wastandin û êşandina piştê çê dike. Her weha bi wan re jî wastandin û pistêşandin çê bû bû. Gava ku gihabûne mala beg rast û rast çûbûn nig beg. Beg hinekî ji wan pirsî bû ku ji ku derê û çawa û her weha jî ji ber çi hati bûn. Reşîd beg xwe weke begekî dide nîşandan û her weha weke begekî nêzîkî li wan dikir. Lê divêt em bêjin ku hê ne beg bû. Birayekî wî ku ji wî mazintir hebû û mirov bi çavên begîtiyê li wî dimeyizandin. Lê birayê wî yê mazin di wê kêlîkê de ne li malê bû. Reveberiya osmaniyan jê nexweş bû. Ji ber vê yekê jî diçûn ser wî her ku derfet dîti bana. Ji ber wan çûyinan weke dem êke çûbû nig Mîrê Bota ji bo ku ewlekariyê xwe bigre. Lê Reşîd beg ji ber ku li hevberê osmaniyan ne dirabû û li gor hinek gotinên wan bi wan re bi rê ve diçû, bêhtir ne dihatine ser wî de. Ji ber ku car bi car bi osmaniyên re dimeşî, hinek mirovên herêman jî jê nexweş bûn. Lê belê ne diçûn ser wî de di wê heyamê de. Bavê wî gava ku miribû çavên xwe berdabû begîtiyê. Her weha bi rêveberiya osmaniyan re meşîn jî, jê re dibû weke hêzeke ku xwe bide nîşandan. Lê divêt mirov bêjê ku dêna

mirovan bi bêhtirî jî, li ser birayê wî yê mazin bû û bi navê xwe weke Mîrzan beg dihate ser zimên. Mîrzan beg ji aliyê bavê xwe ve jî dihate hezkirin. Di nav civakê de gava ku mirov hez ji begê xwe dikir û ku begê wan jî hez ji êkî dikir her weha qedir jê re çê dibû. Mîrzan beg jî ji aliyê mirov ve dihate hezkirin. Gelek caran jî gava ku bavê wî çûbû Cizîra Bota nig Mîrê Bota ew jÎ bi xwe re biribû. Ji ber vê ji mîr jî wî nas kiri bû. Mir gava ku ew dîti bûn, ji kesayetiya wî bi kêf û bawer bû bû. Her weha gava ku xeterî li ser çê bû bûn ji çûbû xwe li Mîrê Bota girti bû. Ew demek dirêj bû jî li nig mîr dima di wê heyamê de. Ji vê yekê jî Reşîd beg derfet standibû û xwe weke begê mazin yê ku dewsa bavê xwe bigire dabû nîşandan. Bêguman divêt mirov bêjê ku yê herî bêhtir mazin û baş Mîrzan beg bû û mirov ji xwasteke xwe ji aliyê wî ve dida nîşandan. Mirov ji tiştek ne digotin ji ber ku hûrmeta wan ji begê wan yê mazin re hebû. Ji aliyekî din ve jî ew jî kurê wî mirovê ku jê re hûrmet dihate girtin bû. Bi vê yekê re jî bêhtir çi deng li hevberê wî ne derdixistin.

Dilşad û Dîlberê herdûkan bi hev re çûbûn odaye mazin ên ku lê dirûniştin û ji xwe re dipeyivîn. Herdûkan jî gava ku li hevberê Reşîd beg rûniştî bûn, li nig hevdu rûniştî bûn. Dîlberê weke kêlîkekê dixwast bi destê Dilşad bigire ji ber ku çawa ku dikevin hundurû de, çavên Reşîd beg çûbûn li ser wê di wê heyamê de. Her weha xwastekek ketibû di dilê wê de di wê heyamê de. Gava ku keti bûn hundurû û rûnişti bûn Reşîd beg jî gava ku Dîlberê dibîne, bi çavên xwe yên ku pir bi bal,  lê dimeyizêne. Dîlberê ev yekê kifş dike di wê heyamê de. Gava ku ev yekê kifş kir jî pir acizbûn pê re çê dibe. Lê ji bo ku nede derve jî bi baldariyê tevdigere. Lê çend wisan tevdigere jî dîsan ji rûdana wê ew acizbûna wê ne dida veşartin. Gava ku her weha dîti bûn ku Bala Reşîd beg çûye ser wê, hê bêhtir xwe bi ser Dilşad ve dabûyê de. Car bi car ji serê xwe ji dikire di ber xwe de û her weha li pêşiya xwe dimeyizand. Dilşad û Reşîd beg bi hev re dipeyivîn di wê heyamê de. Dîlberê jî li nig Dilşad rûniştî bû û ji xwe re dihesand. Dilşad ji beg re behsa hatina xwe û hevalê xwe dikir ku çi di rê de dîti bûn û çawa hati bûn ta wir û di herêman de çawa buhurtibûn û

hwd, jê re bahs dikir. Dilşad di wê kêlîkê de bêhtir acizbûna Dîlberê fahm ne kiri bû. Ji ber vê yekê jî tevgera xwe asayî berdewam dikir. Her weha ta demeke dirêj li nig hevdu rûniştin û ji xwe re peyivîn. Ta ku rûniştî bûn jî bala Reşîd beg li ser Dîlberê ma bû. Dîlberê keçikeke ku gelekî xweşîk bû. Bi meyizandin û nêzîkatiyên wê yên ku nazikane ne, bala mirov diçû ser wê. Mirov gava ku ew didîtin, li xweşikatiya wê pir bi bal dibûn. Ji aliyekî din ve jî ji aliyê rûdana wê ve gava ku hinarikên wê ji ber dîtinan sor dibûn, bala mirov hê bêhtir dikisşande ser wê gava ku lê dihate meyizandin. Di wê kêlîkê de jî çavên ku li ser Dîlberê bûn, dibûn sedema fihêtbûnekê ku bi wê re xwe dida nîşandan. Lê bi wê re di wê heyamê de bi têne ne fihêtbûn hebû. Bi fihêtbûnê re acizbûn jî her weha xwe ji ruyê wê dida derve, li ber çavan. Dîlberê di wê kêlîkê de xwe digirt. Nehêşt ku ji tevgerên wê tiştek were têgehîştin ji acizbûna wê di wê heyamê de. Reşîd beg fahm kir bû ku ew aciz bû bû. Lê dîsan meyizandina xwe berdewam kiri bû. Di wê heyamê de ne dixwast ku tiştekî bide ber çavan bi tevgerên xwe re. Her weha weke heyamekê gava ku li nig hevdu rûniştin, êdî gava bi ber êvarê re dem hat, Dîlberê û Dilşad jî bi destûrxwastinê re rabûn û çûn odeya ku ji bo wan hati bû amadekirin. Lê Dîlberê piştî ku li nig beg rûniştî bû û çavên beg ên ku li ser wê raq mabûn, dîti bûn, êdî pişt re nerehet bû bû. Dîlberê her weha gava ku bi Dilşad re dabûn rex hevdu û diçûn odeya xwe ve, di wê heyamê de ji ruyê wê dihate têgehîştin, ku ne rehet bû. Her weha bi vê yekê re Dîlberê di serê xwe de dihizirî ji ber ku ev nêzîkatiya beg di serê wê de li mejiyê wê aliqi bû.

Reşîd beg gava ku Dîlberê hati bû li hevberê wî rûnişti bû bi çavên raq re lê meyizandibû. Dîlberê jî ji vê yekê pir aciz bû bû. Wî jî ev yek di wê heyamê de fahmkiri bû. Lê dîsan meyizandina xwe qut ne kiri bû û berdewam kiri bû. Dîlberê bi xweşikatiya xwe re li ser wî gelekî bandureke mazin kiri bû. Bi bandora ku li wî hatî kirin re, li wê dimeyizand. Ji ber vê yekê ji Dîlberê aciz bû bû. Reşîd beg gava ku Dîlberê û Dilşad ji wir çûbûn jî hêji ew di fikaran de bû di wê heyamê de. Ma gelo çi hizir di serê wî de di wê heyamê de hebû û ev çi bû ku wisan mazin çê bû bû ku ta ku wî evçend

dihizirand? Li odaye Reşîd beg gelek mirovên din jî yên ku li nig wî di civata wî de rûniştî bûn, hebûn. Lê di wê kêlîkê de tema wî ji wir û wan inansan ne bû. Di serê xwe de ji wir weke ku çûbû dihate, xuyakirin. Gelekî li ser Dîlberê di serê xwe de dihizirî. Dîlberê û Dilşad bi mehvandarî re hati bûn mala wî di wê kêlîkê de. Li mala wî herdû jî di wê kêlîkê de mêhvanên wî bûn. Mirov gava ku li malekê bû mêhvan dibe weke rûmeta wê malê di wê heyamê de. Her weha nêzîkatî li mêhvandariyê dihate kirin. Mêhvandarî di nav civakê de gelekî bi qadr û qiymet dihate pêşwazîkirin. Nuha jî Dîlberê û Dilşad bi hev re li mala Reşîd beg mêhvan bûn. Reşîd beg ji diviya bû ku mêhvandariya xwe li hevberê wan bidana nîşandan bi nêzîkatiyeke baş û durust. Ji aliyekî dî ve jî diviya bû ku mêhvan ji aliyê nêzîkatiyên xwediyê malê û tevgerên wî ve ji aciz ne bûba. Her weha mêhvandarî li ser hinek nêzîkatiyên rêzê re di nav civakê de hebûna xwe ava dike. Reşîd beg di nav mirovên ku li dora wî rûniştî bûn de, ji xwe ve çûbû. Di mejiyê xwe de ne di nav wan mirovên ku li dora wî bûn, de bû. Dîlberê û xweşikatiya wê di serê wî de cihekî ku gelekî mazinbû girti bû. Reşîd beg di serê xwe de weke ku wê çawa bibe xwediyê wê xweşîkbûne dihizirî. Lê ka ma ev yek mimkun bû? Dîlberê û Dilşad hez ji hevdu dikirin û ya ku ew anibûn wê derê jî ev hezkirina wan bû. Reşîd beg ev yek jî ji nêzîkatiyên wan fahm kiri bû. Lê bêguman gava ku ev yek dîti bû jî hêdî hêdî hati bû dîtin. Gava ku Dilşad û Dîlberê ji nig wî rabû bûn û karkiri bûn ku herin odeya xwe ji paş wan ve jî pir bi bal ve Reşîd beg li Dîlberê meyizand. Dîlberê gava ku di bin çavên xwe ve lê meyizandibû, ev yekê pir mazin û qenc dîti bûn di wê heyamê de. Lê Dîlberê di wê heyamê de jî tiştek ne dabû kifşkirin. Her weha weke ku ne dîti bûn li xwe hanîbû û ji wir derketi bû bi Dilşad re. Hebûna Dîlberê her weha di serê Reşîd beg de pir mazin cih girti bû. Piştî ku ew ji wir çûbûn, êdî Reşîd beg pir bêdeng bû bû. Di wê kêlîkê de mirovên ku li dora wî dipeyivîn gelek bûn, lê ta wî ji wan ne bû. Reşîd beg li ser Dîlberê di serê xwe de dihizirî. Her weha weke demeke dirêj di serê xwe de li ser Dîlberê dihizirî. Piştî fikarên xwe re dike serê xwe de ku xwe bike xwediyê Dîlberê. Bi vê yekê re li xwe dihizirî bi

wê re. Reşîd beg di wê kêlîkê de ku hê xwe bi yekcarî weke serokekî didît. Ev hizra wî di serê wî de pir diçû û dihat. Dîlberê li gor ku wî di wê kêlîkê de hizir di serê xwe de çêkir, bi yekî re revî bû û hati bû wir li nig wî di wê heyamê de. Loma di serê xwe de hizirên xwe dibirin û dihanîn. Her weha gava ku di serê xwe de weke heyamekê hizirî bû, giha bû hizrekî ku tiştek hati ba serê Dilşad û wê Dîlberê jî bi têne û ji wî re maba. Ji xwe wan herdûkan jî hevdu ravandibûn û hati bûn wê derê. Reşîd beg her weha çavên xwe berda tunekirina Dilşad bi vê yekê re. Gava ku Dilşad tune kiri bana, êdî wê Dîlberê jî yê wî ba. Ji xwe ku mirov jî ji wî pirsîbana, ma çima ku ew mirov hat tunekirin, wî gotiba ku wî keçik bi darê zorê ravandi bû û çawa ku keçik hati bû, ew jî çû bû ser wan û hati bû tunekirin. Lê Reşîd beg ta wê kêlîkê jî hê jî ni zani bû ku Dilşad û Dîlberê kenig û kurêmên hevdu bûn. Wî hizra xwe li ser ku keçikê ji destê mirovekî ku keçik bi darê zorê ravandi bû, ava kiri bû. Loma biryara xwe dide û dimîne şiyar ta ku dibe êvar ku hemû kes raza bûn.

Dilşad û Dîlberê jî di odeya ku ji wan re hati bû amadekirinê de di rex hevdu de xwe dirêj kiri bûn û razahî bûn. Lê Dîlberê ji ber ku lê nihêrti bû, xew ne ketibû di çavên wê de. Wê li ser cihê xwe di rex Dilşad de xwe dirêj kiri bû lê hê hişyar bû. Reşîd beg jî mabû hişyar di odaya xwe de. Bi Reşîd beg re dilzûavêtinek (împuls) mazin hebû. Ew jî li odaya ku tê de rûniştî hişyar ma bû ji bo ku tiştê ku dihizirî bi cih bihêne. Li odaye xwe ku tê de mayi rawesta ta ser dana razanê re. Gava ku dem dibuhure û dibe ber nîvê şevê ew ji odayê derdikeve û ber bi odeya ku Dilşad û Dîlberê ve diçe bi dilzûavatina xwe re. Gava ku diçe şûrê xwe jî bi xwe re hildide û diçe bi ber odeya wan ve. Her ku diçe jî, ji xwe re dihizire ku ka wê piştî vê yekê çi bibe. Wî tiştê ku dikir ku wê di dawiya wê de çi bibe fahm ne dikir. Lê pir li wê yekê jî ne dihizirî. Tenê Dîlberê di serê wî de bû. Di ser û dilê Dîlberê de jî Dilşad hebû û di wê kêlîkê de jî Dilşad li nig wê di xewa şêrîn de bû. Lê ta wê ji Reşîd beg tune bû ku bi ber wan ve dihat di wê kêlîkê de. Dilşad di xewê de bû. Dîlberê jî hê şiyar bû lê ew jî gumana ku Reşîd beg di ser wan de dihat qet ne dikir. Yek di xewa şêrîn de bû û ya dî jî li evîna xwe

di kêfê de bû û dirêjketî bû. Dîlberê jî ji ber ku bal û meyizandinên Reşîd beg ên kirêt hişê wê çûbû ser vê di wê kêlîkê de loma şiyarbû ma bû. Lê bi bal û meyizandinen Reşîd beg re tirsek jî keti bû di dilê wê de. Ev tirsa ku ketibû dilê wêe de jî ne hiştibû ku ew razê di wê heyamê de.

Di wê heyamê de Reşîd beg jî şûr di dest de û di hatina xwe de digehê nêzîki odeya ku mêvanê wî tê de dirazan. Gava ku Reşîd beg digehê nêzîki devê deriyê wan, dîsankine ji xwe re li hevberê deriyê wan. Her weha weke bêhneke ji xwe re di cihê xwe de dimîne di ber devê derî de. Piştî ku li devê deriyê wan weke behneke ku dimîne, di ber derî de hinek çavên xwe raq dike li hundurê xênî û li wan dimeyizêne, ku ka ew şiyar in yan jî ne şiyar in. Dihate têgehîştin ku Dilşad ne şiyar bû. Lê Dîlberê şiyar bû. Lê ew ji dirêjketî bû. Bi wî awayî re gava ku li wê dihate meyizandin, mirov digot qey ku ew jî raza ye û di xewê de ye. Reşîd beg gava ku her weha pir baş xwe amade dike û piştî li meyizandina hundurû re lê wisan tê ku ew herdu jî razahî ne. Ew jî hewlê dide xwe ku bi carekê bikeve hundurû de. Wî dîtina xwe de wisan fahm kiri bû ku Dîlberê jî razahî ye. Lê di rastiyê de Dîlberê şiyar bû di wê kêlîkê de. Di nav cihê xwe de wilo xwe dirêj kiri bû, ku mirov lê dimeyizand, mirov digot qey ew jî di rex Dilşad de razahî ye dihate xuyakirinê. Her weha gava ku Reşîd beg bi xwe bawer dike ku ew herdû jî rezahî ne û ji bo ku bi keve hundurû de ji cegerekî ji dide xwe êdî bi carekê re xwe li derî dixe û dikeve hundurê odeyêi de. Gava ku Dîlberê jî her weha ketina Reşîd beg ya hundurê xênî dibine, êdî ew jî qîreke dide xwe. Bi qêrîniya wê re Dilşad jî ji xewê dihilcêne di. Dilşad jî li qêrîna wê dirabe ser xwe de ji xewê. Lê gava ku ew jî ji xewê dirabe hê ew nûhatî ser xwe ve Reşîd beg pêşîkê xwe diavajê ser Dilşad bi lezekê re û pê re gems digire. Gava ku Reşîd beg xwe diavaje ser Dilşad de jî hê li devê derî xencera xwe ye ku gelekî tûj e di deste xwe de amade kiri bû, dixe di dilê Dilşad de. Gava ku Reşîd beg xancera xwe dike dilê Dilşad, di cih de jî di dilê wî de xancera xwe dizivirêne. Gava ku xanchera Reşîd beg di dilê Dilşad de dizivire, êdî ew jî ji kal dikeve di wê heyamê de. Dîlberê ji her weha ku vê yekê dibîne, xwe li ser Dilşad

xwar dike û digire ber pêsîra xwe. Dimeyzêne Dilşad bêcan e. Paşê ku gava Reşîd beg bi ser Dîlberê de tê, dide xwe û here devê derî. Derdikeve derve ji odeyê. Dîlberê gava ku xwe bi lezê digehîne derve û hespekî ku lê suwar bibe digere. Dîlberê gava ku baz dide ji odeyê hîç li pey xwe na meyizêne û bi girîbûneke hişk di qirika wê de re baz dide xwe digihêne derve. Gava ku Dîlberê xwe digihêne hespekî êdî di cih de lê suwar dibe û hesp dide bezandinê da ku ji wir zû bi zû dûr bikeve. Dîlberê gava ku li ser hêsp diçû weke ku hê li odeyê be û tiştên ku di wê heyamê de dîti bûn ji ber çavên wê re dibuhurtin, wisan diçû. Her weha ji odeyê derketi bû û xwe gihandibû hespekî jî û li hespê suwar bû bû û bi lezê ji wir dûrketibû çûbû. Bi Dilşad re hati bû wir lê bi serê xwe tenê ji wir dûr diket diçû. Çend zû xwe gihandibû derve û li derve bû jî, di wê kêlîkê de weke ku miçiniyek pê re çê bû bû, dihate xuyakirin. Di rê de di wê heyamê de gava ku diçû çend bi çavan xwe dimeyizand ji di çûna xwe de dîsan mirov dikari bû bêjê, ku miçiniyek wê girti bû. Bi vê miçûyê re li ser hespê ku di bin de dibezî û ew lê suwar bû diçû di rê de ji wir dûr diket. Dixwast hema ji wir dûr bikeve û bi lez û bez diçû.

## III

Êdî hinekî din jî bi zanebûn û mazin bûbû Mihemed gava ku bi seydayê xwe re ji nig Şêx tê malê. Gotinên wî û mirov li xwe dayin guhdarkirin bi wî re hê mazintir dibe. Lê gava ku ji mala Şêx tê malê weke ku bûbe mirovekî din ji aliyê kesayetiyê ve. Her weha hinek guherandinên mazin pê re didan nîşandan. Di peyivtinan de gotinên wî hê bêhtir li mirov bi bandûr dihatin. Ji aliyê kesayetiyê ve xwe bi mirov re dayin herêkirin jî hê mazintir çêdibe bi wî re. Di çûn û hatina xwe de dîtin û fêrbûnên xwe de ji mirovan re dibêjê bi zimanekî ku gelekî xweş be û bi zanebûn be. Mirov her weha gotinên wî bi jinbûyinên wî re jî, wî hez dike û ji wî fêr dibe. Her weha guherandina mazin bi zanebûnê re xwe bi wî re dida nîşandan. Mihemed bi ger û dîtinên xwe re hizran di serê wî de ji

mazin dike. Bi vê mazinbûnê re êdî nêzîkê mirov dibe û mirovan nêzîki xwe dike. Hizra wî ya li ser dunyayê û xwezayê jî, xwe bi wan pêşketinên ku bi wî re dihatine xuyakirin de, hê bêhtir xwe bi temen dikir. Mirov bi jînbûnên xwe re, xwe mazin dike. Ew jî her weha mirovên ku xwe bi jinbûnên xwe re xwe baş û mazintir dikir. Nêzîkatiyên wî yên li mirov hê bêhtir bi zanebûn xwe dida nîşandan. Di bingeha vê yekê de jî, pêşketinên di zanebûna wî de hebûn. Pêşketinên di zanebûna wî de jî bi ger û dîtinên wî re mazin bûbûn. Di bingeha vê mazinbûnê de jî famhkirina wî jî hebû. Her weha xwe gelekî pêş ve biribû. Ew gera bi seydayê xwe re li nig Şêx ji wî re bûbû bingeheke ku zanebûna xwe re di nav mirovan de were ser ziman û herêkirin û her weha weke zanistvanekî were naskirin û nîşandan.

Gava ku Mihemed tê malê êdî mirov dikarê bêjê ku zanistvanek e û êdî di nav mirovan de bi hiş û hizir tê naskirin bû. Bi vî awayî mazinbûn pê re çê bû bû. Piştî ku Mihemed diçe nig Şêx û li nig wî bi gelekî mirovên din ên ku zanistvan bûn û her weha bi yên ku gelekî zane û di nav civakê de weke zanistvanan dihatin naskirin, bi wan re hevdîtin kiri bû, êdî bi wan mirovan re meraqa cihên din jî ji bo dîtina bi wî re mazin çê bû bû. Cizîra Bota her weha mirov dikarê bêjê ku cihekî ji wan ciyan bû di serê wî de. Mirovê weke Melayê Cizîrî jî ku di wê demê de dijiyan û li wê herêmê bûn jî di mereqa wî de bûn. Bi zanebûna mirov her weha navê wan jî pir derketi bû û dihate naskirin. Dîtina wan mirovan jî dibû meraqeka di dil û serê mirovî de. Mihemed jî her weha xwediyê mereqeke bi zanebûnê re bû. Navên mirovên ku zane bûn û bi zanebûna wan re navê wan mazin dibe û te naskirin. Zanebûn her weha bi naskirinê re dibe teybetmendiyek ji mirovên zanistvan re di naskirina wan de. Mihemed jî gava ku çûbû nig Şêx çawa ku gelekî mirov naskiri bû û hizrên wan fêr bû bû, her weha ew jî hati bû naskirin û hizra wî jî hati bû zanîn. Mihemed li gelek mirovên zane hisadibû û xwe li wan jî dabû hesandin. Ji aliyekî din ve jî yekê bi zanebûna xwe re hati bû naskirin. Di nav civatê de rûniştin her weha ji bo ku mirov bi hizir û raman were naskirin, derfeteke mazin dide mirov. Di nav civatê de rûniştin û

mafê axiftinê jî hildan û axiftin jî tiştekî ku gelekî mazin bû, ku divêt her weha werînin ser zimên. Hizrên mirovên zanistvan an jî yên xelkê bi civatên dihate naskirin û bi lêvkirin.

Mihemed ji aliyê jîrbûnê ve xwe pêş xisti bû. Mirovekî zanistvan bû welê lê dimeyizandin. Bi vî awayî dihate naskirin di nav xelkê de. Piştî ku ji nig Şêxê xwe vegeriya, di nav mirovan de xwe dida têgehîştinê. Her weha piştî perwerdeya ku li nig seydayê xwe hildayî, mirovê ku xwe gihandibû radeyeke mazin jê derketi bû. Di nav xwandinê de çûyin bi dîtin û xwandina li nig zanistvanan çêdibû. Li nig mirovan her weha ku mayin bi hizir û ramanên wan re xwe mazinkirin diviya. Ji ber vê yekê jî diviya ku ew xwe bigehêne nav wan ku mirovên bi zanebûna xwe re mazin bûne di nav wan de xwandina xwe berdewam kiri ba. Vê yekê jî bi mejî kirin hebûnek jê re diviya. Mihemed gava ku çûbû nig Şêx li gelek cihan geriya bû û bi gelek mirovên ku bi zanebûnê re mazin bûn, bi wan re rûniştî bû û bi wan re dan û standinan kiri bû. Bi vê yekê re li ser gelek herêman û hizran agehiya wî çê bû bû. Bi vê yekê re jî derfetên wî çê bûbûn ku ji bo xwandinê xwe bigehÊne hê gelek pirtûkên zanistvanên mazin, ku li ser jîrbûn û pêşketina ku hati bûn nivisandin. Di nav wan pirtûkan û hizran de jî radeya ku heyî, li hev girtin jî bi wî re çêdibû, ku ma kîjan hizir çi dibêjê û kîjan hizir ji kîjan hizirî mazintir e rûberkirin dihat kirin. Ji bo vê yekê jî hinek pêşketin jî di aliyê hizir de diviya bû ku da ku kari ba bike. Ew pêşketin û rade jî bi wî re çê bû bû. Her weha li ser tiştên ku ferbû bûn jî hizra xwe hanîna ser ziman ji girîng bû. Wî gava ku dixwand û fahm dikir, ji hizra xwe li ser wan hizran di nav xelkê de dihanî ser zimên. Bi vî awayî zanebûna xwe dikire xwediyê wateyeke mazin di nav xelkê de.

Mihemed gava ku divegeriya malê, êdî weke ku demeke xwe hem ji aliyê xwandinê ve be û hem jî weke ku ji aliyê kesayetiyê ve be gihandibe dihate dîtin. Di rastiyê de jî divêt ku mirov bêjê di wê kêlîkê de di rewşeke nû de bû di jiyana xwe de. Êdî bêhtir diçû nav civatan de û ji mirovan re di nav wan de dipeyivî bi mejî û hizir re û bi hizir û ramena xwe re. Piştî ku ji mala Şêx vegeriya bû êdî weke ku ketibe taqîkirina radeyekê û jê bi serfirazî temam bûbe dihate

xuyakirin. Bi vî awayî weke ku ketibe demeke nû de dihate xuyakirin di jiyane xwe de. Di rastiyê de jî her weha weke ku nêzîkatî lê bêt kirin dihate dîtin ji aliyê xelkê ve. Gav avêtin û hizra xwe hanîna ser ziman êdî ji bo wî weke radeyekê dihate xuyakirin. Ev yek ji dide xuyakirin ku hem ji aliyê hizir be û hem jî ji aliyê kesayetiyê be, ketina wî ya di nav demeke nû têne ser zimên. Nêzîkatiyên wî her weha di wê demê de bi taybetmendiyên wî yên zanebûnê re û bi taybetmendiyên wî yên kesayetiyê re dihatine şirovekirin. Ev yek jî taybetmendiyên kesane zanîna pê re dihênin ser ziman. Hizir bi dîtinê re pêş dikeve. Her weha gava ku mirov girîngdayina xwezayê ya ku bi nêzîkatiyên wî re têt ser ziman şirove dike, mirov dibine ku xweza bi wî re weke hizrekî jî wate distêne. Xweza di serê wî de gava ku xwe bi wate kir êdî mirov dikarê bêjê ku hizra xwezayê bi mirov re wateye pêşketinê çê dike. Her weha wateya pêşketinê jî hebûn û pêşketina hizir bi xwe re têne ser zimên. Hizir di jiyanê de xwediyê hebûnekê ye. Ev yek jî bi hizirandinê têt ser zimên. Di nêzîkatiyên Mihemed de jî her weha divêt mirov hinek şiroveyên bi hizira jiyana wî re bike. Hizirandin hinek nêzîkatiyan divêt ji bo ku karibe pêş bikeve bi mirov re. Bi vê yekê re jî mirov dikarê bêjê ku bi mirov re nêzîkatiyên bi taybetî hene. Li jiyana mirov meyizandin ji aliyê hizir ve hinek azmûnan dide ji mirov re. Mihemed bi nêzîkatiyên xwe re mirov dide hizirandin. Ew bi xwe re mazin jî dihizirî. Ji ber vê yekê jî xwastina wî ya dîtina herêman derdikete pêş bi wî re. Gava ku çû bû nig mala şêx li wê heremê jî bi seydayê xwe re li gelek ciyan geriya bû. Gava vegeriya bû malê jî ev xwastina wî hê bêhtir pêş keti bû. Ji aliyekî dî ve jî gava ku hati bû malê, ev xwasteke ku di dilê wî de bû, hêdî hêdî bi wî re dibû weke xwastekeke ku bi cih bihaniya pê re bi wate dibû. Naskirin û xwastin, dîtin di bingeha hizra wî de di serê wî de ava dibû. Dîtin mirov serwer dike. Ta wê demê bi dîtinan ji xwe re di kesayetiya xwe de serweriyeke mazin çê kiri bû. Bi vê yekê re jî hê bêhtir dixwast ji bo dîtina herêman here wan deran û bibîne ka çawa ne. Mirov ni karê bi wî taybetmendiyê tenê çûna xwe şirove bike. Ji ber ku xwastina xwe gihandina zanebûnê jî di serê wî de hebû.

Mihemed piştî ku ji nig Şêx divegeriya malê, hinekî dî li malê dimîne û pişt re karê xwe dike ku here herêman bigere. Hinekî li wan herêmên dûrên xwe digere. Pişt re xwe digihêne biryarekê de. Ew biryara wî jî çûna Cizîra Bota ye. Cizîra Bota di wê demê de bi zanebûn û zanistvanên ku tê de ne deng dabû. Mirov ji gelek herêmên ku derfetên wan bû hebû, xwe digihandinê. Cizîra Bota ji aliyê zanist û zanebûnê ve li Kurdistanê her weha weke navendekê bû. Zanistvanên diçûn wir daku xwe bigihenin zanebûnê jî her weha yên ku li wir in. Mirov ku diçûn wir de, ji aliyê pirtêkan ve be yan jî ji aliyê xwe gihandina zanistvanan jî be, derfet ji wan re çêdibûn. Mirovên zanistvan piranî jî li wir li hev digihan. Yan jî mirov dikarê bêjê ku li wir xwe hinekî din bi zanebûn û zanist re pêşdixistin û mazin dikirin. Ji van aliyan ve derfet çêdibûn. Mirov li wir xwe digehandin zanistvanan. Mihemed jî gava ku çûbû nig Şêx, bi gelek mirovên ku çûbûn Cizîra Bota re hevdîtin pêk hanî bû. Ji gotinên wan jî gelek tişt der heqê Cizîra Bota de ji fêr bû bû. Di serê wî de jî wêneyekî Cizîra Bota ji çê bû bû. Gava ku hati bû malê jî li ser wê wêneya ku di serê wî de bû pir dihizirî. Bêhtir li mala ne dima û biryara xwe da ji bo ku here Cizîra Bota. Di serê wî de Cizîra Bota xwediyê wateyeke gelekî mazin bû. Gava navê Cizîra Bota tê ser zimên weke navê dibistanekê jî were ser zimên e.

Mihemed piştî ku ji nig Şêx hat malê bêhtir li malê ne dima û dikari bû hema bikeve ser rê û here Cizîra Bota. Gava ku amadekariyên xwe dike û yên ku xatir ji wan bixwaze xatir dixwaze û dikeve ser rê, da ku here Cizîra Bota. Her weha piştî dema xwe ye ciwantiyê dikeve rê de. Ew ta dema xwe ya ciwantiyê, demên xwe bi xwandinê re dibuhurîne. Di wan demên xwe de jî bi gelek mirovên zane re jî tê nig hevdu. Ji xeynî vê yekê jî, bi gelek mirovan re dirûne û dipeyive. Mirovên ku bi wan re dirûnin jî, mirovên zane bûn. Hizir û ramanên wan fêr dibe û ya xwe jî bi wan re dide têgehîştindan. Vê yekê jî di navbera wî û mirovan de dibe bingeha nasbûnekê ji bo wî di wê demê de. Gava ku ji malê derdikeve bi nasbûneke ku pê te naskirin û baş tê naskirin derdikeve. Gava ji malê derdikeve jî êdî dibê mirovekî ku ji

nav xelkê. Mihemed gava ku ji malê derdikeve dikeve nav xelkê de, xelkên êdî wî nas dikin û navê wî baş û qenc fêr dibin. Bêguman navê wî yê di nav xelkê de têt naskirin jî navê Feqiyê Teyran e. Feqiyê Teyran her weha navê zanistvanekî ye. Ew zanistvan jî ew e. Mirov gava ku wî dibînin, axiftinên wî hez dikin û her weha nêzîkatiyên wî jî dibinen, ew di çavên wan de dibe Feqiyê Teyran. Mihemed gava ku ji malê derdikeve, berê xwe dide Cizîra Bota. Lê gava ku diçe jî li gelek cihan jî dirawêste û li wan deran bi xelkê re dimîne. Gava ku diçe nav wan, dikeve nav civatên wan de û bi wan re dipeyive. Mirov gava ku li wî dihesênin, hizrên wî fêr dibûn. Bi hizirfêrbûnê re wî jî nas dikin. Mihemed di nav mirovan de her weha gelekî hat naskirin. Her herêmên ku diçiyê de jî, tê de dimîne û bi mirovan re dimîne û xwe bi wan re dide naskirin. Mirov bi wî re hizra wî jî nas dikirin û fêr dibûn. Naskirin jî wî êdî mazin dike. Bi mazinbûnê re jî di serê mirov de dibe xwediyê rêzeke ku wî weke zanistvanekî dide nîşandan. Di rastiyê de jî êdî ew zanistvanek bû û zanistvanekî xelkê xwe bû. Xelkê êdî ew di nav xwe de nas dikir û didît. Mihemed êdî ku ji malê derketi bû, bûbû mirovê xelkê. Xelkê li hizirê wî dihesand û rêz didanê. Ew jî bi hizir û ramana xwe re, ji xwe mirovekî mazin bû. Mirovekî mazin dihizirî. Hizra dema xwe baş û mazin girti bû. Hizra dema xwe baş û qenc fahm dike û di nav xelkê de dihêne ser zimên. Gava ku mirov wî şirove dike, mirov dibîne ku ji gelek aliyan ve taybetmendiyên zanebûnê pê re pêşketi bûn. Wan taybetmendiyên wî gava ku mirov li wî dimeyizand jî mirov hema didît.

Zanîna bi taybetmendiyên xwezayê re hanîna ser ziman bi wî re mazin bû. Hizra xwe bi vê yekê re li nêzîkatiyên xwezayî ava dikir û dihanî ser zimên. Li gor wî zimanê xwezayê heye. Gava ku mirov li xwezayê dimeyizêne, ne gengaz e, ku mirov vê yekê ne bîne. Gava ku mirov dît jî bi mirov re pêşketin çêdibe. Lê li gor wî ji bo ku mirov kari ba bibîne jî divêt ji dil mirov zanibe. Lê meyizêne da ku mirov bibîne û fahm bike. Ji vî aliyê ve jî li gor wî hinek taybetmendiyên teybet hene. Bi dil meyizandin teybetmendiyek ji wan taybetmendiyan e, ku divêt mirov nas bike. Dil ji mirov re

çavekî ye, ku pê li dunyayê meyizêne. Lê bêguman mejiyê wî jî riyekê ye ji bo ku li dunyayê bêt meyizandin. Gava ku di bingeha wan nêzîkatiyan de nêzîkatiyên xwezayî hebûn, wî çaxî mirov dikarê bêjê ku wê rastiyê nêzîk bikin. Rastî li gor Mihemed rasteqînî (heqîqet) ye. Rasteqînî jî bi mirovan re ye. Rasteqîniya mirov hebûna hizra Xwuda mazin dike. Vê hebûna rasteqînî ji bo ku mirov xwe bigehêne rasteqîniyên din, divêt ku mirov weke ku pêpelokekê bibîne, ji bo ku mirov bilind bibe di zanebûnê de. Her weha yek bi ya din re tê. Bi vê yekê re rastiya jiyanê mirov dikarê baş bibîne. Jiyan li gor wî xwediyê dendikeke bingehînî ye. Ev dendikê bingehînî jî, ji hêza xwe çêdibe. Hêz ji çend mirovên bi fahmbûn û zanebûn bûn êdî wê di xwe de mazin bi be û wê xwe mazin bike û têgehîştin cebike. Gava ku têgehîştin çêdibû. Mirov dikare bêje ku bi têgehîştin û rastiyê re xwe gihandine rasteqîniyê çê dibe û mazin çê dibe.

Mihemed bi wan hizir û ramanan re dikeve rê de û dike ku here Cizîra Bota. Ew zanistvanekî ku di riya rastiyê de bû. Gava ku di rê de diçû jî, ji xwe re dihizirî. Hizira wî di serê wî de ew dibire cihên dûr. Gava ku ketibû rê, tenê bi xwe re hinek pirtûkên xwe kiri bûn di tûrika xwe de û bi xwe re hildabûn. Ji xeynî vê yekê jî hinek nivîsên ku wî nivîsîbûn pê re hebûn. Ji van pê ve tiştek din bi xwe re ne hildabû û ne biribû. Gava ku diçû di rê de cih bi cih lê radiwesta û li pirtûkên bi xwe re hildabûn, li wan dimeyizand. Di nav pirêzên giya de rûniştin û ketina fikaran û xwandin wî rehet dikir. Wî hez ji nav pirêzan û li nav giya rûniştinê dest bi hizirê dikir. Wî gelekî jî vê yekê dikir. Gava ku wî ev yek dikir, bi xwezayê re weke ku bibe yek lê dihat. Di nav pirêzan de rûniştin û hizirandin û li ber bestên avan rawestan û hêlbest û qesîde gotin jî, şahiya dilê wî dihanî. Bestên avê gava ku mirov li ber dirûne, hênikayiyeke pir mazin dide mirov di wê kêlîkê de. Gava ku tav jî hinekî germ dibe û li ber siyekê rûniştin jî bû, wî çaxî hênikatiya ku hebû xwe dide dilê nav mirov. Hênikatiya ku xwe dide nav dilê mirov jî rehetiyake baş û mazin dide mirov di wê heyamê de. Av di wê heyamê de germahî hinekî kêm dike Lê na şikêne. Bi vê yekê re hênikatî çêdibe û bi mirov re rehetiyak ji tê ser pê. Di rewşên weha de

hizirandin jî baş dibe. Mirov di wan deman de hê bêhtir di xweza de kûr dibe di serê xwe de. Ew hêsaniya ku ji hênikatiyê tê di wê heyamê de di serê mirov de dibe bingeha hizirbûneke ku mirov pir bi kêf dike di wê rewşê de. Mihemed ji ber vê yekê bû ku ku digeha beravan dirûnişt û dihizirî ji xwe re. Mihemed gelekî hez ji xwezayê dikir. Ji ber vê yekê bû ku gava ku li beravan an jî her weha li nav pirêzên giyê dirûnişt gelekî bi kêf dibû. Bi vê yekê re jî xwe dida hizirandinê di wan deman de. Kêfa wî dihat ku di nav xwezayê de her weha bimîne û bihizire. Gava ku ji malê derketi bû bi dana çol û beyaran re ketibû ser rê de. Gava ku di rê de diçû ji her herêma ku digihayê de jî pir bi bal lê dimeyizand û paşê dibuhurt diçû. Gava ku jê dibuhurt jî, weke ku axînek ketiba di dilê wî de lê dihat. Divêt mirov bêjê ku her weha dîtin di bingeha hizirîbûna wî û xwezabûna wî de cihekî mazin ji digirt. Hizra xweza ku di nav hizrekî de hat ser zimanê wî, hizir jî bi xwe re xweza dike. Bi vê yekê re jî li xwezayê hizirbûn mazin çêdibe. Gava ku li xweza hizirbûn ji çê bû êdî mirov dikarê bêje ku pêşketin di dîtine de û di hizir de xwe dide nîşandan. Her weha bi Mihemed re jî pêşketin mazin çê bû bû. Hizra xwe bi xwezayê re pêşxisti bû. Bi vê yekê re divêt mirov bêjê gava ku di riya xwe de diçû jî, li ber avên bestan dirawestiya ji xwe re û dimeyizand û dihizirî li ser xwezayê.

Di rewşeke her weha de Mihemed rastî Dîlberê dilbirîndar tê. Mihemed gava ku hinekî di weste û digehê ava bestekê û li ber dirûne, da ku hinekî xwe rehet bike, di wê heyamê de hezî dengê wê dike. Gava ku dirûne hinek nanê ku di di turikê wî de ye derdixe û dest bi xwarinê dike. Pê re dengê xişxişek tê guhên wî ji cihê ku lê rûniştibû hinekî jê wir de. Gava ku xişxiş tê wî ew ji dide xwe û bi ber cihê ku xişxiş jê te ve dimeyizêne. Gava ku dimeyizêne weke mirovekî ku li wir heye li ber ber çavên wî dikeve. Ew jî gava ku baş dimeyizêne, fahm dike û bi rastî ji ew mirovek e ku jê wir de rawestaye, li hevberê wî û di nav çiqilan de lê dimeyizêne. Mihemed baş dibîne ku ew jî bi ber wir ve diçe da ku here bibîne û bimeyizêne ka ma kî ye yan jî çi kesek e ku li wir e.

Gava ku baş dimeyizêne û fahm dike ku miroveke êdî weke

ku di dilê wî de jî rehetiyek çê dibe. Bi têgehîştina wî ya her weha re, ku dît ku ew xişxiş ji çi tê êdî ew ji rehet dibe û hem jî hinekî mereqa mazin dikeve di dilê wî de di wê heyamê de. Gava ku fahm dike ku xişxiş ji mirov ji hatîye acêb jî dimîne di cihê xwe de. Ma gelo ew kî ye û çi karê wî li serê vî çiyayê heye? Hem ji bi têne ye. Mihemed gava ku kifş kir, êdî ber bi wê ve çû da ku lê meyizêne ka ma kî ye. Gava ku diçe dimeyizêne dibîne ku wa jinek e li serê wî çiyaye bi têne ye. Mihemed gava ku dît ku wa jin e êdî hê bêhtir şaş û mat ma. Gava ku ew di bi çavên xwe de li jinê hema wilo di cihê xwe de meyizand. Cilên wê tev qetiya bûn. Çi pêlav an ji çarox di lingên wê de ne bûn. Pêxwas bû. Ji lingên wê dihate kifşkirin ku li kaviran ketibû û xûn jê dihat. Binê pahniyên wê gava lê wan dihate meyizandin ji pêxwasbûnê çermê stûr avatibûn. Lê pahniyên wê hati bûn dirandin ji ber pêxwasbûnê. Rû û destên wê gelekî qirêj bûn. Cilên ser jî tev qetandî. Pora wê jî tevlihev bûbû gijilokek. Gava ku li porên wê dihate meyizandin dihate têgehîştin ku ji nav daran çûye, li daran hatîye qelibandin. Ji dûr ve jî gava ku li porê wê dihate meyizandin, dihate têgehîştin ku weke ku hêjên biçûkçik jî hebûn di nav pora wê de û pora wê bi wan re weke kaşokan dihate xuyakirin. Di cilên wê de jÎ cihên aliqandinên daran xuya bû. Bi kinc û kirasê wê ve ew tenihênin ku hebûn, hati bûn ferişandin û bi wê farişandinê re tayên dirêj çê bû bûn pê ve. Bi wan tayan re jî pîjên daran lê aliqî bûn. Pora wê jî li pêşiya wê ve jî ser rûye wê girti bû. Di nav biskên pora xwe re li pêşiyê gava ku serê xwe dihilda dimeyizand. Kirasê wê li pêşiya wê gelekî qatiya bû. Gava ku her weha li pêşiya wê ve lê dihate meyizandin, dihate dîtin ku navika wê di cihên qatandî de dihate xuyakirin. Li destên wê jî gava ku dihate meyizandin bi neynokên wê ve xûna ku berê jê hati bû û li ser zûwa bûbû. Gûzekên serdestên wê jî weke yên lingên wê di ser de hati bûn û çermê wê li dûrên gûzekan gihabû hevdu. Çengên wê jî ji milikÊn wê yên qatahî ve derketi bûn derve û dihatine xuyakirin. Çavên wê jî hinekî ji dûr ve gava ku li wan dihate meyizandin, dihate dîtin ku hinekî mazin bûn.Lê divêt mirov bêjê ku çavên wê di rastiyê de bêhtir ne mazin bûn. Lê ne biçûk jî bûn. Sorbûna li dora çavên wê

dihatine xuyakirin. Ji çavên wê weke ku kil kiri be û kilê çavên wê bi hestiran re herikî be xwarê, dihate xuyakirin. Her weha weke qeytanokên lêwîçinê dihatine xuyakirin. Bi vî awayî weke ku giriya be û hestirên wê çawa ku bi di rûye wê de herikî bin û gihabin hinarikên wê û di cihê ku tê re hatîba jî dihate xuyakirin. Di wê heyamê de gava ku li çavan wê dihate meyizandin mirov digot qey wext e wê bigirî. Xetên ruyên wê kifşkirinên xwe bi lêwîtandinê re xwe stûr kiri bûn. Di kirasê wê de di derên qatahî de gava li laşê wê dihate meyizandin, dihate dîtin ku laşê wê gelekî sipî bû. Lê gava ku lê dihate meyizandin, dihate dîtin ku sipîtiya laşê wê di binê lewitandinê de hati bû veşartin. Pora wê ya dirêj gelekî lewitî bû. Bûbû weke biskên qarmicokî. Lê gava ku li wan biskên wê jî dihate meyizandin, dihate dîtin ku hingê li darêan aliqî bûn bi wan biskan re çê bû bû, ku gelekî gijlonek bûbûn. Biskên wê weke biskên pezan dirêj û weke hiriyê li ser pişta mihên lihev gelijî bû. Li paqên wê jî cihê ku bi keviran re hati bûn xisandin û bi xisiandinê re birîn bûbûn.  Pişt re rehetbûyin dihate xuyakirin. Li gelek cihên ku li paqên wê jî weke qamûskên birînan dihatine xuyakirin. Li argûşka wê ya çepê jî weke pizrikeke dihate xuyakirin lê ne pirzik bû. Her weha dihate têgehîştin ku ew derê wê ketibû ser kevirên ku li ser wan zugûr hebûn. Her weha dihate têgehîştin ku ew demeke dirêj ku di jiyanek dijwar de ma bû.

Hê bi gelek aliyên din re jî Mihemed gava ku ew dît gotina ku pêşî ji devê wê derketi bû ’aaaxx ma ka ez dibejim’ bûbû. Pişt re ‘kê te hanî vî rewşê Xwudê ji wan re ne hêle!’ Goti bû. Pişt re Mihemed di cihê xwe de bêdeng ma û hema wilo li Dîlberê meyizend. Dîlberê hema wilo di cihê xwe de bêdeng ma bû. Pişta wê li kevirekî bû. Li ber kevir gava ku Mihemed hati bû nig wê, weke ku bitirse, xwe li ser çokên xwe lihev kiri bû kom û xwe dabû rûniştandin. Lê ji cilên wê çend qatahî jî bûn, dihate têgehîştin ku yeka keça begekî yan jî axayekî bû. Mihemed weke heyamekê gava ku ew dîti bû, li hevberê wê bêdeng di cihê xwe de ma bû. Piştî heyamekê di cihê xwe de êdî ji wê pirsî bû. Lê di serî de Dîlberê bersiva wî ne dabûyê de. Her weha serê xwe kiri bû di ber xwe de û kelegirî lê dimeyizand. Dibit ku jî kar kiri bû ku bipeyive lê

bêjêyên wê di qirika wê de aliqî ma bûn. Dibit ku dixwast di wê heyamê de ji wî re tiştek bêje, lê weke ku tiştekî di serê wê de ew dabû kilîtkirin. Ma gelo ew mirovê ku di wê kêlîkê de li wê rewşa wê dimeyizand û tiştek jî, ji rewşa wê fahm ne kiri be, wê çend ji bêjêyên ku ji devên wê derketiba wê fahm kiri bana? Mihemed tenê di cihê xwe de mabû û li wê dimeyizand. Dibit ku wî jî dixwast tiştekî jê re bibêjê di wê heyamê de. Lê ka ma wî ku tişteke gotiba wê çi bigota? Her weha dîtinê de pirs li pey pirsê dikete serî de. Di wê rewşê de jî weke ku bersiva her pirsê hebû. Lê dil ne ra digirt, ku bihêne ser zimên. Lêvên di wê heyamê de li hev dihatine kilîtkirin. Mirov ku li wê rewşê dimeyizand, bi hebûna xwe re li hevberê wê rewşê şapole dibûn. Mejiyê mirov didît bi wê rewşê re rapêrinê dikir.  dixwast gotina herî  mazin ji bo wê rewşê ku didît bihêne ser zimên. Lê her gotina ku di hundurê xwe de weke ku mazin bû, didît jî gava ku dihate ser zimên biçûçik dima. Bêjeyên ku ji bo wê rewşê ji  bi riya lêvan re dihatine ser zimên jî weke ku biqeribin dihatine ser zimên. Bêjeyên di nav Lêvan de gava ku dihatine ser lêvan weke ku bixwazin careke din vegeriyan meji di nav lêvan de dengê xwe kêm dikirin. Bi dengê kêmbûnê re di qirikê de dibûn qurpînek û diman. Zimanên mirov bi wê qurpînê re diqulapt bi ser xwe de. Weke ku zimankê biçûk bibe deriyek di hundurê dev de û ji bêjêyan re ku derkevin derve, parezbûneke çêdikir, da ku dernekevin derve di wê heyamê de. Bêjêyên her weha di dev de, ji xwe re di piştî zimankê biçûk de jî xwe re kozikek çêdikirin ji bo ku ne binin nav ji wê rewşê re. Di wê kêlîkê de weke ku saqeyekê ku gelekî nigidî be û li  bixe, li mirov dihat. Laşê mirov li ber dîtina wê rewşê ta digirt û gizlonek bi laşê de dihatine xwarê. Hizir weke ku di  de qeşa bigre lê dihat. Hizir li hevberê wê rewşê dibû qalibek kasa di serî de.  zor dida xwe ku gotinêke bêjê ji bo wê rewşê ku dihate dîtin di wê heyamê de. Lê her gotina ku di  de ji bo gotina li ser wê rewşa ku dihate çêkirin jî, weke ku bayê fercê lêxe dima di cihê xwe de, di serî de, di  de. Çi gotin hebûna xwe ji bo ku wê rewşa ku dihate ber çavan bihêne ser ziman têr ne didît. Her lefza ku weke dengeki çêdikir û dihanî ser ziman jî, weke ku ne dixwast di hundurê xwe de çi têne ser

ziman kifş bike wilo li mirov dihat. Gotin bedengî li hevberê wê rewşê ji xwe re dixwast. Weke ku di serî de bitavize, bêgotin dima di wê heyamê de. Ewan gotinên ku di serî de di de çêdibûn ku bûban gurzek û li çiyayan hati ban xistin wê çiya jî çiyayiyê kiri bana. Lê li hevberê wê rewşa xwe di hundurê de di sinçisandin û di de dihiştin. jî ji çêkirin û negotina bêjêyan betal bû bû. Weke ku dixwast di hundurê xwe de her weha bêsinor bêjêyan çê bike bi dimenan raxe li ber çavan. Lê her bêjêyê ku di de dihate çêkirin jî, li hevberê wê rewşê bêserî dima û diçû û dihat di di serî de. Dibit ku rapêrina jî ev bû ku çêdibû her weha li hevberê wê rewşê ku di serî de. Rapêrina rapêrina mirov e. Rapêrina mirov jî her weha li hevberê rewşên wîsa xwe dide nîşandan. Li hevberê Dîlberê, Mihemed bêdeng mabû. Her weha di serê wî de jî jixweçûyin bûbû bi wî re li hevberê wê dîmena ku didît. Di serî de xwastibû ku hinek gotinan bêjê, lê gotinên wî di nav lêvên wî de aliqi mabûn û ji devê wî ne derketi bûn. Mihemed bi çavan weke ku hêsir jê werin xwarê, li Dîlberê dimeyizand. Di wê heyamê de piştî dîtin û meyizandinê, gotina ku ji devê wê derketi bû 'aaaxx ma ev çi bext e ku ez hanîm vê rewşê. Çi baxtekî bêbext!' Pişt re Mihemed ji cihê xwe lebitî û ber bi wê ve çû ku pê re bipeyive.

Lê gelo ew ê bipeyiviya? Yan jî wê çawa bipeyivîya? Ew jî di serê xwe de di wê kêlîkê de weke dihate dîtin di bêkifşbûnekê de bû. Dîlberê di rewşeke wilo de li ber çavên wî bû ku hewl daba xwe ku bipeyive wê bêjêyên wî ji devê wî revin çûbana ji bo ku wê rewşa ku dihate dîtin na hênin ser zimên. Bêjeyên bi wî re di rapêrinê de bûn. Mihemed gava ku ber bi Dîlberê ve bû weke ku dîtina bêkal mabû, lê hati bû. Gava ku çû nig Dîlberê jî li ber wê li hêla rastê li ser çokên xwe rûnişt û bêdeng ma li nig wê. Gava ku li ruyê wî dihate meyizandin, mirov digot qey wext e wê gotin ji devê wî derkeve ji bo ku bipeyive. Lê bêdeng bû. Bi bêdengiyeke wilo bû ku gelekî bi êşê re di cihê xwe de dima. Mihemed carekê dida xwe ku hewl bide pê re bipeyive. Lê jê re zahmet dihat ku bipeyive. Lê dîsan da xwe ku bipeyive. Li cihê Dîlberê hinekî dida xwe ku xwe bizivirêne da ku berê xwe bi yekcarî bide wê di wê heyamê de. Mihemed gava ku berê xwe dayê de pêşî xwast ku

destê wê bigire. Destê xwe avête destê wê û girt. Gava ku Mihemed destê Dîlberê girt êdî berê xwe dayê de. Lê Dîlberê kelegirî bû. Gelekî tirsiya bû. Têne li nav çavan Mihemed meyizand.Mihemed jî berê xwe da bû wê û her weha li wê dimeyizand. Mihemed li hevberê wê bêdeng bû. Çi gotin ji devê wî ji nav lêvên wî ne derdiketin di wê kêlîkê de. Her weha Mihemed bi bêdengi weke heyamekê li wê meyizand. Piştre Mihemed hêza xwe li xwe da hevdu û li wê mayizand. Mihemed dixwast ku bi wê re bipeyive. Lê Mihemed ew yekê di xwe de ne didît ku bipeyive. Wilo li wî dihat ku gotinek ji devê wî derketiba, wê weke ku hêtak bi ser wî re wê bi xûrehene. Di wê kêlîkê de axiftin gelekî giran dihat. Lê Mihemed dîsan dida xwe ku bipeyive bi wê re. Gava ku çavên xwe biribûn ser ya wê û li wê meyizandibû, her weha hema wilo di cihê xwe de mabû û li wê dimeyizand. Di wê meyizandinê de carekê çavên xwe dibe erdê û li erdê dimeyizêne. Gava ku çavan biribû erdê her weha weke heyamekê serê wî di ber wî de ma bû. Gava ku serê xwe rakir da xwe û gotiyê de; ’ka ji min re bêjê ka ma kê ev yekê haniye serê te û çawaç’ Dîlberê ku weke heyamekê piştî wê gotina wî re bêdeng ma, êdî serê xwe rakir û li nav çavên wî mayizand. Piştre Dîlberê dest bi peyivtinê kir. Lê gava ku dipeyivî jî bi êşa dilê xwe dipeyivî; ’Ez li te dimeyizênim ku tu feqiyekî zanist î û te zanîn xwandiye. Çi wilo tê xuyakirin. Tu jî derekî tê û tê herî derekî.’ Mihemed, piştî ku evan gotinan wê bihîstin, bersiva wê da û got; ’herê rast e, ez ji derekî têm û ez ê herime derekî. Lê min çi dît min hingi jê xwe re got; xwezi ez pêpûk bim û nuha ne mirov bim ku min ev ne dîti bana. Lê ji min re bêjê ez çi bikim? Ahdê min e ji te re ku ez te bi vî awayî ne berdim û herîm.’ Dîlberê gava ku Mihemed her weha got hinekî bêhtir kelegirî bû. Lê di wê kêlîkê de ne dixwast ku bigiri. Dîlberê piştî ku Mihemed dipeyivî êdî wê jî li ruyê wî mayizand û gotiyê de; ’faqiho meyizêne li rewşa min, yên ku ez kirime vê rewşê de mirov in. Ez çi ji te re bejim? Ji biçûkatî ve min û kurêmê min me hez ji hevdu dikir. Lê malbatên me ne li hev bûn. Me jî got ku em werin nig hevdu me biryara xwe da ku weke demekê ji malên xwe biçin û paşê em ê vegerin malê. Em bi hev re ji malê derketin û

hatin heremêke din ku li wir Reşîd beg serek e û em hatin mala wî. Lê Reşîd beg çav berda min û kuramê min kuşt. Min jî xwe ji destê wî rizgar kir. Lê ez ji wir ne derketim, ji ber ku hê cane laşê min li wir e. Hê xwîna wî li ser laşê min e. Vêca nuha ez ji te dixwazim tu herî mala me li nig bav û bîrayên min û ji wan re bêjî ku xweşka wan ji êşa dilê xwe bi çol û çiya ketiye. Lê dîsan bêjê êşa dilê wê na şikê. Ji wan re bêjê xwîna kurêmê wê li erdê ye. Laşê kurêmê we jî li erdê ye. Bêjê wan zûkin werin kurêmê xwe û xwuşka xwe hildin. Bêjê wan agirê dilê xwuşka wê gelekî mazin e. Bêjê bi wî agirê ku bi wê re ye çiya vêdikevin. Bêjê xwuşka wê li serê çol û çiya dijî û bi sewalan re di nêçîrê de ye. Bêjê faqiho tiştê ku te dîtî, bêjê faqiho. Li pirtûka rastiyê meyizêne ka ma çi tê de dinivisîne bihêne ser ziman. Meyizêne û bipeyive da ku rastiya min bibînin û werin êşa di dilê min de bibînin.’Mihemed piştî wan gotinên Dîlberê re dest bi peyivtinê kir û her weha jê re got ji kûrahiya dil; ’ Te navê xwe ji min re got. Te got navê min Dîlber e. Ey Dîlbera dil êş, ez dibêjim ji te re ji dil ku peymana te li dilê min ket. Axîna te ya dilê min bûye êşekî di dilê min de. Dîtina te di serê min de mazin cih girtiye. Êşa te min ji dil dîtiye û fahm kiriye. Ez bûme pira dîtina xwe îro bi dîtina te re. Ez bûme xwediyê êşeke mazin di dilê xwe de. Bi sê kelamê ji navê Xwudê kim, ez ê xwe gihênem mala wê û ez ê êşa dilê te ji wan re bêjim. Ez nuha li hevberê te rawsta me. Ez êşa dilê te dibînim. Ew kula ku çi li van çiyayan kiri evdal ez jî kirim evdalê te. Ew kula ku bi te re çê bûye, êşa wî kete dilê min de ji gava ku min te dît. Awayê jiyana êşa xwe bi te re mazin şanî min de. Êşa mazin min bi te re fahm kir. Ruyê qenciyê û neqenciyê min bi te re baş û mazin dît. Ey Dîlberê dil peymana xwe min da te ku ez ê herîm û êşa te ji wan re bêjim. Ez ê êşa te ji mirovan re bêjim. Ez ê êşa te ji mirovan re bi rastteqînî bêjim. Ez ê bêjim ku ka min çi çawa û di çi rewşê de dîtiye. Rastiya wê bi hebûna te re bi min re were ser zimên. Rastî wê bi te re qenc û xirab were dîtin. Rastî wê bi te re û bi hanîna min ya ser zimên re mazin were têgehîştin. Êşa dilê te mazin e. Hingî rastî bi te re mazin li ber çavan e. Ey keçika dil bi êş, li min meyizêne ku çend min ji te fahm kiriye! Ey keçika delal meyizêne li min ka min çend

êş girtiye ji te. Ey keçika şêrîn meyizêne li min ka min çend kulekî mazin bi te re di dilê xwe de girt. Ey keçika dil bi êş li min meyizêne lê li çavên min ne meyizene ku da çi êş û fihêtiye min ne de ruyê min. Ey keçika delal û şêrîn çi di ciwaniya xwe de pîr bûyî. Te ez jî bi dîtinê re kal kirim. Te ez ji çavçisî û kelegirî kirim. Te ez jî çavşil kirim. Te ez jî bi êş kirim. Ez ji dilê xwe re dibêjim ey dilo de bêjê du peyva. Ey dilo de bêjê du bêjeya. Ey dilo ji dilê bi êş bide ser ziman da ku ji xelkê re bidim fahmkirin. Keçika dîlber û dilêş va ez dikevime ser rê. Ez ê çime mala we, bi bav û birayên te re bipeyivîm.'

Piştî ku her weha Mihemed bi Dîlberê re peyivî, êdî hewl da xwe ku bikeve ser rê û here mala wê û bav û birayên wê bibîne û bi wan re bipeyive. Berî ku here Dîlberê hat nig wî û hemaviyek ji ber xwe derxist û da Mihemed da ku bi xwe re bibe. Mihemed, gava ku Dîlberê hemawî daye de, rahişt û kire di ber xwe de û kir ku here. Lê gava ku kir ku here, hat li hevberê Dîlberê û weke heyamekê li çavên wê yên bi êş meyizand. Mihemed di wê kêlîkê de weke ku tijî bû dihate xuyakirin. Çavên xwe gava ku dibirine ser Dîlberê, xwe ne digirt ku li wê bimeyizêne. Çavên wê di wê kêlîkê de gava ku li wan dihate meyizandin, gelekî bi bal bûn. Çavên wê weke çirayekî vêxistî bû dihatine xuyakirin her çend ku xemgîn jî bûn. Gava ku li çavên wê dihate meyizandin mirov digot qey çîk ji çavên wê diçin, dihate xuyakirin. Gava ku mirov ji ber royê dihate ber sîhwanê, weke ku ro tîrêjên xwe di çavên wê de bide nîşandan, dihate xuyakirin. Bi vî awayî çavên wê gelekî bi bal bûn. Çavên wê gelekî xweşîk bûn. Çavên wê bejna wê gelekî xêşik didane ber çavan. Gava ku her weha li wê dihate meyizandin, bala mirov diçû ser çavên wê û pişt re jî bi wê yekê re diçû ser bejna wê ya ku li ber çavan bû. Mihemed her weha gava ku li wan çavên wê dimeyizand, gelekî di bin bandûrê de dima. Mihemed êşeke mazin gava ku li çavan wê dimeyizand dixwand. Gava ku êş ji çavên wê dixwend jî gelekî êşeke mazin dixiste di dilê wî de. Her weha gava ku wî li wê û çavên wê dimeyizand, gelekî di bin bandûrê de dima. Bi vê yekê re karê xwe dike û ji wir dike ku dûrkeve here. Lê destê wî ji wê ne dibû ku wê li wir bihêle û here. Vê yekê jî li wî bandûrek

dikir. Di dilê wî de raperînek ji dîtinên wî hebû. Di dilê xwe de weke ku difûrî dihate xuyakirin. Weke mirov ku di xewê de gelek xûlobatan bibîne dihate xuyakirin. Ew jî her weha di rewşekê de bû, ku xûlobatan didît. Lê xûlobatên ku didîtin ne di xewê de didîtin. Di jiyanê de û şiyar bû, her weha dîtin. Mirov gava ku xûlobatan dibîne zû bi zû ji bîr nake. Her weha Mihemed jî tiştê ku dîti bûn ne dibû ji bîr bike. Ji tiştên ku dîti bûn gelekî bi bandûr bû bû. Mihemed her weha bi vê yekê re karê xwe kir û bikeve ser rê de da ku here nig bav û birayên Dîlberê û rewşa wê ji wan re bibêjê. Bi gavên lezê dabû ser rê û ji wir bi dilêş û dilbikul dûr diket.

Mihemed gava ku ji wir dabû ser rê, destê wî ji wir ne dibû. Gava ku gavên xwe diavêtin jî bi wî re giraniyeke mazin çêdibû. Gava ku ji nig Dîlberê berê xwe dabû ser rê ku here, çi gavê ku pêşîkê diavêt, pê re carekê jî li paş xwe ve dimeyizand bi aliyê Dîlberê ve. Hizra wî ji wir ne diçû û ew bi xwe jî ji wir bi dilêş diçû. Her weha weke heyamekê jî gava ku diçû ji li paş xwe ve dimeyizand. Ew bi xwe re di rê de bû diçû. Lê mejiyê wî li paş wî bû. Hinekî ji wê jî dûrketi bû. Di navbera çûna Mihemed û cihê ku Dîlberê lê dima qeşakî bilind jî bû bû. Lê dîsan dimeyizand li paş xwe ve di çûna xwe de. Mihemed gelekî di bin bandûra Dîlberê de ma bû. Rewşa ku ew tê de dîti bûn jî her dem li ber çavên wî bû. Mihemed di rê de diçû û bi lez jî diçû lê di serê wî de Dîlberê û cihê ku Dîlberê lê bû di hizra wî de bû. Têne ne di hizra wî de bû, bêguman li ber çavên wî jî bû. Li ser linga bû di rê de diçû lê weke ku di wê rewşê de di şiyariya xwe de di xewê de be lê dihat. Li ser lingan diçû lê dîmenên ji hebûna Dîlberê û rewşa wê di ber çavên wî de diçûn û dihatin. Her dimenên ku di ber çavên wî de diçûn û dihatin jî, bi wî re hestbûneke mazin çêdikir. Bi hestan re jî wî digot qey wek difûre lê dihat. Bi hestbûnê re gelekî çisî dibû. Her weha di nav hestan de weke ku wî xwe winda dikir lê dihat. Gavên xwe di wan esnayan de hê bêhtir dirêj û zûtir dikirin di rêveçûna xwe de. Di rê de çend zû diçû û çend di rê de kesek li pay kesekî diberde û ku kesên din yên nû derdiketine pêşiya wî jî hê bêhtir ji xwe re dikire hirahir ji ber ku ji kesekî digehê kesekî. Hirahira wî jî ne tenê ji bêbihna wî dihat. Her weha ji nexahebûniye wî jî dihat.

Di lezê de û di çûnê de xwe winda kiri bû. Gav li pey gavê hê zûtir diavêt da ku hinekî hê zûtir xwe bigehîne cihê ku wê heriyê de. Her gava ku gav diavêt jî, jê re dibû bingeha gotineke ku di hundurê xwe de digot; 'a wa ye gavake dî jî çû, hinekî dî jî bi ber wir ve çûm.' Gava ku diçû hingî di serê xwe de dihizirî nezanibû ku çawa diçû. Her gavên ku diavêt bi rastî jî wî nêzîk dikir. Bi rêveçûneke ku nîvbaz rêve diçû. Lê rêveçûna wî weke ku rê têra wî ne dikir jê re dihat. Di wê kêlîkê de gelekî dixwast, ku hê zû here û bigihê nig birayên Dîlberê, da ku wê ji wir rizgar bike gavek bi gavekê hê zûtir. Lê çend zû jî diçû riya wî wisan zû hew ne dibû. Bi wê yekê re jî dida xwe da ku hê zûtir bibe di wê heyamê de. Bi vê yekê re jî gelekî bi qehr û hêrs dibû ji xwe re ji bo ku çima zû ne diçû di wê kêlîkê de. Lê çi kiri bana jî diviya bû ku wê rê qet kiri bana û çûba û xwe gihandiba mala bavê Dîlberê. Riya wî di wê kêlîkê de gelekî jê re dûr dihat. Di rê de her weha wilo lê hati bû, ku gava ku kaşek dibuhurand digiha kaşekî dî ji xwe re bi hêrs dibû. Ji ber ku çima ew kaşê din derketiye ku cihê ku mal lê ne. Wî di serê xwe de dixwast ku di pişt wî kaşî de cihê ku wê çûba li pişt wî kaşî bana. Lê cihê ku ew ê çûba ne li piştî kaş bû. Êdî pişt re ji xwe re dihizirî de nexwe li piştî kaşê dî ye. Yan jî li pist kaşê ku gehayê de ye. Her weha her kaşê ku digehayê de û jê dibuhurî li pista kaşê ku jê bûhûri dihizirî di wê heyamê de. Bi vî awayî di gelek kaşan de buhurti bû. Lê hê jî di rê de bû. Bi vê yekê re jî hersa wî bêhtir dibû ji wî re ji ber ku çima hê ne gehaye. Di riya xwe de digeha gelek beravan û germavan jî lê li yekî jî ji wan ne dîsannkinî di rê de. Her weha tenê dixwast riya xwe berdwam bike, da ku hinekî hê zûtir bigehê mala bavê Dîlberê. Westiya bû jî. Lê westandina wî ne di bîra wî de bû. Tenê tiştê ku di bîra wî de bû ew bû ku dixwast ku gavek berî gavekê xwe bigihene cihê malê bavê Dîlberê. Ji ber vê yekê jî di serê xwe de dihizirî ku çend gavên xwe zûtir kiri bana, wê hê zûtir xwe bigehanda mala bavê Dîlberê. Bi vî hizra ku bi wî re çêdibû rê gavên xwe hê bêhtir bêhtir dikirin. Çend gavên xwe bêhtir jî dikirin germbûna laşê wî jî hê bêhtir dibû û ku germbûna wî hê bêhtir jî dibû hê bêhtir jî dixwast ku hê zûtir di rê de here, da ku hê zûtir xwe bigihêne cihê ku wê heriyê. Bi vî awayî di rê de

xwe ji bir dikir û diçû. Riya wî di nav çiyayan de bû. Riya wî di nav çiyayên bekês û çolan de bû. Di riya xwe de digeha gelek tiştên xwezayê weke sinaçiya û daristanan. Di ber gelek daran re ku bi wan ve fêkî hebû jî dibuhurt diçû. Lê li yekî jî li wan daran ne dibû xwedî ku li wan meyizêne yan jî li nig wan rûnihê da ku behna xwe bistêne. Di vê xalê de tiştek ne di bîra wî de bû. Tiştê ku di wê heyamê de di bîra wî de bû ew bû ku xwe gehandiba cihê ku wê çûba.

Di rê de gava ku diçû ji gelek hizir jî di serê wî de çê dibûn. Gelek hizrên ji wan hizran ku weke pirsan dihatine ber bîra wî de, ew hê bêhtir ji xwe ve dibirin. Di serê xwe de dikir ku giha wir wê çi kiri bana, yan jî çi gotiba. Her weha hizr bi pirsiyaran di serê wî de çêdibûn. Gava ku giha wê derê di cih de diviya bû ku here nig kîjan birayê wê. Ev yek jî di serê wî de diçû û dihat. Di nav civakê û xelkê de her weha birayên mazin hinekî hê bi zanebûn û maztir dihatine dîtin. Li hinek ciyan jî weke di dewsa bav de dihatine dîtin. Li wê herêma Kurdistanê jî her weha ev yek hêbû. Birayê mazin gava ku bav ne li malê ba yan jî çûba derekî dûr jî û zû ne vegeriyaba malê, kurê mazin dewsa bavî de dihate dîtin. Di wê heyamê de gava ku hinekan bixwastana ku tiştek bikiri bana yan jî bipirsîbana, digirtin û diçûn nig birayê mazin yê malê dipirsin. Her weha birayê mazin piştî bav re di nav civakê û xelkê de kevneşopiya xwe çêkiri bû. Ev kevneşopî ji gelekî ji rêzê dihate dîtin di nav civak û xelkê de. Bêguman di her malekî de birayekî mazin hebû. Bi vê yekê re birayê mazin nêzîkatiya xwe di nav civak û xelkê de mazin ava dikir. Gotina wî jî piştî ya bav re ne dihate guftûgokirin û bi cih dihanîn. Mihemed wan taybetmendiyan hemûkan jî dizanibû û zanibû ku jî di nav civakê de çawa bi kar dihatine hanîn. Bi vê yekê re jî hizra ku di serê xwe de guftûgo dikir de, dizanibû ku wê çûba ku derê yan jî pêşî wê çûba nig kê. Mihemed gava ku li nig Dîlberê bû nûhatî bû hizra wî ku der heqê malbetê de pirsan bipirse di wê heyamê de. Ji ber vê yekê ji divêt mirov bêjê ku ji Dîlberê der heqê malbatê de tiştek ne pirsî bû. Her weha çend birayên wê hebûn an jî ne bûn ne pirsî bû. Di wê heyamê de jî ber dilêşiya Dîlberê ji xweçûnê wê, ew tiştekî

wisan ji wê ne pirsî bû. Tenê Dîlberê behsa bavê xwe kiri bû. Navê bavê xwe jê re gotî bû. Mihemed jî navê bavê wê bihîsti bû. Lê berî hingê ne dîti bû. Ji nûke diçû wê derê û wê ew dîti bana. Bi vê yekê re hinek xamîtî jî pê re hebû. Lê Mihemed ji xwe bi bawer bû ku wê ji xamîtiya xwe bi buhure. Mihemed mirovekî ku di zanebûna xwe de ne xam bû. Bi vê yekê re lê baweriya wî hebû. Lê car bi car jî ji zanebûnê bêhtir jî hinekî dîtin jî diviya hebe ku da ku xamîtî ji holê rabe. Tenê ya wî ev dîtina wî ne bû. Lê diviya bû ku bi ser ve jî bi hatina. Wî xwe ji vî aliyê ve ji bo bi ser ve hatinê re bêgav û mecbûr didît. Di rastiyê de ji rewşa wî jî her weha bêgaviyek dide pêşiya wî di wê heyamê de. Sûnda wî ji wî re di dilê wî de hebû. Sûnda wî bi wî re peymaneke mazin bû ji wî re. Bi vê yekê re ji xwe diviya bû ku bi ser ve were da ku Dîlberê ji wan şert û mercên ku tê de ye rizgar bibe. Wê ew jî ji aliyê wujdana xwe ve rehet bûba. Wî ne ev yekê ji xwe tenê ne jî aliyê wujdan ve ji didît. Ew ji aliyê mirovatiya xwe ve jî nêzîk dibû. Bi vî aliyê ve jî hestên wî xort û mazin bûn bi wî re. Her weha hestên wî mazin dihatine ser ziman bi wî re di wê heyamê de. Mihemed gava ku di rê de diçû di her gava wî de Dîlberê li bîra wî bû. Hebûna Dîlberê û rewşa wê ji bîra wî ne diçû. Gava ku diçû di rê de car bi car jî ku li ser Dîlberê ji xwe ve diçû û qirika wî tijî dibû. Dora çavên wî weke xet xwe didane kifşkirin di wê heyamê de. Ji dûrî ve gava ku li xetên çavan wî dihate meyizandin dihate têgehîştin ku mirov digot qey çavên wî şil in di wê heyamê de. Lê çavên wî ne şil bûn. Di çavên wî de hêsirên zûwa hebûn. Di hundurê xwe de bi bîrhanîna xwe de gelekî bi hest bû. Ev yek jî gava ku lê dihate meyizandin dihate dîtin. Her ku bi hest jî dibû, hê bêhtir dida xwe da ku xwe zû bigihêne mala bavê Dîlberê. Di rêveçûneke wilo de bû ku ne dîxwast ku qavzeken wî ji gavên wî yên ku berê ku avaçibûn kêmçir bin. Behne wî li ser dilê wî keti bû lê dîsan ne dixwast ku her weha hêza gavên wî kêm bibin. Wilo lê dihat ku gaveke wî kêm bûba wê li paş maba. Ji ber vê yekê jî çend jê dihat her weha wilo hêz dida xwe da ku hê zûtir here. Hê zûtir here û erka ser şanê xwe hê zûtir bi cih werîne ji bo wê keçika reben Dîlberê. Di wê kêlîkê de Mihemed bi gavên xwe re gems

digirt. Ne dihişt ku gavên wî di wê heyamê de wî behêz bikin. Çi kaşê ku dibuhurt ku digeha kaşekî dî jî, digot 'aha dibit ku li pêşiya vî kaşê ku li pêşiya min e li pêşiya wî kaşî kaşek heye, li ber wî ye. Ez hê bilezênim, ez hê zûtir xwe bigihim.' digot ji xwe re. Gelek kaşên ku jê buhurti bû û cihê mala bavê Dîlberê ne li pişt wan kaşan bû. Ta ku gihabû ber kaşê ku di rastî de mala bavê Dîlberê li pişt bû. Lê wî ji xwe re digot ku ne li piştî wî kaşî jî be, wê li piştî kaşê din be. Rê evçend dûr bû. Gava ku ji xwe re dipeyivî, dengê xwe hes dikir. Ber bi roavayê re Mihemed digehê ser kaşê ku mala bavê Dîlberê li ber e. Gava ku ji ser kaş ve tê, malan dibine, êdî bêhneke kûr û mazin jî ji dil dide derve di.

Di riya xwe de hîç li derekî ne rawestiya bû ta ku were wir. Bi vê yekê re jî pir westiya bû. Ji wastandina bêhna wî, bi ser wî keçikê bû. Lê gava ku malan dîti bû, gelekî dilxweş bûbû. Lê divîya bû ku têbigehê ma ka cihê wê ku hati ba, ev der bû yan na. Hebû ku cihê ku giha bû ne cihê mala bavê Dîlberê bû. Hizrên di serê wî de gelek bûn. Lê ku ne ew der jî ba, dîsan di dilê wî de rehetiyek çê bû bû. Dibit ku ew rehetî ji bihnvedana wî dihat. Cihê ku ew diviya bû ku hati ba ne ew der bana jî, wê ev yek bi wî re dilêşbûnekê bi xwe re bihaniya. Mihemed ji vê yekê re amade bû. Gava ku mirov di weste, tiştekî ku hêviyê dide mirov û ji mirov re mazin tê û her weha mazin di dilê mirov de cih digire, bawerkirin e. Yê wî jî her weha dîtina mala bi wî re hêviyeke mazin çêkiri bû û baweriyêk jî xisti bû di dilê wî de. Lê ta ku ne ew der jî bana cihê ku ew hati ba. Ta ku ji wir jî diviya bû ku hinekî din çûba. Mihemed hinekî wastahî bû. Lê ku cihê ku diviya bû ku wêriye ne ev der ba, wê dîsan dawiyê çûba cihê ku malê bavê Dîlberê lê bû. Wê çûba, ji ber ku bêguman wî dixwast ku here. Her weha biryara wî di serê wî de zelal bû. Çend westayî jî ba, wê westandina wî ev zelalbûna wî xira ne kira. Westandina wî ji zelalbûna wî re di dilê wî de çi nezelalî çê ne dikir. Mihemed di riyeke pir dirêj de û bi wastandineke mazin hati bû. Rewşa Dîlberê di serê wî de bû. Her weha di wê kêlîkê de gelekî ji wê dûr jî ketibû. Lê weke ku ew li nig wî be di wê heyamê de bandûrek li ser wî dikir. Hebûna wê ya ku di serê wî de weke hebûna wê ya rast li nig wî li ser wî bandûrek

diberda. Mihemed dihanî  bîra xwe de car bi car gelekî bi hest dibû. Dîlberê di serê wî de hizrekî gelekî rast, mazin û bi bandur bû. Bi vê yekê re Mihemed gelekî di bin bandûra Dîlberê de bû. Gava ku di rÊ de diçû jî weke ku li nig wê be û ew li hevberê wî be li pêşiya xwe dimeyizand û diçû. Dîlberê li paşiya wî ma bû. Lê di rastiyê de li paşiya wî ne ma bû. Dîlberê di serê wî de pê re hati bû. Gava ku li pêşiya xwe jî dimeyizand, weke ku li wê meyizêne diçû û gavên xwe diavêtin. Weke ku Dîlberê ne li paş wî mabe, weke ku li pêşiya wî be diçû û bi ber cihê ku here, gavên xwe diavêtin. Wî bi wî re her weha weke ku ew hinekî din nêzîktirê wê dikir di çûne de. Di serê xwe de Mihemed weke ku ber bi wê ve diçû bi gavên mazin diçû. Bi vî awayî jî di serê xwe de ew mazin dida hizirandin. Na, na Dîlberê li paşiya wî ne ma bû. Ber bi Dîlberê ve diçû. Çawa ku gava bihê cihê malê bavê Dîlberê, êdî wê ew jî li wir bihê bi wî re. Di serê wî de wê li wir be. Lê bi hebûna xwe re dibit ku ne li wir be. Ma gelo di wê kêlîkê de, ya girîng ne ew bû ku pêşî xwe bigehîne mala bavê wê di wê heyamê de? Dîlberê bi wî re ne hati bû. Wî bi têne dabû ser rê û hati bû. Bi vê yekê re jî ji bo ku Dîlberê ji wir hati ba, diviya bû ku Dilşad jî pê re hati ba. Dilşad di wê kêlîkê de ne li nig wê bû. Çawa ku Mihemed di wê kêlîkê de bi tenê di rê de bû ew jî bi tenê re li serê wî çiyayê Raz mabû. Çiyayê Raz weke ku ew di nav xwe de veşarti be bûbû. Çiyayê Raz bi razbûneke mazin re di wê kêlîkê de xwe dida jiyandin. Bi razkirinekê re dijiya. Bi evîndariyeke birîndar re dijiya. Çiyayê Raz di wê kêlîkê de bi evîndarekî ku hati bû maritandin re dijiya. Ew evîndar jî ku pelên baskên wê hemû jî jê hati bûn hilkişandin û ew bê taqeta firîbûne hati bû hiştin. Evînek ku difire xweş dibe. Evînek bi çeng û baskên xwe re bi hêybet e di jiyanê de. Çiyayê Raz evîneke ku ji wan qasên hatî dûrxistin di hundurê xwe de vedişart û diparast di wê heyamê de. Razbûna çiyayê Raz xwe berda bû ser wê evînê hingê. Evîn di raziyê de veşartî ma bû. Evîna ku li ber xwe dida di razbûnê de dijiya.

Mihemed gava ku hati bû serê kaşê, hinekî bêhnawî fireh bûbû. Gava ku malan dîti bû, êdî da bû xwe ku bi lezê here da ku here nav wan malan û fahm bike ku ka ma rast hatiye yan çewt.

Gava ku dikeve ser riya malan, bi wê yekê re jî dihizire di serê xwe de. Hê bi yekcarî ni zani bû ku ew der e yan ne ew der e. Lê bi wî re dilperîneke jî dest pê kiri bû. Her weha ku weke heyamekê dihere êdî pê de digehê nav wan malan. Gava ku digehê nav malan, êdî ew jî çavên xwe digerîne, da ku ka ma ku hinekan na bîne ku ji wan bipirse ka mala bavê Dîlberê li ku derê ye. Gava ku dikeve di nav malan de û weke hinekî diçe, êdî rastê hin kesan tê. Gava ku digehê dahma wan mirovan slava xwe dide wan û bi slava xwe re li dahma wan diraweste û ji wan dipirse ku ka ma ew der e. Mirov gava ku bersiva wî herêni didinê de, ku ew li cihê mala bavê Dîlberê lê ye, êdî ew jî ji wan mirov lava dike ku wî bibine mala bavê Dîlberê, yê ku bi navê xwe Hêşo Axa ye. Gava ku her weha Mihemed bi xwastina çûne mala Hêşo Axa dibêjê, êdî hinek ji wan mirov serê xwe bi xemgîni dikine ber xwe de û li erdê dimeyizînin. Her weha gava ku weke heyameke li nig hevdu bêdeng dimînini û di cihê xwe de êdî yek ji wan ku bi mazinatiya xwe re navser dixuya, yekî ji axiftinê hez dikir. Li Mihemed nihert û jê re bi xemgînî got; ’Ez fêhm dikim ku tu yekî zane yî û biyaniyê vê heremê yî. Tu hatî nig axayê me. Ji rewşa te jî têt têgehîştin ku tu ji reyeke dûr têyî. Tu li ser serê me hatî. Lê belê te hay nîn e ku axayê me çûye rahmetê. Em ji nûke ji çilê wî derketin. Lê ka were em ê te bibine mala wî. Kurên wî ketine dewsa wî de. Kurê wî ye mazin mirovekî mazin e û nuha jî li dewsa bavê xwe dirûne. Ew jî bi navê xwe re dibêjinê de Badran beg. Bedran beg mazin e malê ye. Ji ber vê yekê jî ew nuha li dewsa bavê xwe dirûne. Yê navîn jî heye, ku xortekî gelekî baş e. Ew jî bi navê xwe Lolan beg e. Lolan beg jî mirovkî mazin e. Ew jî weke birayê xwe yê mazin civata wî li dora wî ye û di nav civata wî de ne bi axiftin e. Yê biçûkê wan jî weke begekî tê pêşewazîkirin. Mala wî jî li aliyê mala bavê wî wan e û li nêzîkî mêrga li ber avê ye. Ew jî bi navê xwe re dibêjinê Nîge beg. Nîge beg yê biçûk ê wan e. Axayê me bi du jin bû. Ew ên ku min nuha ji te re gotin, zarokên xatûna wî ya pêşî bûn. Lê kurekî wî yê dî jî heye. Ew jî ji xatûna wî ya duyemîn e. Ew jî bi navê xwe Memyan beg e. Ew jî mirovekî gelekî zane û tê dîtin. Bavê wî jî gelekî hez jê dikir ji ber ku mirovekî pir bi fahm bû. Bi vê yekê re di

nav xelkê de hat naskirin. Vêca ka tu were em te bibine mala axayê me. Li nig kurê wî yê mazin, ku nuha jî dêla bavê xwe di nav civatê de rûnişti ye û bi mirovan re dipeyive. Axayê me mirovekî xwedî zanebûn û mêr bû. Mirov gelekî qencî jê dîti bûn. Bi vê yekê re ez bêjim mirov bi çûna wî yê ji nav me, gelekî dilêşiya wî girtin. Mirov her weha qencekî xwe winda kir.' Piştî wan gotinan, Mihemed her weha li wan mirov û li ruyên wan meyizand û sersaxî ji wan re xwast. Pişt re di nav wan de yê ku navserî bû, li wî meyizand û gotiyê; 'heger ji were ne be zahmet, hûn min bigehînin mala axê da ku ez sarsaxiya xwe ji wan re bidime nîşandan.' Gava ku Mihemed ev yek got, êdî ew jî lê meyizandin û li hev jî meyizandin û yê navsere dihate xuyakirin; 'bi xêr û silamet' got û dan pêşiya wî û çûn mala axê. Piştî ku her weha herêkirin çê bû, êdî dane dû hevdu û ketine di riya malê axê de. Mihemed gava ku di nav wan de diçû, hem li wan dimeyizand û hem ji di serê xwe de li Dîlberê dihizirî. Di wê heyamê de gava ku ew dipeyivî, wî tiştek der heqê Dîlberê na hanî bû ser zimên. Lê gava ku bihîsti bû ku bavê wê emrê Xwedê kiriye, hê bêhtir dilêş bû bû. Gava ku di rê de diçû jî gelekî bi hizir bû. Mihemed ji riyekî gelekî dûr ve hati bû. Çawa ku bi rê ketibû jî, li çi derî ne rawestiya bû, ta ku hati bû wê derê. Gava ku lê dihate meyizandin jî dihate têgehîştin, ku gelekî westiya bû. Lê wî li wastandina xwe ne dîmeyizand. Têne yê ku di serê wî de bû, dixwast ku xwe bigehîne malê axê. Li mala axê wê çawa jê re çêl û bahs kiri ba ku baş hati ba têgehîştin. Her weha di serê xwe de bi van hizran,  û bi rênîşanderên ku li dora wî pê re hati bûn ketine hawşa mala axê de. Gava ku Mihemed kete hawşa malê axê de, dît ku gelekî çûn û hatin hebû. Di nav wan mirovan ku diçûn û dihatin de, buhurtibûn odeya ku civat tê de rûniştibû. Gava ku ew jî ketine odeyê de, êdî wan ji slav dane yên ku rûniştine û bi slavbûna xwe re di nav civatê de rûniştbûn. Yên ew hanîbûn mala axê jî bi wî re buhurtibûn û di nav civatê de cih ji xwe re girti bûn û rûniştbûn. Mihemed piştî rieyekî dirêj û bi wast gihabû mala bavê Dîlberê û nuha jî di malê bavê wê û di odeya wî de rûniştibû. Di civatê de kurê wî yê mazin di serî de rûniştî bû. Gelek mirov di civatê de hebûn. Piranî jî mirovên ku rûniştî bûn,

yên ku hati bûn şînê, bûn. Mihemed di nav civatê de hinekî li dûrê Bedran beg rûniştîbû. Cihê ku Mihemed lê rûniştî bû, hinekî nêzîki devê derî bû. Her weha Mihemed piştî ku rûniştî bû, weke kêlîkeke paşê dabû xwe ku bi aliyê ku bedran beg lê rûniştibûyê bimeyizêne. Serê xwe ber bi pêşiya xwe ve hanî weke ku diq bike û bi aliyê ku beg lê rûniştibûyê ve meyizand. Gava ku serê serê xwe hanî pêşî û meyizand dît ku Bedran beg li serê civatê li ser cihê xwe rûniştî ye û bi yên li dora xwe dipeyivî.

Mihemed gava ku di cihê xwe de rûnişt, her weha weke heyamekê di cihê xwe de jî bi bêdeng ma. Car bi car ku mirov di rex de rûniştî bûn, jê re tiştek ne pirsîbana, ne dipeyivî. Lê di hundurê xwe de jî gelekî bêtebat bû, dihate xuyakirin. Di navbera cihê ku ew rûniştibû û cihê ku beg lê rûniştibû, gelek kes hebûn. Car bi car li aliyê beg ve dimeyizand ji ber ku were xuyakirin ji aliyê wî ve û bi wî re bipeyive. Lê Beg di nav peyivtinê de, weke ku xwe windakiri bû dihate xuyakirin. Bi vê yekê re jî, ji xwe re dihizirî lê di cihê xwe de bêtebat bû. Mirov di nav civatê de rûniştî bûn, tev jî mirovên ku bi mazinatiya xwe re serwer û navser bûn. Hemûkan jî mirovên ku xwe didane guhdarkirin bûn. Gelek ji wan jî dihate têgehîştin, ku ji dûr ve hati bûn. Mirov ku rûniştî bûn, gelek ji wan cilên zadeganên  herêmên din li ser wan bûn. Cilên herêman cûr bi cûr hebûn. Bi vê yekê re dihate têgehîştin ku gelek mirov ji wan mirovan ji cih û herêmên dûr ve hati bûn. Bi bêhtirî jî hinek zanistvan li wir hebûn û rûniştî bûn. Ew jî ji nêzîkatiyên wan û ji cilên wan dihate kifşkirin, ku zanistvan bûn. Cilên zanistvanan jî ne kêmi yê cilên zadeganan bûn. Ew jî bi gotin û axiftinan ve mirovên ku gelekî xuya bûn. Gava ku dipeyivîn jî, bi zanebûn, dengên xwe bilind dikirin. Ev yek jî weke ku zanebûna wan bi hebûna xwe re li ber çavan dihate xuyakirin. Ji her aliyan ve gava ku mirov li wan mirovên ku zanistvan bûn dimeyizand, gelekî jixweqayilbûna wan dihate ber çavan. Mihemed mirovekî zanistvan bû. Ew jî hêdî hêdî pê re qayilbûna wî çêdibû. Lê gava ku mirov bi Mihemed re jixweqayilbûnê şirove dike, mirov dibîne ku Mihemed bi du aliyan re nêzîkî jixweqayilbûn dibû. Ev yek jî ji nêzîkatiyên wî dihate têgehîştin. Aliyek jê jî bi wî re, bi aliyê hizir û

zanebûnê ve derdikete ber çavan. Aliyê dî jî şerê bi kibrê re xwe dadihanî holê û Mihemed gelekî jî ji vê aliyê acizbûna xwe dihanî ber çavan. Mihemed hez ji nêzîkatiyên kibrê ne dikir. Ev aliyê dawiyê dibû bingeha acizbûnên ji ber ku xwecudadîtin û xwe li ser mirov re mazindîtin pê dihate ber çavan û Mihemed jî ji vî aliyê pir aciz bû. Mirov ku zanistvan ba, ku ji van taybetmendiyan ve hinek nêzîkatî pê re diyar dibû. Mihemed van taybetmendiyên bi herdu aliyan re jî li gelek cihan dîti bûn. Bi vê yekê re jî zanibû ku van taybetmendiyan çawan in û bi çi awayî re dihênine ser zimên. Gava ku Mihemed ketibû di nav civatê de û rûniştî bû, li dora xwe pir bi bal dimeyizand. Mirov ku li dora wî rûniştî bûn, hemû jî mirovên ku di nav civatê de pir mazin bûn. Lê ta Mihemed bêhtir jî di wê kêlîkê de ne li ser wan bû. Gava ku lê dihate meyizandin, dihate têgehîştin ku bêhtir jî ji vî aliyê ve ne di serê wî de bûn. Ew ji ber tiştek hati bû wir û hê ew tiştê ku bi cih bihaniya, ne hanî bû. Vê yekê jî ew bêtebat dikir û diêşand. Mirovên ku di rex wî de rûniştî bûn jî, gava ku li wî dimeyizandin ev bêtebatbûn bi wî re pir baş û mazin didîtin û fêhm dikirin. Mihemed her weha di nav civatê de pir aciz dihate xuyakirin di wê kêlîkê de.

Gava ku Mihemed çendî bîstekê di cihê xwe de rûniştbû û hê bi beg re mafê xeberdanê ne hildabû, ku bipeyive, di acizbûna wî de êdî bi dixuya û bêhtir xwe dida ber çavan. Wilo li wî dihat ku ji wê de pê de êdî tebat ne dikir ku wisan bêdeng di cihê xwe de bimîne. Mirovên ku ew hanî bûn wir jî, hinek ji wan di rex wî de rûnişti bûn. Gava ku Mihemed careke din li beg mayizand û dît ku beg hê dipeyive, fahm kir ku wê zor be ta ku ji aliyê beg ve were kifşkirin di wê heyamê de. Bi vê yekê re li yekî ku pê re hati bûn mala axê peyivî û gotiyê; ’ma tu dikarî min bigehînî mala beg yê ku bi temenê xwe re di bi bin Bedran beg de ye?’ Gava ku Mihemed ev yek jê pirsî, bersiva herênî hilda û karê xwe kir ku bi hev re rabin herin. Gava ku karê xwe kirin, ku rabin û hema ku rabûn ser çogên xwe, beg ew kifş kirin. Beg bi dengekî bilind bi aliyê Mihemed ve xwe zivîrand û peyivî li wî; ’seydayê min, tê çi bikî? Hê em bi hev re ne peyivîne jî û çi zû wilo tê herî? Têt xuyakirin ku tu ji dûrî ve hatî. Me xwe di nav peyivtinê de bir û hanî û em bi te re ne

peyivîn. Li me bibore! Na çê na be ku tu her weha ji malê derkevî û herî. Pêşî ez bêjim ku tu bi xêr hatî vir. Tu mêhvanê me yî, de keremke cihê xwe û li reheta xwe bimeyizêne.' Mihemed gava ku beg lê meyizand û peyivî, her weha êdî Mihemed jî bi vê peyivtinê re di cihê xwe de ma. Bi axiftina ku bi beg kirî re jî, bala mirovên li civatê jî çûbû ser wan. Bi vê yekê re Mihemed jî her weha bersiva beg di cihê xwe de da; 'rast e begê min, ez ji dûrî ve têm ku ez axeyê xwe bibînim. Lê min ne dît. Min bihîst ku koçê dawiyê kiriye. Min jî dela wî tu dîtî, ku di cihê wî de rûniştiyî. Du sê gotinên min yên ku gelekî girîng hebûn min ê ji axayê xwe re gotiba. Hinek gotinên bi dilêş bûn. Lê min dît ku bi hebûna wî re jî dilêşbûna wî çê bûye, çûye ber dilovaniya Xwedê. Ez jî aliyê Cûlemergê têm. Ji Miksê me. Axayê min em nas dikirin. Begê min naskirinên axayê me jî gerek nas bike. Ew jî mazinatiyek e. Ez ji riyeke dûr ve dihêm ku bi axayê xwe re tiştekî gelekî bi dilêş bidipeyivim. Bi vê yekê re pêşîkê slav û rêzên min herê bike û pişt re li min bihişêne ku di nav civatê de ez ê çend peyvên dilêş dipeyivim. Çi bêjim û ez çend ji dil bipeyivîm.. Êş ku têt dîtin jiyanê gran dike. Êş ku têt gotin jiyanê bi êş dike. Êş ku têt gotin û têt zanîn êşa çê dike. Begê min! Kurêmê te û xwuşka te bi hev re reviyane, çûna. Lê haya we ji wan nîn e ku çi hatiye serê wan e. Vê yekê jî li bihesêne û bizani be. Lê ku nuha we li min hesand û min ji axiftina xwe hewkir, hûn ê hem ji wan bi agehdar bin û hem jî dilê we bi êş be. Pêşîkê divêt ku yê bi êş ji we re bêjim, ku xwuşka we û kurêmê we gava ku bi hev re çûbûn, ne dixwastin dilêşiyekê çêbikin. Dixwastin ku bi we re lihevbûnekê çêkinloma çûbûn. Bi hev re çûn, lêbelê hezkirin jî bi wan re di dilê wan de ji bo hevdu hebû. Bi hev re diçin xwe li Reşîd beg ku kurê Silo Axa ye digirin. Ji gotina ku min bihîstiye dibêjin Silo Axa mirovekî gelekî baş bû. Bi vê yekê re xwuşk û kurêmê te diçin xwe li wan digirin. Lê gava ku diçin mala Silo Axa, kurê wî Reşîd beg li wir dimîne û li dewsa wî dirûne. Ew jî gava ku xwuşka we û kurêmê we bi hev re dibîne çavên wî diçin ser xwuşka we û dixwaze bibe xwediyê wê di wê heyamê de. Bi vê yekê re kurêmê wê jî dikuje. Gava ku kurêmê wê dikuje, êdî xwuşka wê jî xwe ji destê wî rizgar dike û xwe dispêre çiya. Nuha divêt ku ez ji wê re

bêjim ku xwuşka we bi wê êşa di dilê xwe de xwe sipartiye çiyayê Raz. Nuha çiyayê Raz wê diveşêre. Ez nuha ji wir tem bo dîtina wê ku dilê min gelekî êşandiye. Wê ji min re gotiye ku here êşa di dilê min de û rewşa min ya ku te dît, ji wan re bêjê ku da werin êşa min dilê min bibînin.’ Bi wan gotinan re bêdengi bi hemû mirovên ku li wir rûnişti bûn çê bû. Hemû jî wilo li çavên Mihemed û yê Bedran beg dimeyizandin. Gava ku beg gotinên Mihemed seh kirin û Mihemed gotinên xwe hewkirin, beg ji cihê xwe rabû ser xwe di wê heyamê de. Gava ku beg rabû ser xwe, her weha bi hinek gavan re hate nig Mihemed û li hevberê wî rawesta û her weha jê re û di nav civatê de dipeyivî; ’Seydayê min, te bi van gotinan re dilê me kire pûc û hûrhûr kir. Diya me û ya wê ne yek e. Lê em ji xûnekê ne. Tiştê ku te nuha gotî ji min re, li ber wan gotinên te rawestin jî bêxîretî tê jimartin. Em çi carî vê yekê herê na kin.’ Bi vê yekê re Bedran beg bang kire xûlamên xwe û bi wan re xeber şande ji birayên xwe yên din re ku di cih de werin wê derê nig wî da ku bi hev re bin. Bi wê yekê re mirovên ku li dora wî bûn bi wan re jî bêdengî berdewam bû. Di rewşên weha de gava ku kî amade be, diviya bû ku xwediyê malê bi têne ne hişta. Yên li wê derê hemû jî li nav çavÊn Bedran beg dimeyizandin weke jê re bejin, ku ka ma em çi bikin? Bedran beg di wê heyamê de gelekî bi qahr dihate xuyakirin. Her weha gava ku xûlamen wî jî çûn ku xeberê bidin begên din ku ew jî werin nig wî di wê heyamê de, ew jî li ser lingan bû û li paş ve li xûlaman dimeyizand ta ku ji ber çavan winda bûn.

Mihemed gava ku gotinaxwe goti bû, êdî weke ku hinekî rehet bû bû. Lê di dilê xwe de hê jî weke ku ne rehet bû. Dîlberê di mejiyê wî de bû. Gelekî li ser Dîlberê dihizirî. Gava ku ji wir hati bû, Dîlberê li wir bi tenê ma bû. Ev yek jî di mejiyê wî de bû. Bi vê yekê re jî ne rehet bû. Bedran beg jî li ser lingan bû û li pêşiya wî bû. Bedran beg kurê Hêşo Axa yê herî mazin bû. Di nav zarokên wî de jî yê yekêmin bû. Bavê wî pir hez jê dikir. Bi temen jî mirovek ku ne biçûk bû. Ew bi xwe jî xwedî jin bû û navê xatûna wî jî Rejnîser bû. Rejnîser jî ji mala axê bû. Gava ku Bedran beg têt 18 salî, êdî Hêşo axe Rejnîser’ê bi wî re mar dike. Mala bavê wê mala axê bûn. Di

dema xwe de gelekî bi nav û deng jî bûn. Lê di şerêkî ku hêrisê de ku hinek leşkerên osmaniyan têne ser herêma wan, hêza xwe winda dikin. Piştê eşîra bavê Rejnîserê Hasê Axa di wê hêrişê de tê ser wan de dişikin û winda dikin. Hasê Axa di nav eşîrê de ne bi nav Hasê Axa dihate ser ziman. Mirov bi wî navî ji ew nas dikir. Lê belê piranî digotinê de Eliyê Hasê. Navê bavê wî jî Hasê Axa bû. Navê wî jî bavê wî kiri bû Elî beg. Lê Elî Beg zû de dimire. Gava ku bavê wê ji zû de dimire, êdî Eliyê Hasê jê re têt gotin. Lê êdî bi navê bavê wî weke Hasê Axa jî jê re te gotin. Mirov ku gelekî bitfire bû û eşîra wî jî mazin bû. Navê herêma wî jî digotinê de Rizbinê. Rizbinê jî herêmeke, ku gelekî mazin û kevn bû. Cihekî ku xwediyê dîrokekî gelekî kevn bû. Li Rizbinê gelek fileh û êzdî jî dijiyan. Lê navenda wê piranî jî fileh bûn. Di wê herêmê de bêhtir fileh hebûn. Ji ber vê yekê jî ji aliyê çanda olîtiya filetiyê ve jî cihekî ku gelek pêşketî bû. Dera Rizbinê jî mazin û bi nav û deng bû. Piştî bisilmanetiyê jî hebûna wê berdewan kiri bû. Çend li herêmê hêriş bûbûn jî dîsan wê derê hebûna xwe berdewam kiri bû. Mirov digotiyê de Dera Derizibînê. Pişt re her weha navê Derê bi navê herêmê ve dibe yek û dibe navê herêmê. Navê Derizbînê ji herêmê re dimîne. Lê gava ku hêrişên osmaniyan dihên ser herêmê, êdî herêm bêhtir li ber xwe na de û dikeve. Hasê Axa jî di ser de têt kuştin. Ji Malbata wî jî yê ku dimînin sax jî, hinek ji wan dihên nig Hêşo Axa ku xwe bisipêrinê de. Hêşo Axa wan dike nav xwe de û diparêze. Di wê demê de gava ku tên, Rejnîserê hingê 13 salî ye. Gava ku tên û pişt re ew jî mazin dibe, êdî ew û Bedran beg bi hev re tên markirin. Rejnîserê û Bedran beg di temenê hevdu de bûn. Ji wê herêmê hinek êzdî jî hebûn ew jî yên ku di filitîn diçûn herêma Mûşê yan jî herêma Laleşê. Li herêma Mûşê ji eşîrên êzdiyan gelek hebûn û ji aliyê hêzê ve jî ne kêm bûn. Rejnîserê piştî ku bi Bedran beg re mar bû, êdî pê de sê zarokên wê çê bû bûn. Keçek û du kurên wê bûn. Zarokê wê yê pêşî kur bû. Ew jî di wê demê de baş mazin bûbû û gihabû 16 salên xwe. Mirovekî gelekî jêhatî jê derketi bû û navê wî Sekban bû. Gava ku hêriş têt ser herêma bavê Rejnîserê, êdî ew herêm gelekî bêmirov dimîne. Keçên ku sax dihênin girtin jî gelek ji wan ji aliyê leşkeran ve tên

birin. Her weha ji eşîra Rizbiniyan çi kesek din na filite. Yên ku difilitin jî gava ku hêriş wê bibe û berî ku bibe, leşkerên ku diçe ku hêriş di rê de ye, ji aliyê mirovan çawa dihên dîtin, xeberê digihênin eşîrên dorê da ku werin bi hawara wan ve. Yên ku rizgar dibin jî gava ku suwarên eşîran diçin û tên, êdî yên hêrişker jî ku baz didin diçin rizgar dibin. Di wê heyamê de yên ku ji wan dimînin sax jî rizgar dibin. Lê gelek ji wan yên ku dimînin sax jî, weke keçên wan hêrişkaran bi xwe re dibin û diçin. Bi vê yekê re, herêm dimîne vala ji mirovan. Lê yên ku destên wan ji warên wan na bin jî, li herêma  xwe divegerin û carekê din jî hebûna xwe bêhtir dikin û berdewam dikin.

Bedran beg her weha piştî ku Mihemed jê re behsa Dîlberê kiri bû, êdî ji cihê xwe rabû bû û ne rûnişti bû. Hadana wî ne dihat ku rûne. Mirovên li dora wî jî, bi wî re weke ku bêhadan bûn, dihatine xuyakirin. Her weha li ser lingan ma bûn û li hêviya birayên xwe yên din bûn ku werin. Di wê heyamê de mirovên ku li wir weke serokê êlên din hati bûn wir, xeber dişandine ji herêmên xwe re, da ku ji bo her rewşê xwe amade bikin. Bi vî awayî gelekî lebateke mazin dest pê kiri bû. Lê lebata ku bi bedran beg re hê mazintir bû. Bedran beg gava ku xebera Dîlberê seh kiri bû, êdî ji her aliyê ve lebat û bidengi pê re çê bû bû. Mirov ku di wê kêlîkê de dihatine hevberê Bedran Beg pir bi bal li nav çavên wî dimeyizandin. Mereq, Lebatî, bidengi, hêrsbûn û her weha qaharandin ji ruyên mirovan xwe mazin dida derve. Mirov ku li nig Bedran Beg diman jî gelek ji wan jî bi bêdengiyeke ku dixwastin ku fahm bikin ku ka ma wê çi bibe, wisan di cihê xwe de ma bûn. Gava ku dihate meyizandin, dihate têgehîştin ku di her rewşê de wê tiştek bûba. Lê ka ma wê çi bûba ew yek ji hê ne xuya bû. Di wê heyamê de jî hêdî hêdî birayên wî yên din jî çawa ku xeber hildabûn, ew jî keti bûn rê de û hati bûn. Di wê heyamê de birayê wî yê biçûk pêşîkê dabû devê derî û hati bû. Ew jî yê ku bi navê Memyan Beg bû hati bû. Memyan Beg birayê Dîlberê yê ku bi hev re ji dayikekê bûn. Hêdî hêdî birayên wî yên din jî dihatin. Gava ku ew jî hatin, hemûkan li nig hevdu kom bûn. Bedran Beg êdî ku gava hemû hatin ji wan re dest bi axiftinê kir: 'î roj min tiştek bihîst ku pişt koçkirina bavê

min re ji me re gelekî giran e. Xwuşka me gelek tiştên ku ne baş in hatine serê wê û nuha wê bi hebûna xwe re xwe spartiye Çiyayê Raz. Em ji bavê xwe fêr bûn, ku em di her demê de bi hev re bin û li nig hevdu bin. Î roj rojeke weha ye ji bo me. Dilşad hatiye kuştin. Ew jî ji me ye û kurêmê me ye. Çend malbatên me ne li hev bin jî, dîsan ev yek divêt ku em rast û herê bikin. Dilşad xortekî gelek hêja bû. Bi xwuşka me re hevdu revandibûn. Çûbûn mala Silo Axa û xwe li wan girti bûn. Lê Silo Axa ne li jiyanê bû û kurê wî ye bi navê Reşîd Beg di dewsa wî de û destê xwe kiriye xûna kurêmê me û xwuşka me. Hûn jî dizanîn ku em ji nûke ji çilê bavê xwe derketin. Hê ku êşa bavê me dilê me dişewitand, êşeke din ket dilê me. Ev yek ji me re gelekî gran e, ku di vê demê de me ji malbate xwe hinekên din jî windakirin. Piştî ku bavê min rahmet kir êdî ez weke mazin ê we û malê me. Min biryara xwe ya pêşî her weha li ser êşa me de. Vêce nuha min bang li we kir ku ez ji we re bêjim min biryara şerê li Reşîd Beg bikin da! Hûn jî xwe ji vê yekê re amade bikin. Rabin ku em herin xwe bidine nîşandan ji Reşîd Beg re ku ka ma em kî ne.’ Piştî van gotinên Bedran Begê, di ruyên birayên wî de û di yên dora wî de matmayin, hêrsbûn xwe dabû nîşandan. Bi ve matmayinê re her kesek di cihê xwe de bêdeng mabû. Mihemed jî her weha di cihê xwe de bêdeng ma bû. Êdî karê şerê li ser Reşîd Beg dihate kirin di wê heyamê de. Mirov ku diçûn û dihatin êdî gelek bûn. Çi mirov tiştê ku Reşîd Beg kiri bû ne dipêjirand ji ber ku ne hebûn û ne jî çanda civakê vî tiştî dirakir. Karekî berûmet bû. Kî jî ba, bêceza ne dihate hiştin. Di wê heyamê de xeber zû digehê eşîrên ku li hawîrdorê diman. Ew jî vê yekê ne dipêjirandin û xeber ji Bedran Beg re di şandin, ku pê re bûn. Eşîrên hawîrdora weke serek, eşîra Bedran Beg didîtin. Di serokatiya eşîrê de gava ku axa bimire êdî yê ku were cihê wî, di çûn û hatina mahzitiyan de ye ku di cihê wî de di dewsa wî de dirûne ku wê bibe axa. Ew yekê jî weke kevneşopiyêkê bi cih dihate hanîn. Piştî ku bavê Bedran Beg jî koçê dawiyê kiri bû, êdî weke yê mazin ew çûbû ser û weke serekê di nav mahzitiyan de bû. Bi vê yekê re çawa ku Hêşo Axa diçe ber dilovaniya Xwedê, êdî Bedran Beg jî mirovê ku dihatin mahzitiyê pêşewazî dikir. Bi vê

yekê re ew jî êdî her weha dibû weke serekê eşîra û wilo dihate naskirin. Bi vê yekê re êdî biryara ku Bedran Beg bida, çi kesekî ni kari bû ku bêjê ku ez herê na kim di nav tevaya eşîran de. Bedran Beg her weha êdî serekê eşîrê bû û wê hêdî hêdî ji bûba Axaye eşîra di demê de. Axatî weke rewşeke sereke bû.

Di mala axê de amadekariyeke pir mazin dihate kirin ji bo ku herin şerê li ser Reşîd Begê. Bedran Beg nuh hati bû ser eşîra xwe û diçû şer. Mirov tev li dora wî bûn. Gelek mirovên ku hê di dema bavê wî de li nig wî bûn, nuha dîsan bi wan re û li nig Bedran Beg bûn. Ew mirov jî mirovên ku sereke bûn û pir zane jî bûn. Ta wê kêlîkê Bedran Beg çi biryar dabû deng ji wan ne derketi bû. Gelo ji ber ku xelet didîtin loma deng ne didan an jî gerek ne dîtin ku bipeyivîn. Axiftina wan bêguman wê hê bêhtir bawerî daba Bedran Beg di wê rewşê de. Lê deng ji wan ne derketi bû. Di ciyên xwe de bêdeng ma bûn. Ew jî wê bi begê xwe re çûbana şerî. Wan jî amadekariyên xwe dikirin.

Mihemed jî piştî ku bi Bedran Beg re dipeyivî, êdî mabû bêdeng di cihê xwe de. Ew jî di rewşê xwe de dihizirî û dihizirî. Lê çi dihizirî ji di serê xwe de dihizirî. Di wê kêlîkê de çi kesekî nizanibû ku çi di serê xwe de dihizirî. Lê mirov ku ew ji ku derê hatiye û çi jinbû ye û her wêhê çi dîtiye ku zanibihêne wê zan bikirene ku ka ma çi dihizire an ji çi di serê wî de heye. Mihemed gelekî bihizir bû û di cihê xwe de sekinî bû. Mirov li dora wî diçûn û dihatin di wê heyamê de. Beg ji di wê heyamê de li nig wî bû. Beg li ser duseke di cihêLê wî ye rast e de rûniştibû bû. Lê bi hev re buhurtibûbûne nêzîki cihê ku beg Lê dirûnişt. Mirov ku li dora wan ji li wan bi bal dimeyizandin. Ta wê kêlîkê Mihemed ne di bala wan mirov ku li wir rûniştibû de bûn. Lê gava ku her weha ku mihmed biaxiftin dîti bûnn êdî fahmkiri bûn ku ew mirov ne mirov ku nezane û bezane. Bi vê yekê re bala mirov çûbû ser wî. Bedran Beg jî li oda rûniştinê de geh dirûnişt û geh dirabû ser xwe de. Ew behadan bû. Di wê heyamê de bi hadanbûn jî bêguman hinekî dijwar bû. Nexasim mirovên wek wî ku çavên hemûkan jî li ser wî bû di wê heyamê de. Di rewşên weha de mirov li gavên began an jî axayan dimeyizandin. Beg yan jî axayên wan, ji wan re dibûn

rêber di rewşên weha de. Bal û çavên her kesî li ser Bedran Beg bûn. Mirov li gavên wî dimeyizandin. Rewşa wî helak bû. Beg di wê heyamê de li dora xwe dimeyizand û li yên dora xwe ne qadr û qiymetê dida wan. Ne têne di wê heyamê de di her heyamê de ev yek hebû. Lê di rewşên weha de diviya ku di bin zanebûnê wan de gav bihatina avêtin, da ku di xeletî ne hatina kirin. Amadekariyên şerê de hêdî hêdî digeha dawiyê. Her kesekî yê ku wê çûba şer, hêdî hêdî xwe amade dikir. Lê bêguman wê kengî çûbana çi kesekî jî tiştek ni zanibû. Di serê çi kesekî de çi hizîrek ne bû. Lê gava ku li ruyê wan mirovên ku xwe di wê heyamê de amade dikirin dihate meyizandin, dihate dîtin ku gelekî bi hêrs û qahr bûn. Hemûkan jî yên ku xwe amade dikirin peya bûn. Hemûkan jî berî hingê gelek geştê şerî kiri bûn û şervanên baş bûn. Hemû jî simbêlqeytan bûn. Hemûk jî şûr û xencerên wan di ber wan de, bi wan re bûn. Hemû jî ji bo şer xwe bi şûtikan girê didan û li hêspên xwe suwar dibûn. Mirovên sereke jî her weha li nig beg bûn û hê li hundurû bûn. Hinek ji wan mirovan ku serek bûn û di amadekariyan de cih digirtin jî, diçûn û dihatin di nav mirovan de. Di şerekî de diviya bû ku kêmasî ne hatîbana jînkirin. Gava ku kêmasiyek derketiba, dibit ku ew kêmasî bûba bingeha tekçûna wan di wê heyamê de. Ji ber vê yekê jî pir baş diviya bû ku wan xwe amade kiri bana û bi bal û serinc bana. Her weha encax wê serwerî rewşên ku derketibana pêşiya wan bûbana. Di her rewşê de ji bo ku serkeftin were pê, divêt ku mirov serwer be. Serwerbûn jî xwe baş amadekirin û hizirandinê re çêdibû. Ev herdû aliyên ku di bingeha xwe de zanebûn parastin, êdî mirov dikarê bêjê ku wê serkeftin bihaniyana ji xwe re. Zanebûn di rewşên weha de gelek bi nirx e.

Gava ku digehîjin ber bi esrê ve êdî hema mirov dikarê bêjê ku amadekariyên wan ber bi dawî dihatin. Wa ye dibû êvar. Ma gelo wê ber vê êvare rê kevinê de? Wilo dihate xuyakirin ku her weha wê bi êvarî jî bana, wê ketibana rê de. Gava ku bi ber bi êvarî re xeber dane beg ku amadekarî ber bi dawiyê ve tên, êdî beg jî amadekariyên xwe kiri bûn. Bedran Beg gava ku amadekarî hew dibin, Memyan Beg da nêzîkê xwe û li pêşiya suwaran di rastkirinê

de ku jê re bibe alîkar. Lê Bedran Beg komeke dî jî, ji suwarên ku gelekî xort in, dide amadekirin û Lolan Beg jî da ser serê wan û bi rê ket. Ew kom jî koma suwaran bû û gelekî bi hêz û xurt bû. Ew kom jî wê li pêşiya wan çûba, hem ji wan re rê vekiri ba û hem jî, wê li pêşiya wan wê xwe gihandi ba cihên ku herinê de, ku çi tiştên nebaş ne bin. Lê her cihê ku tê re wê çûban jî, li hinek cihên ku wê kifş bikin wê hinek mirovên din li wir bigrin nav xwe û bibin yek. Ev yek jî hem ji bo ewlekariyê bû û hem jî ji bo ka ma hêzen Reşîd Beg çawan e û li ku derê bi cih in werin kifşkirin. Di navbera Lolan Beg û Bedran Beg de jî Nîge Beg ji wê koma pêşî bû û wê li pêşiya Bedran Beg û wan çûba. Ji aliyekî din ve jî wî hinek komen din dabûn amadekirin. Ew kom jî wê di cihê Bedran Beg û wan re biçûna. Lê wê ji wan ji bêhtir ne dûrbana, daku kari ba di cih de xwe bigehandinawan di rewşên nebaş de. Cihê ku lê kom bû bûn jî, wê koma Lolan Begê kifş kiri bana û ewlakariyê hildabana. Lê Lolan Beg jî bi suwarên xwe re wê ji dûrî ve wan parastiba. Lolan Beg jî her weha li pêşiya xwe hinekî mirov ku ji aliyê leşkerî ve û ji aliyê zanebûnê leşkerî ve baş bûn şandi bûn da ku rewşa herêmê jê re bêjin û wî agehdar bikin. Ew suwarên ku li pêşiyê jî diçûn, cihê ku wan xwe digihandiyê de, li wan deran jî wê çavdêrên Lolan Begê didanîn. Ji aliyê çavdêriyê ve ew mirovê pêşeng weke zemanêkî çavdêriyê bi xwe re çê kiri bûn. Çavdêrî ewlekarî ye û her weha gelek çavdêrên wan hebûn. Yên ku di pişt wan de diçû jî ji wan nîşanan fêhm dikirin ku ka rewşê wê derê çawa ye. Wan suwarên pêşeng jî, ji aliyê naskirina herêmê ve jî gelekî xwediyê hunereke mazin bûn. Bedran Beg her weha ji paş xwe ve jî ewlakariyeke mazin girti bû. Ji hev jî ne dûr û bêtêkilî bûn. Bedran Beg rastkirineke wilo kiri bû ku gelekî ewlekariyeke mazin ji wî re û ji şervanên wî re çê dikir. Bi çendî ku rewşa Lolan Beg ji wan re dibû ewlakar, ya wan jî ji wî re dibû ewlakar. Hêza ku bi Nîge Beg re jî bû, Bedran Beg dabû pêşiya xwe û pişt Lolan Begê. Nîge Beg bi hêza xwe re dikari bû ku xwe di cih de bigehanda herdû aliyan jî di wê heyamê de. Hêza Nîge Beg hêzeke ku hem ji ewlakariyê re bû û hem ji lêxistinê re. Hêza Lolan Beg jî, hem ji ewlakariyê re bû û hem jî parastin û çavdêrkirinê re bû. Ji xeynî wan hêzan jî,

hêzeke ku di rewşên nebaş de bi du aliyan ve wê kari ba bal bikişanda ser xwe jî, hati bû amadekirin.Hêzen bal kişandine jî bi çendî ku weke komên teybet hati bûn amadekirin her weha jî weke ku di nav koma Lolan Begê de bi alî û bi nîzam bûn û her weha komên ku dikari bûn ku bi serê xwe jî gavên biavêtana hebûn. Di nav komên din de jî her weha weke vê koma balkişandina komên din jî, yên bal kişandibin hebûn. Lê hebûna wan diviya bû ku ne hati ba kifşkirin. Lê taybetiyekî wan koman hebû ku gelekî girîng bû. Gava ku ketibana tangasiyê de di cih de bi hêz dibûn. Ev yek jî ji rastkirinên koman dihat. Bi çendî ku her weha bi hev re bi têkilî bûn, her weha jî ji ji hev bi pêwendî dihatine xuyakirin. Bi vê yekê re Memyan Beg jî bi mirovên zane û yên ku li dora rastkirinê kar dikirin. Memyan Beg yekî ku hê cuwan bû. Lê ji aliyên weha ve mirovekî zane bû. Gava ku Memyan Beg rastkirin dide avakirin, ta ku kîjan mirov wê li kîjan hespê jî suwar be, yan jî li hespekî çawa suwar be dida kifşkirin. Wî ev yek jî gelekî girîng didît. Li gor wî 'mejiyê mirov di raskirinê de têkneçûnê kifş dike.' Wî her weha gelekî girîngî dida rastkirinê. Ji bo van fêrbûnên xwe jî bi mirovekî ku ji aliyê hizir ve mazinbûn pê re hebû. Li dora wî gelek mirovên ku zane bûn hebûn. Wan mirovan jî ji aliyê mejî ve yan jî ji aliyê rastkirinê ve wî pêş xistibûn. Ew bi xwe jî mirovekî ciwan bû û her weha di wan aliyan de hunera xwe didanî ber çavên ji mirovan de. Lolan Beg jî mirovekî ku dema ciwaniyê buhurandi bû. Bi vê yekê re jî hebûna şer jî dîti bû. Ji aliyê nêzîkatiyên şer ve jî ne mirovekî ku nezan bû. Mirovekî ku zane bû. Baweriya mirov jî pê dihat. Ji ber ku mirov ew di demên zor de dîti bûn û zani bûn ku mirovekî çend xwedî huner û hêz e. Di gelek cihan de bi bavê xwe re ma bû û tiştên mazin dîti bûn. Lolan Beg û Memyan Beg di gelek rewşan de weke ku hevdu temam dikirin dihate ber çavan.

Bedran Beg li ser hespê xwe bi gelek mirovên sereke re ku li dora wî bûn, diçû. Mirovên ku pê re hati bûn hemû jî giregir û serekê eşîran bûn. Mirovên li dora wî mirovên ku di demên zor de buhurti bû. Piraniya wan jî xwediyê zanebûneke mazin bûn. Bedran Beg li ser hespekî sipî suwar bû bû. Hespê wî hêspekî ku

mahînek bû û gelekî ji hêja bû. Hespên yên mirov din yên ku weke sereke pê re hati bûn jî gelek ji wan sipî bûn. Lê yê Bedran Beg ji aliyê amadekirinê ve jî weke ku diyarbûneke wî hebû. Bedran Beg li pêşiya suwarên xwe bû û serekê eşîrên ku pê re hati bûn jî di rex de bûn û diçûn. Ji aliyekî din ve jî gava ku ji pêş ve li wan dihate meyizandin, dihate dîtin ku ji keviye rast û çepê ve bêhtir fireh bûn bi suwarên re dihate ber çavan. Her weha wilo dihate ber çavan ku hêrişeke di cih de bûba, wê begê xwe kiri bana nav xwe de û biparastina. Lê begek çi cari ne dixwast ku li paş bimîne li nav leşkeran. Ew jî bi leşkerên xwe re di nav zorê de cih digirt û bi wan re re şerê xwe berdewam dikir. Di wê heyamê de jî tiştê ku dihate dîtin jî ew bû ku beg li pêşiya leşkerên xwe bû hem ji bo ku xwe bide nîşandan û hem ji ji bo arîşeyên leşkerên wî bi cih bihêne. Gava ku di rewşekê de arîşe xira bû, êdî tekçûn çêdibe. Bedran Beg vê yekê weke ku zanibû li leşkerên xwe dimeyizand û wan dilxweş dikir.

Nûçe ji Lolan Begê tê ji wan re ku wê li ku derê bin û wê li ku derê daynin. Lolan Beg bi pêşeng û berîvanan re biryara xwe dide ku ka li ku derê baş e û divêt li ku derê dahênin were xuyakirin. Gava ku kifşdikin ji pêşengek ji pêşengên ku bi wî re di kifşkirinê de cih girtî jî, dikevin rê de û tên nig Bedran Beg û serekeyên din û ji wan re dibêjin ku wê li ku derê dahênin. Hingê pêşeng tiştê ku diviya bû ku ji wan re bêjê ku got, êdî ji wê pê de ku di serê hineken de jî yên ku li wî hesandin ku tiştek ji bo pirsbûna di serê wan de hebe ew jî dipirsin û mejiyê xwe zelal dikin. Li herêmê û li ser cihê ku wê lê dahênin, di şeran de rewakirin çê dibe. Lolan Beg cihê ku xuya kiri bû hinekî ji Çiyaye Raz wir de bû. Bi aliyê herêma Reşîd Beg û ji Çiyayê Raz wir de cih hati bû amadekirin.

Di vê heyamê de jî divêt ku mirov bêjê Mihemed jî bi wan re keti bû rê de. Ji Mihemed re jî hespêk peyda kiri bûn û ew jî suwar bûbû û bi wan re ketibû rê de. Hespê ku Mihemed li ser suwar bû di rex Bedran Begê de diçû. Lê gava ku lê dihate meyizandin, weke bêhtir ne bi kêf bû ku li ser hespê suwar bû bû. Wî hez ji peyaçûn- û hatinê dikir. Lê rewşa wan jî ne rewşa Mele Seîd bû ku piyade herin. Ji ber vê yekê jî ew ji li ser hespek bû suwar bû û bi

wan re keti bû rê de.

Lolan Beg li pêşiya wan û li ser serê leşkerên xwe diçû. Lolan Beg gava ku ber bi Çiyayê Raz ve têt, Dîlberê têt hişê wî di wê heyamê de. Dîlberê li ser wî çiyayi dima bi kul, bi elem û bi wan êşên gran ên di dilê xwe de. Mihemed jî hinekî bi dilper bû di çûna li nêzîkiya çiyê. Dîlberê hîç ji mejiyê wî ne derdiket. Di her kêlîkê de li ser wê dihizirî û dihizirî. Dîlberê li ser wî gelekî bandûreke mazin kiri bû. Dîlberê li ser serê Çiyayê Raz dima. Lê ew ji wê cihê ku lê maba ji çiyê wirde bû. Lolan Beg pêşîkê têt ber çiyê dike ku xwe bigehene wê di wê heyamê de. Lê gava ku diçe ew wê nabine. Hinek mirov jî li wir dihêle da ku li wê bigerin û wê bibînin. Ew bi xwe jî diviya bû ku li pêşiya suwarên xwe be ji bo ku cih ji yên ku wê werin re hati ba amade kirin. Lolan Beg bi suwarên xwe re dikeve wê herêmê de êdî bi suwarên xwe re dest bi girtina ewlakariyê dike. Gava Lolan Beg bi suwarên xwe re dikeve herêmê de û ewlakariya herêmê ji bo Bedran Beg û leşkerên ku wê werin digire û cih ji wan re amade dike, êdî ew jî dike ku ber bi Çiyayê Raz ve vegere. Lê pêşegek wî dide rawestandin ji ber ku diviya bû ku ewlakarî bihatina girtin û sehêtkirin li ser herêmê hati ba avakirin. Ji bo vê yekê jî diviya bû ku ew li ser serê suwarên xwe ba, da ku sehêtkirin hati ba kirin. Lê hizra wî ji li ser Çiyayê Raz bû û li ser Dîlberê bû.

Dîlberê li ser serê çiyê bû. Gava ku ew hati bûn jî di cihê xwe de wê ew dîtin ku dihatin. Lê di xwe de ne didît ku here nig wan. Rewşa ku ew te de bû rewşeke gelekî xirab bû. Cilên li ser wê qetiyayî bûn.Laşê wê ji di çilê wê de dihate xuyakirin. Wê çawa derketiba pêşiya wan? Wê ew rû di xwe de ne didît. Gava ku dibîne ku ew dihên, dilopên hêsiran ji çavên wê de dikein ser kabûkên wê de. Gelekî bihest dibe. Di dilê xwe de dixwaze ku ji xwe re bigirî û digirî. Lê bi xwe re weke ku şer dikir da ku xwe bigire, da ku deng ji wê ne derkeve. Di wê heyamê de xwegirtin gelekî jê re zor dihat. Gava ku wê ew dîti bûn, jiyana wê ya berê qat bi qat di ber çavên wê de çû û çû. Jiyana ku berê jiya bû bi Dilşadî re, hatina suwarên ji bo şer û rewşa wê ya di wê kêlîkê de ew tê de bû. Çi kiri ba ji ev her sê rewş li ber çavên wê ne diçûn.

Ew her sê rewşên ku gelekî êş didanê de. Wê çawa derketi ba ber çavên mirovan? Ew bi xwe jî li jorê wan bû. Hêdî hêdî ew jî ber bi jorê ve diçûn. Gava ku didît ku ew hêdî hêdî ber bi jorê ve dihên, dilperiya wê ya ku di dilê wê de bêhtir dibû. Wê xwe di nav hajên daran de veşartî bû.

Hêdî hêdî komên şervanên din jî, ji ser aliyê çiyê ve derdiketin û ber bi koma Lolan Begê ve diçûn. Çend kom bêhtir dihatin wê ji fahm dikir ku wê hê koma şervanên herî mazin were. Bi hev re weke artêşeke gelekî mazin dihatine xuyakirin. Piştî ku hinek komên biçûk hatin, êdî Dîlberê ji dûr ve dît ku artêş wa ber bi wê ve têt. Gava ku hê dûr bûn û her weha li wan dihate meyizandin, dihate dîtin ku mirov digot qey komên miroyên girtine erdê û dihên. Gelek mirov ji dûr ve dihatine xuyakirin. Lê wan jî dilê Dîlberê rehet ne dikir. Ma gelo wê ev kari ba ku Dilşad sax bike, vejîne û bihêne hevberê wê? Ev yek ne gengaz bû. Lê ji vê yekê dihate têgehîştin ku hê Dîlberê çûna Dilşad herê ne kiri bû. Dilşad hê di serê wê de weke berê mabû. Wê car bi car gava ku dihizirî digot; ‘a ha wê nuha Dilşad wa li hevberê min be’.  Carina jî weke ku li hevberê wê be li wê dihat. Lê dimeyizand û dimeyizand. Dilşad jî her weha di dîtina wê de lê dimeyizand. Dilşad gava ku di Newrozê de ew dîti bû,  her weha hema li wê bi ken meyizandi bû. Di wê kêlîkê de jî weke ku li hevberê wê be û lê bimeyizêne û bi ken lê dihat. Her weha gava ku wilo li wê dihat, ku ew li hevberê wê ye û li wê dimeyizêne, êdî wê jî wilo li wî dimeyizand. Wê gava ku ew di dîtina xwe de rûken didît, wê jî dixwast ku bikene. Lê ne dikenî. Ni karî bû ku bikene. Weke ku di hundurê wê de tiştekî ne dihêşt ku ew bikene. Gava weke ku ew didît wilo li wê dihat, wê digot qey laşê wê tevizî be. Çawa ku marek hê serê sibehê bitevize û her weha ji ber wê tavzê ku ni kari bû lebat bikira, ew jî wilo tevizî bû.Wê ne kiri bû bikene. Ku hewlê dida xwe bi vî awayî re bersiva bi ken bide Dilşadî. Lê ni kari bû, qirika wê tijî dibû û di qirika wê de dima. Wê tijîbûna wê ne dihêşt ku ew bikene. Ne dihişt ku wan lêvên xwe yên ku sor bû bûn, bigehîne hevdu. Dîlberê li dunya xwe her weha dijiya. Li dunya wê hê Dilşad bi wê re bû û bi wê re dikenî. Wê jî bi wî re dixwast bikene, lê ne dikenî.

Çima? Wê di hundurê xwe de Dilşadî di jînê de hişti bû. Ew hiştin bû ku dikir ku ew bi hev re dikenîn. Lê çima wê ni kari bû ku bikene? Kenkirin carina çend zor e. Carina bi êş dike. Ken ji şahiyê dihêt. Gava ku wê ew didît ne dikari bû bikene? Ew ken ji ber ku ne ken bû. Ew ken girî bû. Ew ken giriyê dil bû. Dîlberê di dilê xwe de her dem dikir girî. Ta ku sax be, wê her û her kenekî ku giriya dilê wê bide derve wê hebe. Girîna dil wê her dem xwe li nig wê bijiyanda. Dil digirî. Dilê digirî jî dilê Dîlberê bû. Dilgirîn bi xwe re zivistana jiyanê dihêne. Gava ku giri bû wî çaxî jî serma û elema zivistanê di dilê wê de hebû. Di dilê Dîlberê de serma û elemek hebû. Ew serma û elem bi wê re bû bû kelem. Dîlberê dil bi kul bû, elema di dilê xwe de win bû bû. Gava ku suwarên ku dihatin wê her hê bêhtir ji xwe ve biri bû. Ji ber ku weke ku bi rastiyekê re rû bi rû bihata lê dihat. Gelo ew rastî jî çi bû ku wê her wisan ditirsand? Rastiya ku di ser û dilê xwe de herê ne kiri bû. Bi vê yekê re weke ku ne dixwast, ku wan bibîne. Lê wan jî ber bi wê ve dihatin û dihatin.

Hêza mazin ya ku Bedran Beg li ser serê wê ye hêdî hêdî dihat. Dîlberê li cihê xwe ye ku rûnişti bû hatina wan didît. Hema wilo di cihê xwe de rûniştibû û li hatina wan dimeyizand. Dihatinê de çend ku nêzîk dibûn û ber bi wê ve dihatin. Lê Dîlberê wêra ne dikir ku derkeve pêşiya wan û xwe şanî wan bide. Dîlberê ji wan bêhtir ne dûr bû. Dengê xwe kiri bana, dibit ku wan wê dengên wê seh jî kiri bana. Lê di xwe de ne didît ku derkeve holê û here nig wan. Ji aliyekî din ve jî weke ku ne dixwast ku ji wir biqete û here. Wilo li wê dihat ku ji wir çûba wê ji Dilşad jî qut bûba. Dibit ku sedemeke ku di dilê wê de ye, ew jî ew yek bû, ku wê ji wir ne dikir. Ew demeke dirêj bû ku li wir bû. Li wir di her kêlîkê de Dilşad di serê wê de bi wê re û li nig wê bû. Ditirsiya jî ku ji wir çûba wê ew dîtinên wê li wir maba. Her weha wê ne dixwast ku ji wan dîtinên xwe veqete û here. Wê ne dixwast, ku tiştên ku didîtin û dihatine ber çavên wê de ji wan biqarehe û here. Her weha ew çiya jê re bûbû weke malekê. Çiyayê Raz di razbûna xwe de weke ku tiştek veşarti be û ew jî bi wî tiştî ve girêdayî be. Dêşt û çolên ku li ber çavên wê dihatine xuyakirin jî, weke ku wê bi dîtina xwe ve

girêdabûn lê dihat. Wê çawa ji wir veqetiya ba? Evîna wê ya ku di dilê wê de li wir weke ku li wê derê xwe dijiyand, bi wate kiri bû. Bi vê yekê re ne dixwast, ku ji wir biqarehe û here. Ne dixwast ku ji evîna xwe her weha biqarehe û here. Evîn di dilê wê de bû û evînek jîndar bû. Her dem jî di dil de wê xwe vejanda. Evîn di dil de hebûneke xwe çê dike û dide vejîn. Her weha evîn di jiyanê de bi çendî ku dijî, wê ewçend jî bijiya. Evîna di dilê Dîlberê de jî her weha vejiya bû û ev evîn bû wê dida jiyandin. Jiyana wê qenc bi xwe ve girê dabû û ne diberda, da ku bimêne di vejînê de. Her weha ji ber vê yekê bû ku Dîlberê li wir bi hebûna wê re girêdayî bûbû. Dîlberê gava ku hatina suwaran didît û hilkişîna mirovan ku ber bi çiya ve dihatine jor, di hundurê xwe de her weha pê dihêşiya. Her ku pê dihêşiya jî, weke diviya bû ku xwe bida ber bi paş ve û ji wan baz bide, lê dihat. Dîlberê çend hatina suwaran ku bêhtir didît, hem dilperîn û hem ji hestbûna wê pê re bêhtir dibû.

Gava ku hêza mazin nêzîk dibe, Dîlberê dibîne ku wa Bedran Beg jî li pêşiya wan suwaran û li ser pişta hespê xwe ve têt. Birayê wê Memyan Beg jî di rex de ye li ser hespê ye û ber bi wê ve têt. Ji ewca baniya çiyê ew pir xweş didîtin. Dîlberê her weha gava ku ewdîtin qirika wê tijî dibû. Di wê heyamê de jî mirovên ku li wê digeriyan jî bi çiyê de dihilkişiyan ber bi jor de. Dîlberê ewna jî pir baş û qenc didît. Dîlberê ku dengê xwe kiri ba wê seh kiri bana. Lê dengê xwe ne derdixist. Ta ku jê jî dihat, nedîhişt ku dengê wê derkeve, da ku ewên ku hatine nêzîkê wê, da ku hişê dengê wê ne kin.

Bedran Beg û Memyan Beg li ser hespên xwe li pêşiya suwaran di ber wê de diçûn, di wê heyamê de Dîlberê dît ku Mihemed jî wa ye li ser hespekî ye û di rex wan de ye û diçe. Dîlberê gava ku ew dît, her weha wê kêlîkê li wî jî meyizand. Mihemed jî hati bû bi wan re. Wî dikari bû ku carekê di ne yê wir. Lê hati bû. Dibit ku di dilê xwe de xwasti bû ku careke dî jî wê bidîta. Ma ka Dîlberê dixwast ku xwe şanî wan bide? Dîlberê li wir di rewşa xwe de bi tenê û bêdeng, hema wilo li wan dimeyizand. Ew jî hema wilo ji wê bêxeber ku li wê derê dimeyizandin, di nig wê de dibuhurtin û diçûn. Dîlberê ji dûr ve gava li cihê ku Li wê

bisekinin, dimeyizand didît ku hin bi hin pir dibûn. Dîlberê tiştê ku dibû di wê kêlîkê de didît. Ew jî bi hebûna xwe re li ber çavên wê bûn, lê ji wê nehaydar û bêxeber.. Dîlberê xwe şanî wan ne dida da ku wê bibînen. Dîlberê xwe şanî wan nedida, ji ber ku ditirsiya, ku wê ji evîna xwe ya ku li wê derê di dilê xwe de bi cih kiri bû wê dûrkeve. Wê jî çi carî ne dixwast ku ev yekê bibe. Her weha tenê dixwast bi evîna xwe re bijî û her dem li nig hevdu bin.

Di wê heyamê de li aliyê Reşîd Beg jî pê heseha bûn ku Bedran Beg bi hêza xwe re hatiye ser wan de. Ew jî li hev kombû bûn û guftûgo dikirin ku ka ma wê çi bikin. Gava ku li hev digehin û guftugo dikirin, digotin ku tiştê ku Reşîd Beg kirî, ne rast bû. Di wê heyamê de jî serekên eşîran piştî ku ew rewş bûbû êdî di nav xwe de yek ji xwe kiri bûn serekê eşîrê û Reşîd Beg bêbandûr kiri bûn. Reşîd Beg êdî weke mirovê ku di nav wan de rûnihê û ji wan re bipeyive ne dihate dîtin. Li gor kevneşopiyan diviya bû ku Reşîd Beg bêceza ne hati ba hiştin. Lê ta wê kêlîkê jî hê Reşîd Beg sax bû û li wir bû. Lê ji aliyê serekên eşîran ve bêbandûr hati bû hiştin. Serekên eşîran, gava ku li hev digîhenin û rewşê guftûgo dikin, di wê heyamê de Reşîd Beg jî dikin di bin ewlekariyê de, da ku ji wê derê ne çe çi dernên din. Serekên eşîra gava ku li hev digehînin, li ser rewşê dipeyivin. Lê berî ku lihevdu rûnihên jî, hinek berevan û pêşengên şandi bûn, ku li rewşê meyizênin û werin ji wan re bibejin ku ka ma rewşa wan çawa ye. Di wê heyama rûniştinê de berevan û pêşengên wan dihên û rewşa ku dîtin ji wan re seranser dibêjin. Ew jî gava ku hatina Bedran Beg dibihîzin, fêhm dikin rewşa tê de ne, giran e û şer jî di navbera wan de çê bibe, wê gelek mirov werin kuştin û ziyanên wan wê bibin. Ji aliyekî din ve jî ku şer bûba wê şerekî, ku şerê birakujî ba. Ev wê rewşeke gelekî giran bihaniya ji wan re.

Silo Axa mirovekî ku gelekî zane dihate naskirin. Wî li dora xwe gelek mirovên ku zanistvan bûn, dabûn hevdu û bi wan re dişêwirî. Her weha di nav xelkê de jî navê şêwirmendên Silo Axa derketi bû. Ji aliyekî di ve ji şêwirmendên wî hemûken ji mirov ku gelekî di nav xelkê de bi bandûr bûn û di nav xelkê de jî xwediyê rêzeke mazin bûn. Piştî ku Silo Axa dimire, êdî weke ku cihê wî

dimîne vala, wisan li xelkê dihat. Lê şêwirmendên wî weke ku di dema wî de çawa bûn, piştî wî re jî, her weha hebûna xwe berdewam kiri bûn. Lê herêmê jî ji ber ku di ber çavan de bû, di çi demekê de jî pirsgirêkên wê hew ne dibûn. Osmaniyan bela xwe ji wan ne divekir. Gelekî jî diçûnen ser wan de. Ji ber vê yekê bû ku Mîrzan Beg hati bû şandin nig Mîrê Bota. Hê Mîrê Bota dema ku Silo Axa sax bû, herdûkan gelekî bi ser hevdu de diçûn. Gelek caran Silo Axa çû bû nig Mîrê Bota. Ji ber vê yekê jî Mîrê Bota li Mîrzan Beg xwedî derketi bû. Piştî ku Mîrzan Beg diçe nig Mîrê Bota, êdî osmanî hinek nêzîkatiyên xwe paş ve kişandi bûn. Dema ku Silo Axa koçê dawiyê kir û Mîrzan Beg jî bi têne mabû û di diçûn ser herêmê de. Lê piştî ku Mîrzan Beg diçe nig Mîrê Bota, êdî çûna ser wan weke berê na be. Hebûna Mîrê Bota her weha xwediyê bandûrake mazin bû. Piştî ku Silo Axa koç dike û Mîrzan Beg jî bi têne dimîne êdî Osmaniyên ji gelekî çûbûn ser wî de. Mîrzan Beg mirov ku bi kevneşopîyên xwe ve girêdayî bû. Bavê wî gava ku hê ew piçûçik bû ew danibû nig seydayên da ku mazin fer bi be. Her weha bi wî re kêşaneyekê ku xwedî zanebûn ji bû hebû. Serekên eşîrê gava ku Mîrzan Beg çûbû nig Mîrê Bota êdî kar û bare eşîrê wan dikir. Gava ku Mîrzan Beg diçe, êdî Reşîd Beg ji li dewsa bavê xwe dirûne û xelk jî bi vê yadgariyê rêz didiyê de. Sedema ku rêz didanê, hem kurê Silo Axa bû û hem jî di cihê wî de dirûnişt, ji ber vê yekê bû. Wan herdu sedeman her weha ji wî re rêzbûnek mazin dabû avakirin. Wî jî bi vê yekê re weke ku xwe winda bike lê hati bû. Berî wê demê jî çend tiştên ku dikirin, mirov digotin kurê Silo Axa ye û tiştek jê re ne digotin. Lê piştî wê rewşê ku bi Dilşad û Dîlberê re rû da, êdî mirov li hevberên wî rawestan. Mirov ev yek li gor kevneşopiyên xwe weke berêzeke mazin dipejirandin. Di rastiyê de her weha ew yekê li hevberê kevneşopiyên civakê, gelekî berêziyeke mazin bû. Wê rewşê di ser û dilê mirov de gelekî êşeke mazin çê kiri bû. Gava ku serekên eşîran her weha vê yekê dibînien, dikin ku wî bêbandûr bikin. Piştî ku wî bêbandûr dikin, ji aliyê xelkê ve jî nêzîkatiyeke herênî dibinin û êdî ew jî her weha bi xwe re rewşa serokatiya eşîran bi rê ve dibin.

Lê Rewşa Dilşad û Dîlberê Li herêmên hemûkan jî hati bû zanîn û mirov jî gava ku dibihîstin, gelekî qahra xwe jî dihanîn ser zimên. Tiştekî ku bi Dilşad û Dîlberê re bû bû, gelekî û gelekî bêrêz didîtin. Weke bêrêzkirineke mazin dijimartin. Her weha bi bihîstina Şerê Bedran Beg re êdî rewş bûbû rewşeke çivakî di qada xwe de. Mirov pir jê dipeyivîn û li ser hizirên xwe digotin. Lê gava ku mirov bûyer dihanîn bîra xwe jî pê gelekî biêş dibûn. Ev rûdan li hevberî toreya bicih bû. Derveyî kirinên civatê bû. Nêzîkatiyên evîndariyê di çanda ciwanî û ya civakê de xwediyê hinek taybetmendiyên hûneri yên mazin bû. Di şahîyên weke şahiyên Newrozan de jî wan nêzîkatiyên taybetmendiyên xwe weke taybetmendiyên çanda bingehîn dihanîn ser zimên. Mirov her weha bi vê çanda civakê re nêzîkatiyên xwe dihanîne ser zimên û ew bûyer di vê temenê de weke bêrêziyeke mazin li hevberê civakê didîtin. Di vir de hêjayê gotinê ye ku divêt mirov bêjê ku çivaknasiya civakê pir mazin û peşketî bû. Ji aliyê hizir û hestiyar ve pir pêşketî bû. Ji lew re civaka wan, civaka herî kevin a cîhanê bû. Ji ber vê yekê ve jî ev rewş her weha bandûreke mazin dida nîşandan li ser mirovên vê civata kevin a xwedî kevneşopiyên serteserî û ebediyetê.

Piştî ku hêza ku bi Bedran Beg re hati bû, êdî hemû civata leşker liser girtî jî li cihê bûnû ji xwe re li ser riyeke çareseriyê dihizirîn. Serekên eşîra wan jî li çend roj bû li ser hev civiya bûn û guftûgo dikirin ku ka ma çi dikari bûn bikin. Di wê heyamê de jî hêze Bedran Beg hati bû nêzî wan danî bû. Di nav xelkê de jî çûn û hatin bêhtir bû bû. Herkesek dihizirî ku ka ma wê çi bibe. Lê çi hizra yekî jî, ji wan ne bû. Herkesekî digotin êdî çi kesekî ni kari bû ku pêşî li vê bigire. Wê şer bibûna. Lê ku şer jî bibûna êdî wê gelek windabûn jî ji wan re çê bûna. Rastî her weha bû. Bêguman ku şer çêbibûna wê gelek windabûn çêbibûna. Vê yekê serekên eşîrê jî dizani bûn û dizani bûn, ku ji çi kesekî ne dixwast, ku ji bo tiştekî her weha şer bikirana. Mirov ev kirina Reşîd Begê tiştekî pir xirap û wek bêrûmetiyekê didîtin û ne dixwastin ku ji bo vê yekê şer bikin. Di vê rewşê de ku şer qewimî ba û mirov keti ba şer wê zor jî bûba. Ji ber ku her weha derûniya mirov di zorê de bû û ji aliyê din ve jî hêza Bedran Beg pir mazin bû. Li ser vê yekê jî serekên

eşîran dihizirîn ku ka ma wê çi bikin.

Di dawiyê de biryara xwe didin ku ji nav xwe hinek mirovên ku serekên binemal^n mazin bişênin da ku bi Bedran Beg re hevdîtinê çêbikin. Gava ku serekên eşîran li hevdu civiya bûn ku ka ma wê çi bikin, di guftûugoyan de hîç gotin li ser Reşîd Beg ne hati bû. Weke ku hebûna Reşîd Beg ne be tevdigeriyan û biryarên xwe dabûn. Lê gava ku guftûgo bû di hundurê guftûgoyan de hinekên ji wan serekeyan digotin ku divêt Reşo Axa bêceza ne mîne. Lê ji ber ku ew kurê axayê wan bû, ku êdî herkesekê gava ku vê hizra xwe digotin, hinekî jî dihizirîn û digotin. Li dawiyê gava ku biryara xwe dabûn, êdî Goti bûn ku em serê xwe ji wî na êşînin û hwd. Piştî wê yekê ku biryara xwe didin û hinek mirov ji nav xwe ji diyar dikin ku bişînin da ku bi Bedran Beg re hevdîtinê bikin, êdî pişt re civîna xwe bi dawiyê dihênin.  Dikevin ser rê de û dikin ku herin nig Bedran Beg, da ku pê re hevdîtina çê bikin.

Di wê heyamê de Reşo Axa jî hati bû girtin û keti bû di bin çavan de. Reşo Axa çi gotiba û ne gotiba êdî gotina xwe ne dida herêkirin bi wan mirovên ku serek bûn. Mirov êdî guh ne dida wî. Gava ku dîti bûn çi çareserî jê re ne maye, êdî ew jî biryara xwe dide ku ji wir bireve û here. Lê ka ma wê ev yekê çawa kiri bana? Ew jî êdî ku çareserî ji xwe re wekî din ne dît, êdî ji xwe re çareyek din dît ku xwe bikuje û ruhê xwe bi destê xwe hew bike. Ew bi xwe jî hati bû xistin di odeyekê de û li devê derî ji yên ku lê agehdar bûbûn hati bûn rawestandin. Her serê kêlîkekê jî hinek ji mirovên serekê jî dihatin û li wî dimeyizandin. Cihê ku ew kiri bûnê de ji aliyê ewlakariyê ve cihekî ku gelekî baş bû. Lê jê re nabe zor ku mirovên ku li devê derî bûn bihêne rê û ji wir derkeve û here. Ji ber ku ew hîna jî kurê axê wan bû û mirov jî her weha ji wî saw digirtin. Wî jî vê yekê zanibû ku sawa wî li ser mirovan hebû. Bi vê yekê re dibake yên ku ji bo wî li devê derî rawestane û bi wan re dipeyive, da ku wan qanih bike. Bi axiftinê re sawê xwe û tirsa ku ji wê sawa wî çêdibû,jê re dibe weke heval û ew wan pawanan bi vê yekê re dihêne rê li gor xwe di wê kêlîkê de. Gava ku ew dihên rê, êdî ji wir derdikeve û bi bal xwe digehîne tewla mehînan yan ji cahnûkan ku ji wir hespekî ku derbixe û lê suwar be û ji wir

dûrbikeve û here xwe jiyana xwe li derve hew bike. Di tewlê de li hespekî geriya bû lê ne dîti bû. Tenê mehînek bi dest wî keti bû. Kiri bû ku xwe bigihêne hespekî û lê suwar bibe û ji wir here. Lê tenê kari bû xwe bigehîne mehînekî. Hesp gava ku pîr dibe, dibe mehin. Mehîn jî loma bêhtir ne bezek e. Lê ne bêbeza bû. Reşo Axa têne ew mehîn dîti bû û li wê mehînê suwar bû û dabû ser rê de. Mehîn çend baz dida jî, ji beza mirov bêhtir baz ne dida yan jî piçekî jê bêhtir diçû. Gava ku li mehînê suwar dibe, êdî dide devê hawşa malê û ji wir dike ku derkeve û here. Ma gelo wê çûba ku derê? Ki ye wî hawandiba? Ew bi xwe jî li ser vê xalê bêhizir bû. Lê diçû. Tirsa canê wî keti bû dilê wî de û ew dibir ji wir. Tirs di mirov de tiştê ku neke jî dide kirin. Gava ku ji malê derdikeve û dikeve nav malan de ji na hêle ku mirov wî bibînin. Lê mirov ku wî dibinin ji bi çavan matmayî lê dimeyizênin. Hem jî ew li mehînekê suwar bû bû. Her weha çawa dike, xwe ji navendê derdixe. Dem jî êvar e. Lê ji tavahêyve bêhtir ne reş e. Gava ku tê ber kenarê navendê ji aliyê derve êdî dike ku bide mehinê ku bi bez here,  lê mehîn wê çend bazdêne ku! Ku hinekî ji wir dûr ketiba heye ku rizgar bûba. Ku hinekî ji navendê dike ku dûrkeve ji aliyê hinek şervanan ve têt kifşkirin. Leşkerên ku wî kifş dikin jî leşkerê Nîge Beg bûn. Leşkerên Nîge Beg jî hinekî ji Bedran Beg wirde bi cih bûbûn. Ji aliyê xwe ve her weha hêza Nîge Beg aliyê ku lê bû baş û mazin kiri bû bû bin ewlekariyê xwe de. Navend jî di bin çavên hêzên eşîra Silo Axa de bûn. Ji wî aliyê ve ku Reşo Axa kiri bana ku çûba, wê di cih de hati ba kifşkirin. Ji ber vê yekê jî, kiri bû ku di keviyê de, di navbera herdu hêzan de çûba û xwe rizgar kiri ba. Gava ku leşkerên Nîge Beg wî kifş dikin bi dengêkî ku hinekî bilind di bakirinê de ji bo ku wî bibînen ku ka ma kî ye. Ji dûrî ve jî ne weke leşkerekî dihate xuyakirin. Ji ber vê yekê ji bêhtir leşkerê ku ew dîti bûn li ser ne sekinî bûn. Tenê xwasti bûn ku ruyê wî bibînin û jê bigerin û here. Lêşker têt û wî dide rawestandin,  te nig wî û lê dimeyizêne û gava ku bêjiyê de êdî here bi riya xwe de. Leşkerekî din ku li wî dimeyizêne fêhm na ke ku ew Reşo Axa e. Lê gava ku lêşker dev jê digere êdî ew jî dide mehîna xwe ji wir here. Hinek leşkerên din dikevin gumanan de û dixwazin carekê din wî bidin

rawestandin. Reşo Axa weke mirovekî asayî be, tevdgiriya gava ku ew leşkerên din jî ew dibînin. Lê Leşkerên ku têne nig wî carekê din wî ji Mehine wî paya dikin. Gava leşkerên dixwazin ku ew peya bibe û bi vê yekê re di ruyê wî de tirs digire êdî. Leşker hê bêhtir bi xwastek dibin ku wî peya kin. Ew jî gava ku dibêjine 'de peya be!' fêhm dike ku ew hat naskirin û dide mehîna xwe ku baz bide. Lê gava ku dike ku baz bide êdî hinek leşkerên din xwe digehininê de û ewan leşker bi carekê re xwe diavajine hafserên mehînê û wî peya dikin. Lê hê jî fahm ne kirine ku ew Reşo Axa e. Gava ku wî peya dikin leşker hinek pirsên bi qehr jê dikin û bi ser wî re dixûrihên û diçin. Ew jî dibêjê 'divêt ku ez xwe bigihênime mala xwe ji bo ku mitala min ne kin'. Ev gotina wî ji leşkeran re bêloçik na yê. Lê li wî bi hers bûn di wê kêlîkê de. Gava ku leşker dibêjinê 'li Mehina xwe suwar bibe û here!' êdî ew jî bi lezê dike ku li mehîna xwe suwar bibe û here. Di nav vê çûn û hatinê de, hinek leşkerên din jî li xwe wan digehînin û bi ser wan de kom dibin. Di wê heyamê de jî serekek ku li nig Nîge Beg rawestaye ber bi wan ve têt, ku meyizênin ka çi bûye. Gava ku ew ber bi wan ve têt, di wê heyamê de jî Reşo Axa dike ku li mehîna xwe suwar be û here ji wir û rizgar be. Gava ku ew lingê xwe diavêje ser zenguyê mehînê û lê suwar dibe û berê mehînê dizivirîne ku here serleşker dibake leşkeran; 'wî rawestînin!' Gava ku her weha deng diçe gehê Reşo Axa, êdî Reşo Axa dikeve tirsê ne radiweste û dilezêne ku here ji wir. Leşker dîsan wî didine rawestandin. Gava ku yê sereke xwe digehîne wî nas dike kî ye û dibêjê: 'Kuro wî ne berdin, ew Reşo ye!' Gava ku yê sereke her weha vê yekê dibêje, bi gotinê re leşker xwe diavêjine ser klaxê wî de. Yê sereke ku digehê dahma wî, êdî dibêjiyê de: 'Hey xirabo! Ma tu çawa rizgar bî ji destê min?!' Gava ku têt naskirin kî ye û leşker wî digirin serek jî digehîje wî û biderbehêzeke bi wî dikeve û dest bi lêxistina wî dike. Reşo Axa di destên wan de bû û kutanê dixwar ji destê serleşkerî de. Ev nûçe zû digihê Nîge Begî. Gava ku Nîge Beg jî têt wir û ew lê na xe û dibêje bigrin û bihênin. Reşo Axa di wê heyamê de têne destê xwe dida ser serê xwe daku xwe ji derbên ku têne bipareze. Ji wê pê ve destê xwe ne dide ber xwe di wê heyamê de. Nîge Beg ji

leşkeran re dibêjê wî sax bihêlin ta ku em wî bibine nig Bedran Begî. Bi vê gotina Nîge Beg re êdî wî digirin û dibin nig Bedran Beg. Di wê heyamê de hinek dengê qêrîn û hawar ji aliyê çiyê ve tên. Nîge Beg û serekên ku pê re ne, bala wan diçe ser wan dengan dixwazin fahmkin ka ji bo çi ye. Hinek sereke û hinek leşker Reşo Axaê girtî li pêşiya wan e diçin. Gava ku diçin ber bi çiyê ve û hinekî nêzîk jî dibin êdî dengên ku dihêne wan ber bi zelalbûnê ve diçin. Lê hê jî bi yekcarî na yêt têgehîştin ku ka ma ji ber çi ew deng dihên. Gava ku Nîge Beg û yên ku pê re ne fêhm dikin, êdî hê bêhtir bi rêveçûna xwe re dilezênin û ber bi çiyê ve diçin. Nîge Beg fêhm dike ku Dîlberê hatiye dîtin. Her weha gava ku ew fêhm dike ku Dîlberê hatiye dîtin, êdî ew ji bi kêf dibêjê: ’Begê min! Dîlberê hatiye dîtin, Dîlberê dîtinea!’ Gava ku Nîge Beg her weha vê yekê seh dike bi gavên bezê re dike ku here ber bi çiyê ve. Gava ku diçe û dibîne ku bi rastî jî wa ye Dîlberê hatiye dîtin pir dilxweş dibe. Lê gelek hestewar jî dibe gava ew rewşa wê ya xirab dibine. Nîge Beg gava ku Dîlberê dibine her weha êdî weke ku hinekî dilê wî ji tijî bûbe lê têt. Lê Nîge Beg weke ku bixwaze xwe bigire bi xwe re tevdigere. Dîsan ew tijîbûna wî baş dihate têgehîştin ji aliyê mirovên ku li dora wî bûn.

Nîge Beg gava dibîne ku bi rastî jî wa Dîlberê hatî dîtin, dilxweşiyeke mazin pê re çê dibe. Li hevberê rewşa wê ye ku dihate dîtin jî, wî xwe ne girti bû û tijîbû bû. Gava xwe digehînînê, li hevberê wê rawesta li ruyê wê meyizand. Gava ku li ruyê wê meyizand, di wê de weke qaramên wî bişkên lê hat. Mirovên ku ew dîti bûn, bi çendî ku bi dîtina wê dilxweş bûbûn, ewçend jî bi dîtina wê dilperitî jî bû bûn.

Dîlberê di rewş û dîtina xwe de gelekî hati bû guherandin. Mirovê ku lê dimeyizandin, ev yekê pir baş û mazin fêhm dikirin. Yên ku lê dimeyizandin jî çavên xwe jê ne digirtin û her weha hema wilo lê dimeyizandin di wê heyamê de. Gava ku dest bi hanîna Dîlberê ya nig Bedran Beg kiri bûn, di rê de ku diçûn, di nav destên mirov de bi çavên biêş û mat li dora xwe dimeyizand. Mirov ku ew didîtin jî, her weha bi wan çavan li wê dimeyizandin. Di hanînê de pêşîkê ew ne birin nig Bedran Beg. Pêşîkê ew birin û

kirine konekî, ku ji bo wê hati bû amadekirin. Lê di wê heyamê de jî, Reşo Axa ji dihate birin ku bibin nig Bedran Beg. Di rê de jî gava ku dihate birin mirovên ku ew dibirin dev ji wî û derbehêzkan ne diberdan. Ji kêlîkê ku Reşo Axa hati bû girtin û ta wê kêlîkê ji derbehêzkên li wî rizgar ne bû bûn. Mirovên ku ew ne dîti bûn ji tiştê ku wî kirî ku seh kiri bûn, gelekî jê hers bû bûn. Gava ku ew dîti bûn jî, her weha ew hersbûna xwe wan jî dihanîne ser zimên bi wan derbehêzkan re ku lê dixistinê. Bi vê yekê re, çi kesekî jî ne digot ku lê ne xin. Mirov her weha di serên xwe de xwediyê sedemên mazin bûn ji bo ku lê xin. Lê çi jê jî, bi kirinên ji dilê wan rehet ne dibû. Çi jê jî hati ba kirin dîsan dilê mirov rehet ne dikir. Ma çi hati ba kirin, wê rewşa berê hebû bi xwe re bihaniya? Bêguman ne dihanî. Êşa ku wî dabû çêkirin û xistî dilê mirovan, wê di dilê mirovan de tim û tim maba.

Bedran Beg di bin konê ku ji bo wî û serekan hati bû vegirtin de bû û guftûgo dikir di wê heyamê de. Gava ku pêşîkê çawa Reşo Axa têt girtin ji cihê ku ew tê girtin ve hinek mirov baz didin ku werin xeberê bidine Bedran Begê. Di wê heyamê de Dîlberê jî têt dîtin. Nîge Beg gava ku diçe nig Dîlberê û wê têne bin kon, êdî li derekî na mîne ta ku têt nig Bedran Begî. Nîge Beg gava ku têt û dikeve di bin kon de, di wê heyamê de ye ku nûçeya girtina Reşo Axa jî jê re hanî bûn. Gava ku Nîge Beg dikeve bin kon de, gelekî bêhna wî bi ser dilê wî keti bû. Bi wê rewşê re li hevberê Bedran Beg diraweste. Gava ku çawa ku Nîge Beg dikeve hundurê kon de bi ketine xwe re dibêjê Dîlberê. Her weha pêşîkê tenê bêjê navê Dîlberê ji nav lêvên wî derdikeve. Bala Bedran Beg çûbû ser Nîge Beg. Nîge Beg jî gava ku hati bû hevberê wî, di serî de ji bêhnçikandinê ni karî bû bipeyive. Lê gava ku keti bû hundurû de û li hevberê Bedran Beg jî rûbirû bûbû, dikir ku bipeyive lê hinekî jê re dijwar dihat. Nîge Beg ji behnçikandinê, weke ku lal bibe lê hatî bû. Di serî de kiri bû ne kiri bû ni dikari bû bipeyive. Gava ku dipeyivî jî têne gotina ku ji devê wî derketi bû; ’Dîlberê hat dîtin!’ bû. Piştî ku Nîge Beg ev yekê Goti bû ji Bedran Beg re Bedran Beg ji gelekî pê bi kêfxweş bû bû. Di wê heyamê de jî yê ku hati bû ku ji beg re bêjê ku Reşo Axa jî hatiye girtin, wî jî dest bi axiftinê kir û

her weha jê re got: ’Begê min, Reşo hat girtin’. Bedran Beg gava ku vê seh kir hê bêhtir dilxweş bû bû. Di wê heyamê de wî jî xwast ku here û Dîlberê bibîne. Ji cihê xwe rabû ku here û wê bibîne. Lê serekek gotiyê: ’Begê min, hûn nuha rawestin wê baş be. Ji ber ku nuha wê kirine bin kon de û paqij dikin.’ Lê Bedran Beg ne xwast ku bimîne. Bi gavên ku hinekî zû re berê xwe da devê konê û derket çû ku here nig wê û wê bibîne. Gava ku çû rast û rast çû û kete bin konê, ku Dîlberê hati bû xistin di bin de. Kete bin konê de, dît ku Dîlberê wa ye di nav hinek mirovan de ji piya de rawestayî ye. Dîlberê hê bi wan cilan bû, ku berê lêbûn. Hê cilên xwe ne guherandi bû. Gava ku Dîlberê jî ew her weha dît, hema wilo tenê li nav çawên wî meyizand. Lê qirika wê tijî bû. Di wê heyamê de Memyan Beg jî keti bû hundurû û hati bû û li ber wê bû. Bedran Beg gava ku Dîlberê dît, êdî bi lezê re derket û berê xwe da konê ku Reşo Axa lê dima. Gava ku hat bin konê xwe, êdî gote hinek mirovan ku bi wî re bûn: ’Herin wî netijî bênin nig min!’ Bi Lezê çûn ku wî bihênen. Bedran Beg kete bin kon de. Pê re tebatî ne bû, ku rûnihê. Lê li hêviya wî bû ku werin hevberê wî. Di wê heyamê de şervanek da devê kon û bi slavê re kete hundurê kon de. Şervan rast û rast hat û li hevberê Bedran Beg rawesta û jê re her weha got: ’Begê min, hinek mirov ji aliyên din hatine û dibêjin em dixwazin begê we bibînin. Ji cil û rewşa wan têt têgehîştin ku mirovên sereke û neqandî ne.’ Her weha gava ku şervan jê re welê got, Bedran Beg li ser yekî sereke zivirî û gotiyê: ’Here Reşo bihêne, lê ta ku ez tiliya xwe şanî we ne dim, ne kevîn bin kon de!’ Yê sereke jê re got ’herê’ û di cih de ji bin kon derket. Bedran Beg êdî li lêşker zivirî û gotiyê: ’here bêjê wan bila werin hindurû!’ Bedran Beg fahmkiri bû ku ji eşîra Silo Axa hinek mirovên sereke şandine, ku bi wî re hevdîtinan bikin. Bedran Beg xwe amade kir û ew jî hatin li hevberê wî rûniştin. Bedran Beg dît ku hinek mirov ku pir in wê hatina ku bi wî re hevdîtina çêbikin. Bedran Beg dihizirî di serê xwe de. Gava ku hatin her weha li wan meyizand û bi wan re peyivî: ‘Hûn bi xêr hatine! Ez fêhm dikim, ku hûn ji wir hatine, vêca ka bêjin ku hûn ê çi bêjin’ Yekî ku di nav wan de hinekî bêhtir kal dihate xuyakirin, pêşîkê li hevberê wî bi rêzê re dest bi axiftina

xwe kir û weha got: ’Begê min, pêşîkê ez slavê xwe û yên ku ez ji nig wan hatîme ji Te re dibêjim. Em hatine ku em hinekî bi hev re bipeyivin û em çareseriyekê di nav xwe de bibînin.Tu ji dizane ku eşîra me berê gelekî bêhtir bi ser hevdu ve diçûn.Vê rewşa ku bûye, biçendî ku we êşandiye, me jî her weha êşandiye. Em çi carî vê rewşê na pêjirînin. Ji xwe li gor nêzîkatiya me ya mirovahî û gelêrî jî ev tiştekî gelekî ne baş e. Divêt ku Tu jî vê yekê zanibî ku ez bi serê bavê Te sûnd dixûm ku di vê rewşê de êşa me yek e. Veca çareseriya mirovî ku em hatine bibînin, em di nav xwe hevdu de vê bibînin.’ Gava ku yê kal axiftina xwe hew kir û pê de, êdî Bedran Beg hinekî bi hizir di cihê xwe de ma xuya dikir. Gava ku hinekî bêdeng ma, êpişt re dest bi axiftine kir bi wan re peyivî: ’Weke ku hûn ji dibînin ku em ji bo xwîna xwe hatine. Ta ku me xwîna xwe ne hildabe em na vegerin. Vêce ez nuha ji we re bêjim ku begê wa di destê me de ye nuha’. Gava ku Bedran Beg her weha got, êdî hinek leşkeran ku Reşo Axa nav di destê wan de ye, ketine hundurê konê de. Gava ku yên ku hatin ew di destê wan de dîtin, tiştek ne gotin, her weha lê meyizandin. Lê yê kal ku pêşîkê dipeyivî, carekê din mafê axiftinê hilda û weha got: ’Gava ku em pê hesiya bûn ku ew rewş çê bû bû, êdî me ew ji xwe ne dijimart. Divêt ku ez bêjim ku ew êdî ne ji xwîna ma ye!’ Piştî vê gotinê re Bedran Beg jî gotina xwe weha berdewam kir: ’Hûn nuha hatine nig min. Weke ku hûn hatibin mala min ev ji min re bi wate ye. Ez destên wa vala na vegerînim. Lê ev herêm ji î roj û pê de wê bi herêma me ve be. Gotina me êdî wê li vîr bibihure. Hûn gerek e vê yekê herê bikin. Dilê me bi xwuşka me û kurêmê me biêşe. Ev tiştê ku hatî kirin, çi carî wê ne yê jibîrkirin. Lê her weha divêt ez ji we re bêjim, ku hûn jî zanibûn ku ew Reşo Axa qisasê me ye û nuha jî di destê me de ye. We ji min re got ku ew ne ji me ye êdî. Her weha li kirina wî û di vê rewşê de li wî xwedîderneketin jî bandûek li ser min kir. Bi vê yekê re ez dikarim bêjim, ku nuha ji vir herin êdî ji xelkê xwe re bêjin, ku wê şer ne be. Lê divêt çi gav jî tiştek weha di nav me de ne be. Em mirovê hevdu ne. Lê ew kirina ku hatî kirin çi carî ne ji kirina mirovahiyê ye. Çi carekê jî bêmirovahiya weha bêbersiv na mêne. Wê î roj jî bêguman ne

mêne. Em bêbersiv na hêlin. Ew Reşo Axa bê ceza na mîne. Wê serê wî lêkeve. Divêt hûn jî vê yekê zanibin. Divêt ku ez ji we re bêjim ku nuha hûn li nig min in. Ku wa nuha buhurandin ji bo wî xwastiba û li wî xwedî derketi ba, êdî wê şerekî mazin di navbera me de çê bûba. Lê we nuha li nig min hûn bi zimanekî di re dipeyivîn. Nêzîkatiya bi mirovahî her dem li nig me li ser seran e. Weke hûn jî dibînen em ji bo şer hatine. Me xwe ji şer re amade kir û em hatin. Xwîna me jî li erdê ye û em ê ji erdê hildin. Vê yekê jî divêt ku hûn zani bin.' Di nav wan de yê kal bersiva Bedran Beg da: 'Ta î roj jî em bi hev re bûn, ji î roj pê de jî em ê bi hev re bin. Rewşa ku bûye, bi çendî we, me jî êşand û serê me kire ber me de. Divêt ku ez bêjim, ku em ji bana, me yê ji bêbersiv ne hişti ba. Bêguman ev ne ew rewş eku bêbersiv were hiştin. Em vê rewşê weke ku dest bêt avêtina keça me dijimart. Min nuha li hevberê xwe mirovên zane dît. Mirovê ku dewsa bavê xwe girtiye min dît. Em di vir de weke hevdu dihizirîn ku ji bo mirovê pîs û nebaş gelek xûn ne yêt rijandin. Ji ber ku ew ne hêjayê vê yekê ne. Lê mirovê nebaş her dem jî bi xwe re nebaşî hanîne. Bi vê yekê re ez rêza xwe ji Te re didim nîşandan.' Piştî wan gotinan êdî hinekî bêdengî bû. Piştî ku hinekî di navîngê de bêdengi çê bû, êdî pê de dîsan yê kal mafê axiftinê hilda û ji Bedran Beg re got: 'Begê min dêştûra Te hebe, em ê êdî herin û xeberê bidine hevalên xwe jî ji bo ku ew jî vê yekê zani bin. Wê bi vê yekê re gelekî dilê wan xweş bibe.' Gava ku yê kal her weha ji Bedran Beg re got, Bedran Beg ji got 'destûr ya Te ye.' Bi vê yekê re ew ji hundurê konê derketin û ketine ser riya xwe. Mirov din ji yên ku li nig ye kal bûn û pê re hati bûn û li nig ma bûn, di serê xwe de dihizirîn, ku ma Bedran Beg leyîstikek bi wan re kir an na. Yê kal gava ku lê dihate meyizandin, dihate têgehîştin ku bi bawer bû ji gotina Bedran Beg.

Di vir de hêja ye ku ku mirov du sê gotinan li ser wî mirove kal jî bêjê. Ew bi xwe ji biçûkatiya xwe ve li nig Silo Axa bi cih bû bû û bi gelek mirovên zane re ji rûnişti bû û ma bû. Mirov baweriya xwe bi wî dihanîn. Ji xeynî vê yekê jî, mirovekî gelekî xwendi bû jî. Silo Axa bi xwe gava ku hê sax bû, ku biryareke girîng daba, bi wî dişêwirî û pişt re biryara xwe dida. Gava ku ew bi xwe jî hê biçûk

bû, di şerekî ku bûbû, malbata hemûkan winda kiri bû. Piştî vê yekê ew bi xwe ji aliyê axê ve hati bû hildan û li nig axê hati bû mazinkirin. Bavê wî mirovekî ku gelekî qenciya wî giha bû axê di dema xwe de. Ji ber vê yekê bû, ku navê wî Avdû bû. Lê axe navê bavê wî lê kiri bû û nava wî kiri bû Husên. Mirov di gotinê Husên Beg. Bavê wî mirovekî weke serekekî bû, ku li nig beg bû. Ji ber vê yekê jî mirovekî gelekî rêz jê re digirtin. Her weha zanebûna wî û pirbûna wî di wê demê de jê re dibû bingeha rêzdayineke mazin. Bi vê yekê re êdî koma ku hati bû, her weha bersiva xwe hilda bû êdî divegeriya ku herin nig serekên eşîran û bi wan re encama ku bi dest xistibûn havpar bikin.

Bi ji naskirine vê encamê êdî rewşeke din li wan serwer dibe. Gumana wan ji şer têt birînê. Lê hinek ji wan jî dibêjin; 'divêt ku em rewşa xwe biparêzin, ta ku Bedran Beg bi hêza xwe ji vir here.' Hinekên din ji wan dibêjin; 'em hêza xwe her weha halo bihêlin vêca ew jî wê bêjin ku em şer dixwazin û li bende ne ku bi kevin şer de. Ev jî wê rewşeke nû ji me re derxe holê.' Lê yê kal jî her weha di wê hizrê de ye, ku bikevine rewşeke asayî de. Gava ku wî ji her weha hizra xwe hanibû ser zimên, êdî yên ku hizrên wan ne bi awayî re hebûn, hizrên xwe yên cuda ne hanîbûn ser ziman. Di serê mirov de hê jî rewşeke neasayî hebû ji ber ku hê jî du hêzen ku mazinbûn li hevberê hevdu bûn. Çawa ku di li nig serekeyan bawerî çê bûbû û hinekî dem ji ser çûbû, wisan di şeran de rewş ber bi asayîbûnê ve diçû.

Hêza Lolan Beg jî hinekî ji hêza mazin ya ku Bedran Beg li ser bû, dûr bi cih bû bû. Lolan Beg bi hêza ku li ser serê wê bû, hinekî xwe nêzîktirî navendê bi cih kiri bû. Li pêşiya wan jî cihekî ku mirov jê av dibir û digotinê de Berkahniyê hebû. Lolan Beg mirovên ku pê re jî bûn, kar ji wê avê dîtin. Di wê heyamê de hinek mirovê ku jê sûd û kelk werdigirtin, dihatin ser avê. Lê mirovên ku dihatin, hemû jî gava li wan dihate meyizandin, dihate dîtin ku leşker bûn. Gava ku ewan dihên dibînin, ku hinek ji leşkerê Lolan Beg jî wa ye li ser avê ne, kar jê dibînin. Gava ku leşkerên din jî dihên û li cihekî ku hinekî ji hev dûr e bi cih dibin. Di wê heyamê de li hevberê hevdu dirawestin. Leşkerek ji yê Lolan Beg dibêjê

hevalên xwe; ’meyizêne ew leşkerên Reşo ne!’ Gava ku ew her weha dibêje, êdî ev gotin li zora wan diçe. Gava ku li zora wan diçe, êdî dest bi xebera gahandina hevdu dikin. Her weha sê çar xeberan ji hevdu re digihênen. Bi vî awayî naveng germ dibe û dest bi lihevxistina hevdu dikin. Di wê heyamê de jî deng çû ji herdu aliyan jî. Gelek leşker digihîjin hevdu û dest bi şerê hev dikin. Nûçe digihîjê hêzên mazin êdî lihevxistin mazin dibe û şer di nav wan de derdikeve. Nûçe digihîje Bedran Beg û Bedran Beg derdikeve da ku meyizêne, ku ma çi heye lê gava ku ew dimeyizêne dibîne ku va ye şer dest pê kiriye. Hêza Bedran Beg gelekî mazin û xurt bû. Di demeke kin çi hêze ku digihanê de bi ser hev re dipealixandin. Şer qewimî bû û ji deng û nalînan çi kesekî dengê hevdu ne dikirin. Gava ku her weha bû, êdî hêze Bedran Beg li gor nîzama xwe ya ku hatî kifşkirin re, dikeve qade şer de. Hêza Bedran Beg bi vê yekê re li Berkahniyê na mîne ku wê derê pak dike û ber bi navendê ve dest bi çûnê dike. Bedran Beg di wê heyamê de nûçeyê dide Lolan Beg, Nîge Beg û Memyan Beg da ku hêzen xwe li gor nîzamê bi cih bikin. Di wê heyamê de jî weke sê çar suwarên ku bi lezê dihatin wê navendê ber bi aliyê wan ve. Ew ên ku dihatin jî, hatin kifşkirin ku hinek ji wan mirovên serekê yên eşîrê bi xwe bûn. Gava ku dihên rast û rast li ber Bedran Beg datînin. Bedran Beg bi hêrs li wan dimeyizêne û ji wan dipirse: ’we got em ve rewşê herê na kin lê nuha hûn şerê çi dikin?’ Yekî ji wan li Bedran Beg meyizand û gotiyê de: ’Divêt Tu bawer bikî ku haya me ji vê rewşê nîn e. Ji me re jî hat gotin ku hêza wa hêriş kiriye. Em hatin ku ji Te re bêjin ku ka em vê bidin rawestan.’ Piştî vê gotina wan, Bedran Beg jî ji wan re dibêjê: ’Herin û hêzen xwe paş ve bikişênin di cih de yan na wê zor be ku şer bêt rawestandin.’ Bi vê gotina Bedran Beg re, ew jî di cih de diherin û hêzen xwe bi paş ve dikşînin. Gava ku ew hêzên xwe bi paş ve dikişênin, êdî hêdî hêdî bi gotina Bedran Beg re rawestandtin di nav hêzen wî de çêdibe. Lê di wê dema kin de jî gelek leşker ji aliyên din hati bûn kuştin. Hêzen Bedran Beg bi gotina wî re divegere cihên xwe de. Bi vegerenadinê re rewş hêdî hêdî asayî dibe.

Bi wê rewşê re Bedran Beg hinekî dihizire. Piştî ku hinekî dihizire, êdî bi mirovên ku li dora wî ne, xeberê ji wan ên sereke ne û li ser serê eşîran e. Ji wan re dibêje: ’Leşkerên wan bi şûr û mirtalên xwe berdin. Em dikevine hundurê navendê de yên ku xeletîyan ne ke çi xesar ji me wê ne gihê wan. Lê yên ku li hevberê me rabin, em ê çine ser wan û wê xêsarê bibînin.’ Piştî ku Bedran Beg ev ferman şand, êdî ji mirovên li dora xwe re ji dibêjê: ’Amade bin, karê xwe bikin û nîzama xwe bigirin em ê kevine hundurê navendê de!’ Rewş bi ve gotina Bedran Beg re keti bû rewşeke din de. Wê çi bûba ew jî êdî ni zani bû.

Lê Bedran Beg jî gelekî dihizirî ku ka wê çi bûba. Dihizirî ku hêzen wî ka çûbûna navendê de, şerêkî mazin jî rû daba. Bêguman bi ketina navendê re wê şer jî qewimî ba. Ji ber ku lihevxistina li Berkahniyê bi herdû aliyên re nasikbûnekê peyda bû. Ev nasikbûn jî di wê kêlîkê de mirovan li ser linga hêşti bû. Bedran Beg bi xwe bi bawer bû, ku hêza wî jî pir mazin û bi nizam bûn. Çi hêz bêhtir ni kari bû ku li hevberê hêza wî biraweste. Di lêvxistina li Berkahniyê ev yek jî pir baş hati bû dîtin. Ji aliyekî ve hêza Bedran Beg rast û rast ji bo şer xwe amade kiri bû û hati bû. Her weha ji aliyê derûniyê ve jî gelekî xort li ser xwe bûn. Lê dîsan gava ku li Bedran Beg dihate meyizandin, dihate dîtin ku bi hizir bû. Di serê wî de tiştên hebûn ku ew gelekî didane hizirandin. Bedran Beg piştî ku mirovek kiri bû nûçevan û şandi bû, êdî ew jî hinekî ji devê konê xwe wir de li ser latekî rûnişti bû li navendê dimeyizand. Di rewşa xwe de bêdeng bû di wê heyamê de. Mirovên ku bi wî re bûn jî li nig wî di bêdengiyê de bûn.

Bedran Beg gava ku wê tiştê ku ji nûçegihan re gotiba, Goti bû û êdî nûçegihan jî keti bû rê de û rast û rast çûbû ber bi navendê. Nûçegihan gava ku bi çûna xwe re digihê ber navendê, li wir hinek leşker hebûn ku dipan. Leşkerên  jê dipirsin ku ka ew kî ye û ji ber çi hatiye. Ew jî dibêjê: ’Ez nûçegihan im û fermanek ji begê min ji serekên eşîra we re heye.’ Gava ku leşker vê yekê dibihîsin, wî di cih de digirin û dibin nig yekî ku weke serleşker têt xuyakirin. Gava ku ew dibîne hevberê wî, êdî ew jî jê dipirse, ku kî ye û ji ber çi hatiye. Ew ji wî re dibêjê: ’Ez peyamnêr im û xebereke min ji

serekan re heye.’ Serleşker wî dihilde û dibe nig serekeyan. Bi vî awayî bi serleşker re û bi leşkerên din jî diçine nig serekeyan. Gava ku diçin nûçegihan dibîne ku li hevdu rûniştine û ji dipeyivin. Nûçegihan gava ku diçe û li hevberê wan diraweste, bala wan hemûkan diçe ser wî. Gava ku nûçegihan li hevberê wan e, yek ji wan jê re dibêjê: ’Me bihîst ku te nûçeyek haniye. De ka bêjê ku ka ma te çi haniye, te çi ji me re bêjî.’ Nûçegihan ji wan re her weha gotina bege xwe dibêje: ’Begê min ji we re nûçeyek şand bi min re. Ez ji bo vê xeberê bêjim hatîme vederê. Ez ê ji we re bêjim û vegerim û çime nig begê xwe careke din. Begê min her weha got: ’Êm ê bikevine nav hundurê navendê de, lê divêt ku çi kesek li hevberê me bi şûr û martal ne raweste. Begê min got ku tiştek ji wan ne be, wê tiştek ji me ne be. Begê min ew jî got ku bila li hevber me ne bin û bila ji bo Reşo Axa’yê nebaş bi me re nekevine şer de.’ Piştî wan gotinan serekeyekî gelekî kal bû, ji nûçegihan re weha peyivî ku ji begê xwe re bêjê: ’Nuha ji vir bi xêr û slamet here cihê xwe û ji begê xwe re bêjê ku rêza me wê jê re hebe. Em dixwazin bi Bedran Beg re hev bibînin. Ku tu çûyî, êdî ew ên ku çêkin wê li pey te werine wir.’ Gava ku yê sereke û kal ev gotin got, êdî pê de nûçegihan jî karê xwe kir û ji wir derket ku bikeve ser riya xwe de û vegere cihê xwe. Nûçegihan gava ku ji wir derketi bû hinekî bi lez keti bû ser rê de ji bo ku ew here û zû xwe bigehîne nig begê xwe. Da ku tiştê ku dîtî û seh kirî ji wî re bibêje. Gava ku nûçegihan ji nig serekeyan derdikeve, êdî bêyî asteng dikeve ser riya xwe de û digere cihê xwe. Di demeke kin de nûçegihan digihijê nig Bedran Beg. Gava ku nûçegihan digihîjê nig Bedran Beg, pêşîkê slava xwe didiyê de û jê re her weha dibêje: ’Begê min nûçeya Te weke Te ji min re gotî, min ji wan re got. Lê sereke gotin, ku em jî dixwazin pêşîkê bi beg re hevdîtina çê bikin. Her weha gotine min ku gava ku tu çûyî, pişt te re em ê jî werine wir da ku bi beg re hevdîtin çêbikin.’ Nûçegihan bi van gotinan re axiftina xwe hew kir. Gava ku nûçegihan axiftina xwe hew kir, Bedran Beg jî weke kêlîkêkê di cihê xwe de bêdeng ma û pişt re her weha got: ’Bila werin em ê li hêviya wan bisekinîn.’ Piştî vê gotinê Bedran Beg hinekî bêdeng bû bû dîsan. Weke heyamekê di

cihê xwe de dimîne nûçeyek jê re têt, ku wa ye serekên eşîran dihên. Bedran Beg gava ku ew dihên, wan dihilde nig xwe û li wan dihesîne. Serekên eşîra gava ku dihên, pêşîkê slava xwe didin û bi beg re dest bi peyivtinê dikin. Li nav wan ên ku hati bûn; Husên Beg jî hebû. Husên Beg berê jî hati bû û yekî ku gelekî kal û zane bû. Mirov li gotina wî pir dihesand. Gava hatin û li hevberê Bedran Beg rawestan, dîsan weke cara pêşî Husên Beg pêşîkê mafê axiftinê hilda û dest bi axiftinê kir. Gava ku dest bi axiftinê kir, di serî de her weha ji beg re got: ’Begê min, Te nûçeyek şand ku Te biryar daye ku bi leşkerên xwe re Tu werî û bikevî navendê. Begê min, divêt ku ez di serî de ji te re bêjim, ku em ne li hevber in, ku hûn werin bikevin navendê. Lê weke ku Tu jî dizanî rewş hinekî nasiktir bûye. Di ve rewşê de em na  xwazin ku hîn bêhtir xwîn were rijandin. Rûdana li Berkahniyê jî gelekî em êşandin. Tu jî dizanî ku nuha ku hûn bikevine hundurû de, wê zor be ku mirov sehêtkirinê bike. Lê hûn jî werin bi yên li dora xwe re û bibine mêhvanê me.  Bila ev hatine we bête jimartin ku hûn tev de hatine wir. Wî çaxî wê naveng sar bibe. Xelk jî we weke begê xwe bibînin.’ Piştî van gotinên Husên Beg re, hinekî bêdengi çê bû. Li gor wê rewşê ev yek ne tiştekî ku xelet dihate xuyakirin. Herdu aliyan jî mirovên ji yek axî bûn, ji hev bûn û yek bûn. Bedran Beg piştî ku Husên Beg ev yekê jê re got û yên li dora Husên Beg yên ku pê re hati bûn herêkirin, êdî got: ‘Ez ê hinekî bihizirîm, ez ê biryara xwe paşê bidim.’ Husên Beg, piştî ku beg weha ferman da, êdî carekê din mafê axiftinê hilda û got: ‘Begê min, gava em nuha herin, ku begê me jî bi me re were, wê gelekî hêja be. Mirov wî çaxî wê gelekî rêzê bidine begê min û wê bibînin ku mazinatiya begê min herê kiriye, êdî wê ew jî herê bikin.’ Piştî ku Husên Beg van gotinan jî gotin êdî pê de dîsan bêdengi di nav herdu aliyan de çê bû. Mirovên ku weke sereke li dora Bedran Beg jî bûn, li nav çavên wî dimeyizandin, ka wê çi biryarê bida. Hîna beg bêdengiya xwe hew ne kiri bû, Husên Beg careke din mafê xeberdenê hilda û jê re dîsan  got: ’Begê min, divêt ku hûn bawer bikin ew şerê li Berkahniyê di dilê mirovê me de êşandineke mazin çêkiriye. Ew êşandin tenê ne ji ber şer bûye. Ji ber ku ji ber rewşeke halo û

nebaş jî ketina nav şer jî êşandinekê çê kiriye. Loma jî, ku hûn werin wê mirov gelekî dilxweş bibin. Gava ku hûn hatin, wî çaxî mirov bêjin, ku êdî ji bo vê rewşa nebaş wê şer ne be û kuştin jî ne be. Ev yek wê di dilê mirov de gelekî mazin cih bigre.' Piştî wan gotinan Bedran Beg biryara xwe dide û ji wan re dibêje: 'Ez ê werim bi wê re.' Bi vê gotinê re gelek mirov jî karê xwe kirin ku bi wî re herin. Bedran Beg jî careke din ji serekeyan re dibêjê: 'Ez hatim divêt ku leşker şûr û martalên xwe berda bin.'Bi vê gotinê re jî ji wir ji nig Bedran Beg, ew li pêşiya wan di cih de bi serekeyan divegerin ku rewşê asayî bikin. Husên Beg û hinek ji wan serekeyên din jî dimênin li nig Bedran Beg ku pêk ve vegerin. Yên ku li pêşiyê jî dihên, dikin ku leşkerên wan şûr û martelên xwe dahênin û xwe ji nizama şer vekin. Yên ku li pêşîkê tên baweriya wan bi mirovan têt kirin, ku wê êdî şer ne be.

Mirov ne dixwast, ku di wê rewşê de şer bikin. Ji ber ku rewşeke gelekî berûmet dîtin û gelekî pê diêşiyan. Ji ber vê yekê jî ne dîxwastin ku bikevine şer de. Di dilê mirov de çi kesekî jî ne dixwast, ku ji bo wê rewşê şer bikin. Mirov gava ku dihizirîn, ji xwe re digotin, ku tiştê ku Reşo Axa kiri bû ne tiştekî rast bû. Madem ku nerast e, çima ji bo wê nerastbûnê wê şer bêt kirin. Mirov gelekî dihizirîn. Berî wê demê jî mirovên herdu herêman bêhtir ji bi ser hevdu bûn û gelek ji wan jî mermalên hevdu bûn. Di wê rewşê de jî şer ku çê bûba, wê gelekî û gelekî êşandina mazin çêkiri bana. Jiyaneke xwezayî di nav mirovan de hebû û mirov dixwastin, ku wê jiyanê biparastana. Ta wê demê, hê rewşeke weha rû ne da bû. Bi vê yekê re, divêt ku mirov bêjê, tiştê ku Reşo Axa kirî, mirov gelekî êşandi bû. Ji serekê ku ji bo wî û rewşa wî ne şerekî birûmet ne dihat dîtin. Di vê xalê de, bi hatina Bedran Beg re jî, di nav xwe de wê şiyarbûnek kiri bana û mirov wê jiyana xwe, weke berê berdewam kiri bana. Her weha ji hêvîyeke mazin hebû.

Bedran Beg biryara xwe ya çûnê dide di nav mirovan de çûn û hatineke mazin dest pê kiri bû. Ji aliyê Bedran Beg ve jî gelek mirovên ku mazin û xurtbûn, xwe amade dikirin ji bo ku bi wî re herin. Lê di wê heyamê de hinekî bêdengi jî bi Bedran Beg re dihate xuyakirin. Mirovên ku li nig wî rûniştî bûn jî, ne dixwastin ku

wê bêdengiyê xira bikin. Her weha wan jî di cihê xwe de bêdeng ma bûn. Husên Beg jî li nig wî rûniştî bû û ew ji di bêdengiyekê de bû. Ew mirovekî zane bû. Ew yekî ku dipeyivî mirov li gotinên ku ji devê wî derdiketin dimeyizandin. Ew jî bi serekên eşîran re hati bû, da ku pêşî li şerêkî bigre. Rewş weke ku dihate xuyakirin gelekî û gelekî taybet û nasik bû. Di kêmasiyeke biçûçik de, wê serencamên mazin derketi ba holê. Ji ber vê yekê jî diviya bû ku gelekî bi bal tevbigerin. Husên Beg bi xwe jî berê di gelek rewşên zor de mabû. Gava ku begê wî sax bû, bi wî re çûbû gelek seferan. Her weha di wan sefaran de jî keti bû gelek şeran de. Ji vî aliyê ve diviya bû, ku mirov bêjê ku gelekî dîti bû. Lê gava ku çûbû sefêran jî, ji nig axayê xwe çi carekê jî qut ne bû bû. Ji ber vê yekê jî, baweriya mirov pê mazin bû. Baweriya mirov her weha li zanebûn û pêzanînên wî hebû. Gava ku axa çûbû rahmetê, êdî Husên Beg weke yekî ku pist wî re ku li gotina wî bihesînin, dimeyizandin. Ji ber vê yekê jî, gava ku hati bûn nig Bedran Beg, her weha ew hati bû û ew dipeyivî. Yekî gelekî kal bû. Ji vî aliyê ve jî mirov rêzeke mazin didanê. De wê demê de ew kalbûna wî û pêşeroja wî, dibû bingeha ku wî mazin bidîtina û rêzeke mazin bidana wî. Gava ku hati bû nig Bedran Beg jî, mirov pêşîkê mafê axiftinê ji wî re hêştibû. Bedran Beg jî li pêşiya wî ne dipeyivî. Pêşîkê ew dipeyivî û mirov li wî dihesandin û paşê yên li dora wî hizra xwe goti bûn. Di vir de hêja ye, ku divêt mirov bêjê rêzbûn di pergala civakê ya ku pêşketi bû de, xwediyê hinek taybetmendiyan bû. Di wê rewşê de her weha van taybetmendiyan bi wî awayî xwe didane ber çavan. Rêzgirtin her weha dibû bingeha gelek tiştên baş di rewşên weha de. Bêguman di rewşên weha de hebûna rêzê girîng e. Di xalê pêşîkê de dibû bingeha lihevhesandinê. Gava ku li dihesandin jî, êdî mirov dikarê bêjê, ku çûna ser pirsgirêkan ji bo çarêserkirinê wê encam bidana. Husên Beg jî di wê rewşê de xwediyê wateyeke mazin bû. Piştî şerê li Berkahniyê çê bû bû û hinek xwîn jî rijiya Bedran Beg çûna xwe ye navendê herê kiri bû. Ev nêzîkatî bêguman gelekî û gelekî girîng bû û divêt mirov gelekî girîng şirove bikir. Di wê heyamê de dikari bû ku biryara xwe ji bo neçûnê jî bida û gotiba wan ‘na ez na yêm!’ Lê wilo ne got. Nuha jî

karê çûna wî dihate kirin. Di vîr de xalên herîmazin ku mirov bibîne û şirove bike çanda xelkê ya pêşketî bû. Li gor wê çandê, gavavêtin ji bo serekêyan jî divêtiyek bû. Bedran Beg jî yekî ku di nav civatêa de pir mabû û nêzîkatiyên xelkê baş fahm kiri bû. Ew zanebûna wî jî di bingeha wê biryara wî de hebû. Rewşa ku Dîlberê têde bû û kuştina Dilşad jî di serê wî de bû û vê yekê wî gelekî jî diêşand. Ji ber vê yekê jî, li hevberê hevdu bûn. Bêguman rewşa Dîlberê jî mirov re gelekî giran dihat. Di civakê de jin weke çandeke ji xeynî hebûna xwe, xwedî wate dihate dîtin. Ewçend ji ferhengeke ku gelekî mirov rêz jê re digirt bû. Ya ku mirov herî mazin êşandî jî, her weha ev rewş bû. Dîlberê pêşî bi keçkaniye xwe ve û pişt re jî bi jinîtiya xwe ve, weke çandake civakê ji bi wate bû. Dîlberê çandake civakê bû, ku gelekî jê re rêz dihate girtin. Her weha gava ku li wê rewşa ku tê de bûn dihate meyizandin, dimenekî, gelekî mazin û taybetmend bû.

Bedran Beg di nav mirovên ku li dora wî rûniştî bûn dimeyizand. Lê çavên gelek mirovan jî di wê heyamê de li ser wî bûn. Mirovên ku li dora wî bûn, di wê heyamê de li devê wî dimeyizandin ku gotinêk ji nav lêvên wî derkeve. Ew bi xwe di cihê xwe de bêdengiyek li ser bû. Piştî ku biryara xwe ya çûnê dabû û ji mirovên, ku li dora wî bûn, jê re goti bûn dest bi karkirina çûnê kiri bû. Di wê kêlîkê de mirovên ku li nig bûn û rûniştî bûn, çavên hemûken jî li devê wî bûn. Di wê heyamê de, mirov tev bi bal bûn. Her kesek di wê kêlîkê de di serê xwe de xwediyê hizrekî bûn, ku Bedran Beg wê çûba wir, wê çi bi bûba. Di rastiyê de jî wê çi bûba çi kesekî ni zanibû. Gotinêke biçûçik jî, ji wan re ji bo ku ketiba ser de têr dikir di wê heyamê de. Vê yekê jî rewşeke gelekî û gelekî nasik çê kiri bû. Di vê navengê de Bedran Beg wê çûba nav eşîra ku hati bûn bi wan re şer bikin. Vê yekê rewşê tenê nasik ne dikir, her weha neasayî jî dikir. Bêguman bi vî awayî diviya bû, ku bihatina gotin, ku rewşeke bêasayî ji xwe hebû. Di wê rewşa neasayî de Bedran Beg diçû nav wan de. Lê çûna Bedran Beg di hundurê xwe de wê çi hanî ba ew jî wê di wê heyamê de diyar bû ba.

Gelek mirovên serekê û xurt jî bi Bedran Beg re diçûn. Ji xeynî

vê yekê jî, wê hêzen ku hati bûn hemû jî li ser lingan ji piya ma ba. Her weha hemû kesên amade di cihê xwe de bana. Memyan Beg jî wê bi Bedran Beg re çûba. Lê Lolan Beg û Nîge Beg, wê li ser serê hêzan maban. Ji xeynî vê jî wê gelek mirovên sereke yên ku mazin in, wê li ser serê hêzan amade maban. Vê yekê jî rewşê hê bêhtir neasayî dikir. Di rewşeke asayî de yên ku sereke bûn diviya, bû ku bi beg re çûban. Lê di wê heyamê de wê ne çûba. Ew jî li paş wê maba. Vê yekê jî karê serekên eşîran Silo Axa hê bêhtir dijwartir dikir. Hinek mirovên ku di şerê Berkahniyê de ehlên xwe winda kiri bûn, ne dixwastin ku ew were. Ji aliyekî din ve jî serê Reşo Axa hati bû lêxistin û wê yekê jî li ser mirov bandûrake li ber çavan dihat girtin. Mirov tiştê ku wî kiri bû rast ne didîtin. Li ser wî bixwe ji ne dihizirîn. Lê ji ber ku kurê axêye wan bû, di serê wan de mabû. Tiştê ku wî kiri bû jî, weke ku navê axêye wan lewitandin. Ve ji aliyê derûniyê ve ewan dixiste zorê de. Ji bo wan rewşan diviya bû ku serekeyên eşîran gelekî bi bal û serinc ban, ku tiştekî ne baş rû ne daba. Bêguman kêmasiyeke biçûçik jî bûba bingeha serekî û gelekî mazin di nav wan de. Husên Beg gava ku li rewşê dimeyizand, ev yek pir baş didît. Ew bi xwe jî di rewşên welê de, berê jî mabû û dîti bû, ku di gelek rewşên ji van rewşan de, şer dîsan derketi bû. Vêca di wê heyamê de, ew bi xwe jî, bi rewşeke her wisa re rû bi rû bûn. Çend amadekarî hati bû kirin û hêzeke çawa di wê heyamê de li wir bû, wî dizani bû. Ji xeynî vê yekê jî, dihizirî ku ew hêza ku di wê heyamê de didît, ku ketiba ser de, wê çend xirabiyeke mazin bi xwe re bihaniya, mirovên ku ji bo şer hati bûn, ku li wan dihate meyizandin, dihate dîtin,  ku hemû jî, jêhatî bûn û gelekî jî bi hêz bûn. Husên Beg yekî ku di gelek rewşan de buhurti bû. Ji ber vê yekê jî fêhm dikir ku şerek qewimî ba, wê çend pelixandin bi xwe re bihaniya. Bi vî awayî, çûna Bedran Beg ji bo wan û ji bo herêma wan gelek û gelekî girîng bû.

Gava ku amadekarî hew bû bûn û xeber ji Bedran Beg re hati bû şandin, ku hemû tişt amade ye ji bo çûnê, êdî ew jî ji cihê xwe dirabe û ber bi devê konê ve diçe, ku herin. Mirovên ku wê pê re çûba jî li nig bûn. Ji derve jî mirovên ku karê xwe kiri bûn, ku bi wî re biçin, hebûn. Husên Beg jî gava ku ew rabû bûn ser xwe ji bo

çûnê, êdî wî jî dabû xwe û keti bû rex wan, da ku bi wan re be. Hespê Bedran Beg yê ku sipi bû li devê derî bû û hefsarê hespê wî di destê seyisvanekî de bû û li hêviya wî bû. Bedran Beg gava ku hat derve pêşîkê hinekî li dora xwe meyizand û pişt re bi yên ku wê pê re herin, bi hev re her yek li hespên xwe suwar bûn. Husên Beg ji hespê ku pê hati bû, lê suwar dibe û bi hespê xwe re dikeve rex wan. Her weha yên ku bi Husên Beg re hati bûn û ku sereke bûn, ew jî li hespan suwar bû bûn û dabû bûn rex wan. Li hespên xwe suwar bûn êdî dana rex hevdu û ketine ser re de da ku herine navendê. Di wê heyamê de jî di dilê mirov de got û goteke mazin hebû. Xwîna hemûkan di wê heyamê de di laşên wan de germ diçû û dihat. Bedran Beg li pêşiya gelek mirovên, ku li ser hespan suwarbûyi bûn û bi hev re dane ser rê û di rê de çûne bi ber navendê ve. Bedran Beg gava ku li ser hêsp diçû hinekî bi hizir bû. Di rê de gava ku diçe, weke carekê du carên ji serê xwe li dora xwe dizivirîne û li mirovên ku bi wî re hatine dimeyizêne. Gava ku dimeyizêne dibine ku bala mirovan tev li ser wî bû. Di wê heyamê de her gavê wî, ji aliyê mirovî ve di ber çavan de dihate buhurandin. Çawa weke ku hinekî li ser hespan di rêde diherin, êdî digihine ber navendê. Bedran Beg û yên ku pê re ne, ku digihîjine ber navendê û pişt re, weke kêlîkêke ku li ser hespan, peyade diçin êdî digihîjine nav malên ku bikevine hunduruyê navendê de.

Bedran Beg û yên ku pê re ne, ku dikevîne nav navendê de, ber bi mala axê ve diçin. Çavên gelekan li ser wî bû. Mirov bi bal li wî dimeyizandin. Lê dilê mirov jî di wê heyamê de gelek û gelekî ji dilperî diavêt. Di rex Bedran Beg de jî Husên Beg hebû. Mirov Husên Beg baş û qenc nas dikir. Gava ku Husên Beg di rex Bedran Beg de tê dîtin, êdî baweriya wan têt, ku êdî ne ma şer bibe. Ji xwe gava ku Bedran Beg di nav navendê de diçû, kesên ku bi şûr û mertal bûn, li ber çavên wî ne diketin. Tenê yên ku ji bo ewlekeriyê hebûn, bi wan re şûr û mertal dihate xuyakirin. Gava ku Bedran Beg gotibû; ’divêt ku hûn şûr û mertalên xwe dahênin’ êdî serekeyên eşîran, ku pêşîkê vegeriya bûn ji bo ku şûr û mertalên di destên mirovan de ne mîne û ne yêt xuyakirin, gelekî çûbûn û hati bûn. Wan xwastibû ku jiyaneke, ku weke jiyaneke asayî bidine

nîşandan. Lê bêguman di wê heyamê de, her tişt ne asayî bû. Hebûna Bedran Beg û hatina wî ku dihate dîtin, dihate têgehîştin, ku gelekî neasayîbûn hebû. Gava ku Bedran Beg û yên ku pê re ne hêdî hêdî digihine nêzîki mala axê, têt dîtin ku gelek mirov ku li wir xuya dikin. Bedran Beg bi hespê xwe re û bi yên ku pê re ne û bi yên ku li dora wî ne, dikeve nav wan mirovan û dibuhure, ku bikeve nav hewşa mala axê ya gelekî mazin e. Mirovên ku li wir bûn gelekî li wan dimeyizand. Wan mirovên ku li wir bûn, hineke ji wan berê Bedran Beg dîti bûn. Bedran Beg jî ew dîti bûn. Gava ku gihan dehma hevdu, hinek ji wan mirovan slav jî didanêde û dibuhurtin. Gava ku dikevine hewşa malê û hinekî ji dibuhurin, hinek jinên ku navserî bûn, ji hinekî dûrî ve dihatine dîtin. Ew jin tev bi xiftan bûn. Bedran Beg digihê dehma wan, dibîne ku ew bi bal li wî dimeyizandin. Bedran Beg jî  gava ji nig wan dibuhure li wan dimeyizêne. Di buhurtinê de dihêne ber cihê tewla hespan li wir hinek seyisvan amade ne. Bedran Beg li pêşî çûn hundurû. Bedran Beg Gava ku çû hundurû hê li devê derî yekî, ku sereke bû rê şanî wî dide, ku herine hundurû û rûnên. Wî jê re got: ’Begê min bifermin derbasî hundur bin!’ Bedran Beg tiştek ne got û qevza xwe pêşî di devê derî de avêt û kete hundurû de. Di vir de hêja ye, ku divêt mirov bêjê, ku pêşîkê rêdayin weke rêzeke têt nîşandan. Gava yê sereke di devê derî de xwe dide paş û rê dide Bedran Beg, ev weke rêzekê hat dîtin. Memyan Beg jî bi Bedran Beg re bû. Ew jî di rex wî de bû.

Bi hev re hinekî li hundurû dimînin û pişt re dikin, ku derkevin û herin. Lê berî ku derkevin Bedran Beg jî, her weha ji wan dipeyive: ’Hûn hemû jî dizanin ku di vir de kurêmê min hat kuştin ku bi xwuşka min re bû. Lê ez nuha li wir im. Vê yekê divêt ku were zanîn ku ev çi car jî na yêt jibîrkirin. Min Reşo xiste qisas ji wî re û serê wî lêxist. Wê jî got; em li hevberê vê rewşê ne û em na xwazin ji bo vê şer bikin. Bi vê yekê re şer ne bû. Ji dêla wê jî nuha ez li vir im. Ji îro pê de, wê ev der girêdayî me be. We ji vê yekê re jî got herê. Vêca nuha ez ê tiştekî bêjim, ku divêt hûn bikin. Nuha peyamnêrek ji nav xwe derxin û bişînine Cizîra Bota û Mîrzan Beg ji werînin da ku ew begîtiya we bike. Ji xeynî vê yekê jî em ê nuha

laşê kurêmê xwe bi xwe re ji vir bibin. Bila derbeştê wî were amadekirin, ku em bi xwe re bibin. Bila were li nig bavê xwe bimîne. Bila di cihê ku tê de mayî û mazin bûyi de razê. Lê gerek e ku her kesek ji vê bûyerê ji xwe re fêrekê derxe, ku hêriseke çend mazin e li ser jiyan û rûmete me.’ Piştî van gotinan hinekî bêdengi çê bû. Lê bêhtir bêdengi dirêj ne bû û ye ku ev bêdengî xira kir Husên Beg bû. Husên Beg jî, bersiva Bedran weha Beg da: ’Begê min, Tu gelekî baş û xweş dipeyivî. Weke te gotî wê nuha peyamnêr werin amadekirin û bi rêkevin ku herine Cizîra Bota. Ev yek, weke ku begê min li gor mazinatiya xwe dipeyivî û hanî ser ziman, wê her weha li gor wê mazinatiyê were cih. Lê begê min got ku bila derbeştê kurêmê min jî were amadekirin. Ew yek êşa me jî ye. Ev der jî mala wî ye, ku begê min destûr bide, bila li vir li ciyê xwe be.’ Piştî ku Husên Beg gotina xwe hew kir û pê de, Bedran Beg carekê din peyivî û ji wan re got: ’Bi goristana wî ye ku hatî çêkirin bila bimîne. Lê bila ew bê hildan ji bo ku here nig dê û bavê xwe. Lê bila goristana wî bimene weke xwe, ku ev rewş û tiştê ku bûyî bila ne yêt jibîrkirin.’ Bi van gotinên ku Bedran Beg kirî, bêdengiyek di nav wan de çê bû. Bi wê bêdengiye re serê gelek mirov kete ber wan de. Civat tev bi wê rewşê re gelekî diêşiyan.

Piştî ku Bedran Beg peyva xwe hew kir êdî pê de, hinekî din man paşê rabûn ser xwe ku herin. Lê gava ku Bedran Beg behsa emdekirine derbeştê kurêmê xwe kiri bû, êdî hem di dilê mirovan de êşek çê bû bû û hem jî bi wê dilêşiya mirovan li hev gihabûna hevdu ku amadekariyê bikin. Di nav mirovên zane û alim de jî guftugo dest pê kiri bû. Hinek digotin nerast e, ku ew ji cihê xwe were derxistin û bêt birin li cihekî din. Hinekên din jî digotin, ku gava ku derbeşt hat amadekirin, divêt ji aliyê olî ve tiştên ku werin kirin wê werine kirin û pişt re bermayê wî dikare were birin. Lê mirovê ku vê yekê ne dixwastin tevdigeriyan. Ne dixwastin ku Dilşad ji wê derê were birin. Ji aliyê hestan ve jî hinekî li wan zor dihat. Lê Bedran Beg gotina xwe goti bû û wê bi cih bihaniya. Hê Bedran Beg li wir e dest bi amadekirina birina derbestê hati bû kirin. Her weha di demeke kin de derbestê Dilşad têt amadekirin. Gava ku derbest têt amadekirin, êdî dest bi cihhanîna stûbarên olî

têt kirin. Di dema bi cihhanîna stûbarên olî de, Bedran Beg jî amade dibe. Ji aliyê dî ve ji xelkê wê derê tev jî di wê heyamê de amade dibin. Gava ku li wir in û li derbestê Dilşad dimeyizandin, weke ku li tiştê ku hatî serê wan dimeyizandin. Gava ku derbest hat amadekirin û stûbarên olî jî bi cih tên, yên bi Bedran Beg re hati bûn tev li hespên xwe suwar dibin û dikevine ser rê ku herin. Mirovên herêmê jî cihê ku berê Dilşad lê hati bû danîn, wê derê dikine weke ziyaretgahekî û ji kevîrên reş qûçek lêdikin û li ser hêtan jî naqşan didin çêkirin. Ew mirov jî weke ku Dilşad hê li wir be, wilo xwe bibawer dikin û diçin serdana cihê wî. Gava ku suwarên Bedran Beg jî ji wir bi derbestê rê diçûn û mirov ji paş wan ve li wan dimeyizandin û digotin qey tenê hinek suwarên wa diçin. Wilo li wan dihat. Ji vê yekê pê ve ne dixwastin ku tiştekî din bihênine bîra xwe di wê heyamê de. Wan mirovan ne dixwast ku bihênine bîra xwe ku derbestê Dilşad jî bi wan re diçe. Her weha ne dixwastin ku bihizirîn di wê heyamê de. Lê gava ku Bedran Beg bi derbestê Dilşad re diçû û ku weke heyamekê ji çû êdî hinek mirovên herêmê xwe ne girtin û jin û mêr diketin di nav hevdu de û dane pey wan û çûn ta cihê ku ew lê bûn. Bedran Beg û yên ku pê re ne diherin êdî digihîjin cihê xwe. Piştî re jî koma mirovên ku li pey wan dihat vedigere cihê xwe. Lê leşker gava ku wan dibînen, dikevine gumanan da ku koma bi ber wan ve dihên gelo kî ne. Lê gava ku kom hinekî nêzîk dibe, têt dîtin, ku jin û zarok û kesên bêçek in. Koma mirovan têt û li ber gora Dilşad'î diraweste. Dîlberê jî di bin konê ku jê re hati bû vegirtin de bû. Gava ku Dîlberê pê dihese ku derbestê Dilşad hatiye, êdî dide xwe û bi bezê re derdikeve derve û diçe ser derbestê wî. Xwe diavêjê ser derbestê wî. Ji çavên wê dilop hêsiran bi ser hinarikên ruyê wê re dihêne xwarê. Mirov ku rewşa wê dibînin, ji çavê wan jî hêsir dihêne xwarê. Dîlberê jî jiyana jiyabû, gelekî jî pîr keti bû. Laşê wê gelek lawaz keti bû, dihate xuyakirin. Bedran Beg jî gava ku giha bû cihê xwe û kar kiri bû ku here hundurê konê xwe de, bi hatina koma mirovan, êdî li devê kon di cihê xwe de ma bû.

Di wê heyamê de Mihemed, ku ji mêj ve tiştek ne goti bû, li ruyê Bedran Beg meyizand û gotiyê: 'Begê min, Dilşad êdî yê van

mirovên ku li pey wî hatina, yê wan e. Ez dibêjim heger ku Tu wî li vir di nav van mirovan de bihêlî, wê baştir bibe.’ Bedran Beg li hevberê vê gotina Mihemed hinekî li ruyê wî meyizand û li pêşiya niherî û hinekî hizirî. Pişt re Bedran Beg serê xwe rakir û ji Mihemed re weha got: ’Min jî di vê kêlîkê de, bi hatina van mirovan ev yek fahm kir’. Pişt re Bedran Beg li serekeyên ku li nig wî bûn meyizand û gote wan: ’Cihê Dilşad êdî ev der e. Li vir cihê wî amade kin û wî bi cih bikin. Min nuha fahm kir ku, ew êdî divêt ku li vir be’. Bi vê gotinê re êdî hat gotin ku wê Dilşad li wir were bi cihkirin. Mirov ji bo vê yekê careke din dest bi karû bar kirin. Dîlberê jî gava ku derbestê Dilşad têt û xwe diavajê ser derbestê, êdî hema wilo dimîne. Di wê heyamê de du sê keç û jin hewl dan ku herin nig Dîlberê û bi destê wê bigrin û wê hildin. Gava ku dirahijin destê wê, dimeyîzînin, ku ew jî wa ye behne xwe bi zorê dide û distêne. Gava ku her weha têt dîtin, êdî du sê kes dikevin bin çengê wê de û wê dibine bin konê w. Lê Dîlberê bêhna xwe bi zore re dida û distand. Kesên ku ew hildan û birin bin konê wê, li ruyê wê dimeyizandin, didîtin ku tenê wa ye hêsir ji çavan wê têne xwarê. Dikir ku bi wan çavên bi hêsir re ji wan mirov re tiştekî bêjê. Lê Bêhnçikandina wê destûr ne didayê de ku bipeyive. Di wê heyamê de Dîlberê ket. Êdî weke ku bêhn ne distand. Kesên ku li ber serê wê bûn, li nav çavên wê dimeyizandin. Hêdî hêdî çavên wê jî dihatine girtin. Mirovên li dorê dikirin, ku bi wê re bipeyivin. Lê hemû kirinên wan bêbersiv diman. Gava ku hat dîtin, ku bêhna wê êdî na yê û naçe, tev qêrînî û kirin. Bi vê yekê re nûçeya Dîlberê digehê Bedran Beg û birayên wê yên din jî, dibihîsin ku Dîlberê êdî behn na stêne. Ew jî bi bazekê re tên ku fahm bikin ku ka çi bûye ji Dîlberê. Dîlberê êdî bêhn ne distand. Hatina Dilşad bi wî awayî re li dilê wê dabû. Gava ku her weha nûçeya Dîlberê hat sehkirin, êdî eşîra Silo Axa bi serekeyan re xelk tev hatine wir. Mirov ku li hevberê hevdu bûn, ku bi hev re şer bikin, êdî keti bûne nav hevdu de û dest bi derbestkirina Dilşad û Dîlberê dikirin. Ziyaretgeha pîroze ku ji bo Dilşad hati bû amadekirin, êdî ji bo herduyan bû. Gava nûçeya Dîlberê jî têt bihîstin, gelekî mirov xemgîn dibin. Mirov ji hevdu dipirsin ma ev çawa bû. Mirov hinekî fahm ne dikir

ku dilê Dîlberê jî di wê heyamê de hew lê dida. Dîlberê ta wê kêlîkê li ser lingan dihate xuyakirin. Lê nuha ew jî wek Dilşad bêbêhn xwe dirêj kiri bû li ser cihê xwe. Mirov li dora wê bûn û bi çavên şil re li wê dimeyizandin. Mirovên ku li dora wê diçûn û dihatin, çavên wan tev şil bûn. Gava ku nûçeya Dîlberê têt bihîstin, êdî koma mirova ya ku li pey Dilşad hati bûn, dihatin bi ber konê Dîlberê ve. Gava ku dihêne nig konê Dîlberê li devê kon kom dibin. Hinek ji wan mirovên ku gelekî pîreji in, dikevine bin konê de. Gelek ji wan pîrejinan li ber serê wê dirûnin. Gava ku jinên pîr li nig wê dirûnen, êdî weke hemawiyên kesk, sor, zer, sipî û şin bi cihê wê ve girê didin. Hinekan ji wan, hemawîyan diavêjine ser wê jî di wê heyamê de. Her weha hêdî hêdî dest bi derbestkirinawê jî dikirin. Ji derve jî mirov derbestkirina Dilşad dikirin. Mirovên mazin jî li hev gihabûn û mirovên oldar jî li wir amade bûn û stûbarên olî bi cih dihanîn. Mirov bi Dîlber û Dilşad re gelekî êşeke mazin di dilê xwe de seh dikirin. Xemgîniyeke mazin bi mirovan re dihate xuyakirin. Gava ku her weha li mirov dihate meyizandin, dihate dîtin ku xemgîniyê weke perdeyekê bi ser wan mirovan de xwe berda bû. Di wê heyamê de her kesên ku êşa di dilê xwe de seh dikir, ji hev ne cuda bû. Êşa ku dilê wan mirov diguvaşt, yek bû û êşeke  gelekî mazin bû. Ew êş êşa Dîlberê bû. Ew êş êşa Dilşad bû. Ew êş êşa du evîndaran bû. Ew êş êşa evînekê bû ku di dilan de bûbû agir û dişewitand.

## VI

Gava ku derbestê Dilşad hati bû Mihemed dîti bû û pê re bû bû êşekî gelek mazin. Piştî re ku nûçeya Dîlberê jî giha bûyê, her weha bi wê jî gelekî di dilê wî de êşandin çê bû bû. Gava ku nûçeya Dîlberê giha bû wî, hingê ew di nav mirovên ku sereke de bû. Mihemed piştî ku nûçeya Dilşad û Dîlberê hildabû êdî gelekî pê bi êş bû. Bêdeng ma bû. Lê di hundurê wî de êşeke mazin di dilê wî de dabû çêkirin. Mihemed berê rewşa ku Dîlberê tê de bû, dîti bû. Ji ber vê yekê jî hê bêhtir rewşa ku çê bû bû lê dibû êş. Êşa ku pê

re çê bû bû gelekî mazin bû. Ew bi xwe ji bo ku ew ji wê rewşê rizgar bibe, çûbû nig mala bavê wê û wî nûçeya serpêhatiya Dîlberê dabû birayên wê. Gava ku xeber dabû wan û ew jî hati bûn êdî ew ji bi wan re hati bû. Di serî de gava ku wî Dîlberê dîti bû, êşeke gelekî mazin bi dîtina wê re keti bû di dilî de. Lê nuha bi wê re êşeke hê mazintir keti bû dilê wî de.

Mihemed gava ku nûçeya wan dihilde, dihê devê konê Bedran Beg û bi xemgîniyekê, li aliyê Çiyayê Raz dimeyizêne. Di cihê xwe de ma bû û hema wilo bêdengî ew ji wir biribû. Di serê xwe de weke ku ne li wir be xembar dimeyizand. Çavên wî weke ku bi hêsir bin dibiriqandin. Di serê xwe de tiştên ku dîti bûn, di ber çavan xwe de dibûhûrandin. Gava ku dibûhûrand didît ku gelek tişt dîtine û buhurandine. Her tiştê ku dîti bûn ji tiştê ku êş dixiste dilê mirov de bûn. Gava ku wî jî wan tiştan dihanîne bîra xwe, êşeke mazin dikete dilê wî de. Di wê heyamê de dihizire ku di demeke kin de gelek tişt bûhûrandi bûn. Gelek tişt ji aliyê wî ve hati bû dîtin.Tiştên ku dîti bûn, ji tiştên ku li ser kesayetiya wî gelekî û gelekî bandur çêkiri bûn, dihatine xuyakirin. Li ser tiştên ku buhurandi bûn dihizirî û dihizirî. Wilo lê dihat ku her tiştê ku dîti bûn û buhurandi bû, bû bû weke salekê û keti bû ser temenê wî de. Di wê heyamê de jî xwe westayî didît. Tiştên ku wî dîti bûn, gelekî û gelekî ew wastandi bûn. Nuha jî bi wê westandina xwe re li ser latekî rûnişti bû û li amadekariyên derbestkirina Dilşad û Dîlberê dimeyizand. Her weha dimeyizand û dimeyizand. Lê tenê dimeyizand. Bi meyizandinê re di hundurê wî de êş çê di bû û tavzînok di laşê wî de çê dibûn. Her mirovê ku çavÊn wan şil bûn û digirîn û di ber wî de diçûn û wî ew didîtin, gizlînok di laşê wî de çê dikir. Serma bayê kur, her weha weke ku li dilan bixe, di wê heyamê de li wî dihat. Di wê dema germ de, weke ku di nav seqema berfê de be, li mirov dihat. Ji aliyê peyivtinê ve û gavavatinê ve ne xwastineke ku gelekî dide westandin, xwe dida nîşandan. Mihemed di gavavêtin û nêzîkatiyên xwe de her weha weke ku xwediyê gavavatin û nêzîkatiyên be, dihate xuyakirin. Tiştên ku dîti bûn jê re gelekî gran dihatin. Weke ku barekî gelekî gran be û li ser pişta wî be, dihate hîskirin. Dîtin di wê heyamê de

barê herî giran bû ji mirov re. Dîtina bûyerekî gelekî gran. Mirovên ku diçûn û dihatin jî di gavavêtinên xwe de weke ku bêxwastek bin diçûn û dîtahin. Her weha di ser mirov de pêrde xemgîniye xwe berdabû. Xemgîniye di wê heyamê de di dilên de mal avakiri bû.Êş dide û dide.

Mihemed ta ku derbestên Dîlberê û Dilşad bi cih têt kirin li nig wan dimîne. Piştî ku ewan dihêne bi cihkirin û mirovên herêmê jî ku ji bo sersaxiye dihên şînê, nig Bedran Begî, êdî pê de hêzên Bedran Beg karên xwe dikin ku ji wir vegerin. Di nav wan de êdî ji herdu aliyan jî şer ne derdiket. Weke ku rewşeke nû di nav wan de dest pê bike bû bû. Xelkên herêmê Dîlberê û Dilşad di nav xwe de bi cih kiri bûn.

Di roja dawiyê de berî ku Bedran Beg û hêzên wî vegerin, serekeyên herdu eşîran li hev rûnişti bûn. Li wê rûniştina dawiyê ku bi hev re kirin, gelekî gotin û vebêjên girîng ji hev re kiri bûn. Gotin û vebejên ku weke peymanekê di seran de were girtin, kiri bûn. Hebûna Dilşad û Dîlberê di wê heyamê de gelekî dihate ser zimên. Rewşa ku bi Dilşad û Dîlberê re bûyî, weke bingehekî bû ji wan re. Wê rewşê ji wan re hinek astên mazin dabûn çêkirin. Gava mirov dimeyizand mirov didît ku rêz û nêzîkatî, hizir û mirovatî û xwe weke nêzîkatiyên girîng didan nîşandan di wê astê de. Ji aliyekî divêt hestiyarî û dilêşandinên mazin xwe didan nîşandan bi wan re. Li wê rewşê wek fêrek dihat meyizandin.

Mihemed gava ku Dilşad û Dîlberê bi cih têt kirin, êdî ew jî karê xwe dike ku ew jî biçûya. Her kes di nav bêdengiyê de xwe dilivand. Tenê dengê firaqên wan dihat di wê heyamê de. Ji wê pê ve çi dengên din ne dihat. Xemgînî bi mirovan re hebû. Bi wê xemgîniya ku bi wan re bû tevdigeriyan. Mihemed jî bêdeng bû. Hespê ku ew pê hati bû, li nig hespên serekeyan bû. Gava ku mirovên ku sereke ji cihê xwe dirabin ku herine ber bi hespên xwe ve, di wê heyamê de Mihemed di cihê xwe de dimîne. Mirovên din yên ku pê re ne hinekî jê dibuhurin. Lê yekî kal ku sereke bû ew jî li paş dimîne. Li Mihemed zivîri da ku têbigehê ku ka ma çima wî xwe li paş hêşt. Gava ku li Mihemed dizîvire, êdî weke du se gavan jî diavejê û ber bi wî ve diçe. Gava ku digihê dehma wî

dipirsiyê: ’Mirove hêja çima li paş mayî?’ Mihemed serê xwe pêşîkê dike ber xwe ve û hinekî li erdê dimeyizêne. Pişt re serê xwe dirake û dibejiyê: ’Li vîr wê reya me wê ji hev veqete. Ez ê çime Cizîra Bota. Ez li ser riya Cizîra Bota me.’ Gava ku Mihemed ev yek ji wî re got, wî jî weke bêhneke di cihê xwe de ma û paşê jê re her weha got: ’Ê nexwe wê riya me li vir ji hev veqete. Bi dilê me ye ku tu bi me re werî. Lê tu dibêjî ez ê herim.. Nexwe ka bêjê ji min re, te çi pêwîstiyek, pêdiviyek heye yan na?’Mihemed li hevberê vê gotinê her weha dibêjê: ’Na berxwudar bî. Tiştek ne gerek e, ez tiştekî na vêm. Tiştê ku ez divêm bi min re heye. Ji we re riya wa vekirî be!’ Piştî ku Mihemd van gotinan kirin, êdî yê serekê jî li wî dizîvire û dibêjiyê: ’Riya te jî bila vekirî be! Kengî riya te bi vî aliyê ve keve, wî çaxî li ser ser û ser çavan were! Me di demeke zor de hevdu nas kir. Tu jî di wê demê de amade bûyi. Me bi hev re gelek tiştên bi êş û zor dîtin. Wan tiştên ku me dîtin di dilê me de êşeke mazin berda. Li ser te ji her weha weke ku ez dibînim bandûreke pir mazin berdaye. Xwuda carekê din tiştên her weha ne hêne serê me. Tiştên ku bûn gelekî û gelekî tiştên bi êş bûn. Li vir me gelek tişt bi hev re jiya. Weke tu jî dibînî, ku ev mirov tev ji bo şer hati bûn. Lê şer ne bû. Ji dêla şer her weha rewşeke ku bêşer be hat holê. Ev rewş wê hebûna xwe berdewam bike. Ji î roj pê de jî ji bo ku çi rewşên din ên weha ne yêne jînkirin, em ê tevbigerin. Weke ku te jî dît, ku rewşa Dîlber û Dilşad wê bûba bingeha şerekî mazin di nav van herêman de, lê supasî ji Xwedê re ev ne bû. Ev ji me re tiştekî gelekî girîng e. Van mirovan hemû yê hev in. Lê bi nêzîkatiyên xirab re hatine hanîn li ber hevdu ku bi hevdu re her dem şer bikin. Lê ne kirin. Wê ev rewş çi careke ne yêt ji bîrkirin.’ Gava ku yê sereke dipeyivî û axiftina xwe hew kir, êdî Mihemed jî ji wî re peyivî: ’Te di dawiya gotina xwe de wê çi carî ev rewş ne yêt jibîkirin got. Rast e, wê çi carî ne yêt jibîrkirin. Wan mirovên li vir ku ev rewş dîtin ew û zarokên wan çi carî wê jibîr ne kin. Tiştê ku rast be û rast bûbe wê çi carekî jî ne yêt jibîkirin. Ev rewş dilê mirovan pir êşand. Ew dilêşandin wê her û her bimîne.’ Piştî wan gotinan re Mihemed ji wî xatirê xwe dixwaze û diçe ji Bedran Beg û serekên din jî xatirê xwe dixwaze

ku bikeve ser riya Cizîra Bota.

Lê Mihemed gelekî dihizirî. Li ser ruyê wî kêf ne dihate dîtin. Keti bû nav bêdengiyeke kûr. Di serê xwe de bi bêhtirî jî tiştên ku rû dabûn û ew dîti bûn û bihîstibûn hebûn. Tiştên ku li ser wan dihizirî ji tiştên ku di wê dema kin de ku bi Dilşad û Dîlberê re bûbûn. Gelekî wan rewşan li ser wî bandûreke mazin kiri bû. Rewşa Dîlberê hîç û hîç ji ber çavên wî ne diçû. Gava ku di rê de diçû jî, weke ku di serê xwe de carekê li nig wê be û pê re bipeyive lê dihat. Her cara ku ew dihate ber çavên wî, ew bêhiş dikir. Ji malê derketi bû ku here Cizîra Bota. Lê li ser riya xwe de gelek tiştên ku li ser wî bandûr kiri bûn, jiya bû. Nuha jî di serê wî de tiştên ku dîti bûn û bihîsti bûn dagirtî bû.

di riya xwe de diçû û diçû. Her ku diçû û çiya, kaş û gir li pey xwe dihiştin jî, ji wê rewşa ku jiyabû û dîti bû dûr ne diket. Di gelek cihên xweş de diçû. Lê hişê wî ne li ser wan ciyan bû. Weke ku qet ne dîti be û diçû. Li gelek cihan ji dirawestiya û bêhna xwe distand. Lê dîsan tiştên ku di serê wî de bûn wî bêkêf dikirin û ne dihiştin, ku kêfe bistêne ji dîtina wan cihên xweş ku tê re diçû. Dilxweşbûn hinekî rehetiya di dil û serî de dixwaze. Lê ew bi xwe re di dil û serê xwe de ne dilfireh bû di wê heyamê de. Ji ber vê yekê jî ne bi kêf bû. Li cihên ku Lê rasiwetiya jî, bêhtir ne dima. Her weha weke heyamekê dima û dîsan dikete ser riya xwe de û diçû. Gava ku dirûnişt jî weke kêlîkeke bêhna xwe distand û hinekî ku di xwe de bidîtina li pirtûkên xwe yên ku pê re ne binere. Ji mêj ve ew ne vekiri bû jî. Ji hizirandine pê ve tiştek din ne dikir. Cihên ku tê re diçû jî, tev daristan û cengel bûn.

Di çol û beyarên tenha de tek û tenê diçû. Mihemed her weha gelek rê diçe. Lê ji ber hizrên di serê xwe de ni zani bû ku çend dirêj yan kurt rê çûye. Mihemed gava ku digihê dehma herêmê, ku dibêjinê de Midihê û ji wir ber bi herêma ku dibêjinê Koze ve diçe. Li wir rastî mirovekî jî têt. Mirove ku lê rast tê jî, mirovekî ku keşe bû. Gava Mihemed digihê dehma wî slav lê dide. Ew jî slava Mihemed lê vedigerîne û li ber hev dirawestin û bi hev re dipeyivin. Mihemed gava ku li ber wî diraweste, jê dipirse ku ew kî ye û wê here ku derê. Keşe bersiva wî dide û dibêj: ’Ez bi navê xwe re

Tuma me. Ez keşê dera herêma Colemergê me. Ez ji nig metran dihêm û ez ê nuha jî herime Cizîra Bota. Ez ê li derên wê herêmê jî hinek bimînim û pişt re ez ê vegerim herêma xwe. Gava ku ez hatim ji nig metran ez çûme dera Deyrûlzafaranê. Paşê ez ji wir hatime Midyadê. Li wir jî li dera Şûryan mam. Nuha vêca wek tu dibînî, ku ez di rê de me û ez ê herime Cizîra Bota.' Mihemed gava ku weha li keşê hesand, ji wî re got: 'Ez jî diçime Cizîra Bota.' Piştî ve gotinê Mihemed hinekî bêdeng ma û pişt re her weha berdewam kir: 'Ez jî ji herêma Colemêrgê dihêm û ez ê herme Cizîra Bota. Ev demeke dirêj e,  ku ez di rê de me. Ez ê riya xwe ber bi Kozê dixim û ez ê ji wir herîm. Her weha ez hinekî riya xwe dizivirênim.' Gava ku Mihemed weha ev yek ji keşê re got, êdî keşe jî lê zivirî û gotiyê: 'Tu dikarî di riyên din re jî herî. Hingê wê riya te kin be. Lê weke ez dibînim, ku tu mirovekî zane û seyda yî. Her weha ez û tu em riya Cizîra Bota ji xwe re bikin yek û em bi hev re herin wir. Ez ê jî çime Cizîra Bota.' Piştî vê gotinê, Mihemed gote keşê:  'Bila, em bi hev re herin. Mihemed û keşe gava ku dane rex hevdu û çûn, di wê heyamê de keşe fahm kir ku Mihemed bêhtir jî bi xwezayê re mijûl e. Li bin darekê Mihemed rûnişt û li teyrikan dimeyizend. Weke ku ji wan re bilefze û bivizêne deng derdixe. Yê keşe jî li hevberê vê tevgera Mihemed xwe na gire û jê re dibêje: 'Ez dibêjim qey tu hez ji teyrikan dikî.' Mihemed her weha bi serhejandinê pirsa wî jê re herê dike û paşê dibêje: ' Ew jî bi rih in û zimanê wan jî heye.' Piştî ku Mihemed ev yek dibêjê, êdî keşe jî jê re dibêjê;  'ê nexwe ez dikarim bêjim ku tu ji zimanê wan fêhm dikî.' Mihemed li hevberê vê gotina wî weke ku hinekî bibêşişe û lê dimeyizêne û bi kurtî dibejiyê: 'Herê.' Pişt re herdu careke din dane ser riya xwe û bi hev re ketine ser riya kozê de. Koze herêmeke mazin e. Lê herêmeke ku gelekî hêrişên leşkerên osmaniyan lê bûne. Ji berê ve navê wê herêmê Koze bû. Lê ji ber hêrişên ku lê bû bûn û xelkên herêmê gelek hati bûn kuştin, êdî bûbû herêmeke bêmirov û mabû. Ji ber vê yekê jî xelkê dora wê derê jî navê wê derê kiri bûn Koza Xirab yan jî Xirabekoze. Paşê pir xelk ji herêmên din malên xwe bar dikin wê derê. Bi vê yekê re carekê din mal lê ava dibin. Ji wan gûndan re jî tê gotin

Gûnden li Xirabekoze yan jî rast û rast Xirabekoze. Lê hinek ji wan mirovên wê herêmê jî ji hêrişan rizgar dibin. Di herêm tev daristan e. Darên çilo yan jî darên din hebûn. Ew jî ji mirovan re dibin stareke mazin.

Mihemed gelekî tişt der heqê wan herêmên de bihîstibû. Tiştên ku wî seh kiri bû jî, ji wan kesên ku ji wê herêmê bazda bûn çû bûn wê herêma ku ew lê bû. Lê di wê heyamê de ew bi xwe li ser riya wir de bû ku here wir û wan deran bi çavên xwe bibîne. Mihemed gava ku dikeve ser wê riya xwe, her weha tiştên ku seh kiri bûn jî di mejiyê wî de dibuhurîn. Gava ku bi keşe re diçû, car bi car jî keşe jê dipirsi û wî jî bersiv dida wî û dipeyivîn. Lê ji wê pê de ji ne dipeyivîn. Mihemed gelekî bi hizir dihate xuyakirin. Gava ku li ruyê wî dihate meyizandin, dihate dîtin ku gelekî di hûdûre xwe de bi hizire. Mihemed û keşe ku weke heyamekê bi hev re diherin, êdî weke ku digihine nêzîki ber Xirabekozê. Gava ku digihenê de û malên ji dûr ve dibînin, hinekî ji gund dûr kahniyekê li pêşiya wan derdikeve. Gava ku ew jî digihîjin ser kahniyê, hinekî li ser dimînin û bêhne xwe distînin. Di wê heyamê de jî, hinek kesên ku wan dibînin ber bi wan ve dihên. Gava ku mirov ber bi wan ve dihên, slavê li wan didin û li nig hevdu hinekî dirûnin. Bi hevdu naskirinê re bi hev re dest bi peyivtinê dikin. Gava ku mirovên herêmê têne nig wan û hinekî bi wan re dipeyivin, êdî ew dihildin û dibin malên ku wan li xwe dikin mêhvan. Ew jî gava ku gundî dixwazin wan bibine malê, êdî bi wan re diçin. Lê gava ku diçin jî, bêhtir na mînin. Gava ku ew digihîjin ser kahniyê, dema ber êvarê bû. Diçine malê hinekî dirûnin, xwarinê jî ji wan re dihênin û xwarina xwe dixûn, piştî hinekî bêhna xwe jî diberdin, êdî karê xwe dikin ku herin. Xwediyê malê dibêjê wan divêt hûn bimênin ku ta şîva we jî were amadekirin û bixûn û pişt re em dixwazin ku hûn i şev jî li vir bin. Lê Mihemed vê yekê herê na ke. Ew bi xwe dibêjê, divêt ku em herin, da ku em zû xwe bigihinine cihê ku em ê hernê. Xwediyê malê çend dike na ke ni kare ku wan bide rawestandin. Gava ku xwediyê malê ni kare wan bide rawestandin, ji her yekî wan re turikekî ku tiştên ku di re de ji wan re bikêr were, ji bo xwarinê dide amadekirin û dide wan. Mihemed di wê heyamê de dixwast ku ew

xwe bigihîne herêma Ayserê. Herêmê Ayserê herêmêke ku gelekî xweş bû. Li wir ji xwendegeheke mazinbû hebû. Di herêmê de jî navê wê xwendegehê derketi bû. Navê wê xwendegehê bi navê herêmê re yek dihate ser ziman. Mihemed jî navê wê derê bihîsti bû. Ji Mihemed re ji hati bû gotin, ku gelek mirovên zane li wê derê  diman. Ayserê bêhtir ji Cizîra Bota ne dûr bû. Gava ku wan xwe gihandiba Ayserê, êdî weke ku wan xwe gahandibana Cizîra Bota. Lê yê ku di serê Mihemed de bû ew bû ku xwe gahandiba wê derê û wê derê jî bidîta.

Bi vî awayî Mihemed û keşe bi hev re ji Xirabekoze derdikevin û diçine ber bi Ayserê ve. Riya wan ji Xirabekoze ta Ayserê ne dirêj bû. Gava ku hinekî daban lezê, wê hê bêhtir li wan ne bûye reş, wê xwe gihandiban wê derê. Her weha ew jî dikevine rê de û hinekî lezê didine xwe da ku hinekî zûtir herin û bigihin Ayserê. Di rê de gava ku di serê xwe de mirov biryar da ku mirov here derekî, êdî li ber çavên mirov wast na mîne. Mirov bi wast jî be, dîsan mirov xwe ji riya xwe na ke. Her weha wan jî biryara xwe dabû û keti bûne ser rê da ku herine cihê ku wê hernê.Mihemed û keşe gava ku dikevine ser rê de, êdî bi lezê diçin û di hundurê demeke kin de xwe digehînin ber Girê Elim. Gava ku ewan digehin ber gir, êdî weke ku wan riya xwe nîv bi nîv kiri be têt jimartin. Êdî weke ku gihabin.. Lê hê bi yekcarî jî ne giha bûn. Diviya bû ku hê hinekî din jî biçûna. Mihemed wan deran bêhtir nas dikir. Ji nûke ve dihate wan deran. Lê keşe jî wan deran baş û qenc nas dikir. Gava ku ji Xirabekoze bi rê dikevin, Mihemed zani bû ku wê bi kîjan aliyê ve herin. Wî di serê xwe de riya xwe zani bû. Keşe wan deran berê jî dîti bûn. Ji Mihemed hê bêhtir wan deran nas dikir. Hê ku li Xirabekoze bûn, gava ku xwediyê malê ji wan pirsî bû, ku wê çine ku derê, digot wê herin dêrê ku keşe gotibû ku ’ez nas dikim.’ Mihemed dihizirî ku xwe gihandiban Ayserê, êdî wê ji wan re xweştir ba. Ji wir pê de wê ne bûba zor ji wî re. Vê yekê wî jî zani bû. Ji Ayserê mirovên ku dihatin û diçûn gelek bûn. Ji ber wê yekê jî wê mirov rê şanî wan dabana. Keşe jî rê nasdikir û wan bi hev re gotina xwe kiri bûn ku wê ta Cizîra Bota bi hev re çûban. Mihemed van hizra hê berî ku bigihan herêmê di serê xwe de çê kiri bû. Lê

nuha hevalekî wî ku ew herêmê baş nas dikir hebû. Li herêmê, li gelek cihên deran hebûn ji ber vê yekê jî keşe Tuma li hemûkan jî geriya bû. Bi vê yekê re mirov hem hevdu nas dikir û hem jî herêma ku diçûnê nas dikirin. Li dora Cizîra Bota û li navenda wê xelkê fileh hebûn. Mirovê êzdî ji hebûn. Li Cizîra Bota û li hinekî jê wir de û weke navendeke mazin dihate dîtin, Nisêbîn hebû. Li wan deran û li dora wan deran jî êzdî û fileh hebûn. Her weha xelkê ji olên cuda li nig hevdu bûn û bi hev re gelekî xweş û baş dijiyan. Ku çûban herêma hevdu û li hevdu nebûba mêhvan, dilê wan ji hev dima. Ji ber vê yekê jî gava ku diçûne herêmên hevdu, diviya bû ku hevdu jî bidîtina. Di vir de hêja ye ku divêt mirov bêjê, ku ji navenda Cizîra Bota, ta navenda Nisêbînê Riya Hevrîşimê diçû. Riya Hevrîşimê riyeke gelek cengê wê yên ku diçûne herêmên din jî hebûn. Herêma Ayserê diket di navbera Girê Elim û Riya Hevrîşimê. Lê gava ku rast û rast mirov ji Ayserê diçû ser Riya Hevrîşimê û hinekî jî di rê de mirov diçû bi aliyê Cizîra Bota ve, mirov digiha çemê Zergûzê. çemê Zergûze çemekî ku ava wê gelekî xweş bû. Li ber çem darên behîvan û tûyan hebûn. Hinek darên bearuyan ji hebûn. Lê ne bêhtir.mirov malên xwe nêzîki wê ave çê kiri bûn. Bi malan ve û nêzîki avê ve jî rez û warz  hati bûn danîn. Ayserê jî ji wan herêman ne dûr bû. Mirovên ku li wê herêmê dijiyan, zadên xwe her weha baş dihildan. Ew herêm herêmêke têrav bû.  Ji ber vê yekê jî çi pirsgirek di jiyanê de her weha ji aliyê avê ve bi wan re ne bûn. Çandin ji her aliyê ve pêk dihat. Bi vê yekê re her weha divêt ku mirov bêjê, derûniya mirov gelekî baş bû. Mihemed û keşe Tuma jî gava ku digihîjine dehma Ayserê, her weha rastî xelkê dihên û vê yekê ji baş û qenc fahm dikin. Mirovên wê herêmê her weha mirov dikarê bêjê ku pêşketî bûn. Têrbûn bi mirov re bi her awayî xwe dida nîşandan. Bi vê yekê re mirovên wê herêmê, ji aliyê çivaknasiyê ve jî gelekî li pêş bûn. Hêja ye ku mirov bêjê ji aliyê zad ve gelekî dewlemend bûn. Ji aliyê kevneşopiyan ve jî tevgerên wan gelek kevn bûn. Her weha di her demê de gava ku paletî hew dibû şahî dikirin û bi hev re govend digirtin. Mirovên ku paletî hew dikirin, êdî piştî paletiyê re weke demeke li malên xwe dirûniştin. Di wan deman de jî gelek

mirovên ku henekçî bûn, qirdik çê dikirin an jî cimezî dixemilandin û mal bi mal digeriyan ji xwe re tişt didane hevdu. Mirov gava bi qirdik re hatina devê deriyê malekê, diviya bû ku tiştekî bihatina dayin. Ev dayin jî weke kevneşopiyekê dihate dîtin. Dayin jî xeynî kevneşopiyê dihate wateya ku zadên xwe ji erdê rakirine û sala wan, ji bo wan baş çûye. Lê hinek herêman jî her weha bi qirdik re gerandin dihate kirin. Mirov di dema şahiyê de tişt bi destên xwe çê dikirin û dihanîne ber mirov. Her weha jiyaneke ku xwezayî bû, di nav mirovan de hebûna xwe berdewam dikir. Bi vê yekê re, divêt ku mirov bêjê ku derûniya mirov gelekî geş û zindî bû. Gava li ruyê mirov dihate meyizandin, ev yek baş dihate dîtin. Kulên jiyanê her weha bêhtir bi mirov re ne bûn.

Mirov di demên şahîyan de di wê salê de çi çandiba, ji wan tiştên jî didane ber mirov amade bû bûn. Her weha ev yekê weke serbilindiyekê dihate dîtin. Her borînkirin û keremkirin jî, bi hev re di wê rewşê de dibû. Mirov ku bihatina bûrinkirin, diviya bû ku kerem bike. Ev yek hem ji bo rûmeta xwediyê malê bi wate bû. Xwediyê malê ew dawêt dikir, her weha erê dîkir. Bi vê yekê re nêzîkatiyên di nav xwe de xurt dikirin. Hevnaskirin jî her weha xurt dibû. Di wan rewşan de mirovên ku rewşa wan xweş bû, dilxweş bûn. Lê yên ku rewşa wan ji ber hinek sedemên xwezayî ne baş çûba, êdî diviya bû ku yên ku rewşa wan baş ba, alîkariya wan bikira. Bi wê alîkariyê re, wan jî êdî di rewşa xwe de, hin bi hin rastkirin çê dikirin. Ku rewşa yekî ne xweş ba û yên din ji li hevberê wê rewşa wî bêxem maba, ev mayin weke bêrûmetiyekê dihate dîtin. Mirov di wê rewşê de, ew yek çi carî jî, ji bîr ne dikir. Her cara ku hati ba bîra wan jî, ji wî mirovê ku bêxem mabû re ji bêxêrî dihate xwastin. Mirov êdî bi nêzîkatiyên xwe re di her rewşê de ew yekê li ruyê wî didan. Mirovên ku rewşa wan ne gelekî giran ba, bêhtir ne dihanîne ser zimên. Bi nêzîkatiyên xwe re ku dihatine hevberê wî, tevgerên wî dihanîne bîra wî. Di vê rewşê de jî gava ku mirov didît ku her weha bi nêzîkatiyan re hat dayin li ruyê wî, êdî yên ku xwe ne girtiban jî, bi devkî didane ruyê wî. Lê piranî jî, di rewşên weha de, diketine devê henekçiyan. Ev jî gelekî dibû sedemê ku mirov bi pêkenînan jî dihatine rexnekirin. Navlêkirin

her weha bi du aliyan dibû. Bi aliyê baş dibû û bi aliyê nebaş dibû. Di rewşên wisa de jî, mirov çi cari ne dixwast, ku navekî nebaş hilde. Mirov ji vê yekê re digotin ’rastnav.’ Rastnav jî bi rewşên ku rû didan çê dibû. Di vir de divêt mirov bêjê, ku rastnav di jînkirina wan rewşan de nêzîkatî û helwêsta mirov çawa ba, li gor wê çê dibû. Di bingeha van rewşên hemûken de jî, demên karkirina zadgirtinê jî hebûn. Her weha çi mirov ne dixwastin ku rastnavekî wan yê nebaş hebe. Ji ber ku rastnavekî wan heba, ku baş ba yan jî nebaş, êdî wê li ser wan sax ba. Di nav civakê de ev bûbû xwediyê hebûneke baş di negirtina rastnavekî nebaş. Her weha jiyana mirov bi nêzîkatiyên xwe re, li ber çavên henekçiyan jî bû. Wan henekçiyan, li her mirovî baş û qenc dimeyizandin ku ka ma çi taybetmendiyên wan hene. Taybetmendiyên ku dîti ban, dihanîne ser ziman. Ve rewşê dikir ku mirov di nav civakê de ji her aliyê ve xwe zindî bigrin û xwe bêxiyret ne hişti ban Ji aliyekî din ve jî dibû bingeha jînbûnekê di nav xelkê de. Mirov  bi zanebûn li jiyana hevdu dimeyizandin. Mirov bi hizir re gavên xwe diavêtin. Bi hizir gavavêtin di bingeha xwe de tegihîştin diparast. Ew têgehîştin jî bi bêhtirî ji aliyê civaknasiyê ve bi wate bû. Wekî din jî ji aliyê civaknasiyê ve jî ber bi rehetbûneke ve dihat. Her weha mirov dikari bû bêjê ku di nav mxelkê de pêşketineke mazin hebû. Bi civaknasî, bi hizir û têgehiştin û hebûna mirov bi hev re re xwe ber bi pêş dibe. Ji aliyê din ve jî bi mirovên ku li ser axa xwe be û li ser axa xwe bijî, pêş dikeve. Divêt ku mirov bêjê ku ax, mirov û hizir bi hev re di bingeha civaknasiya çivakî de, xwediyê wateyên mazin in. Mirov di demên pêşketinên xwe de gelek xalên mazin derdixistine holê û pê pêşdiketin. Di vir de xalên herî mazin bi naskirina di nav civakê de çê dibû. Pêşî erdê ku li ser dijiyan naskirin çêdibû. Pişt re mirovên ku li ser wê erdê ku bi wî re di rex hev de dijîn, hevdu didîtin û nas dikirin. Pişt re jî bi vê yekê re di şeran de bi naskirinê re têgehîştin çê dibû. Bi naskirinê re mirov dihatin nig hevdu. Bi hatinê nig hevdu re ji navbera wan çê dibû. Di vê navberê de jî civaknasiya wan ya çivakî pêş diket. Her weha di vê xalê de êdî bi têgihiştinê re jînbûn dibû û pêşketin çê dibû.

Mihemed û keşe Tuma piştî ku gihabûne Girê Elim û ji Girê

Elim derbas bû bûn, êdî weke hinekî din jî rê çûbûn û gihabûne Ayserê. Gava ku digihine Ayserê, êdî hinekî behna wan fireh dibe. Lê gava ku gehiştinwir  ji reşayî keti bû erdê. Lê hê bêhtir jî reş ne bû bû. Mihemed û keşe Tuma gava ku digihijine Ayserê, êdî di nav malan de gava ku diherin, li yekî digeriyan ku jê bipirsin ku wê li ku derê bimana. Gava ku hinek di nav malan de diçin, rastî hinek mirovan dihên. Mirovên ku rastê wan dihên jî, mirovên ku li malên xwe şîvên xwe xwari bûn û ji malên xwe derdiketin ku wê herine malan ku civat lê hebû. Gava ku digihîjine dehma slavê didine hevdu, hev didine naskirin. Gava ku bi hevdu re dest bi axiftinê dikin, pêşîkê Mihemed dipeyive. Gava ku Mihemed xwe dide naskirin êdî keşe Tuma jî xwe dide naskirin. Mirovên ku wan dibînin, wan li wir na hêlin. Li wan dibine xwedî û wan bi xwe re dibine cihê ku wê çinê. Pêşîkê hevdu nasdikin û didine rex hevdu û diçin ku bi hev re herne mala civatê. Gava ku diçin di rê de wan mirovên ku rastî wan hati bûn, ji wan dipirsin ku ji ku derê hatine. Mihemed ji wan re dibêjê ku ew ji aliyê Colemêrgê hatiye û feqi ye û hatiye ku here Cizîra Bota. Her weha keşe Tuma jî xwe dide naskirin û dibêjê ku ji Colemêrgê hatiye ku here ber bi Cizîra Bota ve. Piştî li wan dihesênin, êdî dibêjine wan: ’Hûn bi xêr hatin’ û ew didine rex xwe û dibine mala civatê. Gava ku di re de diçin, ji car bi car jî, mirovên ku ew dabûn rex xwe de, ji wan pirsan dipirsin der heqê riya wan ku jê hati bûn. Wan jî li gor zanebûna xwe bersiva wan didan. Her weha bi axiftina weke heyamekê diherin û êdî digehîjin cihê ku wê werinê. Gava ku digiîjin wê derê, mirovên, ku wan bi xwe re hanibûn, di devê deriyê hawse de pêşîkê re didine wan û wan dibuhurînin hundurû. Ji ber ku ew diyar bû ku ji dûrî ve hati bûn. Gava ku diçine hundurû, dimeyizênin, ku wa ye civat li dar e û gelek mirov di rex hevdu rûniştine û bi hev re dipeyivîn. Gelek ji wan mirovan jî mirov kal û navser dihatine xuyakirin. Lê mirovên ciwan jî dihatine xuyakirin. Jin jî di civatê de hebûn. Lê bêhtirî mêr bûn. Gava ku Mihemed û keşe Tuma ketine hundurû de, pêşîkê slava xwe dan civatê û pişt wan bûrîn kirine rûniştinê. Gava ku dirûnihên, pêşîkê civat hinekî bêdeng dimînin û li wan dimeyizênin. Pişt re yek careke din dibêje wan; ’hûn bi xêr hatin’ û

bi wan re dest bi axiftinê dike. Yê ku bi wan re pêşîkê dipeyive xwediyê malê bû. Navê wî ji digotinê de Rame Beg. Rame Beg mirovekî ji mala axê bû. Lê ew bi xwe jî wek yekî ji rêzê bû. Çi wasf di wê heyamê de destê wî de ne bû. Rame Beg se birayên wî yên dî ji hebûn ew jî her yek li ser herêmekê diman. Rame Beg jî her weha li herêma Ayserê dima. Ew bi xwe jî bêhtir ne ewçendî kal bû. Gava ku lê dihate meyizandin, dihate dîtin ku weke mirovekî ciwan dihate xuyakirin. Mirovekî ku hinekî gir bû û hinekî jî dirêj bû. Simbêlên wî qaytan bûn. Cilên ku lê bûn ji cilên ji ye cizîriyan ne cuda bûn. Lê cilên bega lê bûn. Ji ber vê yekê jî ji rewşa wî dihate têgehîştin ku ji malekî mazin bû. Çavên wî hinekî gir bûn. Rûdana wî vekirî bû û heiya wî li gor rûdana wî fireh dihate xuyakirin. Ew bi xwe jî di nav nêvê civatê de rûnişti bû û hinek mirovên ku ku kal bûn, li aliyê wî yê çepê û û rastê rûniştî bûn. Ew mirovê zane dihatine xuyakirin. Rame Beg ne dûrî Mîrê Cizîra Bota bû. Di wê demê de jî digotin ku li Cizîra Bota Tacdin Beg bû bû mir. Tacdin Beg nû bû bû mîr û navbera wî û Rame Beg gelekî xweş bû. Dihate gotin ku herdûk ji aliyê malê ve digehan hevdu. Dayika Rame Beg bi malbaviya xwe ve digeha mala mirê mazin. Ew jî bi navê xwe digotinê Sêvê. Di keçkaniya xwe de gelekî xweşik bû. Çavên wê mazin û her dem jî bi kil bûn. Lê Sêvê di wê heyamê de gelekî pîr bû bû û piştî ku hevalê wê yê jiyanê koçê dawiyê kiri bû, ew jî diçe Cizîra Bota û li wir dimêne. Rame Beg bi xwe jî dibû kurê Sêvê û Zengal Axa. Zengal Axa jî axayê cengek ji eşîra botiyan bû. Mirovekî gelekî zane bû û bi başbûna xwe ve dihate naskirin. Ew jî ji xwe di wê heyamê de ne dima. Giha bû ber dilovaniya Xwedê. Gava ku ew digihîjê ber dilovaniyê, êdî kurê wî ye herî mazin ku bi navê wê Rûbar Beg bû, keti bû dewsa wî de. Rûbar Beg jî berî ku bavê wî bigehê ber dilovaniyê, ew şandi bû Cizîra Bota ji bo ku fêrbûneke baş û qenc hilde. Rûbar Beg ji aliyê dayika xwe ve her weha dibû xwarzê Mîrê Bota Tacdîn Beg. Ta ku bavê wî digehîje ber dilovaniyê, ew jî li nig mala xalanê xwe dimîne û fêrbûna xwe li nig wan dike. Cihê ku Rûbar beg lê bû, di wê demê de nêzîkê herêmê Hezexê bû. Bi vê yekê re, hinekî ji Cizîra Bota dûrketi bû. Rûbar Beg her dem bi mirê mazin re gavên xwe diavêtin. Mirê

mazin jî gelekî alîkarî didayê. Her weha Rame Beg jî alîkariyeke mazin ji qesra mîr distand. Di her hêrişên ku bûba, artêşa mirê mazin li nig wî bû. Ji ber vê yekê jî mirov ku xwasti ba hêriş kiri bana ser Rame Beg, bêhtir ne diwêrîn. Hebûna Mîrê Mazin, Mîrê Bota û nêzîkbûna wan ji hev re, ji Rame Beg re dibû bingehekî mazin ji bo ewlekariyê. Mirov ku xwastiba hêriş biriba ser wî jî, bi vê yekê ne diwêrîn.

Bi vî awayî gava ku li Rame beg dihate meyizandin, dihate dîtin ku mirovekî gelekî xurt bû. Gava ku Mihemed û keşe Tuma çûbûn di nav civatê de rûnişti bûn, ji peyvên û nêrînên Rame Beg zû fahm kiri bûn. Fahmkiri bûn ku Rame Beg mirovekî beg bû. Lê waxta ku rûniştî bûn, hê bi wî re bêhtir çi gotûbej ji ne hati bû kirin. Her weha Mihemed ji û keşe Tuma jî di cihê xwe de hema wilo rûniştî bûn û li wan mirovên ku dipeyivîn dimeyizandin û dihesandin. Mirovên ku dipeyivîn jî, mirovên ku navsere bûn û zani bûn, ku bipeyivin û mirov li xwe bidine hesandin. Mirovên ku li dora wan jî didipeyivîn ji pir bi balû serinc li wan dimeyizandin û dihesandin. Rame Beg ji gava ku ew dipeyivîn, li wan gudar dibû. Biguhbûna wî bi xwe re biguhbûna civatê li wan dihanî. Rame Beg her weha hinekî bitesîr dihate xuyakirin. Hesandin û guhdarkirin bêguman di wê rewşê de girîng bû. Weke rûmetdayineke dihate dîtin. Li wan mirovên navser hesandin, rêzekî dida mirov. Mirovên ku li wan dihesand, bi xwe re weke ku hêz bibînin li wan dihat. Ji ber vê yekê jî pir baş û mazin agehdarî bi mirovan re çêdibû.

Rame Beg weke heyamekê li wan mirovên ku dipeyivîn dihesênê, êdî berê xwe dide Mihemed û keşe Tuma û bi wan re dipeyive. Rame Beg gava ku bi wan re destt bi axiftinê dike, pêşîkê hinekî behsa xwe û mirovên li dora xwe dike. Bi vê yekê re jî nêrînên ku Mihemed der heqê wî û civatê de girti bûn, di serê wî de tam dirûnê. Pişt re Mihemed ku Rame Beg axiftinê hew dike, êdî ew dest bi axiftinan dike. Gava ku dest bi axiftinê dike, pêşîkê hinek behsa xwe û herêma ku jê hatiye dike. Gava ku mirov her weha lê dihesandin fahm dikirin ku ew mirov xwedî zanebûn e. Di wê heyamê de hinek seyda di civatê de amade bûn. Gava ku Mihemed dest bi axiftinê kiri bû û axiftine xwe ye pêşîkê hew kiri

bû êdî pê de weke heyameke axiftin di navbera wî û wan sedayan de çê bû bû. Wan sedayan jî, ji wî hinek pirsên xwe pirsî bûn û wî jî bersiva wan dabû. Piştî vê yekê, mirov fahm kir ku Mihemed mirovekî zane ye. Piştî vê yekê gelek axiftin di navbera wî û wan seydayan de çê bû. Car bi car keşe jî bi zanebûna xwe re tevlî guftûgoyan dibû. Lê bi bêhtirî jî guftûgoyên di navbera Mihemed û wan sedayên din de dibuhurt. Seydayên ku amade bûn, mirovên ku hinekî navserê xwe bûn û bi zanebûn bûn. Ji ber vê yekê jî di serî de wan guftûgo di nav xwe de berdewan kiri bû. Mihemed hingê ji wan re hinekî ciwan hati bû. Gava ku li rewşê wî jî dimeyizandin, digotin qey ku Mihemed mirovekî ku ji nûke ve dest pê kiriye. Lê Mihemed ji dema ciwaniya derketi bû û mirovekî ku gelek tişt jî dîti bûn. Di kesayetiya wî de jî, rûniştineke mazin xwe dida nîşandan.. Her weha weke demeke dirêj ji Mihemed û seydayên din di nav xwe di dipeyivîn û guftugo dikirin. Di nav axiftinan de gava ku navê seydayê wî ji devê wî derdikeve, êdî mirov hê bêhtir bala xwe dabûn ser wî. Mirov navê seydayê wî bihîstibûn. Zanibûn ku mirovekî ku çend bi zanebûn e. Bi vê yekê re êdî Mihemed li wir bi zanebûn dihat naskirin. Mirovê ku li wir bûn û seyda bûn, gelek ji wan bi Melayê Cizîrî re jî ma bûn. Gava ku behsa Melayê Cizîrî di nav axiftinan de têt holê, êdî bala Mihemed jî hê bêhtir diçe ser wan mirovên ku behsa wî dikirin. Navê Melayê Cizîrî jî bi hatina ser ziman re hê bêhtir di serê wî de cih digire. Di wê heyamê de ji wan mirovan ku bi Melayê Cizîrî re mabûn jî hinek gotinên wî weke beytên ji wî re dihênine ser ziman. Ev yek ji bandûreke li ser Mihemed diberde. Mihemed piştî ku her weha bi seydayan re axiftinan dike, êdî seydayên bela xwe ji wî ne vekiri bûn. Êdî berê xwe dabûne wî. Lê Mihemed jî gava ku navê Melayê Cizîrî dibihîze, êdî bala wî jî diçe ser wan mirovan ku der heqê wî de axiftin kiri bûn. Berê jî der heqê Melayê Cizîrî de wî gelek gotin bihîsti bû. Ev yek jî bi wî re dibû bingeha mereqeke pir mazin di serê wî de. Gava ku li ruyê wî dihate meyizandin, dihate dîtin ku mereqeke wî di serê wî de heye. Ji ruyê wî ev yek dihate xwandin. Ji aliyekî dî ve jî gava ku gotina Melayê Cizîrî keti bû holê de, çavên wî weke ku biçirisin li wan hati bû. Her weha çirisandin

di çavên wî de dide derve. Mihemed gava ku bahskirina Melayê Cizîrî têt kirin, êdî yên ku bahsa wî kirin, ji bala Mihemed rizgar ne dibûn. Yên ku bahsa Mele Ehmedê Cizîrî kiri bû, goti bû: 'Melayê Cizîrî hê nû demeke kin bû ku hati bû.' Ev peyv di serê wî de meraqek çê kiri bû. Gava ku her weha ye ku ew gotin kiri bû; goti bû: 'Melayê Cizîrî jî nû hatiye.' Pey re jî goti bû 'Melayê Cizîrî ev demek e dirêj bû ku li Amedê bû.' Bi vê yekê re di serê Mihemed de bûbû meraq, êdî wî jî li ser Melayê Cizîrî û Amedê pirsa pirsî bû, ku Melayê Cizîrî çûbû çi Amedê? Her weha seydayê ku bersiv dabûye de jî, ev bersiv jê re welê hanî bû ser zimên: 'Melayê Cizîrî mirovekî gelekî zane bû. Gelekî li ser zanist kûr bû bû. Gelek mirov li nig wî xwandine. Yê Melayê Cizîrî nas dike, dizane ku ji Hasetê ye. Hasetê jî li vir e li Bota ye. Melayê Cizîrî dema xortaniya xwe, yekî ku zû fêr dibû. Ji ber vê yekê jî li nig gelek seydayan digere û zanist û zanebûna wan digire. Di dema xortaniya xwe de gava ku hinekî zanebûna wî mazin dibe, êdî dixwaze hê bêhtir fêr bibe. Bi vê yekê re li gelek herêmên Kurdistan digherê. Diçe herêma Serhede. Diçe herêma Zivingê. Diçe herêma Dêrsimê. Her weha li gelek herêman digherê. Piştî gerandina xwe, xwe digihêne herêma Hêskîfî. Li wê derê jî Şêx Husên heye. Melayê Cizîrî diçe nig wî. Li nig wî jî weke heyamekê dimêne. Lê têne li wir ne na mêne. Gava ku li Nig Şêx Husên dimêne jî, li wan herêmên dora wê derê digere. Li wê herêmê gava ku digere, di gerandina xwe de diçe nig gelek mirovên zane. Xwe digihêne gelek herêmên din, yên ku mazin bûn. Melayê Cizîrî her weha di dema xwe de, xwe digihêne mirovên zane. Ji wan mirovan jî gelekî fêr dibe. Bi vê yekê re mirov dikarê bêjê, ku mirov ji wan demên wî yên ku di gerandinê de ye, jê fêr dibin. Mirovên herêmê wî baş û qenc nas dikin. Nuha ku tu herî wê herêmê, çi mirovê ku Melayê Cizîrî nas ne ke tu zor bibînî. Her weha Melayê Cizîrî piştî demeke ku digere, êdî pê de careke din divegere nig Şêx Husên, ku li Heskîfê ye. Lê vê cara dawiyê ku divegere, bêhtir li nig Şêx Husên na mêne. Şêx Husên li nig Mele Taha ye. Mele Taha mirovekî gelekî zane ye. Zanista wî jî mazin e. Şêx Husên gelekî hez jê dike. Şêx Husên jî bi bawer e ku zanebûna Mele Taha mazin e. Bi vê yekê re Melayê

Cizîrî diçe nig Mele Taha. Mele Taha kirê wî yê şîfakirinê jî heye. Li ser şîfakirinê bi zanebûn e. Mele Taha bi xwe jî di dema feqetiya xwe de hatiye Cizîra Bota û çûye nig Şêxê Çemîşgezekê. Şêxê Çemîşgezekê mazin têt naskirin. Gava ku Melayê Cizîrî diçe nig Mele Taha, demeke li wir jî dimîene. Gelek tiştan ji wir jî fêr dibe. Di wê herêmê de Mele Taha miroekîv baş û mazin têt naskirin. Rêzê mirovan jê re mazin e. Weke şêxekî bi wate ye ji mirov re. Bi vê yekê re Mele Taha ku demeke Melayê Cizîrî li nig xwe dihêle, êdî Melayê Cizîrî li nig wî dibe Mele. Mele Taha bi xwe li Amadê li Medresa wê derê dimêne û perwerde dide. Lê piştî ku Melayê Cizîrî li nig wî her weha têt wê asta meletiyê, êdî Mele Taha jî wî dişênê gundekî, ku bi navê xwe dibêjinê de Sirba. Li Sirba'yê jî li medresê dihate xwandin. Melayê Cizîrî têt ser serê wê medresê ku perwerde bide. Melayê Cizîrî her weha xwe bi fahm û zanebûn kiriye ku bi wê zanebûna xwe re dibe mele û diçe ser serê medreseyan'

Bi van gotinan re Mihemed hinekî dihizire. Gava ku van gotinan jê re hatin gotin, gelekî li ser wî bandûrekê çê dikin. Mihemed piştî gotinên ku seyda der heqê Melayê Cizîrî de Goti bû, êdî li wî zivirî û dibejiyê de: 'Yê min ez ta nuha navê te ni zanim û fahm dikim ku va ye tu mirovekî gelekî bi zanebûn î. Navê te bi xêr?' Piştî vê gotina Mihemed, seyda bi yekcarî xwe li Mihemed zivirand û weke ku bibeşişe li Mihemed meyizand. Seyda weke bêhneke bêdeng dimêne di cihê xwe de û pişt re dest bi axiftinê dike: 'Weke ku tu jî dibînî, wa ye em gelek seyda li vir li nig hevdu ne. Ez bi xwe jî ne ji vir im. Ez ji herêma Destedarê me. Navê min jî Mele Zeynedîn e. Bavê min û kalkê min ji herêma Qarexirabê bûn. Lê ji aliyê dayikê ve jî ez digehime aliyê Alikan. Dibit ku tu jî dizanî, ku piştî hêrişa osmaniyan diçin ser Alikan êdî hêza wan na mêne. Yên ku difilitin jî xwe dispêrine çiyaye Sipî. Piştî ve rewşê dayika min û bavê min hevdu mar dikin. Mala me nuha li Dastederê ye. Nuha ez li wir mele me jî. Ez nuha hati bûme mala malxalanê xwe, ku wan li Qarexirabê bibînim. Em bi ser hevdu ve diçin. Bi vê yekê re jî divêt ku ez bêjim, ku ev demeke dirêj e ez li vir im. Ev demeke dirêj e jî li Cizîra Bota bûm. Li wir weke demeke li Medresa Sor

mam. Melayê Cizîrî û hê gelek mirovên din, yên ku zanistvan i, li wir dimênin. Tu jî ku tu çûyî wir, tu wê wan bibînî, nuha li wir dimînin. Yekê ku dikeve nav wan mirovê zane de, na xwaze êdî ji nav wan derkeve. Piştî ku Melayê Cizîrî hat ji Amedê êdî ez hatim. Ev demeke dirêj e ez li vir li nig wî mirovê mazin im. Lê divêt ez ji kekê xwe re bêjim, ku min berê ji Melayê Cizîrî nas dikir. Bi temen hinekî ji min mazintir e lê ne bêhtir ji mazintir e. Me di dema xortaniya hev de hevdu dîti bû. Ez hatim û min ew dît û demeke dirêj jî me bi hev re buhurand û nuha jî ez li ser rê me karê xwe dikim, ku vegerime malê. Vêca berî ku ez vegerim jî careke din ji Cizîra Bota vegeriyam û çûme Qarexirabê û ji wir jî hatime vir. Te jî got ku ez hatime herime Cizîra Bota û te got ku ez ji Colemergê hatime. Da ka vêca tu jî hinekî bêjê û bahsa xwe bike û cihê ku tu jê hatî jî, hinekî ji wir bihêne ser zimên.’

Piştî van gotinên Mele Zeynedîn re, Mihemed hinekî bêdeng ma. Mirovên ku li dora wan bûn, di dema ku Mele Zeynedîn dipeyivî, bêdeng bûn û li wan dihesandin. Di wê heyamê de Mihemed jî li berçavan bû. Mirov hema wilo li wan dimeyzend û dihesand. Mele Zeynedîn, zimanê wî gelekî xweş û şêrîn bû. Gava ku mirov lê dihesand, ne dixwast, ku bala xwe ji ser wî bidine alikî. Gava ku Mele Zeynedîn dipeyivî, weke ku helbesteke bixwêne li mirov dihat. Zani bû gotinê li hev bihêne. Bi vê yekê re divêt mirov bêjê ku zani bû ku gotinên xwe li pey hevdu bike rêz. Di vî aliyî de xwediyê hunerekî bû dihate xuyakirin. Mele Zeynedîn weke ku jê dihate têgehîştin, ku hinekî li ser matematîkê zanebûna wî hebû. Gava ku dipeyivî, di nav gotinên xwe de agehiyên li ser dirêjbûn û çend dem girti bû jî digot. Ev yek ji çavên mirov baz ne diîda. Vê yekê, bala Mihemed jî kişandi bû. Lê Mihemed li ser wê yekê di wê heyamê de tiştek ne goti bû. Têne di serê xwe de dibir û dihanî. Mele Zeynedîn bi temen gelekî ji Mihemed mazin dihate xuyakirin. Di wê heyamê de divêt mirov bêjê ku Mele Zeynedîn û Meleye Ayserê Mele Tofîq jî jÎ hevdu nasdikirin û ji hev re weke hevalan bûn. Malê Tofîq yekî bi Melayê Cizîra re ma bû. Hez jê dikir. Lê bêhtir jî li ser Mele Husênê Bateyî bi evîn bû. Mele Husên Bateyî bi dîwan bû. Zembilfiro**ş** û Mevlûda xwe re pir mazin dihate naskirin

ji aliyê xelkê ve. Mihemed jî gelekî der heqê wî de seh kiri bû. Mele Husêne Bateyî ji Eşîra Errtûşiyan bû, ku li Colemergê dima. Ji ber vê yekê jî, Mihemed gelekî der heqê wî de ji seydayê xwe seh kiri bû. Seydayê wî di biçûkatiya wî de, ew bi xwe re dibir Medresa Miksê yê Mir Husên û der heqê Mele Husênê Bateyî de wî li wir dida hesandin. Her weha Mihemed der heqê Mele Husênê Bateyî de jî xwediyê zanebûneke xurt bû. Gotinên Mele Husênê Bateyî, ku dihatine holê û Mele Tofîq hez dikir gelekî li ser wî bandûr dikir û dilxweş dibû. Mele Tofîq jî weke demekê di Medresa Mir Husên de mabû. Pişt re hati bû Cizîra Bota û êdî li wir bû. Li Cizîra Bota demeke dirêj li Medresê Sor dimêne. Pişt re tê Ayserê û li ser wê medresa li Ayserê, dimêne. Mirovekî gelekî kal bû. Ji ber vê yekê jî mirov gelekî rêz didanê. Mirov li gotinên wî baş dihensandin û hizra wî baş di serê xwe de digirtin. Mele Tofîq mirovekî zanista wî mazin bû. Mihemed ku hin bi hin, di nav axiftinan de diçû, fêhm dikir, ku mirovên li dora wî mirovên ku gelekî bi zanebûn bûn. Gava ku Mihemed li wan mirovê zane dimeyizand, didît ku li pêşiya wan hemûkan jî, nivîsen wan hebûn. Hemû nivîs jî, ew nivîsen ku wan nivîsî bûn.

Mihemed piştî ku Mele Zeynedîn vebejîna xwe hew kir, êdî wî ji xwast tiştekî bibêjê. Mele Zeynedîn di dawiya gotina xwe de Goti bû Mihemed: ’Tu jî hinekî der barê xwe û herêma xwe de bêjê da ku em jî li ser jiyana te bizani bin.’ Mihemed jî, gava ku Mele Zeynedîn vebejîna xwe hew kir, vêca wî dest bi gotinê kir: ’Ez bi xwe weke ku min di serî de gotî, ji Miksê me. Li wir min xwandina xwe kir. Lê li Medreseya Mir Husên Welî jî Hinekî mam. Pişt re weke demeke çûme nig Şêxê me li Îdirê. Seydayê min mirovekî gelekî xwedî zanist e û li Medresa Miksê dimîne. Seydayê min Bi koka xwe ji Zivingê ye. Piştî ku Mele Husên Bateyî gava ku digihê ber dilovaniya Xwedê û pê de, êdî seydayê min li cihê wî dimêne. Mele Husênê Bateyî her sal demeke diçû nig Mir Husên Welî. Wan hez ji hevdu dikirin. Cara dawiyê zivistan e û gava ku divegere ji nig wî, di rê de ji befrê xwe disipêre şikeftekê. Lê ta ku befr kêm dibe û xelk xwe digihenênin ew digihê ber dilovaniya li wir. Zanista wî mazin bû. Mirov gelek tiştan jê fêr dibûn. Zimanê wî gelekî

xweş û zelal bû. Gava ku nûçeya wî digihîjê mirov, gelekî dilê mirov diêşîne. Seydayê min nuha gelekî kal e. Ew bi xwe jî dinivisîne. Em bakinê: Mele Ehmedê Zivingî. Li ser babetan kûr e û pirtûken wî hene. Şêxê me jî gelekî hez jê dike. Em gelek caran bi hev re çûne nig şêx. Li wir min dît ku mirov gelekî li ser Melayê Cizîrî jî dipeyivîn. Li wir jî dihate naskirin. Lê min gelekî der barê wî de ji seydayê xwe seh kir.'

Mihemed bi wan gotinan re hê gelek peyivtinan li ser şêxê xwe û seydayê xwe jî dike. Ev herdu mirov gelekî bandûr li ser Mihemed kiri bûn. Gava ku Mihemed dipeyivî, ev yek ji gotinên wî dihate têgehîştin. Lê Melayê Cizîrî jî, gelekî gotinên wî li ser wî bûn. Navê Medresa Sor jî gelekî seh kiri bû, ku mirovên gelek zane li wir diman. Piştî ku Mele Zeynedîn peyivî bû, êdî Mihemed hê bêhtir li ser Melayê Cizîrî xwe gahandi bû hizreke zexm der barê wî de. Gava ku Mihemed ji herêma xwe û ji seydayê xwe û ji şêx dipeyivî, di mejiyê wî de Melayê Cizîrî dijiya. Gotinên Melayê Cizîrî yên ku weke beyt hati bûn holê, di serê wî de cih girti bûn. Gava ku Melayê Cizîrî gotinên wî yên ku weke beytan hati bûn ser zimên, êdî wî jî hinek gotinên xwe weke beytan hanî bûn ser zimên. Mihemed hinek gotinên Mele Husên Bateyî jî ji dîwana wî hanî bûn ser ziman. Ji xeynî vê yekê jî, hinek gotinên şêx û seydayê xwe jî hanî bûn ser zimên. Mihemed dengê wî jî xweş bû. Gava ku di nav axiftinan de germ dibû, êdî bi dengê xwe re jî hinekî dihanî ser zimên. Mirov jî gava ku lê dihesandin, gelekî bala wan diçû ser wî û gotinên wî yên ku dihanîne ser zimên. Gava ku Mihemed li ser Mele Husênê Bateyî jî dipeyive, gelekî bala mirov dikişêne ser xwe di wê heyamê de. Mirovên herêmê, Mele Husênê Bateyî baş û qenc nas dikirin. Mele Husênê Bateyî, di dema feqetiya xwe de û pişt re, gava ku dibe Mele jî, têt herêma Botan û li wan deran digere. Ew bi xwe jî li Cizîra Bota ma bû. Bi wê yekê re jî li gelek derên din jî li herêmê geriya bû û dîti bû. Li nig Şêxê Serdefê jî ma bû. Li herêmê pir bêhtir dimîne û têt naskirin.

Mihemed li ser herêma ku jê hati bû û li ser saydayê xwe hizra xwe ji mirovên ku li dora wî rûniştî bûn re, hanî bû ser zimên. Mirov piştî ku Mihemed hizra xwe hanî bû ser zimên, dîti bûn ku

mirovekî çawa bi zanebûn e. Êdî gelekî bala xwe didane wî. Mele Zeynedîn û Mele Tofîq piştî ku Mihemed dipeyivî û wan jî dîti bûn, ku bi axiftinê êdî pê re keti bûne guftugoyekê, ku kûr bû. Bi Mihemed re li ser gelek mijarên û kesayetiyan ku weke Mele Husêne Bateyî keti bûn guftûgoyê de. Bi çendî ku wan ji Mihemed dipirsî, Mihemed jî ji wan dipirsî. Mihemed gava ku keti bû pirjînê de, bêhtir jî, li ser Melayê Cizîrî pirsibû. Li ser demên Melayê Cizîrî yên ku berî ku here herêmên din, dipirsi. Mihemed gava ku dipirse bersiva pirsên xwe dihilde. Lê di serê Mihemed de, Medresa Sor û zanistvanên ku lê dijiyan ji wî re weke meraqeke mazin bû. Li ser vê xalê jî, ji wan dipirsi. Her weha di demeke dê guftûgoyên wan ewçend germ dibe, ku xwe ji bîr dikin. Di wê demê de jî, Mihemed carekê din hinek pirsên li ser hevdu dipirse. Vê yekê jî bala Mele Zeynedîn kişandi bû. Mele Zeynedîn gava ku bala wî dikisîne, ku Mihemed bi mereqa re ye û ji ser mereqiyên xwe re dipirse, êdî wî jî her weha li Mihemed zivirî û gotiyê: ’keke min, tu hinekî kelegerm xûya dikî. Ez ê tiştê ku karibim ji te re bêjim, ez ê bêjim. Lê tu hatî ku herî Cizîra Bota ku bixwe bibînî. Ez hinekî ji te re li ser Medresa Sor û jiyana seydayê mazin Melayê Cizîrî bênim ser zimên û bibêjim. Medresa Sor gelekî mazin e ji aliyê zanebûnê ve. Gelek mirovên zane tê re hatine û çûne. Her yekê ku hatiye û çûne jî, bi zanebûna xwe re tiştek lê hiştiye û çûye. Her weha ez dikarim ji te re bi nimûnyek re bihênime ser zimên ku bêt têgehîştin. Her yekê ku hatî û çûye di wî baxçê re buhurtiye, kexşek çandiye bi zanebûna xwe re. Ji gelek salan ve, ev yek hebûna xwe berdewam kiriye. Î roj jî Melayê Cizîrî di wê baxça zanebûnê de kexşa diçêne. Ev ji tohv e. Ev tohv jî her weha kexş bi kexş bêhtir dibe. Î roj li wir navê seydayê Cizîrî mazin e bi zanebûna wî re. Seydayê Cizîrî bi koka xwe ji Hasetê ye. Lê li Cizîra Bota mazin bû. Gava ku têt dema xwandinê, Mele Bateyî wî dib Cizîra Bota nig seydayê wî ye ku wê li nig wî bixwêne. Mele Bateyî ji malbateke bi hêz û mazin e. Bavê wî Hemed Beg jî mirovekî zane bû. Seydayê Cizîrî, pêşîkê li nig bavê xwe bingeha xwe digire. Pişt re diçe Cizîra Bota. Gava ku diçe Cizîra Bota jî, li Medresa Sor dimîne. Dema ku dimîne zanebûna xwe kûr dike. Bavê wî û berî bavê wî kalikê wî jî li Cizîra

Bota xwendibûn li qesra Mîrê Mazin ma bûn. Ew bi xwe jî mirovê ku li gotinên wan dihate hesandin. Seydayê Cizîrî ji di dema feqetiya xwe de li nig Mirê Mazin dimîne. Mirê Mazin piştgiriya wî dike û gelek caran jî, wî dihilde nig xwe ji ber ku bi fehm û zanebûn e. Ez dikarim ji te re bêjim, ku Medresa Sor li pişta Mîrê Mazin Mîrê Bota bû. Mîrê Bota jî li pişta seydayê Cizîrî bû. Bi vê yekê re seydayê Cizîrî têt naskirin. Lê tiştê ku ew derdixe pêş jî, zanebûna wî ye ku şanî mirovan dide.'

Mihemed li van gotinên ji devê Mele Zeynedîn ve derdiketin pir bi bal û serinc li wan dihesand. Gelek tişt ji wan gotinên ji devê Mele Zeynedîn derdiketin, fêhm kiri bû. Piştî ku Mele Zeynedîn gotinên xwe hew kiri bûn, êdî di serê Mihemed de 'Medresa Sor', Melayê Cizîrî', 'zanebûn', her mirovên ku hati bûn û buhurtibûn, kexşek ji zanebûna xwe tê de çandi bûn û buhurtibûn' û hwd.. Gelek ji van gotinên ku hati bûn ser zimên, di serê wî de cî bi cî bû bûn, diçûn û dihatin di wê heyamê de. Mihemed her weha piştî ku Mele Zeynedîn vebejîna xwe bi dawî kiri bû, êdî ew jî di cihê xwe de bêdeng ma bû di wê kêlîkê de û dihizirî di serê xwe de. Mihemed her weha di serê xwe de hê bêhtir bi hizir bû. Di wê heyamê de ji tiştên ku li serê wî kom bû bûn, zingînî di serê wî de vedidan. Bi wê zingîniye re di serê xwe de diçû û dihat. Lê divêt ku mirov bêjê ku Mihemed gelek tişt di serê xwe de girti bûn ji gotinên ku hati bûn ser zimên. Têgehîştin û şarezabûna wî, ew dikire xwediyê hizrên mazin di rewşên weha de. Her weha di wê kêlîkê de hizra ku di serê Mihemed de çê bûyî ji xwasteka dîtina Melayê Cizîrî bû. Melayê Cizîrî wî çendî mazin û baş û qenc hati bû ser zimên, meraqa wî û xwesteka dîtinê hê mazintir kiri bû. Lê gava ku ji hizra Melayê Cizîrî hati bû serê wî, di wê heyamê de Mihemed pir bi bal û serinc guhdar bû bû li yên ku dipeyivîn. Gava ku hizra Melayê Cizîrî hati bû ser zimên germbûna laşê Mihemed jî weke ku hê bêhtir bibe lê hati bû. Mihemed di wê heyamê de gava ku dihesand, di serê xwe de weke ku tiştê ku berê jiya bû û dîti bû li ber çavan wî diçû û dihat. Her weha bîranîn ew di hundurê xwe de biri bû û hanî bû. Hingê bi guftûgoyan re weke ku di serê xwe de xwe gihandi be Melayê Cizîrî lê hati bû. Hizra wî

bêhtir fêr bû bû di guftûgoyan de. Lê di serê xwe de gava ku dihizirî, ji xwe re got ku ’divêt ku ez xwe bigihênime Melayê Cizîrî’. Hizrek di serê wî de çê dibû û di mejiyê wî de weke xwurandinek mazin bi wî hizrê re bigre, lê dihat. Her welê, xwastina wî yê, ku dixwast ku Melayê Cizîrî bibîne xwe mazin bi wî re dida derve.

Mihemed her weha gelek guftûgoyên ku di serê wî de hizir çêkiri bûn, kiri bû. Bi wan guftûgoyan re naskirina pê re baş û mazin çê bû bû. Di guftûgoyan de bêhtir jî di serê xwe de xwe gihandi bû hizrên wan mirovan, ku tenê navên wan seh kiri bû. Her weha weke Melayê Cizîrî. Piştî guftûgoyan, Mihemed bi keşe Tuma re wê şevê li mala Rame Beg biman. Lê Mihemed di wan guftûgoyên, ku kiri bû de, xwastibû riya xwe hinekî din jî bizivirîne. Xwastina çûna Hasatê pê re çê bû bû. Gava ku li hevdu rûniştî bûn, di rûniştinê de mirovê ku weke wî biyanî bûn hineken din jî hebûn. Her weha weke Mele Şefîq. Mele Şefîq mirovekî ku ji aliyê herêma Hezexe wan dera bû. Ew bi xwe ji herêma ku digotinê Sincaqê bû. Sincaqê hinekî dûr bû ji wir. Mele Şefîq hati bû ku here Cizîra Bota. Hê yekî ciwan jî bû. Lê bûbû Mele. Mele Şefîq perwerdeya xwe li Cizîra Bota dihilde. Pişt re ku dibe Mele, êdî divêt vegere malê. Piştî meletiyê jî xwandin dihate berdewamkirin. Mele Şefîq berî ku çûba Cizîra Bota wê riya xwe bi aliyê Hasatê ve jî xistiba. Di dema axiftinan de bêhtir ne axifî bû. Têne hema wilo di cihê xwe de ma bû û li guftûgoyan dihesand. Yekî jîr dihate xuyakirin. Kêm tevlî guftûgoyan dibû. Gava ku gotinên xwe digotin jî, mirov lê dihesandin. Ew bi xwe jî nêzîkê Mele Tofîq rûniştî bû. Lê gelek caran jî Mihemed bi çavên xwe re ew biri bû. Lê ewne ji bo axiftina li hevberê hevdu bûn. Gava ku guftûgo di navbera Mihemed û Mele Zeynedîn de hinekî kêm dibin, êdî Mihemed jî hinekî bi wî re mijûl dibe û dipeyive. Bi axiftinê re ji hevdu nas dikin. Mele Şefîq ji Mihemed re dibêjê ku wê here nig Melayê Cizîrî. Mihemed gava ku vê yekê dibihîze, êdî ew jî dibejiyê: ’em bi hev re ta wê derê riya xwe bikine yek û herin te got çi?’ Mele Şefîq vê yekê erê dike. Mihemed bêhtir wan herêman nas ne dikir. Ji ber vê yekê jî bêhtir tiştek ne Goti bû. Gava ku dem ber bi rezanê ve têt jî her weha biryara xwe didin û diçin ku razên. Keşe Tuma jî wê bi

Mihemed re riya xwe berdewam kiri ba. Her weha gava ku Mihemed û Mele Şefîq gotina xwe kirin, êdî diçin û dirazên. Lê gava ku Mihemed diçe ser cihê xwe ku rezê, xew bi çavan wî na keve ji ber ku di guftûgoyan de tiştên ku bihîsti bû, li bîra wî bûn û ew gelekî mijûl dikirin. Mihemed bi gelek saydayan re rûnişti bû û guftûgo kiri bû. Di nav wan de weke seydayekî hati bû dîtin û naskirin.

Êdî Mihemed weke ku di jiyana xwe de di demeke nû de be, lê dihat. Mirov ku ew di nav wan de rûnişti bû, ew weke seydayekî herê kiri bûn. Zanebûna wî di wê heyamê de xwe dabû derve. Di nav wan mirovan de dîti bûn, ku zanebûna wî ji ne kêmî wan mirovên ku gelekî zane bûn. Vê yekê weke hizra wî di serê wî de dida nîşandan. Mihemed jî gava ku li ser vê yekê dihizirî, gelekî di hundurê xwe de dilperîn dibû. Her weha jî gava ku dihizirî, xewa wî ji ser çavan wî direvî. Mejiyê wî ew bi van xalan re di hundurê xwe de dibir û dihanî. Ew jî bi hizrên ku di serê wî de çê dibûn, ji xwe diçû. Her weha Mihemed di nav cihê xwe de jî dema xwe ya razanê tev bi hizirkirinan re dibuhurîne. Di serê wî de piştî ku wan guftûgoyên ku bi wan mirovên zane re kiri bû û pê de gelek hizrên mazin çê dibûn. Di guftûgoyan de weke meleyekî guftûgo kiri bû. Li hevberê çi pirs û gotinan xitimandin pê re çê ne dibû. Bersiva her pirsa ku jê hati bû pirsîn dabû. Bi her gotina ku hati bû ser zimên re hizra xwe hanî bû ser zimên. Dîtin û nêrînên xwe bi mirovên li dora xwe re hevpar kiri bû. Mirov jî her weha gava ku wî hizra xwe hanî bû ser zimên, li wî weke seydayekî bihîsti bûn. Ew bi xwe jî êdî seydayek bû. Ew bi xwe mirovekî ku zane bû û her weha bi mirovên zane re rûnişti bû. Ew êdî di nav mirovan de weke zanistvanekî dihate naskirin. Ji aliyê din ve jî mirovên ku di wê heyamê de lê hesandi bûn, êdî ew weke ku mirovekî zane be, nas kiri bûn û herê kiri bûn. Ew ji aliyê wan mirov ve bi vî awayî hati bû herêkirin û naskirin. Ev naskirin jî her weha dibû bingeha naskirina wî ya herêmê ya ku wê her dem were bi bîrhanîn.

Gava ku çûbû ser cihê xwe weke heyameke dirêj şiyar û di hiziran de ma bû. Piştî ku hinekî di nav cihê xwe de şiyar dimêne, êdî dike ku rezê ta ber beyaniya serê sibehê.  Hinekî dirazê ji ber

ku pir wastahî bû. Rê hinekî ew westandi bû. Gava ku şiyar ma bû jî her weha aliyekî wî ne dihêşt ku bikeve xewê de û rezê, her çend aliyekî wî yê din jî dikir ku bikeve xewê û rezê. Lê ta ku hinekî di nav cihên xwe de dihizire, êdî pişt re dike ku rezahê û dirazê. Gava ku dikeve nav hizran, bi hizirandina xwe re, hêdî hêdî xew xwe diberde ser çavan wî û ew ji xwe diçe. Di serî de hinekî li ber xwe jî dabû. Lê westandina ku keti bû di laşê wî de, ew bêqerem kiri bû. Gava ku bêqerem dimêne, êdî dikeve xew de. Her weha ta berê sibehê direzê. Bi berê sibehê ve, serê beyanî ji xwe dirabe û xwe amade dike. Gava ku dirabe ser xwe û dimeyizêne ku hê çi kesek ji xewê ne rabûye ser xwe di wê kêlîkê de, êdî ew ji oda xwe na derkeve, ta ku wanê din dirabin. Tênê hinek xatênên ku rabû bûn ser xwe û bi kar û barên xwe ve diçûn. Mihemed jî her weha dimeyizêne, ku hê bêhtir çi kesek ne rabûye ji xewê êdî ew jî ta hinek mirovên din rabin li odeya xwe dimîne. Gava ku li odeya xwe dimênê jî her weha amadekirî dimênê. Di odeya xwe de li ser cihê xwe dirûne û li hinek nivîs û pirtukên yên ku her dem bi xwe re digerandin, dimeyizêne. Ta ku mirov din ji dirabin ser xwe, ew jî bi vî awayî di odeya xwe de dimênê. Lê ew der mala beg bû û çavên mirovan li ser bû ji ber vê yekê jî hezûkenê ji xewê rabûn çê dibû.

Weke heyamekê dimîne pişt re êdî mirovên din dirabine ser xwe de. Gava ku Mihemed wan mirovên ku rabûne ser xwe dibine êdî ew ji dike ku rabe û here nig wan. Mihemed gava ku dike ku here derve ji odeya xwe, di wê heyamê de di devê derî de rastî Mele Zeynedîn têt. Gava ku Mele Zeynedîn wî dibine û ew jî wî dibine, êdî ber bi hevdu ve diçin. Mihemed û Mele Zeynedîn digîjine hevdu û ji hev re dibêjin beyanî baş. Gava ku Mele Zeynedîn têt nig wî, êdî bi hev re didine rex hevdu û diçine derv, ku hinekî bêhna xwe bistênin. Gava ku diçine derve, di wê heyamê de rastî hinek mirovên din, yên ku wê şevê li mala beg ma bûn dihên. Ji hev re beyanî baş dibêjin û bi hev re di bin hênikayiya sibehê de ji xwe re digerin. Gava dema taştê têt, êdî ew jî bi hev re didine rex hevdu û diçine ber bi odaya ku lê taştê bikin. Gava ku têne ber odeyê, hê ne ketine odê de li ber devê odê rastî Rame Beg jî dihên. Gava ku rastî hevdu dihên, êdî ji hev re dibêjin beyanî baş û bi hev

re didine rex hevdu û dikevine odayê ku wê tê de taştê bikin bi hev re. Gava ku têne odeyê dimeyizênin ku wa taştê hatî amadekirin jî ji wan re ku bixwun. Mirovên ku di nav mala Rame Beg de sûxra malê dikirin, gelek bûn. Ew mirovên ku sûxrevanê malê bûn, ji zû dirabûn û karê ku wê kiri bana dikirin. Mirovên ku di mala beg de sûxra mala beg dikirin,  gelek ji wan piştî ku karê xwe dikirin, diçûne malên xwe. Lê mirovên ku sûxrvan, dikirin li wan tenê weke sûxreker ne dihate meyizandin. Her weha weke ku ji mala beg bin, dihatine dîtin. Wan mirovan gava ku begê wan çû ba şerekê yan ji her weha derekî ew jî pê re diçûn. Mirovên bi begê xwe ve girêdayî bûn. Bi vî awayî gelek mirovên ku ji bo begê xwe ruhê xwe jî daban, hebûn. Hemû jî li nig wî diman. Gava ku li malê beg dihate meyizandin, weke ku malekî ku gelekî mazin be dihate xuyakirin û dîtin. Mirov ku li nig beg maba, rêzê wan hebû. Bi vê yekê re gava ku li wan mirovan jî dihate meyizandin. Weke ku li mazinatiya beg were meyizandin dihate xuyakirin û dîtin. Beg bi wan mazin bû. Ew jî bi beg re mazin bûn. Bi vî awayî di nav civakê de hevdu temam dikirin. Mirovên ku li mala beg maba jî ji aliyê wan mirovên ve sûxrevaniya wan dihate kirin. Bi vê yekê re mazinatiya mala beg dihate nîşandan ji wan mirovên ku hati bûne mêhvandariyê. Di vir de her weha hinek gotinên ku ji aliyê mirovan ve hati bûn kirin hebûn ji bo vê rewşê. Bi vê yekê re ji mala beg re dihate gotin ku mala 'malmazin.' Malmazin ne tenê bi wateyekê dihate ser zimên. Her weha gelek wateyên wê hebûn û bi wan wateyên re dihate ser zimên. Wate pêşîkê ew bû ku ji mala beg re dihate gotin, ku ew mal mala mazinan e. Wateya duyemîn jî mala ku gelek mirov têde kar dikirin bû û rêz û karê wê mazin bû. Wateya sêyemîn jî ji aliyê alîkariyê ve û ji aliyê ve dihate şirovekirin. Wateya çaremîn jî her weha wateya ku ew mal mala serekeyekî bû û bi vê yekê re jî çi carekê ji wê malê mêhvan û hatin û çûyin qut ne dibûn. Mala beg her weha malmazin bû.

Beg û mirovên ku pê re ne û Mihemed jî bi wan re gava ku taştiya xwe dikin, pişt re derbasê odeya rûniştine dibin. Li wir jî weke heyamekê bi hev re dirûnin. Hêdî hêdî yên ku wê bi rê ve çûban, karê xwe dikirin. Mele Şefîq jî her weha karê xwe dikir.

Mihemed jî xwe hê ji sibehê ve amade kiri bû. Mele Şefîq û Mihemed xwe karkirin ku rabine ser xwe ku wê herin. Keşe Tuma jî dest bi karkirina xwe kir ku bi wan re rabe. Ew jî wê bi wan re çûba. Rame Beg bi rêze mala xwe re bi wan dipeyivî û gote wan: ’Min diviya bû ku hûn hinekî din jî li malê bimînin.’ Yên ku wê çûban supasiya xwe êdî şanî wî dan û gotinê: ’Em ji xweymaliya Te û ji Te xweşnûd ji vir diveveqetin. Divêt ku em bi rekevin da ku şev di rê de ne mînin’. Piştî van gotinên mêhvanan, êdî Rame Beg ji çend sûxrekaran re dibêje ku hinek rêveng, xurakê rê amede bikin û bixine tûrikên wan de da ku di rê de ku gava birçi bûn bixwarana. Dema bi rêketinê têt û Mele Şefîq, Mihemed û keşe Tuma didine rex hevdu û xatirê ji malê dixwazin û ku herin. Gava ku ew dirabine ser xwe ku herin êdî Rame Beg ji bi wan re dirabe ser xwe û bi wan re têt devê derî ku wan bi rê ke. Gava ku ew dikevine rê de, Rame Beg jî careke din divegere nav civatê.

Mihemed, Mele Şefîq û keşe Tuma gava ku ji mala beg dikevine ser rê de hinekî lingên xwe jî sivîk dikin da ku hinekî zû xwe bigehînine Hesatê. Hesatê weke heyamekê ji wir dûr bû û wê daban çola û çûban wir. Di rê de gava ku diçûn, hem ji xwe re dipeyivîn û hem jî bi lezekê re diçûn. Mele Şefîq yekî xort bû. Ji ber vê yekê jî mirovekî ku lingê wî sivik bû. Mihemed jî mirov xort bû. Keşe Tuma jî mirovekî li ser xwe bû, keti bûne rex hevdu de di rê de.

Gava ji navenda Ayserê derdikevin û dikevîne nav erdan de, êdî rastî mirovên ku dixebitîn  dihatin. Hinek mirovên ku erdên xwe çandi bûn, hinekî jî keviya erdên xwe ji bayar hêşti bûn ji ber ku hinek çandinên din bikin. Gava ku rastî mirovan dihatin, didîtin ku wan mirovan di wan erdên xwe yên beyar de çot dikirin. Piranî gamêşên xwe bi gîsnên xwe ve girê dabûn û çot dikirin. Mihemed û hevalên xwe gava ku li wan mirovên cotkar û li cihê gîsnên wan dimeyizandin, ne dixwastin, ku çavên xwe ji wan mirovan û erdê qut bikin. Çavên wan diçû ser cihê ku gêsin lê keti bû. Cihê ku gêsin lê keti bû jî sorekî tarî dida ber çavan. Ax sor bû. Gava ku gêsin jî lê diket, axake sor dirakir. Li ber keviyên erdên mirov, ku dirawestiyan. Piranî jin bûn dihatine xuyakirin. Hinek ji wan ji bi

zarokên xwe re li keviya erdên bûn. Gava ku Mihemed, Mele Şefîq û keşe Tuma digihîjine dahma wan silav didane wan û paşê dibuhurtin. Lê her sêkan jî gava ku li ruyê wan dihate meyizandin, dihate dîtin ku bi dilxweş bûn. Ji xwe re dipeyivîn û di riya xwe de diçûn. Car bi car di rê de hingî axiftinan dikirin ni zanibûn ka riya wan çawa dibuhurt. Mihemed, hem bi Mele Şefîq re û keşe Tuma re didipeyivî û hem jî di hundurê xwe de li ser dawiya riya xwe ku wê rastî Melayê Cizîrî hati ba, dihizirî. Mihemed ji bo vê yekê pir dilşad bû. Pê re hinekî dilperîn hebû. Wî ji seydayê xwe û gava ku çû bû nig mala şêx gelekî li ser Melayê Cizîrî vebêjîn bihîsti bûn. Wê kêlîkê jî di rê de bû û diçû nig wî mirove ku der barê wî de ev çend tişt bihîsti bû. Car bi car ji gava ku bi Mele Şefîq re dipeyivî gotin dihani ser Mele Cizîrî ku baştir bizane ka mirovekî çawa ye. Mele Şefîq jî çi zani bû û bihîsti bû û tiştê ku di wê heyamê de di hişê wî de bû, ji Mihemed re peyv bi peyv digot. Lê çi bersiva ku Mihemed hildaba jî di serê wî de ne dibû bersivek ku têra wî dikir. Her bersiva ku wî dihilda jî weke ku di serê wî de dibû sedama pirsekê. Bersiv û pirs û pirs û bersiv di serê wî de hevdu dibir û dihanî. Lê di wê kêlîkê de, di serê wî de yek ji yekê re têr ne dikir.

Demeke dirêj diçin êdî digihîjine nêzîkê herêma ku Hesatê lê bû. Çend ku ber ve diçûn dilperîna dilê Mihemed hê bêhtir dibû. Çend ku dilperiya wî bêhtir dibû jî, hê bêhtir laşê wî weke ku germ dibû lê dihat. Di rastiyê de ji Mihemed gelekî meraqan dikir, ku Mele mirovekî çawa bû. Mihemed gelek gotin der barê wî de bihîsti bûn. Nuha di rê de bû û wê çûba nig û wê ew bi çavên xwe dîti ba. Gava ku wî ev yekê di serê xwe de dibir û dihanî, dilperiyek bi gelek pirsan re dikete di dil û serê wî de. Mihemed di serê xwe de gelekî dihizirî. Hizirandina wî bi bêhtirî jî li ser çûna nig Melayê Cizîrî bû. Gava ku keti bûne rê de di serî de gelekî guftûgo dikirin û ji xwe re dipeyivî. Lê ku hinekî din rê çûbûn, êdî guftûgoyên di navbera wan de kêm bû bûn, ji ber ku hinekî westandina xwe bi wan re dabû der. Lê ku giha bûn nêzîkê herêma Hesatê, êdî weke ku carekê dî werine xwe li wan hati bû.

Mele Şefîq, Mihemed û Keşe Tuma her weha weke heyamekê diherin, digehîjin herêmê û êdî navenda Hesatê didîtin. Gava ku

navendê dibinin, êdî Mele Şefîq li Mihemed dizîvire û dibêje: 'Weha Hesat e, em gihanê.' Gava Mihemed vê yekê dibihîze, bi gotina Mele Şefîq re bi aliyê Hesate ve dimeyizîne. Dibîne ku cihekî ku ne bêhtir biçûk dihate xuyakirin. Lê ne bêhtir jî mazin bû. Her weha herêmeke ku bi aliyê wê yê çepê ve çiyayek dihate xuyakirin. Çiyayê ku dihate xuyakirin jî, ne bêhtir bilind bû. Li ber çiyê jî gelek darên ku nêzîki hevdu bûn, dihatine xuyakirin. Bi aliyên din ve jî gava ku dihate meyizandin, dihate dîtin ku hinek kaşên din yên ku li pey hev bûn hebûn. Her weha bi dîtina kaşan re dirêjbûnek çêdi bû. Mele Şefîq gava ku navend têt dîtin, êdî li Mihemed dimeyizêne. Mihemed gava ku ew dimeyzêne, dibêjiyê de ku li çi dimeyzênî. Mele Şefîq gava ku Mihemed jê dipirse, ew jî bi aliyê çiyê ve dimeyizêne û bersiva Mihemed dide: 'Tu wan darên ha dibînî? Em hinekî ber bi wan daran ve herin. Em ji wî aliyê ve bikevine gund. Li wir newalekî gelekî xweş têt, em ê wê jî bibînin. Di wê newalê de kahniyeke ku ava wê gelekî xweş e heye. Dibêjine; Kahniyaberê. Kahniyaberê ava wê kûr ji binê erdê ve derdikeve û pir xweş e. Li dora wê jî gava ku mirov dirûnê, hênikayiyekê ku gelekî xweş e bi mirov digire. Em di wir ve herin û wê derê jî bibînin, ma hûn çi dibêjin?' Her weha gava ku Mele Şefîq vê yekê ji Mihemed û Keşe Tuma re dibêjê, êdî ew jî herê kirin û bi hev re berê xwe dan bi wir ve û çûn ber bi newalê ve. Piştî ku hinekî diherin, êdî digihine newalê û diçine serê Kahniyaberê. Li wir weke heyamekê dimînin û bêhne xwe distênin, êdî pê de careke din xwe didine hevdu û dikevine riya xwe de ku herine navenda Hesate. Piştî ku ji ser Kahniyaberê weke heyameke diherin, êdî pê de digehîjine navenda Hesate. Gava ku digehîjine navendê êdî rast û rast berê didine cihê ku Melayê Cizîrî wê  wê be. Mihemed hinekî bi dilperîn bû di hundurê xwe de. Gava ku di nav malan de diçûn jî,wî gelekî wî li dora xwe dimeyizand. Çavên xwe li dora xwe digerand. Mele Şefîq berî vê carê ku hati bû nig Melayê Cizîrî, careke din ji hati bû ji ber vê yekê ji zanibû ku wê Melayê Cizîrî li ku derê dimîne. Melayê Cizîrî piranî li Medresa Sor ku li nav Cizîra Bota bû dima. Lê hinek demên xwe her weha li Hesatê jî dibuhurand. Mele Şefîq vê yekê dizani bû. Mele Şefîq

dizani bû ku di wê heyamê de Melayê Cizîrî wê li wir be. Li Hesatê di rex mizgeftê cihekî ku weke cihê xwandinê bi kar dihate hanîn, hebû. Ew der jî weke medresa wê derê bi kar dihate hanîn. Melayê Cizîrî piraniya caran jî li wir dima. Her sibeh zarokên gund li hevdu dihatin û li wir perwerde didîtin. Meleyê Hesate jî hebû. Ew jî navê wî Mele Yûsif bû. Ew bi perwerdeya zarokan re mijûl dibû. Her sibeh ku zarok dihatine ji bo xwandinê, bi wan ve ew mijûl dibû. Car bi car Melayê Cizîrî ji mijûl dibû. Lê Melayê Cizîrî bi pêdeçûnÊ ve mijûl dibû. Mele Şefîq gava ku hati bû navenda Hasatê, êdî li Mihemed zivirî bû û gotibûyê: ’Divêt em herine mizgeftê.’ Mihemed jî Goti bûyê ’belê.’ Êdî wan ji berê xwe dabûn ber bi mizgeftê ve.

Gava ku di rê de diçin, rastî hinek kesan dihên ku wê ew jî biçûna mizgeftê. Gava dihên  dahma hevdu, slavê didine hev û li dahma dirawestin. Yek ji wan mirovan dest bi pirsînê dike ji Mihemed û hevalên wî. Gava ku pirsên xwe dipirse, Mele Şefîq bersiva wan dide. Piştî ku pirs hati bû pirsin û Mele Şefîq jî bersiv dabû, êdî pê de ne Mihemed û ne jî Keşe Tuma deng ne kiri bû. Ew mafê axiftinê ji Mele Şefîq re hişti bûn. Yên ku pirs pirsî bûn ji wan, pirsî bûn ku ew ji ku derê hatine û wê bi ku derê ve herin?. Mele Şefîq gava ku dibêjê wan ku ew hatinea ku Melayê Cizîrî bibînin êdî ew didine rex hevdu û diçin ku herine nig Melayê Cizîrî. Ne Mihemed, ne Mele Şefîq û ne jî Keşe Tuma xelkê wê derê bûn. Ji ber vê yekê jî baş dihate têgehîştin ji wan û nêzîkatiyên wan. Mirovên wê derê hema bêjê hemû hevdu nas dikirin. Lê ew hersê ne dihatine naskirin. Gava rastî wan mirovên ji xelkê wê derê hati bûn, ji zûka li hevdu germ bû bûn. Gava ku didine rex hevdu, êdî rast û rast diçine ber bi mizgeftê ve, ku herine nig Melayê Cizîrî. Dem ji nîvro buhurti bû. Lê bi ber mizgeftê ve diçûn. Bi vê yekê re Mele Şefîq dipeyivî û ji wan dipirsî: ’Ma gelo seyda nuha hê li mizgeftê ye?’ Yekî ku ji wan mirovên rêberê wan, hinekî jî navsere dihate xuya dikir, bersiva Mele Şefîq da û jê re got: ’Herê, Mele gava ku te mizgeftê ku mêhvanên wî hebin, wan jî bi xwe re dihêne mizgeftê. Bi hev re dihên û Mele hinekî bi mêvanan re dipeyive û pişt re civîn belav dibe. Nuha hê civîn belav ne bûye.

Mele hê li wir e. Em ê herin ku hê axiftina wî hew ne bûye. Em ê hinekî lê guhdar bin. Piştî ku Mele axiftina xwe hew kir êdî wê civîn jî belav be.' Piştî van gotinan êdî hinekî bêdengi çê bû. Lê bêdengî bêhtir berdewam ne kir. Pişt re yekî ji xelkê wir digot: 'Mele bêhtir li vir na mîne. Bêhtir li Cizîra Bota dimînê û li Medresa Sor e. Ne zû ve hatiye vir. Berî nuha bi çendakê hat vir. Lê wê dîsan vegere here Cizîra Bota. Li wir bi cih e û şagirdên ku li wir jê fêrê digirin hene. Bi aliyê Memolanê wan deran ve çû bû. Gava ku divêt vegere jî, riya xwe bi vir dixe. Gava ku hat vir jî gelek mirovên ku wî bibînin jî hatine vir. Ji ber vê yekê ji li vir ma. Mala meleye min ji ji vir bêhtir nedûre. Gava ku Mele têt vir, êdî ev der jî dibe bi nav û deng. Mele, li cihê ku xelk bêhtir hebe li wir dimîne. Ji ber ku mirovên ku werin wî bibînin, da ku ew jî derfet çêke ku wan bibîne. Nuha li gûnd gelek mirovên ku ji derên dûr hatine hene. Hemû jî hatine ku Melê bibînin. Jin, mêr û zarokbi hev re hatine ku wî bibînin.'

Her weha ji xwe re dipeyivîn di rê de ta ku digihîjine mizgeftê. Gava ku digehîjine mizgeftê êdî dimeyizênin, ku wa ye li wir gelek mirovên ku li hev kom bûne hebûn û Mele di nav wan de dipeyive. Lê gava ku dibînen pêşîkê komê mirovan dibînen. Melayê Cizîrî bêhtir ji aliyê Mihemed wan ve na yêt dîtin. Ji ber ku di navbera wan de gelek mirov hene. Mirov gava ku nivêj kiri bûn, êdî bi hev re derketi bûn derve û ji xwe re rûnişti bûn û li Melê dihesandin. Gava ku ew jî bi hev re digihîjine nig komê, pêşîkê hinekî weke ku se çer gavan ji komê dûr dimînin. Ji xwe bixwastina jî, ni kari bûn ku bêhtir ber bi pêş ve herin, ji ber ku gelek mirov kom bû bûn. Gava ku Melayê Cizîrî di nav gotina xwe de hinekî dirawestiya, êdî ew jî bi yekcarî diçine nav wan mirovan û slavê didine wan û di nav wan de dirûnin. Her weha gava ku dirûnin weke heyamekê bêdeng dirûnin û li Melayê Cizîrî dihesin.

Melayê Cizîrî gava ku li aliyê wî dihate meyizandi, dihate dîtin ku wa ye hinek pirtûkên li nig wî hebûn. Divana wî ya bi nav û deng jî li pêşiya wî bû. Li hinekî bi aliyê wî ye rastê ve, li dahma kaboka wî bû. Hinek nivîsen wî yên din jî li nig wî bûn. Car bi car jî gava ku dipeyivî û di nav axiftina xwe de dipa, jî li wan nivîsên xwe

dimeyizand. Melayê Cizîrî gava ku lê dihate meyizandin, dihate dîtin ku girêdana wî giredana cizîriyan bû. Hinekî heniya wî vekirî bû. Birûhên wî ne bêhtir stûr bûn û ne jî bêhtir zirav.. Lê hinekî ji hevbelakirî dihatine xuyakirin. Rûdana wî gêş bû, lê hinekî jî jidil dihate xuyakirin. Mirovekî ku ne bêhtir hûr bû. Hinekî gir bû û dirêj jî bû. Gava ku dipeyivî, dengê wî h3ıkarî û bandûr li mirov dikir. Dengekî wilo li ser wî bû, ku gava li wî dengî dihate hesandin, rahranok di laşê mirov de dihanîn. Mihemed jî gava ku rûnişti bû, her weha hema wilo di cihê xwe de rûnişti bû û li wî dimeyizand û dihesand. Mihemed gava ku rûnişti bû Mele Şefîq jî li nig wî rûniştî bû. Keşe Tuma jî hinekî jê wir de rûnişti bû. Mirov fahm dikir ku Keşe Tuma mirovekî ku ji aliyê olîtiyê ve yekî ku cuda bû. Her weha her kesek di cihê xwe de rûnişti bû û li Melayê Cizîrî dihesandin. Piştî heyamekê Mihemed û Melayê Cizîrî çav bi çav dihên. Gava ku çav bi çav dihên, êdî Melayê Cizîrî dibîne ku wa ye çavên Mihemed rasterast li ser wî ye. Bala wî jî bi vê yekê re diçe ser Mihemed. Gava ku bala Melayê Cizîrî diçe ser Mihemed, êdî car bi car çavên xwe dihanîne ser wî û lê dimeyizand. Mihemed li cihê xwe req li Melayê Cizîrî dimeyizand û dihesand. Ta ku Melayê Cizîrî axiftina xwe hew kir ev yek bi Mihemed re her berdewam kir. Mihemed gelek dilper dihate xuyakirin. Gava ku Mihemed li Melayê Cizîrî dimeyizand û lê dihesand, gelekî dilxweşiyekî mazin xwe di rûdana wî de dida derve. Ta Melayê Cizîrî dipeyivî, ew di cihê xwe de wisan bêliv ma bû. Piştî ku Melayê Cizîrî axiftina xwe hew kiri bû êdî pê de, bala xwe dabû ser Mihemed. Mihemed mirovekî ku bi nêzîkatiyên xwe re xwe diyar dikir.

Melayê Cizîrî yekî pîr bû. Lê Mihemed di wê demê de hê ji nûka, ji dema ciwaniya xwe derdiketi bû. Mihemed bi nêzîkatiyên xwe re weke mirovekî, ku gelekî têgehîştî diyar dibû. Vê yekê jî bala Melayê Cizîrî kişandi bû. Gava ku Melayê Cizîrî ew dîti bû, hê di nivê axiftina xwe de bû û bala wî çû bû ser wî di wê heyamê de. Melayê Cizîrî gava ku di nav axiftina wî de bala wî çûbû ser Mihemedî, êdî bi hinek awiran ve çavên xwe dibire ser wî û li wî dimeyizand. Lê gava ku axiftina xwe hew kiri bû êdî pê de, carekê din slav dabû Mihemed û pê re dest bi axiftinê kiri bû. Melayê

Cizîrî gava ku bala xwe dide ser Mihemed, êdî bala mirovên ku li dora wî bûn jî diçe ser Mihemed. Gava ku Melayê Cizîrî slavê careke din didiyê, bi slavê xwe re dibêjiyê ’hinekî bi pêş ve were û bi xêr were!’ Mihemed jî gava ku Melayê Cizîrî her weha dibejiyê, êdî ew jî hinekî xwe bi pêş ve dide. Piştî ku Mihemed hinekî bi pêş ve diçe, êdî Melayê Cizîrî hinek pirsan jê dike da ku wî nas bike. Mihemed gava ku Melayê Cizîrî pirsan jê dike, ew jî der barê xwe de jê re dipeyive. Piştî ku Mihemed dipeyive, mirovên dora wî jî bi gotinên wî re ew nas kiri bûn. Mihemed di wê heyamê de bala Melayê Cizîrî û yên li dora mazin kişandi bû ser xwe û gotinên xwe. Mihemed piştî ku hinek behsa xwe dike û hinek bi Melayê Cizîrî re jî got û bêjê dike, pişt re hinekî naveng bêdeng dibe. Gava ku Mihemed dipeyivî, axiftina wî li ser mirovê ku li wir rûniştî bûn û li wî hesandi bûn bandûrek hêşti bû. Êdî bala mirovên li dora wî bi vê yekê re çûbû ser wî. Di wê heyamê de bala Melayê Cizîrî jî pirtir çûbû ser wî. Piştî ku Melayê Cizîrî li wî her weha hesandi bû, êdî pê de ne hêşti bû ku ew ji nig wî qut bibe. Mihemed xwediyê dengêkî zelal bû. Ji ber vê yekê jî di serê mirovên, ku li wî hesandi bûn, bandûreke mazin hêşti bû.

Her weha piştî hatina Mihemed û hevalên wî yê li nav civatê, êdî civat dike ku ji hev bela bibe. Hêdî hêdî mirov hewl didan, ku rabin û herin. Lê li ciyê xwe diman, ta ku Melayê Cizîrî rabûba ser xwe. Bi Melayê Cizîrî re wê rabûbana ser xwe û çûbûbana. Melayê Cizîrî jî dikir ku rabe di wê heyamê de. Heyamek paşê êdî Melayê Cizîrî welê dibêjê ji yên ku li dora wî ne: ’Em rabine ser xwe û herine malên xwe, hinekî li malê bi mêhvanên xwe re jî em rûnên.’ Piştî ve gotinê, Melayê Cizîrî ji Mihemed û Mele Şefîq û Keşe Tuma re dibêjê: ’Fermon! Dixwazim ku hûn bi min re werine malê. Em nuha bi hev re rabin û herine malê.’ Mihemed bi guhên xwe bawer ne dibû ji dilxweşiya xwe.

Pişt re bi hev re dirabin û didine rex hevdu û diçin ku herine mala Melayê Cizîrî. Gava ku dirabin û dikevine rê, Mihemed û Melayê Cizîrî didine rex hevdu. Gava ku ji hewşa mizgeftê derdikevîn û dikevîne rê, di re de Mihemed çavên xwe li dora xwe digerîne û li mirovên li dora xwe dimeyizêne. Li malan jî

dimeyizêne. Hesat herêmeke ku gelekî xweş dihate xuyakirin. Mirovên ku li dûrên wan jî bûn, zane bûn. Gava ku diçin di rê de rastî zarokên ku bi hev re dileyistin dihên. Zarok ji xwe re bi kaşokan re dileyistin. Dengên wan gelekî bilind dihate mirov gava ku dileyistin. Gelek ji wan zarokên ji kaşok di destên wan de hebûn. Zarok ji xwe re kelik çê dikirin û bi kaşokan re nîşan lê digirtin. Mihemed gava ku digihê dehma wan zarokan, li wan dimeyizêne û dibuhure ji wan bi Melayê Cizîrî û yên ku bi wan re bûn. Gava ku yên ku bi Melayê Cizîrî re hati bûn, ku ji zarokan dibuhurîn, êdî pê de weke heyamekê ku pişt re diherin û digihine malê Melayê Cizîrî. Gava ku digihine malê, êdî bi hev re dikevine hewşa malê de û dibuhurine oda rûniştinê û ji xwe re dirûnin û dest bi axiftina dikin dîsan.

Mihemed gava ku bi Melayê Cizîrî re hati bû di rê de gelekî li dora xwe meyizandi bû. Gava ku meyizandi bû jî xwasti bû ku wan deran nas bike û mirovên wê derê bibîne. Mala Melayê Cizîrî jî ji mizgeftê bêhtir ne dûr bû. Ji ber vê yekê jî bêhtir di nav malan de ne çû bûn. Tenê di tara ku di navbera mizgeftê û malan de bû buhurti bûn. Gava ku hati bûne malê jî çûbûn odeya civatê û ji xwe re rûnişti bûn û bi hev re dest bi axiftina kiri bûn. Mala Melayê Cizîrî hinekî mazin bû. Çûn û hatin jî gelekî tê de hebû. Melayê Cizîrî li Cizîrî Bota dima. Li wir li malê bêhtir ne dima. Ji ber vê yekê jî birayê wî ye ku biçûk bû li wî malê dima. Birayê wî yê biçûk bi nav digotinê Semîr. Lê birayekî din jî hebû û ji wî ji biçûktir bû. Ew jî navê wî Nebî bû. Piştî Melayê Cizîrî, yê mazin û Semîr bû. Di nav civatan û guftûgoyan de li gotina wî baş dihate hesandin. Piştî ku Melayê Cizîrî çûbû ber bi Amedê ve, êdî dayika wan Kudu ku digihê ber dilovaniya Xwedê. Dayika wan gelekî rêz jê re dihate girtin. Malbavê wê li Cizîra Bota bû. Malbavê wê ji koka xwe ve digiha mala Mîrê Bota. Ew bi xwe jî yeka di nav civatan de xwedî gotin bû. Gelekî jî xweşik bû. Xiftana rengîn jî her dem lê bû. Keçeke wê jî hebû û navê wê Sosin bû. Keça wê piştî ku digihê demê mêr, digihê kurê Mir. Mêrê Kudu jî navê wî Mihemed bû. Mihemed jî serekê eşîrekê bû. Ew bi xwe jî kurê axê bû. Gava ku bavê wî digihê ber dilovaniya Xwedê, divêt ku Mele bikeve di

dewsa wî de. Lê rê dide birayê xwe yê ku ji wî biçûktir bo vê yekê. Bîrayê wî jî her weha dikeve dewsa bavê wî de. Di rastiyê de yê mazin ew bû. Diviya bû ku ew ketiba cihê bavê xwe de. Lê wî xwe da xwandinê. Ew û birayê wî her dem bi hev re dewletî bûn. Birayê wî li gotina wî dihesand. Her weha Mihemed ta dawiya jiyane xwe berdewam dike. Lê gava ku digihê ber dilovaniya Xwedê, êdî birayê wî Semir dikeve dewsa wî de. Semir çawa ku bavê wî weke begekî bû û mirov her weha didît ew jî wilo dihate dîtin û naskirin. Çawa ku Mihemed rê dabû birayê xwe yê biçûk, her weha Melayê Cizîrî jî rê dabû wî. Mirov car bi car digotiyê Semir Beg. Xatûna wî navê wê Zerîn bû. Zerîn gelekî xweşik bû. Ew bi xwe jî yeka ruyê wê fireh bû. Hinarokên wê her dem sor bûn. Lê sorkirineke xwezayî her weha li ser rûya wê hebû. Pora wê dirêj bû. Keziyên xwe jî dihonandin, hemawîyeke sor û yekê şîn jî ji keviyê ve di nav pora xwe de dihonand. Gava ku dihûnand jî milikên xeftanê xwe di ser de bi hevdu ve girê didê û diberda. Car bi car ji weke keçên ku ji nû ve digihan, pora xwe hine dikir. Li pêşiya vê jî gava ku lê dihate meyizandin, dihate dîtin ku her dem hinek qeranezên ku di sikra wê de bûn dihatine dîtin. Qeranezên ku di sikra wê de bûn yê nîvê, ku li ser singa wê bû mazin bû. Lê ji herdû aliyên sikrê ve ku ber bi jore ve diçû, ta ber bi ber qamçike ve biçûk dibûn. Wê her weha cil û qeranezên xwe bi xwe re gelekî baş kiri bûn ber hevdu de. Her weha gava ku lê dihate meyizandin, gelekî yeka ku lihevhatî dihate ber çavan. Ew bi xwe jî yeka ku bi xweşikatiya xwe re li hevhatî bû. Her dem jî xwe xwe li hev dide û derdikete hevberê mirov. Ne dihêşt ku mirov wê paşpalî bibînin. Ew bi xwe jî ne yeka ku paşpalî bû. Gelekî jî hez ji peyayê xwe dikir. Gava ku wê hev mar bikirina jî, hê berî hingê bi hev re hevdîtina wan hebû.Wan hez ji hevdu kiri bûn û bûbûn jin û mêrê hev. Di wê demê de jî gava ku li wan dihate meyizandin, dihate dîtin, ku hê weke wê roja pêşî hez ji hevdu dikirin û her wisan li hevdu dimeyizandin.

Piştî ku Mihemed û Melayê Cizîrî û yên ku bi wan re hati bûn odeya rûniştinê êdî bi hev re dest bi axiftinê kiri bûn. Lê bêhtir Melayê Cizîrî dipeyivî û mirov lê dihesandin. Mirovê ku hati bûne

wir, xwasti bûn ku li wî bihesênin. Ew ji ber vê yekê hati bûn. Mihemed jî di cihê xwe de rûnişti bû li wî dihesand. Gava ku Melayê Cizîrî dipeyivî, Mihemed bala xwe ji ser wî ne dibir. Axiftinên Melayê Cizîrî gelekî di serê Mihemed de cih digirtin. Melayê Cizîrî jî car bi car çavên xwe dibirine ser wî û li wî dimeyizand. Bala Melayê Cizîrî li ser wî bû. Melayê Cizîrî gava ku axiftina xwe hew dike, li Mihemed dizivire û dibêje: ‘ De ka vêca tu jî hinekî ji me re bêje da em jî hinekî ji zanebûna te hildin. Min li te hisand li mizgeftê û min dît ku te gelekî xwandiye û yekê zane yî. Mirov ku çendîn bixwîne, divêt biaxiftin be jî. Ma ne wilo?’ Gava ku Melayê Cizîrî her weha dipeyivî, êdî Mihemed jî dest bi axiftinê kir û her weha ji Melayê Cizîrî û mirovên li li civatê got: ’Mamosteyê hêja! Rast e, mirov bi zanebûna xwe re zane û jîr e. Ez ji aliyê Colemêrgê dihêm ku herime Cizîra Bota. Xwasteka min ew bû, ku Meleye xwe bibînim. Gava ku ez dihatime vir, di riya xwe de ez li gelek cihan ku navê mamosteyê min lê dihat ser zimên buhurtim. Ez hatime Ayserê jî. Ji wir bi rehberiya Mele Şefîq re nuha em li mala Meleyê xwe ne. Hevalên min yên din jî, ez di rê de rast li wî hatim’ Her weha gava ku Mihemed dipeyivî û axiftina xwe hew kir û pê de, Melayê Cizîrî carekê din peyivî: ’Tu gelekî bi xêr hatî! Hûn tev bi xêr û xweşî hatin! Tu hê ciwan î. Lê tu bi zanebûn î. Min ev yekê fahm kir. Bi min re wan mirovên ku li te hesandin, ji te têgehîştin ku tu zane yî. Madem ku tu wê herî Cizîra Bota were em bi hev re herin. Ez jî divêt ku sibe herim.’ Piştî ku Melayê Cizîrî ev yek got ji Mihemed re Mihemed pir dilxweş bû. Bi wê dilxweşiya xwe re, rûken li nav çavên Melayê Cizîrî dimeyizand û gotiyê: ‘Mamosteyê min! Heger em ne bin bar ji we re, belê, ez bi dilxweşî dihêm bi we re. Ez pir dixwazim ku bi we re riya xwe berdewam bikim.’ Her weha Melayê Cizîrî û Mihemed piştî ku hinekî ji xwe re di nav civatê de diaxifin, êdî riya xwe ya Cizîra Bota kiri bûne yek ku wê bi hev re biçûna.Mihemed ji aliyê gotinê ve gelekî pêşketî bû.Gotinên ku ji nav lêvên wî derdiketin weke beytan di serê mirov de diman. Her wek peyvên ciwan ên Melayê Cizîrî. Herdû jî di nav civatê de nêzîkî hevdu rûnişti bûn û bi hev re gotûbêj dikirin. Mihemed gava ku axifti bû navê seydayê xwe jî ji

wan re Goti bû. Êdî bala mirov hê bêhtir çûbû ser wî. Mirovên ji herêman gelek seydayê wî nas dikirin. Ji wan mirovên ku di civata Melayê Cizîrî de rûniştî bûn jî, ku seydayê Mihemedî nas dikirin hebûn. Melayê Cizîrî jî ew nas dikir. Melayê Cizîrî gava ku carekê çûbû Bazîdê nig Mir Mihemed Begî, li wir hev dîti bûn. Mir Mihemed Beg Melayê Cizîrî li nig Mîrê Bota nas kiri bû. Piştî ku ew nas kiri bû êdî xwasti bû ku Melayê Cizîrî were nig wî û bibe mêhvane wî. Her weha gava ku Melayê Cizîrî jî diçe mêhvanderiyaMir Mihemed Beg li wir rastî Seydayê Mihemed yê ku bi nav jê re digotinê Mele Hemedê Zivingî têt. Melayê Cizîrî gava ku rastî seydayê wî têt, bi hev re dimênin. Lê bêhtir jî li nig hevdu na mênin. Gelekî û gelekî jî di dilê hevdu de cih digirin û ji hev diveqetin. Gava ku ji hev diveqetin, hevdu ji bîr na kin di demê de. Melayê Cizîrî hê ew ji bîr ne kiri bû. Gava ku Mihemed bahsa wî kiri bû, di cih de ew hati bû hişê wî. Piştî ku Mihemed bahsa wî kiri bû êdî hinekî jî li ser wî bi hev re dipeyivîn. Seydayê wî jî gelekî ji faqiyên xwe re bahsa Melayê Cizîrî dikir. Her weha Mihemed jî gelekî der barê Melayê Cizîrî de ji seydayê xwe hez kiri bû. Melayê Cizîrî li herêman gelekî bêhtir û zû hati bû naskirin. Mirov ku çûba nig Mîrê Bota jî piraniya wî ji gotinên wî û bi dîtina wî re nas dikirin. Ew bi xwe li herêmên Kurdistanê gelek geriya bû. Ew gerandina wî, wî mazin dabû naskirin di nav xelkê de. Mirov gava ku ew dîti bûn, gelekî lê hesandi bûn û jê hîkarî wergirti bûn. Her weha Melayê Cizîrî, êdî mazin têt naskirin. Melayê Cizîrî divêt mirov bêjê, ku li gelek herêman di civatên mîran, began û axayan de mabû û xwe dabû hesandin. Bi vê yekê re mirovên wan herêman, êdî ew mazin nas kiri bûn. Melayê Cizîrî bi gotinên xwe re di serê mirovan de xwediyê cihekî ku gelekî mazin bû. Piranî jî gava ku bûbû seydayê Medresa Sor, êdî hê bêhtir ji aliyê mirovan ve hati bû naskirin. Mirov gelekî bahsa wî dikirin.  Êdî qor bi qor dihatine nig ku wî bibînin.

Melayê Cizîrî û Mihemed her weha demeke xweşj bi hev re dibuhurînin. Piştî ku Mihemed hati bû nig wî û wan jî hevdu dîti bûn û bi hev re çûbûn malê, êdî pê de ji xwe re rûniştî bûn û bi hev re dest bi axiftinê kiri bûn. Gava ew hati bûn malê, gelek mirovên

din jî bi wan re hati bûn malê. Hemû jî bi hev re li hevdu rûniştîbûn. Di wê heyama axiftinê de Melayê Cizîrî jî gelekî ji Mihemed hîkarî wergirti bû. Mihemed xwediyê zanebûneke mazin bû. Melayê Cizîrî jî vê yekê fahm kiri bû û ne weke feqiyekî, yan jî yekê ku nû bûbe mele. Lê weke mirovekî ku zanistvan be, tevdigere. Di rastiyê de jî Mihemed mirovekî zanistvan bû. Vê yekê jî, wî bi zanebûna xwe re ji mirovan re danî bû holê. Li nig Melayê Cizîrî ji her weha zanebûna xwe danî bû holê. Gava Mihemed û Melayê Cizîrî bi hev re dipeyivîn, Melayê Cizîrî çi pirs ji wî kiri bû, wî jî bersiva wî baş û têr dabû. Vê yekê jî hem bandûr li ser Melayê Cizîrî kiri bû û hem ji baweriya wî ya ku derbarê wî de xurt kiri bû. Her weha Mihemed û Melayê Cizîrî ta ber êvarî li hevdu rûnişti bûn û dipeyivîn. Gava ku bi hev re çû bûn û nivêjên êvarê (eşayê) kiri bûn, êdî pê de dîsan hati bûn û li hevdu rûnişti bûn û axiftina xwe berdewam kiri bûn. Her weha ta şev dereng şiyar mabûn û bi hevdu re guftûgo kiri bûn. Piştî ku diçin razên, Melayê Cizîrî hinekî din jî şiyar dimîne û li ser Mihemedî dikeve di nav hizirandinan de. Melayê Cizîrî wê şevê ta nîvê şevê şiyar mabû û li ser Mihemed hizirî bû. Wî çi jê pirsî bû, Mihemed jî bersiv dabû. Vê yekê jî di serê wî de ew dida mijûlkirinê. Melayê Cizîrî li gelek cihan geriya bû û gelek mirovan dîti bûn. Wî mirovên dixwandin ji gelek dîti bûn. Yên ku didîtin hema bêjê bi hemûkan re jî dipeyivî. Lê yekî jî ji wan weke Mihemed di serê wî de evçend cihê mazin ne wergirti bû. Melayê Cizîrî mirovekî ku bi meraq bû. Ji xeynî vê yekê jî, bi çendî ku bi mirovên zanistvan û mazin re dipeyivî û hizra wan dihilda û fahm dikir, ewçend jî bi xwendekarên xwe re jî didipeyivî û hizir û zanebûna wan fêhm dikir. Gelek caran jî di nav ciwanên ku li nig wî dixwandin û fêr dihildan, dikete guftûgoyan de û hizir bi wan re dida ravekirin. Her weha divêt mirov bêjê ku Melayê Cizîrî hez ji guftugoyan dikir. Gava ku Mihemed jî hati bû nig wî, bi Mihemed re jî her weha diket guftûgoyan de. Bi guftûgoyan re hizir û zanebûna Mihemed fahm kiri bû. Wê şevê ku Mihemed li wir ma bû, gelekî li ser wî dihizirî. Hebûna Mihemed li ber çavên wî jîndar bû. Melayê Cizîrî piştî ku şev belav bûbû û ew jî di odaya xwe ya rûniştînê de tenê ma bû, êdî keti bû nav behra hizran. Di wê dema

ku di odeyê de ma bû, hinekî hizirî bû û pişt re xwasti bû ku hinekî li pirtûken xwe jî bimeyizêne. Lê bêhtir ni kari bû, ji ber ku çavên wî êdî bêhtir ne didîtin ji ber xwandina bêhtir. Li ser xwe jî gava ku bêhtir dima, laşê wî diqerimî. Bi vê yekê re jî êş di laşê wî de dest pê dikir. Ji ber vê yekê ni kari bû ku bêhtir rûniştî jî bimîne. Lê wê şevê dixwast ku bimîne. Her weha xwesteka ku keti bû dilê wî de, bi wî re bû. Bi vî awayî Melayê Cizîrî, ta ji nîvê şevê mele bangdana li serê beyaniyên sibehê dimîne. Piştî ku bangdana sibehê dibe û ew jî nivêja xwe dike, êdî pişt re dike ku hinekî xwe dirêj bike. Her weha piştî nivêja xwe re xwe dirêj dike û dikeve xewê de. Gava ku dikeve xewê de, dimîne di xewê de ta ku dibe nêzîkî dema taştê. Berî ku bibe dema taştê, hinek hê zûtir dirabin ser xwe ji xewê û xwe amede dike û dikin ku herin odeya ku têde taştê bêt kirin. Gava ku Melayê Cizîrî xwe amede dike û dike ku ji odaya xwe ya rezanê derkeve, ku here odeya taştê têde, di devê derî de, rastî Mihemed têt. Mihemed ji xewê wek her car zû rabû bû. Lê di odaya xwe de mabû, ta ku mirovên din jî ji xewê rabû bûn ser xwe. Gava ku dîti bûn, ku mirovên din wa ne ji xewê rabûn, êdî ew jî ji odayê derketi bû ku here nig wan. Her weha gava ku ew jî ji odaya xwe ye ku têde raza bû, kiri bû ku derkeve, li devê derîyê odê rastî Melayê Cizîrî hati bû. Gava ku herdûkan rastî hevdu hati bûn, êdî pêşîkê rojbaşî ji hev re kiri bûn û pişt re dabûne rex hevdu ku herine odeya mazin, ya ku wê têde taştê bikirana. Gava ku diçin û digihine odeya ku wê têde taştê bikin û li ser sifra ku ji wan re hati bû amedekirin dirûnin, Mele Şafiq û Kêşê Tuma dihên. Ew jî gava ku dihên rojbaşî dixwazin û bi wan re li ser sifrê dirûnin. Gava ku ew jî tên û dirûnin Melayê Cizîrî dibêjê wan, ku dest bi xwarina taştê dikin. Piştî ku dest bi xwarinê dikin, Melayê Cizîrî li Mihemed dizivire û dibejiyê, ku di wê rojê de bi rêkevin û herin Cizira Bota. Mihemed di rex Melayê Cizîrî de rûnişti bû. Gava taştê dikin Mihemed bala wî li ser Melayê Cizîrî ye. Di wê heyamê de Mihemed dibîne Melayê Cizîrî weke ku ji cihêla xwe ve aciz bû, dihate xuyakirin. Ew cihêla wî ya rast e bin çengê wî û di dehma dilê wî de weke ku êş hebû, dihate xuyakirin. Car bi car jî Melayê Cizîrî destê xwe diavête wê cihêla xwe û pê re weke ku ruyê xwe

diqirmiçand. Mihemed gava ku wî dibine ku acizbûn pê re heye, ji wî dipirse ku ka çi yê wî heye. Lê Melayê Cizîrî dibêjê ku tiştekî wî dijwar nîn e. Her weha ji wan re dibêjê ku dibe ku ez bêhtir li ser ve cihêla xwe şevê mame ji ber wê yekê jî hinekî diêşê. Piştî vê yekê êdî tiştekî din na yêt gotin ji aliyê wî ve. Lê bala Mihemed her weha ji bo vê rewşê çû bû ser wî di wê heyamê de. Her weha ta ku taştêya xwe hew kirin jî, bala Mihemed li ser wî ma bû.

Piştî ku taştêya xwe dixwin, dibuhurin odaya rûniştînê ku hinekî ji xwe re rûnên. Di wê heyamê de ji karê Melayê Cizîrî û wan dihate kirin, ku wê bi rê ketiban ku çûban Cizîra Bota. Her yekê ji wan re hespek têt amedekirin. Ji Melayê Cizîrî re ji hespekî ku mahîneke sipî têt amedekirin. Hinekî mirovên din jî yên ku her dem bi Melayê Cizîrî re diman û ku sofî bûn, wan jî karê xwe dikirin ku wê pê re biçûna. Ji wan re hinek hûrmûr jî dihatine amadekirin ku wê bi xwe re biribana. Ji bo barê hûrmûran jî hinek hespên din ji bi hinek rehberan re dihatine amedekirin. Melayê Cizîrî wan deran tev nas dikirin. Lê bi têne û destvala jî ne dihate şandin. Ji ber vê yekê jî hinekî amadekarî ji bo çûna wî dihate kirin. Her weha ku weke heyamekê piştî taştê dirûnin êdî nûçe ji Melayê Cizîrî re têt ku wa ye amadekarî çûne hewbûnê. Gava ku nûçer ji wan re têt, êdî ew jî karên xwe dikin û pirtuk û nivîsên xwe didine hevdu û dikine turikên xwe yê rê û dirabine ser xwe ku derkevine derve û bi rêkevin. Gava ku dirabin û dihêne ji derve, dimeyizênin ku hespên wan hatine  amadekirin û li hêviya wan in ku herin û li wan suwar bin û bi rêkevin. Ew jî gava ku her weha dibînen, ku wa ne hespên wan amade ne, êdî ew jî diçin û li hêspên xwe suwar dibin û yên ku wê bi wan re bikevine rê de ew jî li hespên ku ji xwe re amade kirine suwar dibin û bi hev re ji maliyan xatirên xwe dixwazin û dikevîne rê de ku herine Cizîra Bota. Mihemed bêhtir hez ji suwarbûna hespan ne dikir. Lê ew jî di wê kêlîkê de li hespekî suwar bû bû. Gava ku ew li hesp suwar dibe, ji hespê dikeve, rex hespê Melayê Cizîrî. Bi hev re dikevine rê de û diçin ku herine Cizîra Bota. Li ser hespan gava ku diçûn, bala Mihemed li ser Melayê Cizîrî bû. Gava ku li Melayê Cizîrî dimeyizand, didît ku hinekî bêrewşî pê re hebû. Vê yekê jî bala wî baş û mazin

dikişande ser wî. Çend ku diçûn û ji gund dûr diketin, dihate dîtin, ku hê bêhtir bêrewşiyekê bi Melayê Cizîrî re xwe dida nîşandan. Di rê de gava ku heyamekê diçin, êdî digihîjine ber çemekî, ku ava wê diheriki ser ava Diclê. Gava ku digîhîjine ber çem, hinekî li wir dirawestin û bêhna xwe distênin. Melayê Cizîrî û yên ku pê re ne, ji hespan peya dibin, ku hinekî bêhna xwe divekin li ber wî çemî. Melayê Cizîrî têt ser wê avê û hinek av diavêjê ruyê xwe û hinekî jî di devê xwe de diwêrde û divexwe. Gava ku weke qederêkî li ser wê ava çem dimênin, êdî carekê din li hespên xwe suwar dibin û dikevine riya xwe de ku herin. Di rê de gava ku diçin hinekî ji xwe re dipeyivin jî ta ku dihêne nêzîki Cizîra Bota. Riya wan bêhtir ne dûr bû. Lê wan jî bi dilê xwe û bi hêdîka rê çû bûn. Gava ku digehîjine Cizîra Bota, êdî hinekî weke ku bêhn distênin li wan têt. Lê Melayê Cizîrî gava ku lê dihate meyizandin, dihate dîtin ku hinekî nebaş dihate xuyakirin.

Pêkve dihêne navênda Cizîra Bota êdî keşe Tuma jî ji wan xatir dixwaze û bi riya xwe de diçe. Lê Mihemed û Melayê Cizîrî û yên ku bi wan re bûn, bi hev re riya Medresa Sor digirin û diçine Medresa Sor. Her weha piştî ku digihîjine navêndê, êdî hinekî rê diherin û diçin û digihîjine Medresa Sor. Melayê Cizîrî û Mihemed gava ku dihêne Medresa Sor, bi hev re hinekî ji xwe re dikin ku rûnên. Lê dibînin ku rewşa Melayê Cizîrî hê bêhtir xira bûye. Her weha Melayê Cizîrî û Mihemed li medresê ta ber bi êvarê li hevdu dirûnin û dikin ku bipeyivîn. Di wê heyamê de nûçe çûye ji Mîrê Mazin re jî, ku Melayê Cizîrî hatiye. Gava ku Mîrê Mazin seh dike, ku Melayê Cizîrî hatiye, ew jî têt nig wî. Gava Mîrê Mazin jî têt Medresa Sor, êdî civat li Medresê digehîje hev. Lê têt dîtin, ku hin bi hin rewşa Melayê Cizîrî ji xirabtir dibû. Piştî heyamekê Melayê Cizîrî êdî na ke ku bipeyive. Ni kare di rûniştina xwe de, xwe li ser xwe bigire. Melayê Cizîrî her weha di nav mirovên ku li dora wî de bûn, ji xwe diçe. Gava mirovên dora wî dibînin ku rewşa wî pir giran e, êdî dirahêjinê û ew dibine ser cih. Melayê Cizîrî bihna wî jî hêdî hêdî kêm dibû. Gava ku ew hati bû dirêjkirin li ser cih, Mihemed jî li ber serê wî rawestiya bû. Hin bi hin tarîtî di çavên Melayê Cizîrî de dihat. Ew kêlîk, kêlîka dawiyê bû ji bo Melayê

Cizîrî. Êdî ev yek, ji aliyê mirovên li wir bûn jî, baş dihate têgehîştin. Melayê Cizîrî di wê kêlîkê de, hê çavên wî bi yekcarî tarî ne bû bûn, li nav çavên Mihemed meyizandi bû û her weha jê re Goti bû: ’hizra jiyanê û rastiyên jiyanê li vir bide van mirovan’. Mihemed ev gotin hîs kiri bû û fahm kiri bû. Pişt re bi yekcarî çavên Melayê Cizîrî diçine ser hevdu û behna wî êdî naçe û na yêt û bihn bi yekcarî diçike. Êşa wî dikeve di dilê mirov de. Melayê Cizîrî êdî giha bû ber dilovaniya Xwedê. Melayê Cizîrî gava ku ji dunyê koç kiri bû, 76 salî bû. Piştî ku Melayê Cizîrî digehê ber dilovaniyê jî, ji Medresa Sor na yêt veqetandin. Tirba wî li Medresa Sor têt avakirin û ew li wir têt bi cihkirin.

Melayê Cizîrî di sala 1642’yê de çavên xwe li jiyanê dimiçîne. Barkirina Melayê Cizîrî ji nav me, gelekî dilê mirov diêşîne. Piştî ku Melayê Cizîrî digehîje ber dilovaniya Xwedê, êdî li Medresa Sor domaneke nuh bi Mihemed re dest pê dike. Jiyana Mihemed êdî bi dema xwe ya zanistiyane li Medresa Sor, li Cizîra Bota dest pê dike. Jiyana wî, ji wir û pê de êdî bi çendî zanistvaniya wî, evînekê jî dike nava xwe de û her wisan berdewam dike. Ew ê ji wir û pê de, evîndarî û rastî, hizir û gotin, zanistvanî û jiyan, mazinatî û mirov, di jiyana wî de bi wî re were ser zimên.

DAWÎ